

# HAWAR

1

Hejmar 1 - 23

(( 1932 - 1933 ))



- **HAWAR .**
- **Weşanén Kombenda Kawa bo çanda Kurdî .**
- **Ji çapa NÛ DEM hatiye wergirtin amadekirina .**  
**F. CEWERI Stockholm 1998 .**
- **Çapa yekem Erbil - Kurdistan - 2001**  
**Tele - Fax : 2231886 .**
- **Beyrut - Liban . P. o . Box . 113/ 5933 .**
- **Kawa verband fur kurdische kultur e.v Adenauer**  
**Allee - 54 - 53113 Bonn - Germany .**  
**Tel : ( 0049 ) 228 242 5038 .**  
**Fax : ( 0049 ) 228 242 523 .**  
**E . mail . Komkawa @ T . on line . de .**

**Nomra spartiné li Reberatiya giştî**  
**Rewşenbîrî Hewlêr : 157 - 2001**  
**Çapxana Perwerde - Hewlêr**

## **GOTINA WEŞANVAN**

Bi dilgeşî hin ji kelpûré Bedirxaniyan dubare Çapdikin , ev malbata welatparéz û rewşenbîr ku emeké wan liser hemî kurdekî heye bisaya wan hîmé kurdayetiyé pencén xwe berdane nav axa kurdistané liher cih û warekî .

Di reçika wafadariyé de seroké kabîna çwara li heréma fidralî li kurdistana Iraqé rézdar **NÉÇÎ RVAN BARZANÎ** pirtûkxana Bedirxaniya li bajaré Dihoké danî . îro jî bipiştgîriya wî kombenda **KAWA** hin ji kelepûré Bedirxaniya çapû belav dike .

Hevîdarin rojén tén karibin hin karén tir divé riyé de pékbénin .

**Çavdéré gistî**  
**Kombenda KAWA bo çanda kurdf**  
**SALAĤ BEDREDÎN**

**Newroz**  
**2001**





# NAVEROK

**PÊŞGOTIN** ..... 15

**HEJMAR (1)** ..... 21

Armanc, awayê xebat û nivîsandina Hawarê

Ji xwendevanan re

Elfabeya Kurdî

Stûna Feqehan

Stûna Zarowan: buhar

Edebiyata Welatî

Hawar hebe, gazî li dû ye

Di dora dinyayê de

Xatirxwaziya Memî

Hêvi ji xwendevanan

Ferhengok

**BIRÊ FRENSIZÎ**

Buts et caractères de la revue Hawar

L'Alphabet Kurde

Notices sur la littérature, mœurs et contumes Kurdes

**HEJMAR (2)** ..... 41

Civata arîkariyê

.....

Ta, tawî û tabir

Dr. E. Nafiz

Lehî

.....

Du Egîd

Dr. K. A. Bedir-Xan

Elfabeya kurdî

.....

Gundê nûava

Qedrican

Ferhengok

.....

Tola welêt

.....

Xanî

Dr. K. A. Bedir-Xan

Berdêlk

Osman Sebrî

**BIRÊ FRENSIZÎ**

L'Alphabet Kurde

.....

La langue Kurde

.....



**HEJMAR (3) ..... 61**

|                        |                     |
|------------------------|---------------------|
| Hevxistina zmanan      | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Quncika bijîşkê        | Dr. E. Nafiz        |
| Pêrûzname              | Hamid Ferec         |
| Sîlêman Bedir-xan      | Qedrican            |
| Dibistan               | C. A. Bedir-xan     |
| Elfabêya Kurdî         | » » »               |
| Bi hênceta piroznamekê | » » »               |
| Ferhengok              | » » »               |
| Ma çima diçi           | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Lavelav                | » » »               |
| Şeva we xweş           | C. A. Bedir-xan     |

**BIRÊ FRENSIZÎ**

|                     |                 |
|---------------------|-----------------|
| L'alphabet Kurde    | D. A. Bedir-Xan |
| Le Folklore Kurde » | » »             |

**HEJMAR (4) ..... 81**

|                   |                     |
|-------------------|---------------------|
| Ber tevna mehîûrê | C. A. Bedir-xan     |
| Hacî Qadirê Koyî  | Hevindê Sorî        |
| Lawikê min        | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Elfabêya Kurdî    | C. A. Bedir-Xan     |
| Ferhengok         | » » »               |
| Yekbûn û yekîti   | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Wişyar bibin      | Hacî Qadirê Koyî    |
| Gotina welat      | Cegerxwîn           |
| Zerî Kubarê       | .....               |

**BIRÊ FRENSIZÎ**

|                       |                 |
|-----------------------|-----------------|
| Textes et Traductions | D. A. Bedir-Xan |
| L'alphabet Kurde      | » » »           |
| Folklore Kurde        | » » »           |

**HEJMAR (5) ..... 101**

|                  |                     |
|------------------|---------------------|
| Edebiyatî Kurdî  | Hevindê Sorî        |
| Loriya Bedir-Xan | C. A. Bedir-Xan     |
| Pirûziya Hawarê  | Seyid Hiznî         |
| Besreka Zêrîn    | Qedrican            |
| Dildiziya Gulekê | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Elfabêya Kurdî   | C. A. Bedir-Xan     |
| Welatî Kurdan    | Evdilxaliq Kerkûkî  |

Delaliya Zarowan  
Şin û Pesna Zîné  
Pesna Dêrikê  
Alê Kurdan

E. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Cegerxwinê Kurdî  
Herekol Azîzan

Ronigariya şagirtên kurdên Iraqê

BIRÊ FRENŞIZÎ  
L'alphabet Kurde  
Berceuse  
Floklore Kurde

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
D. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (6) ..... 121**

Hawar  
Zozanê Tocî  
Mar û mirov  
Ji min bawer bibe  
Melayê Cizîrî  
Dik û Rovi  
Hêva çardeşevî  
Ferhengok  
Ji bona Hawarê  
Gulbanakê Hişyariyê  
Berdêlk  
Hawar e  
Kurdewarî  
Sê malo gundo!  
Elfabêya Kurdî

Şakir Fettah  
Nemirê Miksî  
Çirokbêj  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
Çirokbêj  
Qedrîcan  
Herekol Azîzan  
Cegerxwin  
Mela Elî  
Qedrîcan  
Bozan Şahîn  
Faiqê Bêkes  
Stranvan  
C. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENŞIZÎ  
Un femme, Chef de tribu  
O, village de trois maisons  
Floklore Kurde  
L'alphabet Kurde

N. A.  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
D. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (7) ..... 141**

Kurdmanc Qenc in  
Cemilê Haco  
Le Hawarda  
Edebiyata Kurdî  
Mêrê min

Cemilê Haco  
C. A. Bedir-Xan  
Serjêr  
Hevindê Sorî  
Dr. K. A. Bedir-Xan

Cewabname  
Zarê Kurdmancî  
Mişo û Xido  
Elfabêya Kurdî  
Ferhengok  
Birin  
Ey Fecr  
Hesinker  
Delalê Eyşê

Helim Rifqî  
Hawar  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Lawikê Kurd  
Qedrican  
Stranvan

BIRÊ FRENSIZÎ  
O Belle Aîch  
Fables  
Memê-Alan  
L'alphabet Kurde

Herekol Azîzan  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
» » » »

**HEJMAR (8) ..... 161**

Şeraniya Zmanê Kurdmancî  
Edebiyata Kurdî  
Bêriya Welat  
Hawarek  
Rêya Teze  
Kurdeki Kiçik  
Elfabeya Kurdî  
Ferhengok  
Ji Xanî ra  
Strana Dilan  
Ez Goriya Bangê te me  
Ala Ku[r]dan  
Hişyarname  
Dawet e  
Yelî Delal  
Tirsim Ez Bimirim

C. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sorî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Weccî Cemîl Paşa  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
Behmen Zerdeştî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Mamoste  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Lawê Fendî  
C. A. Bedir-Xan  
Stranvan  
Dilokvan

BIRÊ FRENSIZÎ  
Memê-Alan  
Chansons

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan

**HEJMAR (10) ..... 201**

Leylana Rastiyê  
Eksi Sedayi Hawar

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Pîrot

Gelo ne Wisan e  
Ji mela û şexan re  
Ji pismamê min re  
Mîr û Kund  
Dilê min pir dişewite  
Yekîtiya herfan  
Elfabêya Kurdî

Qedrîcan  
Cegerxwînê Kurdî  
F. Mistefa Şahîn  
Koçerê Botan  
Selahedînê Serhedî  
Xweyiyê Hawarê  
C. A. Bedir-Xan

Îlhamî Hawar  
Ax Kurdistan  
Hey Weten  
Berdêlk  
Hişyarî  
Di Şorezeraqê de  
Ji xwendevanan ve

Gewran  
Silêman Bedir-Xan  
Xwedok  
Cegerxwînê Kurdî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Qedrîcan  
Hawar

BIRÊ FRENSIZÎ  
La musique Kurde  
Memê Alan  
O sans maison  
L'Alphabet Kurde

Pr. G. Michaelian  
D. A. Bedir-Khan  
Hereqol Azîzan  
D. A. Bedir-Khan

**HEJMAR (11) ..... 221**

Şîn  
Yekyetîman  
R. Bedir-Xan  
Dr. E. Bêreqdar  
Çîrçîroka Bingolê  
Elfabêya Kurdî

C. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sorî  
Hawar  
Hawar  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan

Sînor  
Meşheda Ibretê  
Zarînek  
Tabûta Bixwîn  
Şehîdê Gewre  
Zimanê min

Evdilxaliq Esîrî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Cegerxwînê Kurdî  
Qedrîcan  
M. Ehmed Botî  
Dr. K. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENSIZÎ  
Memê Alan  
Legende  
L'Alphabet Kurde

Dr. A. Bedir-Khan  
Herekol Azîzan  
D. A. Bedir-Khan



**HEJMAR (12) ..... 241**

|                      |                     |
|----------------------|---------------------|
| Yekyetîman           | Hevindê Sor         |
| Gazinda Xencera min  | C. A. Bedir-Xan     |
| Em çîman bişûnda man | Mistefa Şahîn       |
| Çaw                  | Gewran              |
| Strana Gulê          | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Yekitiya Kurdan      | Ş. M. Şahîn         |
| Taziye               | Mamosta             |
| Kew û Qitik          | M. Ehmed Botî       |
| Ker, Gur û Rovî      | Koçerê Botan        |
| Elfabêya Kurdî       | C. A. Bedir-Xan     |

|                 |                     |
|-----------------|---------------------|
| Le bo Şehîdekî  | Ehmed Namî          |
| Xeyal           | Tahir Fiad          |
| Yadî Weten      | F. Bêkes            |
| Ey Gelawij      | Gewran              |
| Heyv û stêr     | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Cegerxwîn       | Qedrîcan            |
| Gazî            | Evdirehman Fewzî    |
| Her biji        | Le Zibêr Kurd       |
| Nalnala Dil     | Îsmail Hebeş        |
| Hawar e         | Lawê Fendî          |
| Ziyareta Hawarê | Mistefa Mîlî        |

|                            |                  |
|----------------------------|------------------|
| <b>BIRÊ FRENŞIZÎ</b>       |                  |
| L'Alphabet Kurde           | D. A. Bedir-Xan  |
| L'ane le loup et le renard | Kotscherê Botan  |
| Memê Alan                  | D. A. Bedir-Khan |

**HEJMAR (14) ..... 281**

|                       |                |
|-----------------------|----------------|
| Komelî Zanistî        | S.....         |
| Reşoyê Darê           | Cemilê Haco    |
| Yekyetîman            | Hevindê Sorî   |
| Gazind û Gîlî         | Osman Sebrî    |
| Xuyabûnî Kurdî        | Ehmed Hemdî    |
| Le Kurdistan xwînî da | K.....         |
| Derdê Nezaniyê        | Lawê Fendî     |
| Du guharto            | Herekol Azîzan |

|              |                  |
|--------------|------------------|
| Ho Cegerxwîn | Evdilxaliq Esîrî |
|--------------|------------------|

Bo xawenî Hawar  
Ji kiriyaran re  
Ma em tenê  
Sekala  
Şêr û piling û rovi  
Duri Şehwar  
Belê em man  
Xemi Zalim  
Dadê  
Welat û dilê min

Apetîn  
Cegerxwîn  
M. F. Botî  
Hêmen  
Cegerxwîn  
Evdilxaliq Esîrî  
M. E. Botî  
Miço Mili  
Qedrîcan  
Dr. K. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENŞIZÎ  
Note sur la Bible-Noire  
Deux variantes

Dr. K. A. Bedir-Khan  
Herekol Azizan

**HEJMAR (15) ..... 301**

Şêx û axa û mineweran  
Kaxezî aşkiar  
Du Sersal  
Tûş ey Tebiet  
Cuhabên Koçerî  
Yekyetîman  
Kiroşk û Kûsî  
Kitêban

Haco  
Lawikî Kurdperwer  
Xekî Vexwendî  
Lawikî Kurd  
M. E. Botî  
Hevindê Sorî  
Bekrî Qotreş  
Hawar

Hevîn  
Qûy Qelan  
Delala Çavreş  
Bo Xanimêk  
Bêriya Welêt  
Kulilkên Ezêb

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Evdilxaliq Esîrî  
Evdirehman Fewzî  
Goran  
M. E. Botî  
Dr. K. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENŞIZÎ  
L'Alphabet Kurde  
Parlet de Hevêrkan  
Notice sur la bible-Noire

Dr. A. Bedir-Khan  
Hawar  
Dr. K. A. Bedir-Khan

**HEJMAR (16) ..... 321**

Sehîti  
Du bend  
Kurd û terbiye

Hevindê Sorî  
Cegerxwîn  
Lawikî Kurd

Zerêle  
Berê çawan bû

Evdirehman Fewzî  
Dr. K. A. Bedir-Xan

Strana çiyayikî  
Dest jê bû  
Kanî axa kurdan

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Newzad  
M. E. Botî

**BIRÊ FRENSIZÎ**  
De la grammaire kurde  
L'Alphabet kurde  
Notice sur la Bible-Noire

D. A. Bedir-Khan  
D. A. Bedir-Khan  
Dr. K. A. Bedir-Khan

**HEJMAR (17) ..... 341**

Şêx û axa û mineweran  
Hawara biyaniyekî  
Li ber tirba Şêx Seîd  
Ax li me  
Elfabêya Kurdî  
Dersxane

Evîn Cîwelek  
Hevindê Sorî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Ehmed Mêlik  
C. A. Bedir-Xan  
Hawar

Hubel wetan  
Çarînen Xeyam  
Kurdistana bê dibistan  
Tola Karwên

Kurdê Wanî  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
M. E. Botî  
C. A. Bedir-Xan

**BIRÊ FRENSIZÎ**  
De la grammaire kurde  
L'Alphabet kurde

D. A. Bedir-Khan  
D. A. Bedir-Khan

**HEJMAR (18) ..... 361**

Xwe binas  
Kurd û Kurdistan  
Şêr û gayê zer  
Ecêbên Dinyayê  
Elfabêya Kurdî

C. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sorî  
M. E. Botî  
Xeberguhêz  
C. A. Bedir-Xan

Şehname Şehîdan  
Çarînen Xeyam  
Welatê Kurdan  
Gotina Gewr  
Ji Kitêba Goranî

Cegerxwîn  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
F. Hesên  
Ibrahîm Mela  
Esîrî

Cuhaba dayikê  
Roja Nû

Hawar  
Dr. K. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENŞIZÎ  
De la grammaire kurde  
L'Alphabet kurde

Dr. A. Bedir-Khan  
Dr. A. Bedir-Khan

**HEJMAR (19) ..... 381**

Kurd û Kurdistan  
Xewna Rastiyê  
Sebat  
Dengekî Zerdeştîyan  
Biyaniyê çî dîtine  
Bi xwalê xwe ve  
Ferhengok

C. A. Bedir-Xan  
E. Hesên  
Ş. M. Şahîn  
Hawar  
Herekol Azîzan  
Nezîr Lewend  
Hawar

Hawar û Dildarî  
Serhedan  
Welat  
Çarînen Xeyam  
Şahname Şehîdan  
Lawiko

M.....  
Miço Mîlî  
Axayê Mirdêsi  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Cegerxwîn  
Stranvan

BIRÊ FRENŞIZÎ  
La femme Kurde

Dr. K. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (20) ..... 401**

Heyîneke yeksalî  
Du Dengbêj  
Xurtiya Bînahiyê  
Hevînd  
Ferhengok

Nivîsanok  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Çîrokbêj  
C. A. Bedir-Xan  
Hawar

Lavelav  
Serxwebûna Mirîşkan  
Revandin  
Cuhaba Lawanî  
Berxikê Hawarê  
Dilber  
Çarînen Xeyam

Osman Sebrî  
Cegerxwîn  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Qedrîcan  
H. Smaîl  
M. F. Botî  
Dr. K. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (21) ..... 425**

|                     |                     |
|---------------------|---------------------|
| Sehîti              | Lawekî Kurd         |
| Li Gornistana Amedê | Osman Sebrî         |
| Îlyas Efendi        | Cegerxwîn           |
| Şin                 | Hawar               |
| Ji dûr ve           | Osman Sebrî         |
| Eyloyê Pîr          | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Kurd yek in         | Şêx Heyderê Êzîdî   |
| Kîseyî pûç          | H.....              |
| Bîrhatiyek          | M. E. Botî          |

|                    |                     |
|--------------------|---------------------|
| Çarînên Xeyam      | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Peyameke Cegerxwîn | Cegerxwîn           |
| Ez bi şûr im       | Ebû-Inad            |
| Fermana Kurdan     | Remoyê Qenco        |

**BIRÊ FRENSIZÎ**

|            |                      |
|------------|----------------------|
| Sinêm Khan | Dr. K. A. Bedir-Khan |
|------------|----------------------|

**HEJMAR (22) ..... 445**

|                         |                     |
|-------------------------|---------------------|
| Jespên xweşxwanên kurdî | Cegerxwîn           |
| Şîna xwalê min          | Qedrican            |
| Mîr Mihê                | Cegerxwîn           |
| Tirba sipî û marê qut   | F. Hesên            |
| Sehîti                  | E. S. Gewrî         |
| Sehîti                  | Osman Sebrî         |
| Ibret                   | Cegerxwîn           |
| Nivîsevan               | Dr. K. A. Bedir-Xan |

|                 |                     |
|-----------------|---------------------|
| Çarînên Xeyam   | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Tairxek         | Evîn Ciwelek        |
| Berdêlk         | Lawê Fendî          |
| Wefdî Kurdistan | Pîremerd            |
| Tola bavan      | Heval Şikrî         |
| Bo xawenî Hawar | Ewnî                |
| Ax û keser      | M. E. Botî          |
| Newzad          | Hey dinya fanî      |
| Civatmiletan    | Selam               |

**BIRÊ FRESIZÎ**

|       |                |
|-------|----------------|
| Besna | Herekol Azîzan |
|-------|----------------|




**HEJMAR (23) ..... 465**

Zarê Dumilî C. A. Bedir-Xan  
Sehîti Cegerxwîn  
Sehîti Lacê Henî  
'Herwekî hate gotin Dr. K. A. Bedir-Xan  
Kurd û Kurdistan Herekol Azîzan

Çarînên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan  
Xwe nas bikin Feridûn  
Dilmestî Evîn Cîwelek  
Keleha Xursê Bijîşkê Mîran

**BIRÊ FRENSIZÎ**  
Memê Alan D. A. Bedir-Xan

|                               |            |
|-------------------------------|------------|
| <b>BEŞA TÎPGUHÊZIYÊ .....</b> | <b>585</b> |
| <b>HEJMAR 2 .....</b>         | <b>487</b> |
| <b>HEJMAR 3 .....</b>         | <b>488</b> |
| <b>HEJMAR 4 .....</b>         | <b>490</b> |
| <b>HEJMAR 5 .....</b>         | <b>493</b> |
| <b>HEJMAR 6 .....</b>         | <b>495</b> |
| <b>HEJMAR 7 .....</b>         | <b>497</b> |
| <b>HEJMAR 8 .....</b>         | <b>499</b> |
| <b>HEJMAR 9 .....</b>         | <b>501</b> |
| <b>HEJMAR 10 .....</b>        | <b>505</b> |
| <b>HEJMAR 11 .....</b>        | <b>512</b> |
| <b>HEJMAR 12 .....</b>        | <b>519</b> |
| <b>HEJMAR 13 .....</b>        | <b>526</b> |
| <b>HEJMAR 14 .....</b>        | <b>531</b> |
| <b>HEJMAR 15 .....</b>        | <b>536</b> |
| <b>HEJMAR 16 .....</b>        | <b>540</b> |
| <b>HEJMAR 17 .....</b>        | <b>543</b> |
| <b>HEJMAR 18 .....</b>        | <b>551</b> |
| <b>HEJMAR 19 .....</b>        | <b>560</b> |
| <b>HEJMAR 20 .....</b>        | <b>567</b> |
| <b>HEJMAR 21 .....</b>        | <b>584</b> |
| <b>HEJMAR 22 .....</b>        | <b>595</b> |
| <b>HEJMAR 23 .....</b>        | <b>603</b> |



# HAWAR hat hawara me!

Hawar dengê zanîne ye. Zanin xwe nasîn e.  
Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike.  
Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.  
Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin.  
Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e.

*(Celadet Ali Bedir-Xan, Hawar hej. 1, 1932)*

**K**ovara HAWARê gelekî bi derengî kete destê min. Ez bawer dikim min ew di Sala 1982an de bi dest xistibû. Niha nayê bîra min bê min ew çawan û bi kîjan riyê bi dest xistibû, lê baş tê bîra min gava ew ketibû destê min, fena ku malê dinyayê bûbû yê min. Ez ji xwendina wê têr nebûbûm. Mîna ku min tişteki xwe yê bi qîmet winda kiribû û dîsan ew dîtibû. Hawarê ez hê bêtir bi nivîsandina kurdî ve girêdabûm. Şêrîniya zimanê kurdî bi min şêrîntir kiribû; fikra dostanî, xweşbînî û bêhnfirehiyê li ba min bi qîmet kiribû. Ez ber bi cihana kurdîtiyê, ber bi kûrîtiya dîroka kurdan ve ajotibûm. Xwendina çîrok, stran, şîret û gotarên di Hawarê de tameke bi lezet dabû min. Bîrbîrî û sergiraniya Celadet Bedir-Xan, hêviya peyda-bûna entelektueliyeke kurdî li ba min xurt kiribû. Hêviya entelektueliyeke kurdî ya xurt, hêviya biserketinê dabû min. Ew Hawara bi çapeke piçûk û bi aleke kurdî pêçayî, ji bo min, bersiveke herî di cih de ya li dijî politikayên asîmilasyon û înkariyê bû. Niha, gava ez rûpelên Hawarê di ser hev re diqulîpînim, ez rêdigihîjim ku Mîrza Hemreş Reşo bi jinûveçapkirina Hawarê zehmetiyeke çawan kişandiyê, karekî çiqasî baş û pîroz kiriye. Ez bawer dikim, ger ne ji vê fikir û xebata Hemreş Reşo bûya, wê Hawar bi tenê di arşiv û pirtûkxaneyên hin entelektuelên kurdan de bima û wê nivşek ji xwendina Hawarê bêpar bima. Bêparmayîna wî nivşî, wê di warê zimên de gelek serêşî bi xwe re baniya. Hemreş Reşo bi jinûveçapkirina Hawarê, hem Hawar ji mirin û jibîrkirinê parastiyê, hem ew gihandiyê nîşkekî, hem jî rê li ber berberî û nelihevkerinên zimanê kurdî girtiye.

Niha, gava mirov li dîroka Hawarê û li rola wê ya troyîn dinihêre, di salên heftêyan de çapnebûna Hawarê, hem di warê zimên û rola zimên de, hem jî di warê hî-

sên milî û xwenaskirinê de, kêmasiyeke mezin e. Di salên heftêyan de, bi taybetî ji 75an heta 80yî, li bakurê welêt tevegrike xortan ya xurt hebû. Dînamîka salên heftêyî mîna bombeyekê ji teqandinê re amade bû. Lê ev dînamîka ha bêtir angajeyî siyaseta bû. Ger bi qasî karên siyasî, karên edebî û çandî jî hatibûya kirin û di wan salan de kovara Hawarê li bakurê Kurdistanê an jî li Tirkîyeyê hatibûya çapkirin, wê li hemberî pêla asîmilasyonê bibûya bendek. Lê mixabin, ew nivîşê li welêt, ji peydakirin û xwendina kovara Hawarê bêpar ma; yên ku derketin derveyî welêt, ev kovara ku di dîroka edebiyata me de rola wê ne kêmî rola pirtûkeke pîroz e, li biyanîstanê bi dest xistin. Dîsan li vê biyanîstanê, dostê hêja, rehmetiyê Mihemed Bekir, bi zewq û besteke mezin li derxistina Hawarê mijûl bûbû. Wî bi çapeke bedew, ji hejmara îrê heta hejmara 9an, mîna cildekê derxist. Lê nexweşiya kambax pêxîla vî dilşewatê kurd berneda û hê berî ku ew bigihîje armanca xwe bi cih bîne, wî ji nav me koç kir. Mîrov dikare bibêje, ku di pêla dudan ya danasîna kovara Hawarê de, rola rehmetiyê Mihemed Bekir gelekî mezin e. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike.

Mîna jinûveçapkirinên Hawarê, destpêka weşana wê jî her li derveyî welêt bûye. Piştî şikestina serhildanên Dêrsim û Agiriyê, piştî xebatên dûr û dirêj, Celadet Bedir-Xan, bingehê kovara xwe li Şamê datîne. Ew hejmara pêşî di 12ê îlona 1932an de derdixe. Celadet Bedir-Xan dixwaze bi derxistina kovara Hawarê di dîroka kurdan ya nûjen de rûpelekî nû veke û kurdiya ku bi salan di bin nîrê zordestiyê de maye, rizgar bike. Wekî din, ew bi kovara Hawarê kevneşopiyekê jî dişikîne; dev ji nêvî bi tirkî û nêvî bi kurdiyê berdide, an jî bi temamî dev ji zimanê tirkî berdide û di şûna wê de kovara xwe, çend rûpelên frensîzî ne tê de, xwerû bi kurdî derdixe. Celadet beg dixwest bi riya Hawarê kurdan bi zimanê wan, bi girîngiya zimanê wan; bi gotineke din, bi hebûna wan bihesîne. Gava mirov çavekî li her 57 hejmarên Hawarê digerin, mirov dibîne ku Celadet Bedir-Xan vekirî tu îdeolojî nepesinandine, kurd nekirine sinif û tebeqe, sinif û tebeqeyek negirtiye û li dijî sinif û tebeqeyêke din şer nekiriye. Di ferhenga wî de gotina "kurd" tê maneya biratî, hevaltî û dostaniyê.

Di welatekî bê dibistan de, bê perwerdeya bi zimanê mader de, wî dixwest bi Hawara xwe dibistaneke milî ava bike; tê de fikir û ramanên milî, tê de dostanî û biratiyê belav bike.

Lê dema wî demeke bédengiyê bû; demeke şikestina kurdan, demeke tirs û sargunan bû. Kurdên xwende kêm bûn, yên hebûn jî ne ewçend nêzikî zimanê kurdî bûn. Celadet dixwest bi riya Hawarê hem nivîskaran çêbike, hem jî xwendevanan

bigihîne. Wî destê alîkariyê dirêjî Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza û hinên din kir, ew ber bi cîhana nivîskariyê ve kişandin û bi xêra wê dibistanê ye ku îro navê van kesayetiyên kurdan nemir bûne. Hem ew kesayetiyên kurdan nemir bûne, hem jî bi xêra Hawarê zimanê kurdî yê edebî zindî maye. Ji xwe gava Celadet Bedir-Xan destê xwe ji siyasetê dikişîne û xwe bi hemû hêza xwe davêje qada ziman û edebiyatê, ew ê li van rojan fikirîbe. Li gorî delîlên ku li dû wî mane û li gorî gotinên kevaniya wî Rewşen Bedir-Xan ku ez di sala 1987an de li Baniasê lê bûbûm mêvan, Celadet Bedir-Xan derwêşekî karê xwe bûye. Wî hemû xebata xwe li ser siberrojê ava kiribû. Ji bo me bû, ji bo nivîşkî berî me bû. Lê nivîşê berî me pê nehesiya û tê re buhurî, lê ev nivîşê me pê hesiyaye û mîna ku li xezîneyekê rast hatibe, bi herdu destan lê xwedî derdikeve. Hebûn û maneya Hawarê îro ne bi tenê ji bo kurdiya nivîskî, lê ew li ba kurdên îro mîna otorîte jî hatiye qebûl-kirin. Ez bawer dikim ger îro kovara Hawarê tunebûya, me ê di warê zimanê nivîskî de gelek serêşî ji hev re derxista. Îro, piraniya partî û rêkxistinên kurdan, piraniya çapemeniya kurdî li ser rîya Hawarê diçin. Ev jî, ji bo rojên pêş kêfxweşiyekê di-de mirov.

Mîna ku min di destpêkê de jî got ku kovara Hawarê cara pêşî di sala 1982an de kete destên min, lê hinek hejmarên wê yên eslî, di sala 1987an de gava ez li Baniasê li Rewşen Xanimê bûbûm mêvan, wê dabû min. Wê ji min daxwaza çapkirina hemû hejmarên Hawarê kiribû. Ji bilî Hawarê jî wê hinek pirtûkên weşanên Hawarê û xebata Celadet ya li ser zimên "Bingehên Gramera Kurdmancî" dabûn min. Me "Bingehên Gramera Kurdmancî" mîna pirtûk di sala 1993an de weşand. Lê herçî jinûveçapkirina Hawarê bû, hem hemû hejmar li ba me peyda nedibûn, hem jî ji bo karekî weha cesareteke mezin, cidiyet û berpirsiyariyeke taybetî diviya. Gava di destpêka salên 90î de me di bin bandora Hawarê de dest bi weşandina kovara NÛDEMê kir, em hê bêtir li ser derxistina Hawarê fikirîn. Hejmarên ku li ba me kêmbûn, me ji ba Mehmed Uzun û Mahmûd Lewendî peyda kirin. Herdu hevalan jî bê ku tu keleman ji me re derxin, arşivên xwe ji me re vekirin; ez li vir spasên xwe yên ji dil ji herdu hevalan re pêşkêş dikim. Herweha, dostê hêja Emîn Narozî bi xebata şev û rojan tîpguhêziya her 23 hejmarên pêşî kir; ne ji vê xebata wî bûya em ê ji xwendina wan ya latînî bêpar bimana. Ez li vir gelekî spasî wî jî dikim.

Mîna tê zanîn, her 23 hejmarên pêşî bi herdu alfabeyan; ango bi alfabeya erebî û latînî dihate weşandin. Ji hejmara 24an hera ya 57an tenê bi alfabeya latînî hate weşandin. Hem di destpêka kovarê de hem jî di berdewamiya weşana kovarê de ji bilî zaravayên kurmançî, mirov pêrgî zaravayên soranî û zazakî jî tê. Ji ber ku zaravayê



soranî îro jî bi alfabeya erebî tê nivîsandin, me hemû nivîsên soranî neguhestin alfabeya latînî, lêbelê me bi tenê ew nivîsên soranî ku pevgerêdaneke wan an bi kovarê re an jî bi nivîsên kurmançî re hebûn, guhastine. Herçî nivîsên zazakî ne, ji ber ku îro ev zarava bi alfabeya latînî tê nivîsandin, me tîpguhêziya wê kiriye. Lê me di tîpguhêziya hersê zaravayan de jî, tîpa "q" û "k" rast, yanî mîna îro bi kar anîne. Di 23 hejmarên pêşî de tîpa "q" di şûna "k" de û tîpa "k" jî di şûna "q" de dihate bi kar anîn. Di guherandinên hejmara 24an de, em dibînin ku hem alfabeya erebî ji kovarê radibe, hem jî herdu tîp mîna ku em îro bi kar tînin, têne guhertin.

Herçiqas em di destpêkê de fikirîbûn ku Hawarê weke cildekê derxin jî, lê paşê me maqûltir dît ku em bikin du cild. Cilda yekê ji 23 hejmarên pêşî û beşa tîpguhêziyê pêk tê û cilda dudan jî ji hejmara 24an heta ya 57an e. Me ji bo her cildekê naverokên cihê çêkirine, lê me hejmarên rûpelan ji hev veneqetandine. Dibe ku hin hejmarên bi zehmetî werin xwendin hebin, lê me ev yeka han da xatirê orjînalê û me nexwest em hemû hejmaran ji nû ve binivîsînin û orjînalê kovarê xerab bikin.

Me bi vê xebatê xwest ku em di sedsaliya rojnamegeriya kurdî de careke din balê bikişînin ser xwendin û nivîsandina zarê kurdî û careke din Hawarê û xwedî û berpirsiyarê wê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan bi bîr bînin.

Firat Cewerî  
Stockholm, 1998

**X**wedi û berpirsiyarê HAWARê Celadet Alî Bedir-Xan di sala 1893an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Ew kurê Emîn Alî Bedir-Xan û birayê Kamiran û Sureya Bedir-Xan e. Di warê siyasî, kulturî û edebî de, rola Celadet û malbata wî mezin e. Malbata Celadet ku bi têkoşîna xwe ya ji bo avakirina Kurdistanê navdar e, piştî avakirina cumhûriyeta Tirkiyeyê, ji aliyê karbidestên cumhûriyetê ve tê surgunkirin. Bavê Celadet, Emîn Alî û birayê wî Sureya li Misrê bi cih dibin û Celadet û birayê xwe Kamiran jî ji bo xwendinê diçin Almaniyayê. Celadet li Almaniyayê doktoraya xwe ya huqûqê dike û di salên sihî de vedigere Şamê. Şam hingî di destên fransîzan de ye. Celadet li wir dest bi têkoşîna kurdariyê dike û dibe yek ji pêşengên tevgera Xoybûnê yê girîng. Piştî ku serhildana Agiriyê têk diçe, Celadet Bedir-Xan destê xwe ji siyasê dikişîne û xwe bi hemû hêza xwe dide kultur û edebiyatê. Ew di sala 1932an de dest bi weşandina kovara HAWARê dike. Ji sala 1932an heta 1943an 57 hejmarên HAWARê derdikêvin. Ji bilî kovara HAWARê jî wî ji nîsana 1942an heta adara 1945an bi navê RONAHîyê kovareke din derxistiye. Ev kovara ha jî xwerû bi kurdî bû û li ser hev 28 hejmar derketine. Ji bilî kovarên HAWAR û RONAHîyê Celadet Bedir-Xan ev pirtûkên ha jî nivîsandine: *Elîfba Kurdî, Rêzimana Kurdî, Ferhengê Kurdî, Rêzana Elfabeya Kurdî, Rûpelên Elfabê, Dîbaca Mevlûdê, Dîbaca Nivêjên Êzdiyan, Mektûb ji Mustefa Kemal Paşa re, Ji Mesela Kurdistanê, wergera çîroka Conî û Cimêma* û bi dehan nivîs û gotarên çapkirî û neçapkirî... Herweha Celadet Bedir-Xan digel birayê xwe Kamiran bi nîya weşanên Hawarê bi dehan pirtûk pêşkêşî pirtûkxaneyê kurdî kirine.

Celadet Bedir-Xanê ku ji bilî navê xwe li dor deha navên din jî bi kar anî ye, di 15. 7. 1951ê de mîna gelek pêşeng û rewşenbîrên kurdan, ji welatê xwe dûr, li Sûriyê wefat kir. Ew niha li goristaneke Şamê veşartî ye.



SAL 1  
~~~~~  
YEQSEMB

# HAWAR

HEJMAR 1  
~~~~~  
15 GULAN 1932

Qomela Qurdi \* Revue Kurde


## Çêdaxizîyên Qomelê

Armanc, awayê xebat  
û nivîsandîna Hawarê  
Ji xwendevanan re  
Elfabêya Qurdi  
Stûna fekehan  
Stûna zarowan : buhar  
Edebiyata welatî  
Hawar hebe, gazi li dû ye  
Di dora dinyayê de  
Xatirxwaziya Memî  
Hêvî ji xwendevanan  
Ferhengê

### Birê Frensîzî

Buts et caractères de la revue Hawar  
L'alphabet Kurde  
Notices sur la littérature, mœurs et  
coutumes Kurdes

çapxana Torokî 1932 — 3em





## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

## Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandîna Hawarê

Hawar dengê zaninê ye. Zanin xwe nasin e, xwe nasin ji me re rêya felat û xweşiyê vediqe.

Her qesê qo xwe nas diqê; diqare xwe bide nas qirin.

Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo zman şerta heyîna pêşin e.

Hawar jî pava bi her tiştê qo qurdanî û qurdîtiyê pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaseta jê dîr e, xwe na xwe siyaseta.

Hawarê siyaseta ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyaseta bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanin, hiner û sinhetê de dê bixebitin.

\*\*\*

Awayê xebatê. — Qareqî qo biqare biçê serî, divêlê jê re pronivîsêq bêt çêqirin. Me pronivîsa xwe ser bingehên jêrin lêqirîye.

1 — Belavqirîna Elfabêya qurdî di nav qurdan û hîngirîna wê. Senifandîna zmanazîna qurdî û bin bi hin di qomelê de belav qirin û pêşdetir di şîqlê qitêbê de derêxistin.

2 — Sehîtiya zarên qurdî û berhevdanîna wan. Sehîtiya ser mirovatiya zmanê qurdî digel zmanên din ên arî. Sehîtiya ser bingehên zmanê qurdî, ser dîroq û awayê rabûn û pêşveqetîna wî.

3 — Berhevqirîna çîroq, çîrçîroq û her texlît laje û stranên qurdî û birêve belavqirîna wan.

4 — Senifandin û belavqirîna diwanên qurdî. Bi van ve jînenîgarîyên şair û mirovên bijarte jî dê bîna belav qirin.

5 — Sehîtiya ser reks û Keydeyên stranên qurdî.

6 — Sehîtiya ser her texlît rêzîqên qurdî û Qurdîstanê, yên zmanê borî û yên îrî û senifandîna wan. Sehîtiya ser hatîna Kurdîstanê û pêş û sinhetên qurdî.

7 — Dîroq û erdnîgarî:

Sehîtiya ser tevayîya dîroq û erdnîgarîya welatê Qurdîstanê û ser dîroqa çîran, berî, paşî û di wextê Mir-Seref de.

\*\*\*

Awayê nivîsandîna — Di heke zmanê me de heta niho gelek tişt hatîne gotin. Lî nav van gotinan de tiştîna rast û nerast jî hene.

Ez qo qurdî û qurdmançmanîm û zmanê xwe rind dîzanîm û min ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wî hîrhîmandîna; keydeyên wî jî hev derêxistine. Diqarîm jî biyantiyan bêtir û kenctir deqêra wî bidim xuya qirin û zanin.

Zmanê me îrî hem freh hem teng e.

Freh e: Pî her tiştê qo qurdî pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî wari de zmanê qurdî hing zmanên din û jî binan bêtir pêş ve çûye, û qemiliye, û jî tu zmanên qemeli bî şûn de ne maye.

Teng e: Herçî qo jî qurdan re nenas mane û qurdî pê mijûl ne bûne, di wî wari de zmanê me rawestiyaye, pêş ve ne çûye, di cihê xwe de maye.

Lê zmanê me jî wan zmanên e qo ber her tiştê nuh, pîrsên nuh dîzên û birêve pîrsên nuh jî wan çar dibin.

Herweqî xelqê Geliyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare ditin, tavil bizarê xwe balafir nav lê qirin. Ji lewre

qo ji banî, ji bala ditre. Disan qurdmancinen qo telefon ditin, ji mesmela wê re bihistoq gotin. Ji ber qo deng pî têt bihistin.

Niho em vegerin ser gotna xwe; ser awayê nivisandina zmanê xwe.

Jrû di zmanê me de du texlit qemani hene: wînda bûna pirsinen qurdî û qetina pirsinen biyani nav zman.

Em çî b qin qo zmanê me biqare vegere ser xuritiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de biqemile û bibe zmaneqî teqûz:

Di wînda bûna pirsan de, pirsin hene yeqar wînda bûne, hin hene ji zareqî qetine lê di zareqî din de dijin û çendeq hene di axaftinê de qem tene gotin lê di mamîq, medheloq, çiroq û stranan de tene bihistin,

Em li peywan in, hin bi hin em wan dixin dest û disenifin û gora mehcetê ji ji nuh ve ser awayê hevedudanina pirsên qurdî pirsinen nuh çêdîqin,

Ji bona pîşveçûna zman, divêt em bendên xwe bi tevayiya van pirsan binivîsinin û li paşîya her hejmarê ferhengoqê danin û tê de mana pirsên qo di zaran de qem bûne û yên qo ji nuh ve hatine hevedudanin ji xwendevanên xwe re bidin zanin. Ji xwendevanên xwe hevî diqim ferhengoqa me kenc bixwînin û di hekê pirseqê de qo fiqreqa wan hebe ji me re binivîsinin; heqê cîyoqa pîrseqê bizanin, ewa ha ji tev mana û ferken wê digel cîyoqa xwe ji me re bidin zanin.

Weqo: rêqirin, şandin, hinartin cîyoqên hev in. Lê di mana rêqirinê de ji manî şandin û hinartinê farkeq heye. rêqirin, herhal, bi rê êxistin û şandin e.

Disan, xeberdan, axaftin, peyivîn cîyoqên hev in. Gelo di nekeba wan de çî ferk hene?

\*\*\*

Hawar zaroqeqa nûza ye. Zarowa me ye; zarowa qurdan e. weq her zaro bi xweyitiya dê û bav, bra û pîsmanên

xwe diqare bîji. Herqes, her qurd diqare ariqariya hawarê biqe.

Tuqes mebeje qo, ez miroveqî reben û neqêrhattî me. Ji min ji diayê pêve tişteq naye.

Belê, tuqes wê xeberê mebeje, herqes bi tişteqî, bi awaqî diqare bê hawra hawarê. Tinê di be qo awayê hawarê nizane. Jê re çend awa hene:

1— Qiriyarê hawarê bûyin û jê re qiriyaran peyda qirin

2— Navên mirovên xwendewar lê nemaldar, qo niqarin qiriyar bibin, û navên medresan ji me re dan zanin. Da qo hawar ji wan re herwe bête şandin.

3— Paş xwendina hawarê ji heval û nasên xwe re dan xwendin û ji mirovên nexwenda re bi xwe xwendin û ew ser tîdexistiyên qo melê serwext qirin

4— Ji hawarê re her texlit şîhr û bendan nivisandin.

5— Çiroq, medheloq û mamîqan berhev qirin û ji hawarê re şandin.

6— Di hekê welat, eşir, bajar û gundê xwe de tiştên qevn û nuh ji hawarê re rêqîqin:

7— Her texlit bergehên Qurdistanê peyda qirin û digel wêşên wan ji me re hinartin.

Ji gotinên jorin kenc dixuye qo ji hawarê re ariqirin geleq hêsani ye. Qesê qo dil biqê dê biqare ji.

\*\*\*

Di destpêqê de qomela me di pînzdeh rûjan de careqê dê derqeve. Piştî çend hejmaran qomela me dê bibe helteqî û li serê her heftêyê dê belav bibe.

#### Ji XWENDEVANAN RE

Hawar hawara we ye,

Deng û gazîya we ye.

Jin û zanina we ye,

Werî, hawara xwe bin,

HAWAR

# Elfabêya Qurdi

BI NAVÊ YEZDANÊ PAQ Ê  
DILOVAN Û MIHRIVAN

Elfabêya qurdi ji sih û yeq herfan hevedudani ye:

a b c e ç d i g h x ê j i k q u  
l m n o p r s ş t û f v w y z .

Herf di dengdayiyê de du texlit in:  
dengdêr û dengdar .

Dengdêr ew herf e qo dixwedeng e. û  
dengê wê bi serê xwe derdixwe û dengê  
dengaran derdixîne .

Dengdar ew herf e qo dixwedeng e,  
ê belê dengê wê bi serê xwe û bê ariqarîya  
dengdêrê dernaqeve .

Di zmanê qurdi de heşt dengdêr  
hene :

a e î ê i u o û

Lewre qo di denganiya qurdi de  
dengdêrêq geh qin û geh drêj nabe deng-  
dêrên qurdi di drêjahiya dengên xwe  
de serseqini ne : qin û drêj in.

Dengdêrên qin :

e i u

e - der دەر , şer شەر , ser سەر

i - qin قین , din دین , bin بێن

u - qurd کورد , qur کور , qul گول

Dengdêrên drêj :

a - av آف , sar سار , bar بار

ê - dêr دەر , şer شەر , mêr مێر

i - tir تیر , ziv زیف , şiv شیف

o - dor دۆر , sor سور , qor کۆر

û - qûr کۆر , şûr شور , dûr دۆر

Di zmanê qurdi de bist û sê dengdar hene:

b - bar بار , bav باف , ban بان

c - car جار , can جان , cîn جون

ç - çar چار , çûn چۆن , çem çēm

d - dar دار , dan دان , dîn دین

g - gav گاف , giş گیش , garan گاران

h - him هیم , hêja هێجا , halan هالان

a - xani خانى , xwarin خوارن , xêr خێر

j - jin جین , jor ژور , jazî ژازى

k - kir کیر , kenc کەنج , keli کلی

q - qa قا , qer کەر , qom کوم

l - lo لو , law لاو , lez لێز

m - mar مار , mêj مێژ , maq ماک

n - nan نان , nerm نەرم , nas ناس

p - par پار , por پور , pehn پەحن

r - rî رێ , rîl ریل , reş رەش

s - sar سار , sebat سەبات , sofî صوفى

ş - şor شور , şev شەف , şa شا

t - tîr تیر , takel تەکل , tûz تۆز

f - fanos فانوس , filan فلان , find فەند

v - vajî vajî , vala فالا , virnî فەرنى

w - war وار , weris وەریس , weq وەق

y - yar یار , yeq بەق , yari یاری

z - zor زۆر , zabit زابیت , nafiz نەفیز

Ji van pêve du herfên biyanî hene  
qo bireq ji qurdan wan dibêjin. Lewre  
qo ew herfên ha di eslên xwe de ne  
qurdi ne me ew ne dixistine nav elfabêya  
xwe .

Ew ji (ح) û (غ) ne, me ew du  
herf bi danîna du dekan ser «h» û «x»  
nîşan qirine .

h - hial حال , x - xar غار

Qo ev du dek qetin ev herfên ha  
vedigerin ser herfên qurdi û dibin «h»  
û «x» .

Ji xwe piraniya qurdan şîna (غ)

(خ) dibijta: xeyidin خەیدین , xeyidin خەیدین

Hawar denge zanîne ye . Zanin ji me

me ژ زانین . به زابینى دىكى ههوار

re rêya felat û xweşiyê vedîçe. Her qesê  
 کسی هر فداکه خوشی و فلات ری یا ره  
 qo xwe nas diqe diqare xwe bide nas  
 ناس بده خووه دکاره دکه ناس خووه کو  
 qirin. Hawara me berî her tiştî heyîna  
 هینا نشتی هر بری مه هوار . کرن  
 zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo  
 کو لوما کرن ناس بده دی مه زمان  
 zman şerta heyînê a peşin e. Hawar jû  
 ژو هوار . . . پشین آ هینا شرطا زمان  
 pêve bi her tiştê qo qurdani û qurditi pê  
 پێ کردینی و کردانی کر نشتی هر ب پێه  
 bendewar e dê mijûl bibe .

بیه . ژول دی . بندوار

Bi xêzên jorin ve me rêberî û rêz-  
 aniya elfabeya qurdi qutiqir. Ji nihopêde  
 bi hûrhûnandina hevedudanina wî dî  
 mijûl bibin

Dûmahîq heye .

### Stûna Fekêhan :

Pêrar, digel çend hevelan derqetî bûm  
 gerê . Çendegê di nav fekehan de mam .  
 Me sê çar medrese ditin Li hin medresan  
 de derqetî jî xelqê cih bêtir bûn. U nav  
 wan de xortên her welatî, her eşîrî peyda  
 dibûn Serhedî, Heza romî, Botî, Diyabe-  
 qri, Bidlîsî, Mûşî, h. p.

Bi ditîna min gelek qêfxweş dibûn, Ji  
 min ser qurdanî gelek tiştan dipirsîn. Pira-  
 niya wan bi herfên latîni jî dizanibûn.

Pêqve digotin qo qurdmanci bi herfên  
 latîni gelek kenc tet nivîsandin Ji bin paşî  
 lên xwe pelin derdixistin û jî min re di-  
 xwendin. Tedigot, hemî jî şair bûn. Şih-  
 rên wan tev ser welêt û millet bûn.

Weqo: Bêrtiya Botan, Zozana Şerevdînê.  
 Girên beriyê, Çiyayên Dêrsimê, Bidlîsa-qe-  
 vnar . . .

Girêdana wan jî qurdmanci bûn, Ji  
 xelqê cih re jî cilên qurdmanci dabûn we-  
 rgitin. Qolosen xwe bi xwe çêdîqirin.

Di nav xêstîne de min jî wan re da-  
 zanin qo dilêmin heye rûjnameqê qurdi  
 derêxînim .

Stûna Zarowan

## B U H A R

Buhar e , nuh buhar e ,  
 Tebiet gîş li qar e .  
 Çi heyadedan çî hal e .  
 Her tîst zendî rewal e .  
 Buhar e , ev buhar e ,  
 Tebiet gîş li qar e .

Berî dîhele li zozan ,  
 Stîrî şîn in li destan .  
 Qalîlq hej nuh sepal in .  
 Gul u bilbil heval in .  
 Buhar e , nuh buhare ,  
 Tebiet gîş li qar e .

Mij qetiye li doran ,  
 Hure-hur e tumberan .  
 Mih û berê in diqalîn ,  
 Qeu li mari dinalîn .  
 Buhar e , ev buhar e ,  
 Tebiet gîş li qar e .

Roj vedide minna bûq ,  
 Şun ve mane ba û pûq .  
 Şehar , zinar , lat û ber  
 Dîçîrsîn der bi der .  
 Buhar e , nuh buhar e .  
 Tebiet gîş li qar e .

Ji min daxwaz qirin qo ji wan re dî  
 rûjname de stûneqê veqim Di vêtûnê de  
 herçî qo di mederesan de nayîn xwendin  
 ji wan re bidim zanin.

Em welê lîqhatî bun- qo wan jî min  
 bipirsîn ez jî gora pîrsiyariya wan belsên  
 ser îlmû hîner jî wan re bêjim ,

Fekêhino! Eve stûna we. Hon hema  
 bipirsîn. Herçî ez bi xwe dizanim jî we  
 re bêjim , heqê di nav pîrsiyariyên we de  
 tiştêq hebe qo ez pê nîzanim jî wan bi  
 pîrsim qo pêdîzanin û jî we re bidim zanin.

## Edebiyata Welati

Edebiyata welati, ew edebiyat e qo ji jina mileti, ji his û dilê wî, ji dirîq û çirçiroqên wî, ji stran û lajeyên wî hiltet .

Qaniya wî, dilê milet, hisû heyata wî ye.

Tinê ev edebiyat e, qo germ rengin, bibihî û xwedan ruhnahtî ye.

Ji vê edebiyatê, dengêblûr û dilanê, stranên çiyê, zizîya hevîn û hejqrnê bi teptepa dilan ve tîn bihistin.

Piraniya miletan pirçar vê rastiyê seh ne diqirin, ber ne diqetin .

Li ewropayê, mifetin hebûn qo hej zmanên xwe ne diqirin. Zmanên xwe qiqiq, teng, nespehî û nebeja diditin .

Ev hal di welatên rohelatî de ji dihat ditin .

Herweqî di nav qurdan de, heçt mirovên zana radibûn qitêbên xwe ne bi zmanê qurdi lê bi zmanê biyantyan dinivisandin .

Piştî xebata sedan salan ; di welatên ewropa û rohelat de hate seh qirin qo ev rê dernaqeve û ev awa naçe serî .

Çiqo milet ji wan qitêban re guh ne dida û xebata wan mirovan herxurdar ne dibûn. Ber vê yeqê ev mirovên ha vegeyriyan ser zmanên xwe . Vêca xebata wan zûqa berên xwe dan û milet pey edebiyata wan çû .

Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateqê geş û zendî çar bû .

Êdin her qes zana nezana, bajari gundî qo xwendinê zanî be, zmanê wan seh diqirin , û qitêbên wan dixwendin .

Ji xwe welê ji diviya bû .

Ji ber qo ji nivisandin û belavqirîna qitêban kesd ew e qo his û fiqrên kenc biqevîn nav xelqî, di dil û serên wan de çih bigirin .

Ji mesela zmanî pëve meseleqê din ji heye .

Herweqî nas e , fiqr û his di dora zmanî de xwe digehîtin hev. û her zman fiqr

û hisên xwe û awayê gotinê xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin , û pey zmanên xwe diqevîn .

Bi vî awayî digel zmanî fiqr û hisên biyantyan ji tîn diqevîn nav me , di dil û hisê me de çih digirin , û rû û gonê me ên manewî diguhêrinin , di hesifînin .

Paştî vê gotinê , kesda me , awayê edebiyata me ji xwe têt seh qirin , û ew rêya qo em tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û diqeve pêşiya me .

Vêca, divêt qo em bi zmanê dê û bavên xwe, bi zmanê şirin û delal, bi zmanê qurdi, bi qurdiya xwerû binivisînin , û fiqr û hisên xwe ji çiroq û stranên qurdi digirin .

Ji xwe Ehmedê - Xanî herî sêsed salt vê rêyê ji me re veqiri bû. Lê heyf paşiyên wî pê ve ne çûn .

Xanî qitêba xwe bi qurdmancî nivisandî bu û fiqr û hisên wê ji çirçiroqe qurdi , ji Memê - Alanê girti bû .

Xanî xurtiya zmanê xwe hej wê gavê hesiya bû , û ji wan re qo pê ne dinivisandin di beyta jêrî dixwest bide zanî

« Saltî şemirand vexwar durdi

Mavendi - derî lisani - qurdi »

Êdin çax e , qo em bidin pey Xanî .

Dr. Qamiran Ali Bedir - Xan

## HAWAR HEBE. GAZÎ LI DÛ YE

Ji bona brayê min Osman Sebrî

Şevqe tari, Çav çavan nabine. Keşa erdê weq gizanan lingên min ên xwas dibire. Bayê reş carnan diqeve guheqî min û di ê din ra derdiqeve. Ket nizanîm qo li qût me? Heyîna xwe bi lîxistina gopal li erdê dizanîm. Ev çend rûj û sev e bi vî awayî diçim, dawî nayê, ji welatê berf û bagerê xelas nabim ...

Belê, îsev ji weq her şev tari ye. Berf û bager ji awaqî li min dide; Sar e, dice-midim. Tewş e, livin di min ne ma, deng ji min dernayê. Tinê sê dengên min qire gazî û hawarî.

Gelo, ev xewna? Çavên xwe vediqim bawer naqim. Lê dizanim ev deng, dengê qurê min e. «Bavol Bavol»

— Ha qurê min ez li qû me?

— Bavol bavê min li mal e, çima çavê xwe venaq?

Disan bi tirs qo min çavên xwe veqir min dît ez li mala xwe, di nav zarowên xwe, li cihê xwe me. Qurê min (Himgr-an) li ber serê min runist û got:

— Bavo, gava qo romo welatê me di-sewitand tu hê li qir buyt, Ji ber vê yeqê me xort û canan hevdu girt û dijminên xwe kels qir, me welatê xwe ava qir. Divêt qo bavê me ji bihata: Lê te xuya neqir, ji xwe min xewna te ji dîtî bû qo tu di tengasiyê de yi; tu li me «Hawar!» diqî ...

Min şal û şapîqê xwe tev şidand û çavê zinaran derhas qir, ez hatim. Min dît qo bavê min ji serma û pûqê kefilîye; dilê-te tinê davêt; Hema min bavê xwe girt û pirtûgên xwe lê şidand û me rêya mal girt. Ev çend rûje em hatine; dê rabe; icar tu me bi jin qe!

Jiyin çikas delal e  
Di nêv bav û biran da.  
Dil heye qo ne nale  
Ber birinên rîman da.

Ev birinî rîman e;  
Bareqî pîr giran e;  
Qezeb, gurçiq ne mane;  
Li pepûqên xwehan da.

Hawara me vava ye,  
Xewa bêqêr bela ye,  
Ket şiq têda ne ma ye,  
Di gotinên yaran da.

Kedrican

### DI DORA DINYAYÊ DE

Bê şiq e qo xwendevanên me ji mijûlayiya me a binghi pêve dê dil biqin ser her tîstên dinyayê serwest bibin. Me ev stûna ha ji bona wî veqir. Ji hejmara duwim ve emê dest pê biqin û xwendevanên xwe ser bûnebûwên dinyayê serwest biqin.

### Xatirxwezîya Memî

Mem got, dê qerem qe ez bemi tu.  
Dêq min i tu, ne bay i weq dî,

Kedrê te erê geleş giran e,  
Mem Kedrê dêyan geleş dizane.

Ser pêsir û sîng û paşila te  
Germi qê dida? tinê dilê te.

Dadê tu yî tu, tu dadîqa min,  
Destê te hejand mehdiqa min.

Alos i erê, erê tu dê yî;  
Fêqê te me, ez tu dar û ra yî

Dadê megirî xwedê piyar e,  
Lawê te ye Mem ji dê re yar e

Maq i erê tu, tu yî dilovan  
Lîngê te de Mem peşib e, kurban

Iznê bide min qo ailbirin im.  
Dadê ji tere qe qe te binim.

Dr. Q.A. Bedir-Xan

Dr. Qamiran Ali Bedir-xan Memê-Alan bi awaqî nê nezîmandîye. Hin menzûmeyên wî di Hawarê de bêne belav qirin. Ev menzûma ha yeq ji wan e.

## Hêvî Ji Xwendevanan

Ji bona Elfabêya qurdî

Em, ji tî ve, elfabêya qurdî rûpel bi rûpel di gomelê de belav diqin. Pêşdetir di şiqê qûtêbê de bêt derxistin.

Ji vê belavqirinê kesda me eve qo herçî xwenda û xanayên qurdaan hene. rûpelên elfabê yeq bi yeq, arêz bi arêz, pîrs bi pîrs, bixwînin, kenc bala xwe bidin û her çî qemantîyan bibinin ji me re binivîsinin, da qo em wan qemantîyan rast biqin.

Jû pêve, ez ji wan tîsteqî din ji hêvî diqim. Ji min re ji bona her rûpelê pîrsînan nû peyda biqin û rêqin.

Li rûpela pêşin me sê herf danîne ( a d r ) û bi van çend pîrs çêqirin. Dibe qo bi van herfan pîrsînan din ji bîn çêqirin. Di rûpela duwim de herfên me bûne pîrs ( a d r e n ) me bi wan ji çend pîrs dîtin. Hejre qo lîneqî din ji peyda bibin

Bi vî awaqî xwendevanên me diqarin bi me re bi rêbittin û elfabêya me bîdîlinin û kencîtir biqin,

*Ji pirsan pêve gora herfên her rûpejê cimleyên spehî û bihiqmet , mamiq û medheloqan ji bigêrî me tèn .*

*Lê divê qo xwendevanên me xwe bilexînin u heta heft, heşt rûjan cuhabên xwe bigehînin me. Da qo di hejmara duwim de em bigarin wan belan bigin :*

## FERHENGQO

**ARMANC** Her tiştê qo ji bona avêtina nîsanê têt daçiqandin. Paşîya tiştê qo çavê mirov lê ye û dixwaze xwe bigehîne wî: Beriqê wî li armancê ne qet, armanca hawarê pêşvexistina zmanê qurdi ye.

**BENDEWAR** Pêgîredayî: Heçî qurd hene hemî ji bi qurdên Irakê ve bendewar in.

**ERDNIGARÎ** Ilma qo bi her awayî wesfa erd û dinyayê dide; çiya, çem, dest, bajar, tendûreq gol, newal h. p. Erdnigariya Qurdistanê.

**BINGEH** Him û eslê tiştêqî: herçend zmanê qurdi û farisî di qitqitên xwe de ji hev vediketin lê di bingehî de digehin hev.

**CIYOQ** Pirsên qo mana wan nizingî hev an weqhev in: weq rêqirîn û şandin.

**DEHQER** Rastiya tiştêqî qo bi temamî û ji bîrî ne nas e û carinan veşartî ye: Ji gotîna xelqî re guh mede dehqera meselê ez dizanim.

**DÎROQ** Pêşîya tiştêqî an miroveqî: Dîroqa dinyayê gelek qevn e, Dîroqa jîna Selahedîn bi serê xwe dinyayêq e.

**H. P.** Heta paşî ..

**JÎNENIGARÎ** Awayê jiyînê û tevayîya biserhatiyên miroveqî jînenigariya wî ye.

**PRONIVÎS** Her tiştê pêqbatî, nivîsandî neuvîsandî, qo

awa û rêveçûna xebat û qareqî nîşan dide, û berî destpêqirînê têt çêqirîn: Me pronivîsa xebata xwe pêqanî, êdî divê qo em dest bi xebata xwe bigin.

**FERHENGQO** Ferheng qomela tevayîya pirsên zmanêqî ye: Ferhengog ferhengeqê qicîq e qo tede pirsînen wî zmanî peyda dibin. Ferbenga qurdi, ferhengogqa hawarê.

**ZMANAZÎN** Tevayîya keydeyên zmanêqî zmazîna wî zmanî ye.

\*\*\*

Herweqî me di serstûna xwe de got pirsîñ hene qo ji zareqî qetine lê di yeqî dî de dijîn. Ji lewre dibê qo di nav bendên me de pirsînen dîñ ji hebin qo ji hîñ xwendevanên me re nenas in .

Em jî wan hevî dîqîn bila jî me mana wan bipirsîn. Da qo di ferhengogqa hejmara duwim de em bigarin mana wan jî bidîn.

## BIRÉ FRENSIZI :

### BUTS ET CARACTÈRES DE LA REVUE HAWAR

Nous avons fondé notre revue, Hawar, dans un but exclusivement scientifique et littéraire.

Elle voudra donc combler une grosse lacune existant dans la nation Kurde.

Elle ne s'occupera en aucun cas de la politique.

Elle ne traitera que des sujets scientifiques qui non seulement intéresseront les Kurdes mais aussi les étrangers désireux de mieux connaître les langues et nations orientales.

Notre programme de travail montrera que tels sont nos buts.

Voici les points fondamentaux de ce programme:

1— Propagation de l'alphabet Kurde parmi les Kurdes. Classification et publication de la grammaire en langue Kurde et plus tard en langue française. La publication de la grammaire Kurde aura

lieu immédiatement après la publication complète de l'alphabet. Aujourd'hui nous donnons les premiers Pages.

2— Etude comparée des différents dialectes de la langue Kurde. Etude de la parenté de la langue Kurde avec certaines autres langues. Etude de l'histoire de ses origines

### 3— Folklore

Cette partie de notre programme sera la plus fertile. Elle prendra soin de la publication des légendes, contes et chansons Kurdes. Une partie de ces publications sera traduite en français.

### 4— Littérature écrite :

Malgré que le Kurde n'a pas été régulièrement écrit, il a eu tout de même des poètes qui ont écrit en leur langue maternelle et nous ont laissé différents manuscrits, dont quelques unes ont déjà vu le jour, nous prendrons soin de les publier peu à peu et plus tard de les classer suivant l'ordre chronologique; ces études contiendront aussi la biographie des hommes de lettre et de divers personnes illustres.

### 5— Musique et Danse :

Dans cette partie nous chercherons à déterminer les caractéristiques de la musique nationale, de fixer et de noter ses mélodies ainsi que les caractéristiques, rythmes et figures des danses Kurdes.

### 6— Moeurs et coutumes :

Etude, détermination et classification des mœurs et coutumes sociales, morales et religieuses du passé et du présent.

Détermination des principes qui ont gouverné la vie sociale jusqu'à nos jours. Définir le costume national et arrêter les nuances d'après les différentes contrées. La vie économique du pays, ses produits et son industrie nationale.

### 7— Histoire et géographie :

Etude de l'histoire et de la géographie générale du Kurdistan et étude de l'histoire des tribus, avant, pendant et après « Mir Cheret » Classification et publication de la volution et de l'influence des Kurdes, au

cours des périodes historiques, ainsi que l'histoire de sa vie politique, sociale et religieuse.

\*\*\*

Nous commencerons la publication de notre revue par quinzaine. Après quelques numéros elle deviendra hebdomadaire.

Notre revue sera publiée essentiellement en langue Kurde et française.

Les articles et les études qui seront publiés dans la partie Kurde seront aussi insérés dans la partie française, exceptés les articles qui auront un caractère purement d'enseignement primaire pour les jeunes gens Kurdes.

## L'alphabet Kurde

L'alphabet Kurde se compose de (31) lettres :

a b c e ç d i g h x è j  
i k q u l m n o p r s  
t û f v w y z

### LES VOYELLES

La langue Kurde possède 8 voyelles :

a e i è i u o û

Comme dans la phonétique Kurde un son de voyelle émis d'un même point de l'organe d'articulation ne peut pas être tantôt bref et tantôt long, les voyelles Kurdes sont stables dans la durée de leurs sons, elles sont brèves ou longues et ne varient jamais comme en français. Par conséquent les voyelles brèves ne deviennent jamais longues et les longues ne deviennent jamais brèves.

Les voyelles brèves sont :

e i u

Les voyelles longues sont :

a è i o û

Voyelles brèves :

E — se prononce comme dans le mot « dette », mais plus fermé et tout à fait bref.

I — ressemble un peu aux «i» de «guirlande» et de «litre» mais plus fermé et tout à fait bref, comme le «e» final des infinitifs allemands ;



kommen, gehen, streiken, essen etc

U — peut être considéré comme composé d'une consonne et d'une voyelle, amalgame du «w» avec le «i»,

چوسری وترکان ژر نوقه کردستانا باکری فگرتن .

سرك ، شیخ ومزین کردان ب دارقه گرن ،  
ژن و زارووبین وان ، ب هزاران کشتن ، مالین

وان ضعط کرون .  
د فی نائی ده مال وگندی بنگی آغازی تالان

کرون وژن وزارووبین وی برچی وتازی هشتن .  
خلکی مالا بنگی آغا ئیدن نکار بون دجهی خوه ده

دگندی پشین خوه ده روتن .  
دیوان ژنککه ژ بهائی ، کچه بافک ،

زارووبین خوه دابوهف وگهاسبو باژار کی کچک  
ل جهسکی ولی کوت کس اوناس ند کرون .

دی ژر صبی حتا آفاری د مالا خلکی ده دخبتی ،  
ب شف گوره درستن و دیسان کاراوی ب کونکی

تیرا دبارا وان د کر .  
لی دقبیاو چند پره ژر بدن آلیکی وژ بونا گفو

بجفینن .  
ما بنگی آغانه و صاندبو کو بلا گفو بجوینه ، مزن

بیه آفدینا باف وولاتین خوه فکه و د ریا فلا تاولاتی  
خوه ده بجخته .

ژ خوه ندنی ره درهاف دقبیاو .  
دی خوه دشداند ، هیژ زیده دخبتی ، لی نشتك

ب سرده ندخت .  
ژر بونا آنبجها وصیتا میری خوه قرارا خوه

داو هر د کچین خوه ئیخستن خباتی .  
د روی باژاری ده مافوران چید کرون . کچکان

دوختی خوه شی بی ده ب چیکر نامافوران وژول  
دبون ، بی دلستن .

ژلورا گلک نه آژوت ژر هر دو ان ره خبات هاته  
دبتن . هر روز صبی خلکی مالا بنگی آغا کار دبون

وهر یک دچوب آلیکی نه .  
دی مالا خلکی ، کچک نفی و لاوک دبستانی .

گلک نه بوری زفستانا ولاتی ژورین  
ب سرده هات .

جلین وان تنک و کفن بون . ل وان سار بو .  
زیزی چند جار ان نخومش کت .

لی دقبیا بول بر هر تشتی راوستن و بجختن ،

# ہاوار

کوہلا کردی

فرمار ۴

—۳۳۳—

۳ نومبر ۱۹۳۲

## یکسون و بکینیمیا کردی

خانی و ملائی بانہ ، طیران ؟  
 گئی کردین جوڑ. خوینا کردان .  
 نابی ژمہ بہ و شیخ أحمد ؟  
 ہیسی مہ بہ زند و دولتا مد .  
 آگری سینہ ، وان و موش و زیلان ؟  
 کانینہ ، ژوان ٹوینہ خورتان !!  
 سنی ، علوی و آیزدی چی ؟؟؟  
 أم بونہ خلام و مانہ برچی !!!  
 کردن ، نہ جداژ دار و رانہ ،  
 بن دستی خوہدی ویک خدانہ ،  
 کردن جو أم ، ژیک نژادن ،  
 نف داد و کرم و پاک نہادن .  
 بختین مہ ییکن ، نہ سی نہ چارن  
 أم کردن و نف برا و یارن  
 آگری سینہ ، وان و موش و زیلان ؟  
 کانینہ ژ وان ٹوینہ خورتان .  
 سنی ، علوی و آیزدی چی ؟؟؟  
 أم بونہ خلام و مانہ برچی !!!  
 وکتورہ . کاروانہ عالی بدرخان

آف لور و بختیاری بابان ؟  
 کردمانج و ہفرمان و زازان ؟  
 کردین ، ژولاتی روم و سوری ،  
 کردین عجم و عراق و سوری ،  
 کردین ژولاتی ژور و ژیرین ،  
 سرچاف بلند و زخم و نیرین ؟  
 یک بختن حمونہ بختیارن ،  
 سر آرد و دنی ، لیان و ژارن .  
 \* \* \*  
 زردشت بو ملائی کفتی کردا ،  
 قانون بو چرایا زندا فستا .  
 آف فلسفہ یا قدیم و پرنور ،  
 زندی ، زمانی کفن و مشہور ؛  
 زردشت و چریا زیبی زردشت ؟  
 رُہنی آوہ ، سرچیان و سردشت .  
 ہر کات ژ کتیا زندا فستا ،  
 پیتک بول دل ، گری د دستا  
 رستم ژ مہ بہ و شاہ نادر ،  
 سلطان صلاح الدینی دنگگیر ،

زكوة غراف ومطبقة  
**أبو نعيم أحمد بن محمد بن إسحاق بن منصور**

حفر جميع المعادين والصورة الملوثة واللوحات النحاسية  
 طبع بطانات وأوربيات بحروف ناضرة على الأبراج الخشبية

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

**أحمد نافذ**

اختصاصاً في الأقسام الداخلية والأطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب

**محمد مصطفى**

الاختصاص في الأقسام الداخلية والعيون وجراحاتها

صالحية

دمشق

اشتراكات مجموعة هاوار

|                       |  |
|-----------------------|--|
| وفي غير هذه الأقطار   | في سورية وقرية والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس |
| عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك | عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك            |
| عن ستة شهور ٩٠ فرنك   | عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك              |
| عن أربعة شهور ٦٠ فرنك | عن أربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك            |

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

سال ۱

پنجم

# هاوار

کوملا کردي

شماره ۴  
۳ نبره ۱۹۳۲

تیده خستین کومله

|                    |                |
|--------------------|----------------|
| ج. ۶. بدرخان       | پرئشما ما فوري |
| هفتدی سوري         | حاجی قادری کوي |
| دكتورك ۰ ۶۰ بدرخان | لاوکی من       |
| ج. ۶۰ بدرخان       | الفایبیا کردي  |
| ==                 | فرهنگوک        |
| دكتورك ۶. بدرخان   | یکبون ویکیتی   |
| حاجی قاذر کوي      | وشیار بین      |
| جگر خون            | گوتتا ولات     |
| .....              | زری کباری      |

م ۱۹۳۲ [مطبعة الترقی بدمشق] ۱۳۵۱ هـ

SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 5



20 Tirmeh 1932

## Qovara Qurdi \* Revue Kurde

### Têdewîziyên Qovarê

Edebiyati Qurdi

Loriya Bedir-Xan

Pêrûziya Hawarê

Besrêqa Zêrîn

Dildiziya Guleqê

Elfabêya Qurdi

Hevindê Sort

C. A. Bedir-Xan

Seyid Hizni

Kedrican

Dr. Q. A. Bedir-Xan

C. A. Bedir-Xan

Welati Qurdan

Delaliya Zarowan

Şin û Pesna Zîne

Pesna Dêriqê

Alê Qurdan

Evdilxalik Qerqûqî

E. A. Bedir-Xan

Dr. Q. A. Bedir-Xan

Cegerxwîne Qurdi

Hereqol Azizan

Ronigariya şagirtên qurdên Irakê

### Birê Frensizî

L'Alphabet Kurde

Bercêuse

Folklore Kurde

D. A. Bedir-Xan

Hereqol Azizan

D. A. Bedir-Khan

çapxana terekî

ŞAM—1932

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

## Rêzana Elfabêya Qurdî

Kurde sur l'alphabet Kurde

Bi çermê xemilandi 12,50 K. S.

Bi çermê adeti 10 K. S.

Ji bona derve divêt hekê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES.**

Damas

Jericho

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

Damas

Sakie

## PHOTOGRAVURE

### Egoubige Frères

*Inscription sur tous les métaux Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.*

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûş-sûrt — 100 frenq

ŞesmeHQî 300 kirûş-sûrt — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûş-sûrt — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

ŞesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Sam : Taxa Qurdan





## Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

### Edebiyatî Qurdî

Lêraneda demanewêt be qurdi basi edebiyatêq biqeyn qe ilakeyêqî zori heye legel edebiyati dinya, we be - taybetî edebiyati ari. Nextêq le hendê edebiyati rojawa deqat, we hendê lêy cuda debêt, ewîs «edebiyati Qurdî» ye.

Herweqû tarixî qurdañ be nezanrawî mawetewe we bêsta betewawetî le lay tarix zaneqan nezanrawe, edebiyati qurdîş bew çesne malûm niye we malûm nebûwe. Herweqû ême betewawetî ew şitane nazanîn qe tesirî qirdiwete ser qurdañ, we tarixî qurdañ herweha ew şitane nazanîn qe tasirî qirdiwete ser edebiyati qurdî, inca ew şitane aya siyasi bê, qomelî (civaqî) bê yan dînî... h. p.

Hemisan çûnqe kewmî qurd tûsî lafawî gelauw kewman bûwe, we kewmanî cuda cuda hemû exlaktî, edebî, qomelî (civaqî) tasir yan qirdiwete ser yan zimanîşyan tasirî lêyan qirdiwe.

Ew milete bêganane qe hatûnete qurdistan we em wilateyan dagir qirdiwe, qemu zor tasiryan lêyan qirdiwe we şteqyan becê hêştiwe, we beşî qurdeyn qe qewtûwete ber em lafawane lejêr tasirî dînu zimanu tabiyatu ehwalî qomelî ewane mawtewe. We çûnqe kewmî qurd nezan bûwe, we medenîyyetî ew milletane zor bûwe, destîyan qirdiwete werqirdîni medenîyyet lêyan. Inca legel medenîyyet. sîti dîqesyan werdegird. Weqû: ziman, edebiyat, helbest, ehwalî qomelî... h. p.

Leber ew şitane qe le serewe gotman qurdeqan hetaqû estaqe le zimani xoyan ziyatir, le edebiyati zimanani bêganane tedeqoşîn. Her be boney ewewe qurdeqan bo edebiyati qurdî teneqoşîwne,

we edebiyati qurdî - ewey qe heye - herwa be nezanrawî mawete we.

Hemû xwendewarani Hawarî xoşewîst dezanîn qogeli qurd qelêqî ari ye, yanî Hindi - ewrûpî ye. Leber ewe zimani qurdî we edebiyati qurdîş weqû zimanani û edebiyatani diqey ari ye, we edebiyati qurdî le edebiyati Farsî, Hindi, Yonani qon, Rûsî, Frensîzi, Elemani... h. p. zor deqat. Inca bo ewe qe em hekikete çuq têbigeyn, ha hendêq basi edebiyatu çesnanî biqeyn.

Edebiyat pêq hênanu gotinî meşqu fiqrî insane be çesnêqî ciwanu xoşu saf qe tasir biqat le ser insan, aya insan xemqînu dilleng deqat, yan ferehnaqu dîlxoşu qeyfdar deqat.

Edebiyat ew şitaneye qe le dîli insan gird debêtewe we detu deqet we derî deqate derewe, we deylêt be zimanêqî sîrîn û ciwan.

Inca edebiyat bêjînu gotinî hemû şteq niye, beşqû ibarete le gotînu bêjîni şteq qe bestirawe be (jîyan) ewe, we qe pêwîstî jîyane. Yeşq le edebîni Misri.. gewre «Abbas Mehmedî Ekkad» gotiwyeti:

Jîyan çî ye we edebiyat çî ye!!..

Du sîtin le yeq şit dururst qirawin we be yeq dezû çêrawin we le yeq qarxane der çûne. Lemew pêş xelq pêwîstedewîst qe boyan îspat biqen qe edebiyat be bêjîyanu pêq nayêt, belam estaqe zor pêwîstîyane qe boyan îspat biqrêt qe jîyan be bê edebiyat nabêt. Legel ewesde ferkêq niye le beyanî em du hekikete: Mebest her weqû her jîyanê edebiyatêqî heye, hemû edebiyatêqîş jîyanêqî heye, we her duqyan be yeq çîst de pêwîrêt we berzî û nizmî dezanrêt.

Ey we xwa hic jîyan be lê meylu

# Sîn û Pesna Zînê

Bilbil û gul, parizê Botan û rengê çav û meng  
Bin siha şîn û qeser weq hêstir e, hawar û deng.

Pilpili, qoqiye zer, nêrgiz benefs û lalezar;  
Weq nivîna Zîna Zêdan, nalenat û giryezar.

Ev stêrên zêr û zivîn ruhniya erd û dinê  
Bin peyê bawîşqê Şîne bir qirin hej û qenê.

Dengê qund û bûm û eylo ser dilê çaxa buhar  
Ser newal û fêd u qanî hêstireq bu aşiqar

Destê reş, key niçinandi, rûyê tavê ser zevî;  
Yeş qevanjen, hat u avêt ser dinê tirê şevê.

Ney dinale, solin û mêrg, parizan guhdane wê  
Şahiya dil, deng û govend nav qeser çû û revî.

Nûbuhar, havin û paiz û zivistan ji ne ma  
Dora wan çaxa qetin, lêlan û bert û ah û ba.

Niqil û teyr û dadiqa duntqilan,  
Distirên, paxendê wan, Zîn qet li calan û qelan.

\* \* \*

Gevre ye ev şîna Zînê, Zîna Zêdan giryedâr,  
Bê heval in gul u bilbil, bê heval e lalezar.

Ruhniya Ewrex u Dêrgul, ruhniya Burcabeleq  
Ruhniya erdê Cizirê, ruhniya Kesra Felq

Ruhniya efser û tac û ruhniya rexta nivin.  
Ruhniya carî xulam û ruhniya Adar û şîn

Ruhniya Tacin, Çeqo û ruhniya mirê Ezin  
Ruhniya parizê jinê, ruhniya jar û hezin

Ruhniya xizan û sêwî ruhniya ezman û çeng  
Ruhniya polad û Ristem ruhniya çavan û reng

Ruhniya qanî û hûrî ruhniya bihna buhar  
Ruhniya bicade, gewher, ruhniya zivînîtar

Ruhniya erdê welat û ruhniya ar û bihust  
Ruhniya av û çiman û ruhniya dar û bihust

cazibe debet! We hîç meylu cazibeyêq be jiyân be bê edebiyateq rêq naqewêt qe  
bê bêjtu û gotin pêqdet! we hîç kîseyêqî lêy biwesête we. We berzi û nîzmi  
rastu ciwanu kîncu jîqele dehête yeq le- edebiyat her weqû jiyân be ayûî şit  
gel kîseyêqî nasîrinu sêwaw û alozaw! depêwrêt... (tewaw ne bûwe)  
Cewabî em sualane hemû emeyeqe *Hevîndê Sorî*

## Soriya Bedir-Xan

-JI HACO AXA RE-

Herweqî xwendevanên me di stûna xwe de bi xwinin, di vê *hejmara hawarê de*, em loriyêqê belav diqin:

« Delaliya Zarowan ».

Ewunde herqes bawer biqit qo ev loriya ha delaliya Bedir-Xanê mezin, loriya bapir min e. Lê ne welê ye.

Bi vê loriyê ne bapirê min Bedir-Xan, lê neviyê wî, brayê min Bedir-Xan dinivinand û dilomandin.

Ev loriya ha qo bi xwe, bi zman û mana xwe ve bêja ye, ji bona min, ji heleqe din bireqe mezin û zehil e. Pê bapir, bav, dê û brayê min - qo her çar ji zûda gehistine rehmeta xwedê - tene bira min.

Ji ber qo Bedir-Xan navlêqirî ye, tê da navê bapirê min heye.

Ew Bedir-Xanê qo bi xurtî û mezinahiya xwe ve navê xwe, li şûna navê malbeteqê xistiye [1]

[1] Herweqî nas e, navê malbata mireqên Botan Azizan e.

Ew Bedir-Xanê qo ji bona yeqitiya Qurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Qudistanê qetiye ser û krênan û her tîstên xwe di vê rêye de feda qiriye û ji bona wê ji miriye.

Ev lori havê min ji brayê min re gotiye.

Ev havê qo ji min re ne tinê xwîna xwe a paq daye - ew xwîna qurdi qo bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên baqurî honiq dibû û di Cizîrê de di nav germiya hat û zinarên Burca-beleq de diqeliha, û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji singên dahatiyên malbata Azizan dihat rêtin û ji rayên wan vedimîzt - lê ez bi dil û hişê qurdanî bi xwedi qirim û xistim wê rêya qo ew bi xwe û havê wî tê de mirin.

Ev lori, dêya min distrand û pê brayê min dinivinand.

Ev dêya qo gava ez hejdeh, nwa-uzdeh salt bûm û min dil qir ez biqevim meqteba herbiyê, ji min re goti bû:

— Ma ji te re ne namûs e? Tu çawan biqevî meqteba herbiyê û bibî zabîtê

Ruhniya zimridê xusrew, ruhniya bistamê Qey  
Ruhniya ney û blûr û ruhniya paxendê mey

Ruhniya seyda, hewarî, ruhniya firdewsê bext  
Ruhniya hêlîna jaran, ruhniya eqwan û text

Ruhniya nermî, delalî ruhniya rêl û çîyan  
Ruhniya şer û pîlîng û ruhniya mîrg û giyan

Ruhniya hevîn û pêtan ruhniya Etrasiyab  
Bendeyê Zîn e firîşte, bende ye Tehmasiyab  
Ruhniya sor û sipî û ruhniya Zer û heşîn  
Ruhniya pîr û ciwan û ruhniya hawar û şîn

Merhema hêstir û jati merhema çaxa xirêb  
Merhema ab û birin û merhema qalan û bab

Zîna Zedan, Zîna ezman Zîna nîreng û delal  
Zîna xortan û firîşte, Zîna çav û bab û qal

Dilqetî ye Zîna Zedan, dilqetî xortan û pîr  
Ser dilan hevîn şah e elser e ser şah û mîr.

*Dr. Zamîran Alî Bedir-Xan*

## Alê Qurdan

Alê Qurdan di nav roq ,  
Çi bedew û biheybet ,  
Bi çar reng î, rengên te ,  
Çi delal û çi xweşqoq .

\* \* \*

Xêzeq qesq û xêzeq sor ,  
Nav sipî û niveq zer .  
Qesqesor e , bi roj e ,  
Ev li jêr û ew li jor .

\* \* \*

Semyana qer û lawan ,  
Rûmeta jin û mêran .  
Neyarên te pir ji hin ,  
Tu dê bidî berawan .

\* \* \*

Qo çirisi roja te ,  
Dê belav bin mij û dû .  
Rabe ser xwe ser bilind ,  
Nizing bûye roja te .

*Hereqol Azîzan*

tirqo. Ev tirqo qo welatê te ji destê te  
stadine, miletê te xistine xulamîyê, bapirê  
te dil û malbata te perîsan qirine û hon  
avêtine zivariyê.

Ev loriya ha ji brayê min e çiqîq  
Bedir-Xau re dihat gotin.

Ev brayê qo xwedê di mentayê de  
da û di mentayê de standi bû. Ev brayê  
çiqîq û delal qo di nav sê çar saetan de  
ser ejnûwên bavê min, di qeleha  
Eqayê de mir.

Ji van pêvedi vê loriyê de bira  
xweha min ji heye. Xweha min pisti  
mirina brayê me, di şîna wî de, bi dengê  
xwe ê ziz ji me re ew dinehwirand û pî-  
em digiriyandin.

Carqê, min ev lori ji Haco axa re  
xwend, û goti bû qo heçî zarowên mala  
me qo navê Bedir-Xan li wan diqin ji du  
sê salan bêtir najiu û dimirin.

Axa hiniq fiqiri û li min vegevand:  
- Ji her qo rehmeti navê xwe nadê tu qesi  
Ji lewra min ji ev benda ha - qo halaneqe  
eştirwarî ye - pêşqesi axayê xwe qir.

*Celadet Ali Bedir-Xan**Lori**Delalya Zarowan*

- 1 -

Binve xweşiya dil û du çavan,  
Dadê ji te re her ru' nighban,  
Da zû tu mezîn bibi Bedir-Xau,  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 2 -

Bişyar mebe, niho ne Kenc e,  
Mehdiq ji te re bizane geuc e;  
Bê xew mebe paşiya wê renc e  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 3 -

Xweşhat î weqî qevoq û berxan,  
Feqrandina te meleq ji heyran,  
Paq e neseba te dadê kurban,  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 4 -

Dewra feleqê li ser me qîu e,  
Bextê me reş e, qezeb birin e;  
Mesqen ji me re niho nivîne,  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 5 -

Ne mal û ne saxî û ne rahet,  
Talan qirine hemî ji mihnet;  
Dişwar e geleq belayê xurbet,  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 6 -

Çerxa feleqê weqî nesim e,  
Ho nabe xwedê geleq rehime.  
Rûja xweşiyê dibit qerim e,  
Binve qezeba min binve lo! lo!

- 7 -

Hewkas tu mebeje ev çî hal e  
Bê sebr mebe welê menale;  
Ewu û qerema Xwedê hevale,  
Binve qezeha min binve lo! lo!

Sparte: 1906

*Emin Ali Bedir-Xan*

## Dildiziya Guleqê

Li her deriyê Diyarbeqerê parizeqî mezin heye. Ev pariz bi sosin û rehnanan, bi lale û benefsan xemilandî ye.

Her êvar biyeqî xwes û honiq bi wan gulêliqan re dilexize. Bihniyê di helanoqa bayî de xwe dihejinin.

nayit. Qortal qer û di guldarîye de ye.

\*\*\*


Di wî parizî de her şev guleq ve-  
dibit. Rengê wê ji laven buqan sortir,  
pelên wê bel û ges in.

Gava desteqî biyani dr. ji wê dibe,  
pelên gula ten yêq.

Ew gul guleqe bi nav û deng e.

## Merîten Qurd Di Rêya Qwendin û Pêşveçelînê De

TOFEQ JI ŞAGIRTÊN QURDÊN IRAKÊ



او اوینه ی لاوانی کوردی بغدادم به یادگار پیشکەشی هاواری کردوه

ئەم لاوانە بەضیکیان لە دارالمعلمین وەهە ندریکیان لە مکتبی ئابووی ، حقوق ، دارالعلوم و قوتای بیکان حەریە ی تیانە

Avên zelal ji şingên kuleteynan divi-  
ziqin. Ji ezmani, stêriq, bîdeng li wan  
fediqirin.

Di bin wê erdê de, di binaniya  
himên wî parizî de qortaleq heye. Qortal,  
qortaleq tari.

Ej wê qortalê de Şêx Seid bi hevalên  
xwe ve vesartî ye. Ji wê qortalê deng

Qurdên qo di serê welatî de hazir bûn,  
dildiziya wê gulê dizanin. Dizanin qo  
spehili û geşiniya gulê nîsoneq ji imida  
Qurdistanê ye.

Dizanin ji qo di nav her pelê wê  
gulê de hezar axên birindaran, hezar  
evd û sehîdan, bi hezaran hêstirên sêwî  
û jimûliyan, bi hezar nîşinên welatîyan  
di xew de ne.

*Besreqa Zêrin*

- Ji rêberê me ê gevre Kedri beg re -

Besreqa zêrin xerab û koloyê Meqso şiqest  
Türcele xopan bêqesma Besbeleq çû bû ji dest  
Baniya Qanihinare Dêriqa rengin bû mest  
Meyperestbû bûn ji derdan rûjbe rûj gazî dixwest

Jrû Meqs; mirê Besreqa zêrin, ne  
hati bû diwanê. Di aliyê malê da li ser  
qurqê kwizîn rûniştî, serê xwe qirî bû  
nav qefên destên xwe, mat, ji xwe re  
texmînan diqir.

Xelqê malê biç di birin qo tişteqî mezin  
lê kewimîye. Mir madê xwe diqir, ji lewra  
tuqes ne wêrî bû nizingî wî bibe.

Pêleqqêqê visan ma. Piştî gaveqê ji  
vê behîşiyê veciniki. Simbêl qetî bû dev;  
Çavên wî bû bûn weq qodiqeq xwin;  
mûwên wî gijgijî, nola şûjînan...

Deng li qurê xwe Şewlî qir:

— Qurê min Şewlo, herweqî tu  
dizanî vê pîşiyê, Mirzoyê Burca-Metinan  
bûye qelemeq û qetiye çavê me. Bi ser  
da dixwaze xweha te Piroz bi qoteqî ji  
me bistine. Ez, qo Meqso, Mirê Besreqa  
zêrin im û hetanî vê gavê min kehra tuqesî  
ne qîsand, ma qo ya Mirzoyê Metîni... Tu  
bawer naqî, eve reşbeleqa wî:

Burca-Metinan 10-7-1200

Şevqê, zûbîteqî dijmin bi delalê xwe  
ve hat û qet nav wî parizî. Bi gavînen hişq  
û qanc pê li çîman û bihnûntyan qir.

Heşînahiyên zrav şqestî, pelên qulil-  
qan ji hev qetîn.

\*\*\*

Di nav bayê evarê de malîneqê zîz  
û zelalî hebû.

Zabit, çengê wî di bin çengê delalê  
wî de, xwe da ber gulê û dest avêt gulê.  
Gul dil qir xwe bigre. Lê ewl ew çîni.

Weqî gul qet nav destên wî, singa  
xwe veqir, xwe geş qir.

Her duwan ew bihn qirin û mirin.

*Dr. Samiran Ali Belir-Khan*

## Meqso I

Ev reşbeleqa min a çaran û bizan a da-  
win e. Heta nihû te guh ne da. Xwedê mezine  
ji gulnedana vêya re? Ma key tu bawer  
naqî qo ezê fermana Metinan li serê te  
raqim, ew Besreqa qo pir li ber dilê te  
bihuriye ezê xaxerab biqim. Ew dotmîra  
qo tu hêjayî min nabînt ezê para dilê xwe  
biqim. Qa binêrim tu çi dibêji?..

*Mirza Firoz*

Şewloyê Meqso bi qerbeqê mezin  
xwend. Ev reşbeleq çî bi bongî hati bû  
nivîsandin. Canê Şewlo ji nişqa ve ricifî.  
Li bavê xwe mêze qir û got:

— Bawol desthilanî mifta xerê ye.  
çêtirê vê tu dizanî.

Meqs disan fiqirî, dizanf bû ev, ne  
pariyê dakurtinê ye. Êdin qîşandina cila  
bê namûsiyê li serê xwe şerm dit. Çar  
neçar ji qurê xwe re got:

— Çeqên xwe gerêdin, her tiştê xwe  
teqûz biqin da qo îcar hustûyê Mirzo di bin  
wî veqim! Reşbeleqêq bi vî lewnî ji  
Mirzo re şand...

\*\*\*

Mirzoyê Burca-Metinan li ser reşbe-  
leqa Meqs pir tehl bû. Bi careqê fermana  
metinan li ser Besreqa zêrin ve reşand.  
Dêriqa çavê mazi û Baniya Qanihinare  
di ber lingan de çûn. Ew xortên bi navê  
bazan dihatine golî, xwe ji Türcele  
beradan, li ber Metinan qozîq vegirtin.  
Her du ali qetin ber hev. Şer dest pêqir..

\* \* \*

Hêvîna dilê Mirzo keynata çavê  
Piroza qeçin bû. Piroz, li ser banê kesrê  
digeriya, dilê wê çargopal lêdixist, tanga-  
siya bav û bira û pismamên wê jê re ne  
tu qul, lê xurtiya Mirzo Firoz ji bona  
wê dilxweşiqê mezin bû. Ji vî alî, wî  
aliyê Kesrê ve diçû di hat, paçê hevirmîş  
weq pêlê helrê li ser canê wê pêl di bû;  
dilqetiye wê li hemîer, bi hêvîna wê ra

## ELfabêya Qurdi

5

Ji ber qo bilêvqirina (y) ji ya (w) hêsantir û (y) dengdareqe nerm e, hêdi hêdi diqeve zarên wan qurdan ji, qo dengdêra (û) stûr û (o) weq xwe dixwînin.

Carinan ji di nav pirsan de diqeve şûna (w):

Suwar — siwar — siyar

Ji hêla din bi (h) re ji diguhêre:

Gerin            gerihan            geriyan  
Bezûn            bezibhan            beziyan

Dihar — diyar

Mehir — meyir

Giha — giya

Ji aliye din di pirsnan erebî de qo qetine nav zmanê me diguhêre û dibe (ê)

زَيْنَب            Zeyneb            Zêneb

خَيْر            Xeyr            Xêr

عَيْرَت            Xeyret            Xêret

زَيْنَل            Zeynel            Zênel

فَيْزِي            Feyzi            Fêzo

Dîvê bête nişan qirin qo di zmanê erebî de axaftinê de ji ev (y) yên ha carinan diguhêrin û dibin (ê)

J. G. — Jîvan qu dengdaran me (j)êxiste nav elfabêya xwe bi wi deugê qo frensîz wê bi lêv dibin û (g) herweqî elman wê dixwînin. (dûmahîq heye)

diajot ser bav û bira û pismamên wê û ew dişqênandin.

\* \* \*

Feleqê, berê xwe jê guherî bû; neçara Meqso ne ma; Besreqa Zêrin xera bû. Piroza Kizîz biderda...

Êdin ji bona xwe jîyan biqêr ne dit; Serê xwe li zinareqî xist û perçivand, mejiyê xwe tekand...

*Kedri can*

## Pesna Dêriqê

- Ji brayê nazdar û ciwan Kedrican re -

Dêriq çî xweş e, bi dar û av e  
Ev av e, li erdê bû belav e,  
Yeş Xab e, belê bihuşta me'wa  
Pir mişmiş û sêv û darên selwa  
Pir gwîz û hejîr û xox û hinar  
Sed qanî û aş û gol û cobar.  
Yeş di heye, pê dibên Qulebê  
Gorî ye ji wê re Xurs û Şebê.  
Pir aveqe sar û rind û îşerîn  
Pir dar û ber û giyayên rengîn.  
Bilbil digirî bi ah û zar e  
Daxwaza wê qomela Hewar e.  
Mizgînî didê Heval û yara  
Kedri qo li Şamê bendewara  
Çepqan diqutin dibên bravo!  
Kurbana te bin xweh û brawo!

*Cegerxwînê Qurdi*

## FERHENGOG

(Parîz)

Bexceyê bihnûn û qultîqan, xemilandi  
û lêqdayî. Bi frensîzî jê re (parç) tête gotin.

(Mehdiq)

Xelqê Botan dibêjin. Qurdmancin hene  
jê re landîq, hinên din dergûş dibêjin.

(Fegrandin)

Nihêrtin, meyizandin. Fedqire binihêre.

(Ejnû)

Çoq, qab. Qurdmancin hene weq frensîz  
sîzan jê re (jinû) dibêjin.

(Heyin, Neyin)

Heyin: halê hebûne. Heyina Xwedê  
ji mêj ve ye û abadin e.

Neyin: halê nehbûne. Heyin û neyina  
wan weq hev in. Ji heyinê qetiye neyînê

(Dilbend, Diblendi)

Ewê qo bi du an çend zmanan dizane,  
û pirsên zmaneqî bi pirsên zmanqî din  
dide zanin, dilbend e. Dilbendê me her  
çend bi qurdmancî rind dizane lê frensîzîya  
wi hîniq qêm e.

Dilbendî: qarê dilbendan. Filan qes  
libendiyê diqe, yant dilbend e.

Notices sur la littérature  
meuse et coutumes Kurdes

5

## MEMÉ-ALAN

Afin de procurer au lecteur une idée générale du texte dont il s'agit, nous faisons précéder la traduction d'un sommaire.

## PROLOGUE

## Les fées

- 1.— La maison de (Singav)
- 2.— Le bassin des fées
- 3.— Les colombes tachetées

## EPISODE: 1

La Maison de (Memé-Alan)

- 1.— Les émirs (Mexrîlî)
- 2.— Naissance et éducation de (Memé-Alan)
- 3.— Bozè-Rewan

## EPISODE: 2

La rencontre de (Zin) avec (Mem)

- 1.— L'enlèvement de (Zin)
- 2.— Le reveil des morts
- 3.— L'appel de (Zin)
- 4.— L'ordre de (Mem)
- 5.— L'échange des bagues
- 6.— Le retour de (Zin)
- 7.— Le deuil de (Zin)
- 8.— Le magicien de (Cizira-Botan)
- 9.— L'amour de (Mem)

## EPISODE: 3

Le départ de (Mem) pour (Cizir)

- 1.— Les parents s'informent
- 2.— L'amour n'a pas de remède
- 3.— (Mem) se met en route
- 4.— Le camarade de voyage de (Mem)
- 5.— Le chasseur de la gazelle
- 6.— (Zin) trompée
- 7.— Devant le fleuve de (Cizir)
- 8.— Le bassin sanglant et les paroles de (Bozè-Rewan)
- 9.— Le berger guide
- 10.— Encore la fille de (Avan)
- 11.— (Beqo) lui-même
- 12.— Les misérables de (Cizir)
- 13.— Le marché aux chevaux
- 14.— Les grands commerçants de

## L'ALPHABET KURDE

5

Il faut signaler une autre particularité au sujet de ce même (i). Dans le sud, on admet que le (i) est parfois prononcé plus fin qu'à l'ordinaire, comme c'est le cas par exemple dans les (izafat), qui se sont produits dans le dialecte du sud en raison de la disparition du genre et par conséquent du cas de génitif.

C'est ainsi que dans le sud, au lieu de dire:

Qurê Romo      Qerâ Romo  
on dit:

Quri — Remo      Quri — Remo  
Qerî — Remo      Qerî — Remo

On trouve également ces izafats dans le Nord, dans des manuscrits d'œuvres littéraires, mais jamais dans la langue parlée ou dans l'épistolographie actuelle.

Les poètes du Nord surtout, à l'effet de suivre plus facilement l' (arouze), rime ambe, ont fait usage de ces izafats comme des expressions étrangères; par exemple dans le vers suivant:

« بک:زاده به بک ژنل میران »

Avec l'alphabet Kurde, nous écrivons le vers de la façon suivante, conforme à la pure prononciation Kurde:

(Begzade ye yeq ji nesli-miran)

Nous mettons un trait d'union entre les mots (nesli) et (miran) pour indiquer la forme étrangère de l'expression.

(à suivre)

*Djela'et Xati Bedir-Khan*

la ville de (Cizir)

- 15.— Les apaches de (Cizir)
- 16.— (Mem) au palais des (Celaliyan)

## EPISODE: 4

La maison de (Zina-Zedan)

- 1.— La maison des (Azizan)
- 2.— Les groupes des Emirs de Botan
- 3.— (Beqo-Avan)



**EPISEDE : 5**

La révélation du secret de Mem

- 1.— La fin du deuil de (Zin)
- 2.— (Zin) s'informe de l'arrivée de (Mem)
- 3.— Le jour de l'an Kurde
- 4.— Le secret de (Mem)
- 5.— Le conseil des (Celaliyan)
- 6.— Le serment du sabre des (Celaliyan)
- 7.— La décision des (Celaliyan)
- 8.— Les adieux de (Tacin) à sa femme
- 9.— La désirée de (Memè-Alan)
- 10.— Qui frappe la foudre?

**EPISEDE: 6**

La paix après l'orage

- 1.— La trahison de (Çeqo)
- 2.— La querelle des frères
- 3.— L'intervention de (Mem)
- 4.— Le droit de propriété à Botan
- 5.— Mem à (Kesaran)
- 6.— La conversation de (Mem) avec (Zin)
- 7.— Le retour de (Mem) au palais des (Celaliyan)
- 8.— (Mir Azin) que pense-t-il?

**EPISEDE : 7**

La surprise

- 1.— (Beqo) au travail
- 2.— Le banquet de (Mir Azin)
- 3.— La mobilisation de Botan
- 4.— Mem blessé
- 5.— L'ordre de retour
- 6.— Le désaccord
- 7.— (Mir Azin) surprend (Mem)

**EPISEDE : 8**

Le salut de Mem

- 1.— L'arrivée des (Celaliyan)
- 2.— Le massacre des chevaux
- 3.— L'incendie du palais
- 4.— Le fils bien aimé dans les flammes
- 5.— (Tacin) a tuer (Siti)
- 6.— Les épées qui parleront
- 7.— Qui est-ce qui était caché sous le manteau de (Mem)
- 8.— Les colombes tachetées
- 9.— Le départ des (Celaliyan)

**EPISEDE : 9**

La fin tragique de (Zin) et de (Mem)

- 1.— La reconstruction du palais des (Celaliyan)
- 2.— Le jeu d'échecs
- 3.— Les oubliettes de (Burca-Beleq)
- 4.— (Siti) à la recherche de (Mem)
- 5.— (Mem) au cachot
- 6.— La grenade de la fille de (Beqo)
- 7.— Le songe de (Mem)
- 8.— La mort de (Mem)
- 9.— Le deuil de (Mem)
- 10.— L'envoyé de (Siti)
- 11.— (Zin) est toujours clémente
- 12.— La mort de (Zin)
- 13.— L'enterrement des jeunes mariés
- 14.— La dernière machination de (Beqo)

**EPILOGUE**

Les feuilles de (Memè-Alan)

- 1.— Le songe de (Mir-Azin)
- 2.— Les mains et l'épine
- 3.— Les colombes tachetées

**PROLOGUE**

Le prologue contient trois chansons. La première parle du roi des fées et de ses trois filles, de leur pouvoir extraordinaire et surhumain, de leur palais qu'on ne voit pas mais dont divers indices révèlent l'existence; fait allusion à ce que entre les fées et les Kurdes existe une relation et à ce que les Kurdes seraient leurs descendants (1). Cette

[1] Cette allusion doit être inspirée ou due aux légendes concernant l'origine des Kurdes, et qui prétendent qu'un mariage de l'être humain avec les fées donna des enfants qui formèrent la nation Kurde. A ce sujet, des versions arabes du temps de Mohamed disent qu'un homme de force herculéenne qui traversait les montagnes du Kurdistan pour venir chez le prophète, rencontra une fée qu'il séduisit. Leurs enfants donnèrent le jour aux Kurdes. Quelques historiographes arabes qui ont situé cette légende les uns avant, les autres durant la vie de Mobamed, l'ont fixée dans cette phrase : (الأكراد طائفة من الجن) qui signifie (Les Kurdes sont une peuplade de djin)

chanson nous parle surtout des trois filles du roi dont les actes feront naître la légende.

Ces trois filles du roi des fées s'appellent d'après une version: (Rojbanû) - Madame soleil qui est une flamme du soleil- (Hêvbanû) - Madame la lune qui est une plume pâle de la lune- (Sîrbanû) - Madame l'astre qui est une étincelle des pleiades- .

D'après une autre version: elles s'appellent (Kemerxan) (Şehriban) (Perixan) (2)

La seconde chanson est consacrée à la description d'un bassin nommé le bassin des fées, qui est entouré de fleurs, des prairies, de cascades, de toute beauté et de fleurs extraordinaires qui fleurissent dans la neige. «Quant le soleil sort de son sommeil, lève la tête de son cousin rougeâtre et fait voir son front, des larmes tombent des yeux des fleurs sur la poitrine blanche des marbres. Le bassin est un miroir pour les astres et la lune. La noire nuit se jette dans l'eau, et se lave; elle en sort, elle se repose sur sa terrasse, et brille. Oui, on le peint comme le bassin aux mille couleurs, de ses eaux jaillissent du vin et du narcotique. Il est creusé entre les prés et les fleurs; les poissons rouges, les serpents d'eau y nagent; on dit aussi que l'eau de la vie éternelle y prend source, qui en boira ne mourra plus.»

Dans la troisième chanson qui est intitulée «Les trois colombes» nous voyons les trois sœurs qui viennent sous l'apparence de ces oiseaux prendre un bain dans ce bassin.

Les trois sœurs quittent leurs plumes et descendent dans l'eau.

La plus jeune frappée de la beauté de ses sœurs sort du bassin se vêt de ses plumes et prenant celles des deux autres colombes sous ses ailes va se percher sur un arbre d'où elle continue à les admirer.

Les deux premières après avoir pris leur bain s'apprentent à sortir mais ne trouvent pas leurs plumes pour se vêtir.

Elles s'aperçoivent que la cadette les a emportées et les lui demandent. La cadette

(2) On trouve des variantes qui parlent de cette dynastie de fées sans faire mention de leurs noms .

ne veut pas les rendre et répond:

— Si vous saviez comme vous êtes belles, j'aime à admirer votre belle nudité.

Ses sœurs répondent en riant:

— Tu es folle de prétendre que nous sommes belles. Tu te figures parce que tu es encore jeune et que tu ne connais pas le monde. Le monde compte deux beautés une du sexe mâle et une du sexe féminin. L'homme c'est ( Memê-Alan ) le prince des Kurdes de ( Mexrib ) et la belle c'est ( Zia ) la sœur du prince de ( Cizira-Botan ) L'Emir ( Azin ). Voilà les beautés, nous ne sommes rien à côté.

La cadette répond:

— Bien alors, je vous rendrai vos plumes à condition que vous me monteriez ( Memê-Alan ) et ( Zina-Zedan ).

Elles consentent et lui promettent d'enlever ( Zina-Zedan ) avec son lit de ( Burca-beleq ) (3) de l'amener au palais de ( Memê-Alan ) et la poser auprès de lui.

La cadette se montra satisfaite et leur rendit leurs plumes. (Elles s'en revêtirent et laissèrent derrière elles le bassin des fées, se mirent devant le vent, le vent devant eux, et avant le bruit du vent elles atteignirent les déserts.) (à suivre)

*D. A. Bedir Khan*

(3) Veut dire château - fort bigarré. Il doit ce nom à la couleur de ses pierres qui sont blanches et noires. ( Burca-beleq ) est l'ancien château fort, résidence d'hiver des princes de Botan. Le château jusqu'à la défaite du dernier Emir de Botan ( Bedir Khan ) ( 1847 ) était en bon état et comptait ( 360 ) pièces, presque autant que les jours de l'année. Le château-fort a une partie de ses fondations dans le lit du Tigre. Aujourd'hui il est en grande partie en ruine; la partie non ruinée sort de palais du gouvernement et de caserne militaire aux Turcs.

Dans la contrée de ( Botan ) de ( Behdjan ) on rencontre plusieurs ruines de châteaux féodaux et d'autres constructions de même couleur de pierre, qui paraissent être d'un style correspondant à l'époque de la féodalité kurde.

Textes et Traductions :

**BERCEUSE**

« La carresse aux enfants » (1)

- 1 -

Dors ! O bonheur de mon coeur et  
 [de mes yeux,  
 Ta mère est tous les jours ta  
 [gardienne (2)  
 Pour que tu grandisse vite mon  
 [Bedir-khan  
 Dors mon amour dors [3] lo ! lo ! [4]

- 2 -

Ne veille pas maintenant, ce n'est pas bon  
 Sache que le berceau t'est un trésor,  
 Ne reste pas sans sommeil le résultat  
 [est peiné,  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

- 3 -

Tu as un bel air, comme les pigeons  
 [et les agneaux  
 Même les anges ont de l'admiration  
 [pour tes regards,  
 Ta généologie est propre, ta mère soit  
 [ton sacrifice,  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

- 4 -

La sphère en rotation est pleine  
 [de haine pour nous,  
 Notre destinée est noir, notre  
 [foie [cœur] est blessé  
 Il ne nous reste comme azile que le  
 [coin de la maison,  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

- 5 -

Ni de bien, ni de bien-être, ni  
 [de repos (l'aise)  
 La calamité nous les a pillé.

(1) Nos lecteurs liront le texte Kurde sous le titre « Delalya Zarowan ».

(2) Ta mère veille continuellement sur toi.

(3) Le mot « qezeh » qui veut dire foie est traduit par amour.

(4) Lo ! vocatif masculin dont le féminin est « lés » qui correspond au vocatif grec « omégar »

Le malheur d'exil est dur,  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

- 6 -

La roue de la sphère est comme le vent,  
 Si ça ne marche pas maintenant,  
 [Dieu est clément,  
 Viendra le jour du bonheur, Dieu  
 [est généreux.  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

- 7 -

Ne dis pas trop, quel état est-ce !  
 Ne sois pas impatient, ne te lamente  
 [pas comme ça,  
 Le secours et la miséricorde du Dieu  
 [nous sont des compagnons,  
 Dors ! mon amour dors ! lo ! lo !

\* :

Cette berceuse a été écrite tel qu'on voit, dans le troisième vers de la première strophe pour un Bedir-Khan qui n'est pas le Bedir-Khan, connu comme dernier Emir de Boten, mais un de ses petits fils, qui portait son nom, et qui est mort comme lui en exil.

Cette berceuse a été composée par Emin Aali, fils de l'Emir et père du petit Bedir-Khan.

Sous le règne du Sultan Abdul-Hamide la famille Bedir-Khan résidait à Constantinople. En (1906) ils furent tous à cause d'une vendetta, exilé dans les différentes parties de l'Empire Ottoman.

Emin Aali Bedir-Khan a eu dans la première étape de son exil, à Sparte, un enfant qu'il appela au nom de son père.

De même que tous les petits fils de l'Emir qui ont porté le nom de famille comme petit nom, sont morts en bas âge, ce petit Bedir-Khan aussi est mort après dix huit mois de sa naissance à Saint Jean d'Acre, la seconde étape de l'exil de Emin Aali Bedir-khan.

La dureté de cet exile qui se prolongea pendant trois ans, mais plus exactement le long exil qui éloigna la famille depuis (1847) de sa patrie après la défaite de l'Emir et qui dure encore pour ses petits fils, jusqu'à nos jours, lui inspira l'amertume et la triste philosophie des quatre dernières strophes.

*Hereqol Arizan*

## شبن و پسنار زبني

گفربه آف شبنار زبني ، زينا زبندان گربه دار  
 بي هفالن گل و بلبل ، بي هفاله لاله زار  
 رهنيا اُورخ و ديرگل ، رهنيا برجا بلك  
 رهنيا اُردى جزيري ، رهنيا قسرا فلك  
 رهنيا افسر و تاج و رهنيا رختا نقين  
 رهنيا چارى خلام و رهنيا آدار و شبن  
 رهنيا تاجين ، چكو و رهنيا ميرى اُزين  
 رهنيا ياريسى زبني ، رهنيا زار و حزين  
 رهنيا خيزان و سيوى رهنيا اُزمان و چنگ  
 رهنيا پولاد و رستم ، رهنيا چاقان و رنگ  
 رهنيا اُردى ولات و رهنيا آر و بهشت  
 رهنيا آف و چان و رهنيا دار و بهشت  
 رهنيا زمردى خسرو ، رهنيا بستامى كهى  
 رهنيا نى و بلور و رهنيا پا خندى مى  
 رهنيا سيدا حواري ، رهنيا فردوس و بخت  
 رهنيا هيلينا ژاران ، رهنيا اُكوان و تخت  
 رهنيا نرمى ، دلالى ، رهنيا ربل و چيان  
 رهنيا شير و پلنگ و رهنيا ميرگ و گيان  
 رهنيا هيفين و بيتان ، رهنيا اُفراسياب  
 بنده بي زينه فرشته ، بنده به تهماسياب  
 رهنيا صور و سپى و رهنيا زرو هشين  
 رهنيا پير و جوان و رهنيا هاوار و شين  
 مرهما هستر و زارى ، مرهما چاخا خراب  
 مرهما آه و برين و مرهما كالان و باب  
 زينا زبندان ، زينا اُزمان زينا نيرنگ و دلال

برو نظار مه زن و فرسو و بسنا هميان مبر  
 مهورت عالي بدرخان

ميرى مه زن! كو قارا هاوارى پرده ننگ  
 و بنجينه ي علم و زائينى و پابه ي تندوقايى صنعت  
 و فن ، پلله ي نه رده وانا چونه به ره و زوروسه ركه ثنا  
 عه زمانا ملتى كوردى به سته زمان و مابه بي فرمه  
 بونا گوتنه و لاوژ برى به رار بي ابي هوندا بوانى  
 كرمانچ و چراخو بنده قاراني پردهوش به هه زار دل  
 خوشى و كيف و استرانينى مه له هورگما ( مجلس )  
 اسماعيل بگ داخوند .

گه ليك برا و خویش هاوالانى دل سوژيه  
 رو نيشتون . مه كه به كه نين و كيف نه خوند .  
 بوئه نه پيروزي و گه يشتا هاوار هورگه خومه  
 دايه رازاندين به يادى روخى پاكي برا جوان وه ساغى  
 و سلامتى هى باش به چي ماوان و به شرفى مه زن  
 و خاوه رهمنى مه زتان مه ده ست كر به كيف و شادى  
 و عود و كانچه و غرامافون نزيك نى ساعات مه  
 هوگري خوي به رنه دا .

كو قارا زار كرمانچي كوتا و نوها مه  
 راگر تيوژوان روزاندا دى ده ركه و بت مه نسخهى  
 وان تقديم ده كه بن ايتر خدى هاوالاوه بيت مبرم .

سيدر مرنى

زينا خورتان و فرشته ، زينا چاف و باف و كال  
 دلكتى به زينا زبندان ، دلكتى خورتان و پير  
 سردلان شفين و شاهه ، افسره سرشاه و مير .

صاحب الامتياز و المدير المسئول

المير مهورت عالي بدرخان

## لورييا بدرخان

— زحاجو آغاره —

هروکي خوهنده قانونه دستونا خوهده بخوينن  
ايروام لورييکي بلاف دکن: « دلالييا زارووان»  
آونده هر کس باور بکت کو آف لوريياها  
دلالييا بدرخاني مزنه، لورييا باپير ينه . لي نه ولي  
يه . ب في لوريي نه باپير يمن بدرخان، لي نفی يي  
وي، براي من بدرخان دغنيانند و دلوراندن .

آف لوريياها کو ب خوه، ب زمان ومانا  
خوه فه هيژايه، ژ بونا من ژ هلكه دن بير که مزن  
وزلوله: پي باپير، باف، ادي و براي من تين بيرامن .  
ژ بر کو بدرخان ناقلي کري يه؛ تيده نافي باپيري  
من هه يه . او بدرخاني کو ب خرتي و مزنا هيبسا  
خوه فه نافي خوه، ل شونا نافي مالباتکي خسته . (۱)  
او بدرخاني کو ژ بونا يکيتيا کردستاني ختبه،  
ژ بونا سرخوه بونا کردستاني کتبه شر وقر بنان و  
هرتشتي خوه دي في ري به ده فدا کريه  
وژ بونا وي ژي مر يه .

آف لوري باغي من ژ براي من ره گو تيه . او باغي  
کوژ من ره نه تي خوبنا خوه آباک دا — اوخوينا  
کردي کو ب هزار سالان وه در زوازانين بوتان ده  
ب باين باکري هونک دبوود جزيري ده د نافي  
گرميالات و زنار ين بر جابلک ده دکلهاء و هر گاف  
دميدانين شر ورومتي ده ژ سينگين داهاتيين مالباتا  
آيزان دهات ريتن — لي از ب دل و هشي

(۱) هروکي تاسه نافي مالباتا بير کين بوتان آيزانه .

کرداني ب خوهدي کرمول وي ري بي خستم  
کو اوب خوه و باقي وي تيده مريون .  
آف لوري ديامن، دستراند و پي براي من دغنيانند .  
او ديا کو گاغا از هژده، نوزده سالي بوم ومن  
دل کر از بکشم مکتبا حريبي ژمن ره گو تيو:  
— ماژ تره نه ناموسه؟ ت چاوان بکفي مکتبا  
حريبي و پي ضابطي تر کو . او تر کو کو ولاني  
ته ژ دستي نه ستانده، ملتي ته خسته خلامي يي،  
باپيري ته دبل و مالباتا ته پريشان کورنه وهون  
آقينه ز بقاري يي .

آف لوريياها ژ براي من ئي کچک بدرخان  
ره دهات گو تن . او براي کو خدي دمنفائي  
ده داود دمنفائي ده ستانديبو . او براي کچک  
ودلال کو د نافي چار ساعتان، در سرازونين  
باغي من، دکلهاء عکايي ده مر .

ژ فان پيه، دي لوري يي ده بير خوهها من ژي  
هيه . خوهها من بشتي مرنا براي مه، د شيناوي ده،  
ب دنگي خوه ئي زير ژ مره او دنهوراند و پي ام  
دگر بياندن .

جار کي، من اف لوري ژ حاجو آغاره خونند  
و گو تيو کو چچي زارووين ملامه بدرخان نافي  
لي دکن ژ دسي سالان ببترا ناژين و دمرن .  
آغاهنک فکري ول من فگراند:

— ژ بر کو رحمتي نفي خوه نادى ت کسی .  
ژ لورامن ژي آف بندها — کوهالانکه عشيروا  
ري يه — پيشکشي آغايي خوه کر .

مهدت عالي بدرخان

## ولایي کردان

کاپرا، مروانه، مالو خانه بی ویرانی مین  
تی بگه زانینی فن و کیرده وه و عرفانی من  
روله بی کوردم سلاحشورم له میدانی شرا  
عالم آیزانی چلون بو روسته می میدانی من  
گو بروی گه شتو گوزاری باغو باغافتم بکی  
هرده لی (الله اکبر) چند خوشه سیرانی من  
آوی برماوهی منه نیوهی جهان تیر آو ا کا  
بو عراق و الجزیره روحه شه م آوانی من  
مزرعه کیلمکی و ولاتم بوته انباری جهان  
رزق ایران و عرب تأمین ا کا خرمانی من

\* \* \*

بو بلندی خوی به قربانی ژپانی گل ا کا  
گیانومالی هیجه لاسر کیرده و گورانی من  
رو بدبو دینو ملت زره بی کورقی و به دی

گیان آدن ناگن تحمل عالم و شیخانی من  
او کسه بد بینه ایساتی جهل بو خوی ا کا  
وا ا کا انکاری زور و بدبه و دورانی من  
لا په ره ی تاریخی عالم شاهده بو دوری من  
دیاره هیشتا تاقی کسرای دولتی ساسانی من  
ادعایی علمی موسیقا امین ایسات ا کا  
راستوسی گااو بیات و لاولک و حیران می من  
پیایوی وک سلطان صلاح الدین ایوبیم بو به  
نغره بو اسلامی عالم کیرده وهی سولطانی من  
انقلابی چون پیگ هینا له اسلامو عرب  
میر (ابومسلم) بوسهر کیردهی گه لی شیرانی من  
نادری افشاری عبد الکریم خانی زنی  
دونی دنگی داله عالم سطوق شاهانی من  
گوفتگو با انتهای بی خاتمه ش بی به م قیسه  
نسبتی آری به سه بو عنغه و عنوانی من  
عبد الظالمی امیری کر کوکی

أدیاتیکیش ژپانیکی هه به ، و هر دو کیان به به ک  
چپشت ده پیوریت و به رزی و نیزی ده زانریت .  
ای وه خوا هیچ ژپان به بی میل و جاذبه ده بیت !  
و هیچ میلو جاذبه بیک به بی یژین و گوتن بیک دیت !  
و هیچ قیسه راستو جوانو قنجو ژ بیک له ده بینه به ک  
له گه ک قیسه بیک ناشرین و شیواوو آلوزاو !  
جوابی نم سو الانه هوو نمه به که ژپان  
به بی ادیاتیکی ریک نا که بیت که لی بو به  
شینه وه . و به رزی و نیزی ادیاتی هروه کو ژپان  
به عینی شیت ده پیوریت . . (تواو نه بو به)

هغدغدی خوری

به کی له ادیاتی مصری گه وره (عباس محمودی  
عقاد) گوتوبه تی :

« ژپان چی به و ادیاتی چی به ! ! . دو  
شتین له به ک شیت دروست کروان و به به ک ده زو  
چیزاون و له به ک کارخانه ده رجوزه . له مه و پیش  
خه لک پی نه ده ویست که بویان ایسات بکن  
که ادیاتی به بی ژپان بیک ناپیت ، به لام  
ایستا که زور پی ویستیا نه که بویان ایسات  
بکریت که ژپان به بی ادیاتی ناپیت . له گه ک  
نه وه شدافریک نیه له به بی نم دو حقیقه . مه  
به ست هروه کو هر ژپانی ادیاتیکی هه به ، هوو

لوری

## دلایا زارووان

۱

بنقه خوشیا دل و دُچاقان  
دادی ژتره هر رو نگهبان  
دازوت مزون بی بدر خان  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۲

هشیار مبه نهو نه قنجه  
مهډک ژتره بزانه گنجه  
بی خو مبه پاشیاوی رنجه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۳

خوش حالی وکی کتوک و برخان  
فکراندنانه ملک زی حیران  
پا که نسبتانه دادی قربان  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

یونانی کون ، روسی ، فرانسیزی ، المانی ، ۵۰۰ پ .  
زورده کات ، انجا بو نهوه که تم حقیقته چاک  
تی بگه یین باه نندیک بلسی ادبیات و چه شنایی  
بکه یین .

ادبیات پیک هینانو گوتنی میشک و فکری  
انسانه به چه شنیکیی جوانو خوشوصاف که تأثیر  
بیکات له سهر انسان ، آیا انسان غه بگین و دلیل  
ته نک ده کات ، یان فرحناک و دلیل خوشو کیفدار  
ده کات .

۴

دورا فلکی لی سرمه کینه  
بختی مه رشه کذب برینه  
مسکن ژمره نهو نقینه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۵

نه مال و نه صاغی ونه راحت  
تالان کرنه جی زی محنت  
دشواره گلاک بلایی غربت  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۶

چرخا فلسی وکی نسیمه  
هوانابه خدی گلاک رحیمه  
روژا خوشی یی دبت کریمه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۷

هو قاس ت مییژه آف چه حاله  
بی صبر مبه ولی مناله  
عون و کرماخوه دی هقاله  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

امین عالی بدر خان

ادبیات نهو شتازیر که له دیلی انسان گکیرد  
ده بیته وهو دبتوده چیت و ده ری ده کانه دهره وه  
و ده بلیت به زمانیکیی شیرین و جوان .  
انجا ادبیات بیژین و گوتتی همو شتیک نه ،  
بشکو عبارته له گوتنو بیژینی شتیک که به ستراوه  
به ( ژریان ) وه ، و که پیوستی ژبیانه .

# هاوار

## کوڤارا کردی

### ادبیاتی کوردی

لیرانه داده مانه بوبت به کورتی باسی ادبیاتیک بکه بن که علاقه پیک زوری مه به له گهل ادبیاتی دنیا ، و به تاییه تی ادبیاتی آری ، نه خیک له مه ندی ادبیاتی روز آواده کات و هه ندیک لی ی جودا ده بیت نه ویش ( ادبیاتی کوردی ) به .

هر و کو تاریخی کوردان به نه زانراوی ما وه ته وه و هیشتا به نه واوه تی له لای تاریخ زانه کان نه زانراوه ، ادبیاتی کوردیش به و چه شنه معلوم نیه و معلوم نه بوه . هر وه کو ایبه به ته واوه تی نه و شتانه نازانین که تأیری کیر دوه ته سه ر کوردان و تاریخی کوردان ، هر وه ها نه و شتانه نازانین که تأیری کیر دونه سه ر ادبیاتی کوردی ، انجا نه و شتانه آسایسی بی کوملی ( جفاکی ) بی ، یان دینی . . .

هه میسه ان چونکه قومی کورد توشی لافاوی گهلان و قومان بوه و قومانی جودا جودا هه مو اخلاقی ، ادبی ، کوملی تأثیریان کیر دونه ته سه ریان ، زیمانیشان تأیری لیان کیر دوه . او ملته ییگانانه که هاتو ته کوردستان

و نه م و ولانه بیان داگیر کیر دوه ، که مو زور تأثیریان لیان کیر دوه و شتیکیان به جی هیشته ، و نه و به شی کورده ی که که و توه ته بهر نه م لافاوانه له ژیر تأیری دین و زیمان و تاییات و احوالی کوملی نه وانسه مساوه ته وه . و چونکه ملتی کورد نه زان بوه و مدنیتی نه و مله تانه زور بوه . ده ستیان کورده ته و هر کیردنی مدنیتی یان . انجا له گهل مدنیت ، شتی دیکه شیان ، و مرده کیرد . وه کو : زمان ، ادبیات ، هلبست ، احوالی کوملی ه . پ .

له بهر نه و شتانه که له سه ره وه گوتمان کورده کان هه تا کو ایستا که له زیمانی خویان زیان تیر له زیمانانی ییگانه تی ده کوشین . هر به بونه ی نه وه وه کورد کان بو ادبیاتی کوردی تی نه کوشیونه . و ادبیاتی کوردی . نه وه ی که هه به . هر وا به نه زانراوی ماوه ته وه .

هه مو خوینده واران (هاوار)ی خوشه و یست ده زانین که گهل کورد گه لیکی آری به معنی هندی آوروپی به . له بهر نه وه زیمانی کوردی و ادبیاتی کوردیش وه کو زیمانان و ادبیاتانی دیکه ی آریه . و ادبیاتی کوردی له ادبیاتی فارسی ، هندی ،



# کتبخانا هاواری

ریزانا الفای پا کردی

هزمار  
۱

غروش سوری

۱۲۶۰۰

۱۰

بِ چرمی جملاندی

بِ چرمی عادتی

زبونادره دفتت حتی پوستی ب سر بیت خستن

زنگراف ومطبعة  
**یونیه اخوان ارباشوق**  
 حفر جیسع العادین والصور الملونة واللوحات الخارصية  
 طبع بطانات وارصيات بحروف تانزة على الاطار الذهبی  
 دمشق  
 ملك الظاهر

الطیب  
**احمد نافذ**  
 انحصان بالارض الجميلة والزهرة والاعمال  
 دمشق  
 عرنوس

الطیب  
**بچه خضیک**  
 ادعتصامی بالارض وارامه العیون وبراقتها  
 دمشق  
 صالحیه

## اشتراکات مجموعه هاوار

|                       |  |
|-----------------------|--|
| وفي غير هذه الأقطار   | في سورية قوتوكية والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس |
| عن سنة واحدة ۱۵۰ فرنك | عن سنة واحدة ۵۰۰ غروش سوري - ۱۰۰ فرنك              |
| عن ستة شهور ۹۰ فرنك   | عن ستة شهور ۳۰۰ غروش سوري - ۶۰ فرنك                |
| عن اربعة شهور ۶۰ فرنك | عن اربعة شهور ۲۰۰ غروش سوري - ۴۰ فرنك              |

للمراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

# هاوار

کوفارا کردی

هزاره  
—  
۲۰ تیرمه ۱۹۳۲


## تیسده خستییین کوفاری

|                               |                 |
|-------------------------------|-----------------|
| هفتدی صوری                    | ادیاتی کردی     |
| ج ۰ ۰ ۰ بدرخان                | لوری یا بدرخان  |
| سید حزنی                      | پیروزییا هاواری |
| قدری جان                      | بسرکا زیرین     |
| دكتور ك ۰ ۰ ۰ بدرخان          | دلذریا گلگی     |
| ج ۰ ۰ ۰ بدرخان                | الغاییا کردی    |
| عبدالحانی کر کوکی             | ولاتی کردان     |
| ۰ ۰ ۰ ۱ بدرخان                | دلاییا زارووان  |
| دكتور ك ۰ ۰ ۰ بدرخان          | شین و پسنایینی  |
| جگر خوینی کردی                | پسنا دیوکی      |
| هر کول آزیزان                 | آلی کردان       |
| رونکار یا شاگردین کردین عراقی |                 |

م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

۱۳۵۱ هـ



## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Têdaxizistiyên Qovarê

|                    |                     |
|--------------------|---------------------|
| Hawar              | Şaqir Fetah         |
| Zozanê Tocî        | Némirê Miqst        |
| Mar û Mirov        | Çiroqbêj            |
| Ji min bawer bibe  | Dr. Q. A. Bedir-Xan |
| Melayê Cizerî      | Hereqol Azîzan      |
| Dîq û Rovi         | Çiroqbêj            |
| Hêva çardeşivî     | Kedrican            |
| Ferhengoc          | Hereqol Azîzan      |
| Ji bona Hawarê     | Cegerxwîn           |
| Gulbanqê Hîşyariyê | Mela Elî            |
| Berdêlq            | Kedrican            |
| Hawar e            | Bozan Şahin         |
| Qurdewarî          | Faikê bêqes         |
| Sê malo gundoî     | Stranvan            |
| Elfabêya Qurdî     | C. A. Bedir-Xan     |

### Birê Frensizî

|                             |                  |
|-----------------------------|------------------|
| Un femme, Chef de tribu     | N. A.            |
| O, village de trois maisons | Hereqol Azîzan   |
| Folklore kurde              | C. A. Bedir-Khan |
| L'Alphabet kurde            | D. A. Bedir-Khan |

Çapxana terektî

ŞAM—1932

# QITÊBXANA HAWARE

HEJMAR

1

## Rêzana Elfabêya Qurdi

Note sur l'alphabet Kurde

Bi çermê xemilandi 12,50 K. S.  
Bi çermê adeti 10 K. S.

Ji bona derve divêt hakê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Kafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES

Damas

Aznous

Damas

Sahis

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubige Frères

Inscription sur tous les métaux. Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûri — 100 frenq

Seşmehqî 300 kirûs-sûri — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûri — 40 frenq

Ji bona welatên din:


Salqî 150 Frenq

Seşmehqî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî tene şandin:

Şam: Taxa Qurdan



## Qoyara Qurdi \* Revue Kurde

### Zozanê Tocî Çawan Bû? Irû Çawan e?

Yeq ji zozanên meshûr Qurdistanê (tocî) ye. Tekrîbî bi sê hezar metrowan ji riya behrê bilindtir e.

Di mabeyna Erdîş û Diyadinê da zozaneqî bi ay û qanî bi gul û giya ye.

Çikeder rindiyên tebhî hene xwedê jê dirîx ne qiriye. Beriya serê mezin da çawan bû? Irû çawan e?

Pêşya serê mezin da Tocî cihê gest û seyranî qer û xortên di Heyderan, Ademan, celalîyan bû.

Cihê rindan, bedewan û delalîyan bû. Li her aliqî qon û xewet li milî hev drêj dibûn. Qeriyên mihê sor û çavres li nav gul û giyan da wiinda dibûn.

Li mileqî şehîna hespan, li mileqî qalîna mihan ji qomên suwaran ji refê bêriwanan û çiyayên delal jindar dibûn. Adeta her aliqî da weq çolbaran avê qer û sahi diheriqîn.

Irû çawan e? Eywah ... ew çiyayên delal û dilrûba, ew zozanên cenetîsa irû cihê hirç û gurane. Cihê qerû û roviyan e.

Ne hespe, ne suwar, ne peze, ne şivan, ne bêri ye, ne bêriwan.

Gelo çî li wan kewimî û çî li wan hat?

Bar qirî bi çiqî ve çûn yan şereqî mezin li wan kewimî û hemî telef bûn.

Belê di pêşya serê mezin da tirqo ji bo veqirina rêya Tûranê dixebitîn. Dixwestin tirqên Enadolê digel tirqên Tûranê mitesil bibin. Di mabeyna wan da tu hêl memînin. Ew ji bi melwqirîna qurda û istîla qirîna Azerbeycanê dihat

wicûdê. Feket telbikîstê fiqrî melûnane ji wan re mimqîn ne bî.

Wextê qo serê mezin destpêqir û xwe ra fîrset xerîmet zanî dest bi qustîna file û teheira qurda qirin.

| کرد و کردستان   | ج ٠٤٠٠ بدخان         |
| خونا راستی بی   | ع ٠٠٠٠ حسن           |
| ثبات            | ش ٠٠٠٠ شاهین         |
| دنگکی زردشتیان  | هاوار                |
| بیانیکی چه دینه | هر کول آزیزان        |
| بجوالی خوه فه   | تزییر لوند           |
| فرهنگکوک        | هاوار                |
| هیوا و دلداری   | م ٠٠٠٠٠٠             |
| مرحدان          | مجموعلی              |
| ولات            | آغایی مردیسی         |
| چار بین خیام    | دکتورک ٠٠٠٠٠٠ بدرخان |
| شهناما شهیدان   | جگر خونین            |
| لاوکر           | سقرانقان             |

١٣٥١ هـ مطبعة الترقی بدمشق ١٩٣٣ م

SAL 1,  
HEJMAR 20  
DUŞEMB  
8 Gulan 1933

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 20  
LUNDI  
8 Mai 1933

Qoyara Qurdi \* Beyne Kurde

## Gewisliyetn Qovart

Heytneqe yeqsali  
Du Dengbêj  
Xurtiya Binahtyê  
Hêvind  
Ferhengog

Nivisanoq  
Dr. Q. A. Bedir-Xan  
Çtroqbêj  
Ç. A. Bedir-Xan  
Hawar

Lavelav  
Serxwerabûna Mirîşan  
Revandin  
Cuhaba Lawant  
Berxiqê Hawarê  
Dilber  
Çarinên Xeyam

Osman Sebrî  
Cegerxwîn  
Dr. Q. A. Bedir-Xan  
Kedrican  
H. Small  
M. F. Boll  
Dr. Q. A. Bedir-Xan

Çapxana Terekî

ŞAM — 1933

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES.  
VENERIENNES ET INFANTILES**

*Andiwar*

*Djézire*

*Dr. M. Khadiz*

*Opérateur et Oculiste*

*Damas*

*Salis*

## PHOTOGRAVURE

### EGOUBIGE FRÈRES

Inscription sur tous les métaux. Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes,

*Damas*

*Malek Daher*

## Qiriyariya Qovarê

Ji bona Sûrtiya, Tîrçiya, Ecemîstan, Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirôs-sûrt — 100 frenq  
Şesmehqî 300 kirôs-sûrt — 60 frenq  
Çarmehqî 200 kirôs-sûrt — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq  
Şesmehqî 90 Frenq  
Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî tîne şandin:

Mîr Celadî Ali Pedir-Xan

Şam: Taxî Qurdan

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse, l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.  
6 mois 60 fr.  
4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.  
6 mois 90 fr.  
4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur propriétaire: Emir D. A. B. dir-Khan.  
Damas: Quartier Kurde

## Hejtneqe Yeqsali

Belê Hawara me bi vê hejmarê dibit yeqsali.

Zaroqe yeqsali hêj sirmêj e, hin ne qetiye ser lingên ji. Carinan diceribine qo liser lingên xwe biseqine, destên xwe dide diwar, qursî û hûrmûrên dora xwe. Lê tişteq heye, ev zaroqa ha ji dêya xwe bûye. Bi serê xwe heyîneq e. Êdî ne weqe berê ye, ne hevîyeq e. Bi çavan tete ditin, bi destan tete girtin. Bi canê xwe ê hûr û zirav têqilî jiyina me dibe. Di civatê de ciheqî wê heye. Fm pê mijûl dibin, ew bi dora xwe bendewar e.

Belê Hawar, ev zaroqa yeqsali di jiyina militê me de heyîneq welê ye qo himê zmanê me daniye. Êdî zmanê me ne tenê zmanê axaftinê ye, bûye zmanê nivisandinê ji. Ji milê din vê zaroqa hani ji me re ev herf anîne û pê nivisandina zmanê me geleqî besani bûye û her dengê zmanê me yeq bi yeq û weqe xwe, liser qaxezê, hate seqinandin.

Gelo berî Hawarê zmanê me tewr ne hati bû nivisandin. Herê, hati bû û di zemanên geleq qevn de. Berî çend babelîsqan hin camêran bi zmanê me qitêbînen mêzin ji çêqirine. Lê wan nivisaran ji me re zmaneq ne dianin pê. Ew nivisarên ji hev cihê, ji pirsên biyant teji, ji zarê xelqê — zmanê xwerû — dûr û tenê bi hin pirsên xwe qurdmancî bûn. Lê herçî ji bit divêt qo her qurdê xwendî û bîrewer navê wan camêran bi pesn û sipas di dilê xwe de hilgire û kedrê wan bizane. Nemaze Ehmedê Xanî. Heqe Hawarê

himê zmanê me daniye Xanî giyanê wî afrandî bû [1] Ji xwe qurdantya bîrewer bi Xanî re dest pê diqe.

\*\*\*

Em vegerin ser gotina xwe.

Weqe em dibêjin zmanê nivisandinê, nabit em bawer biqin qo zmanê me ge-hîştiye wê rêza qo pê her tişt tete nivisandinê û ew mîna zmanên din zmaneqî teqûz e. Bi zmanê me irû tenê hin tişt hene qo rind tene nivisandin û merov ji hekê wan bê qo xwe hîde zeviya pirsên biyantyan, dertêt. Nemaze tiştinen welê qo ji me re ji ser û ramana me bêtir ji dil û hisên me hildeqevin.

Qêmaniyên zmanê me, gava em ji ber vwe dinivistnîn geleq naqevin ber çavan. Ji ber qo mirov, hingî ramana xwe gora pirsên zmanê xwe dieldine û cila ramana xwe ne li pirsan lê ya pirsan li ramana xwe diqe. Lê weqe em ji zmaneqî din werdigerin zmanê xwe dişwari û qêmaniyên zmanê me wê gavê di ber çavên me de bel dibin. Ji ber qo êdî mejiyê me rast bi rast nazê, lê liber tişteqî din digire û em bi raman û awayê gotina yeqî din ve girêdayî ne.

Ji xwe ji bona zmanê me weqe din ne dibû, niqari bû bibe. Ji lewra qo zmanê me hêj zmaneqî hov e, hetanî irû pê tenê tiştinen herûnî û dan û standinê hatine gotin, herçî qo qurdê pê dorgirtî bûn, di hawira wan do peyda dibû, çavên wan bi wan diqet.

Lê tişteq heye qo li geşbûna dawîya zmanê

(1) Ji xwe me dil heye û ji zû ve em li nivisarên qevn digerin da qo pêadetir daba xwe a nivisandî bisenifinî û bi rêz û tarîxê ve belav biqin.

me nişan diqe. Tovê zmanê me toveqî geleq xurt e, di her zeviyê de zû şin dibe. Em diqarin bêtirsi bibêjin qo ji geleqî zmanan zûtir û çêtir. Çimqî di zmanê me de zêreqîyeq heye qo ji bona tişteqî nûjen bi pirsên xwe pirseqe nû dittne pê û lê diqe. Herweqî di zmanê elmanî de. Ji xwe awayê hevduadanina pirsên qurdî û elmanî geleq nizingî hev in. Pêşdetir bi bendeqe cihe ev nizingahî di stûnên Hawarê de dê bête raveqirin.

Bi bist hejmarên qovara me qo heta niho belav bûne me dil qir em her awayê nivisandinê biceribinin û bexin zmanê xwe. Herweqî awayên bingelî, nezm û nesir û çend şiqlên nesrê qem û zêde di Hawarê de belav bûne.

Tenê awayê temaşayê hebû qo hêj ne qetî bû zmanê xwe. Mina qo xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin me ew şiql û awa ji ceriband û xiste zmanê xwe. Temaşaqe qîçiq bi navê (Hevind). Ev mewzûa ha mewzûa qîtêbeqê ye, ne mewzûa çend stûnan. Lê herweqî hale gotin ev tenê ji bona ceribandana û existina zmanê temaşayê li zmanê me hatiye nivisandin. Ji lewra heye qo nivisevan di hin cihan de bi isûlên temaşayê ve ne çû be ji. Divêt holê bête zanin û xwendin.

Di babeta nivisaran de çend pirsên me ji ji nivisevanên me ên delal re hene.

Heta niho ji bona gihandina wan me guh ne dida û her texlîf nivisar dixistin qovara xwe. Emê di san bexin ji, lê ket mebit di nivisarên menzûmê de divêt wezn hebît. Ji irû pêve em şilrinen bêwez naxîn qovarê. Ji xwe mesela weznê, bê aheng û xeyalinen bilind û zrav, tişteqî hêsantî ye. Ma qî heye qo heta çaran û pêncan niqare bijmêre.

Ev in çend nimûne:

|    |     |    |     |   |    |     |      |
|----|-----|----|-----|---|----|-----|------|
| Ê  | le  | qe | ev  | + | ge | leq | qevn |
| 1  | 2   | 3  | 4   |   | 1  | 2   | 3    |
| Xu | dan | rê | ziq | + | xu | dan | tevn |
| 1  | 2   | 3  | 4   |   | 1  | 2   | 3    |

|    |     |     |     |     |    |     |     |     |    |     |     |
|----|-----|-----|-----|-----|----|-----|-----|-----|----|-----|-----|
| Ze | vî  | bûn | be  | yar | +  | gun | dên | me  | xe | rab |     |
| 1  | 2   | 3   | 4   | 5   |    | 1   | 2   | 3   | 4  | 5   |     |
| Ji | dij | mî  | nan | ra  | +  | me  | da  | ye  | cu | hab |     |
| 1  | 2   | 3   | 4   | 5   |    | 1   | 2   | 3   | 4  | 5   |     |
| Qa | nî  | Dêr | gul | +   | qa | He  | re  | qol | qa | Qe  | pir |
| 1  | 2   | 3   | 4   |     | 1  | 2   | 3   | 4   | 1  | 2   | 3   |
| Qa | zo  | za  | nên | +   | Ba | vê  | Tê  | li  | qa | qê  | bir |
| 1  | 2   | 3   | 4   |     | 1  | 2   | 3   | 4   | 1  | 2   | 3   |

Herweqî tete ditin di xêzîqên pêşin de du ling û di lingê pêşin de çar, di duwim de sê moviq hene. Di xêzîqên duwim de ji du ling hene û her ling ji pênc moviqan hevedudanî ye. Xêzîqên sêyim sêling in, di lingê pêşin de çar, di duwim de çar, di sêyim de sê moviq hene.

Belê mirov diqare her xêzîqê holê li yeq veqe, lê bi vî şertê qo moviq ji lingeqî derbasî lingê din mebin yanî divêt her pirs di nav lingeqî de bîmînit û hecaqe wê derbasî lingê din mebit.

Em hineqî çavê xwe li awayê belavqirina qovarê ji bigerin. Hawar di Gulana sala 1932 an de dest bi derqetînê qiri bû. Hingî me geleq da bû serê xwe gelo em wê di çend rûjan de carqê derinin. Me nêt hebû em wê biqîn dehrûjîqî û di serê deh rûjan de carqê derinin. Lê me nediwêrî. Ji lewra we ew qiri bû panzdehrûjîqî, pêşdetir me ew biqira hefteqî. Herweqî di hejmara pêşin de me gotî bû. Lê ne tenê me ew ne qir hefteqî, serê panzdeh rûjan de carqê ji derneqet. Di ziqê hev di serê hejdeh rûjan de carqê belav bû û ji lewra di paşya salê de li şûna qo bist û çar hejmar derqevin, tenê bist derqetin. Heqî zane ji xwe zane ....

\*\*\*

Di despêqa benda xwe de me gotî bû, Hawarê himê zmanê me daniye. Divêt bête zanin qo zman ji himê heyîna me ye û bê zmanê xwe em niqarin bijîn û di nav qoma miletan de weq mileteqî serxwe bîmîtin û paydar bibin. Ji xwe ji bona her miletî ji holê ye. Nemaze ji bona me û ji bona wan miletên qo qetine rîqanê mileteqî bevol.

Ji ber qo miletên bindest heyfna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi keweta du ceqan diparêzînin: Ol yeq, Zman dudo. Lê heqe ola miletê serdest û bindest yeq bibe, hingî çeq yeq bitenê ye, û bend tenê zman e.

Halê me qurdan ev e. Em qetine bin destê sê milet û dewletên misilman, piraniya me ji misilman e, em û serdestên me ji oleqê, ji dineqî ne. Her sê ji xebateqe zor dixebitin qo me taxin miliyeta xwe.

Lê berçî miletên nemisilman, weq filehên ermenî û yûnanî, qo bi babelisqan ve bin destê tirqan de mane û piraniya wan bi zmanê xwe ji nizani bûn û bi tirqî xeber didan, disan miliyeta xwe winda ne qirine. Ji ber qo ew û serdestên wan ne ji oleqê bûn, ji olinen din bûn. Ola wan ew diparastin û nedihîştin qo winda bibin, di nav miliyeteqe dinde bihelin, bibin tirq, ereb an ecem. Jê dixuye qo zman hing olê ne xurt e ji, xesma zmaneqî qo hêj ne qetiye nivisandinê.

Carin hebûn, bê winda qirina zmanê xwe ji, tenê bi hînbûna zmanê wan em diqetin tora wan û dibûn ji mileteqî din. Ji ber qo ola me ji xwe em dighandin

wan, bi hînbûna zmanê wan, benda zmanê ji ji navê radibû û zmanê me qo tenê zmanê axafînê bû di devê me de weq zmaneqî biyani dima û bi zemanî ve me ew ji bir diqir. Çimqî zmanê miletê serdest zmanê nivisandinê bû, me pê dixwend, dinivisand û zanayên me qitêbên xwe pê çêdipirin.

Ev e zman, ev e qurdanî, ev e winda bûn, evê çeqên me.

Ji gotinên jorin rind dixuye qo çeqa qo di destê me de ye çeqeqe ne teqûz e ji, nivçeqeq e. Ol li rasert wê ye. Heqe me ew ji pêş ve ne bir, winda qir, hingî divêt em destê xwe ji heyfna xwe bişoyin.

Gotineqe nas heye. Di bêjin qo : ew meletê qo qetiye bin destê mileteqî din û zmanê xwe winda ne qiriye mîna dilefî ye qo mifta zîndana wî di destê wî de ye, rûjê deriyê zîndana xwe vediqe û jê derdîqeve.

Lê yê qo zmanê xwe winda qiriye mifta zîndana wî êdî ne di destê wî. Lê di destê dijminê wî de ye û dijmin deriyê zîndana girtiyê xwe tucar venaqe.

Ew mifte, trû hêj di destê me de ye.

*Nivisanoqa Hawarê*

**Lavelav**

Yareb tu tinê li min biyar be  
Ev dinya bila liser min bar be  
Tu şinê bide min ez nawestim  
Dê hezar salt welê rawestim  
Heşt sal in te xistim bin vîbarî  
Ez qirim dergehvanê vî arî  
Ne min diquje ne min dijine  
Her dem dilê min î bibirine  
Gava dibare weqe xunav e  
Dema diêşe jana zirav e  
Qela gihanê li min didêre  
Dil û binavan li min dihêre  
Herçiyên qo weqe min bine  
[din  
Her demê dixwazînin Ceger-  
[xwin

Pirsan diqe tir dixe Qûvanan  
Her rojê çêdîqe xweş xuwanan  
Dê geh bigiri dê geh bibêje  
Derdê di dilê xwe de birêje  
Bi vî awayî heqim û zan  
Bi ve rêve çûna pir û danan  
De niştirê li gula xwe xine  
Qem û kirêjê lê bîderxine  
Ji ber qo te wa çêqirne bêvin  
Bê qer û nezan bê jir û bişin  
Derdê min hemû di dil dimine  
li lewre holê tim î bibirine

\*\*\*

Ne temûrling im neji Siqer-  
[der  
Bixwazim dinê bigrim seran-  
[ser

Ne ez Mem im qo dilê min Zin  
[be  
Ne Ferhad im derdê min Şîrîn  
[be  
Welatê delal qo berê em tê  
Her eşîreqê sed Zin û Mem tê  
Fv xortê qo tîro bûne bê per  
Katî nedibûn biqurê Siqender  
Ji bo zeriyê welatî mizgîn  
Her gavê didin Ferhad û Şîrîn  
Ez qurme evîne dil soft me  
Qurdanceq im bendeyê Xanf  
[me  
Min can telata hemû qurdan e  
Li niq şîna te qeleq hêsan e  
Miune akil e nehiş ne tevdir  
Min nîne xwedî heval û hevîr  
Ez cendeqeqlî bê dest û pê me

|                                |                               |                                |
|--------------------------------|-------------------------------|--------------------------------|
| Dilqeti û serxosê vè rê me     | Vegeime niq Yûnis û Circis    | Romî, mêrû mezinê me quştin    |
| Yan derdê min bexê gora şinê   | fro ji hatime erdê mikdîs     | Qita namûsê dime nehiştin      |
| Ya hin zêdetir bide min vîne   | Hinde geriyam dilê min bû xav | Kira me anîn evan bê havan     |
| Da biqaribim liber xwe ragi-   | ez çûme warê Isayê bê bav     | Weq gurê di nav pez bê şivan   |
| [rim                           | Gava qo li wirjî bûme bê fer  | Qemend û zencir diqin Rewa-    |
| Dilê xwe yê xêr nedi hê dag-   | Min da rê çûme niq qurê Azer  | [lau                           |
| [riu                           | Min gotê he rabe qurdê qevnar | Weq berxa şerjê diqin Şepalan  |
| ***                            | Tirzan kewmê te qirin axa sar | Ji xwe re dibin Qeçan û Bûqan  |
| Ey gewretirê şeh û emiran      | Hêviya giştîqan ma liba te    | Davêjime nav êgir Biçûqan      |
| Mihriwanê bêqes û fekiran      | Di ber hemûyave hatme bate    | Dibêjime — wetenî Egilmî —     |
| Lew hinde dirêj diqime peyi-   | Ji bo felata me dê çi biqî    | Yandirin qafiri Qurd degilmî   |
| [van                           | Çi mizgîniyê di destê minqî   | Q'rê qo bi me bûne dirêjin     |
| Da qo ji bo min bibi dilovan   | Diqevime bextê te hezar car   | Em niqarin hemûyî bibêjin      |
| Ne insaf e qo yeqî gunehqar    | Min neqî rê destvala rûsar    | Em hinde diqin Hewar û carî    |
| Tu hewce biqî ber destê neyar  | Da qêta neyar li me nebe xwes | Bi şev û bi roj gazî û zarî    |
| Ez suxteyê evinê jî mejîm      | Piçeği dilê me jî bibe geş    | Dibêjime em vî bari nagrin     |
| Diqim çiroqa xwe bo te bêjim   | Ewî jî li min neqir xwediti   | Me şin nema qo êdî xwe ragrin  |
| Ev bare giran te da milê min   | Herweqî evê dinê min diti     | Li dest diçiyê êdî Rawa te     |
| Ev are xwerû te qir dilê min   | Bazgûrî hemûyan bûm yeqa      | Min destê xwe avêti dawa te    |
| De care li halê min binêre     | [yeq                          | Bawerîya me geleq wezaye       |
| Rehm û qerme li min bidêre     | Mingazî giştîqan qir teqa teq | Piça vinê li niq me nemaye     |
| Ger quda diqim dibên evinê     | Ket qesî negote min tu qî yî? | Ev halê qirêt qo wa dirêj be   |
| Ji lewre qeseq min nahewine    | Daxwaza te çiyê? tu b'xweçiyî | Bawerî li dilê me rej be       |
| Ne Tirkiye, ne Irak û Iran     | Di behra umîde bê mefer mam   | ***                            |
| Ne Surîye, Felestin, û ne Eman | Di pûga bilêqê de li der mam  | Tu li hemûyan çêtir dizanî     |
| Hemûyan li erdê xwe qirin      | Her dem mefere dermanê        | [dînan                         |
| [der                           | Çendeqî gerim l'Xidir û Ilyas | Heya fro me neqir qêmanî       |
| Ez holê mame rebên û se ser    | Her Çendî hene kulên te yên   | Ji bo qo navê té bête gotin    |
| Pir dil diqime xwe bidme       | [xas                          | Me mal û ceger li xwe da sotin |
| [quştin                        | Mideqî wanan jî ez xapandim   | Menamûsa xwe qire berpeyan     |
| Vê qulê bi xûynê bidme şuştin  | Ji vê roja dest vala gîhandim | Mendal û gedeqîştin li rêyan   |
| Belbî vê janc li dil biderxe   | Pê nebûn qo ji bo min fekîrî  | Bi derqetin li Gûnd û Zevîyan  |
| Ah û qeseran hemû bi berxe     | Berê xwe bidin derê te mirî   | Weq Hîrça xwe dabû serê        |
| Pir geriyam min nedi kada şer  | Derdê dilê min bo te bixwînin | [çiyar                         |
| Tu lawe havan nebûne rêber     | Çend lavayîyan liser biwûnin  | Bi Jeqan mêrxas me dane qu-    |
| ez sondê dixum bi lewhimeh-    | ***                           | [ştin                          |
| [luz                           | Min hêvi tinê mabû Mihemed    | Ew welat bi xwîné da bû şûs-   |
| Ez bêtu caran nebûme me'yus    | Tim tim mefera dilê min Eh-   | [tin                           |
| Kesda min ewe bigêjim ar-      | [med                          | Egît Boqeyên bi nav û deng     |
| [manç                          | Pir dil diqir qo herim Medîne | Di me de neman ke Şêr û Le-    |
| Ji bona felata lor û qurdmanç  | Li wî şehîre veqim birinê     | [heng                          |
| Geleqî gerim di vî warê de     | Bêjim : rabe ey zanayê Gewre  | Hawêr liser me agir dibari     |
| Min tu rê nedi di vî arîde     | Dinê li me qurdan teqde ewre  | Li pêş me rawestî bû zivari    |
| ***                            | Tirq û kcem tev li me bûne    | Ji birçîna me lingê xwe dalast |
| Min mefer nedi li tû zindîyan  | [gur                          | Bi vî awayî ola te parast      |
| vêca vegeime ser mirîyan       | Guhpehn e diquje li baqur     | Gorî teme binhêre l'qeda me    |
| Kîreqe xweş da tîrba Cizerî    | Li ntroyê me Erebe neyare     | Hêjaye bixemile geda me        |
| Heya çûmê ser gornâ Herîrî     | Mirin û quştin li me dibare   | Divyabû em jî bi tzu nazbin    |
|                                |                               | Li niqte geleqî serfiraz bin-  |



# Revandin

Zerdelper e, bergehê çavan de, roj veniri  
Guleqe sor di nav av û ezmanan de miri  
Dema hevîn û ramûsanê li ji bo dilqetîyan  
Her gotin dibe şerintir ne qul dimîne ne jan

Delal diqene, stêr diqenin û sûra êvar  
Sar dibe rêwingî ye li ser rêya gund û war  
Zendên bi gurçiq himbez diqin bejnên  
[nermîn

Bayê şahiyê li ba dibe dermanê birin  
Bin silba daran de qeçiqeq diqe ax û hawar  
Çavên wê teji hestir in spehtî ye weq adar  
Rengê wê dibe zer û sor lamên wê dibin  
[germ

Çikas şerîn e rûyê wê, dilê wê çikas nerm  
Rûyê wê weq rohelata buharê; ter û tol  
Xulama xwedê ye, bi xwe ji xwey din û ol  
Li çar dora xwe mêze diqe bi tirs û guman  
Deng naye, bi tinazî stêr diqenin li ezman  
Ne reprepên hespan, ne ax, girîn, ne abeng  
Dinê sar, weq mirî hêdeng, weq hewa bê  
[reng

~ Dixwaze bin lingê wê de erd biheze, xwe  
[veqe-

Ew ji biqeve, lê de weq miriqê raqeve  
Tariya şevê de sê çar suwar xuya dibin  
Weq şehmêr û ejdehar in ji erdê radibin  
Qeçiq xwe davêje ser hespeqî; hevî diqene

Ne hevî tenê tariya şevê ji bi qen e  
Qeçiq cû, revandin, «xwelî li ser wan  
[pismanan»  
Dimirin bê deng «namirin li rêyê dot-  
[maman»

*D. Zamiran Ali Belir-Xan*

## Xurtiya Binahiyê

Bihna guri nine. Lê dibêjin binahiya  
wî zor e. Ya mehinê ji jê ne qemtir e.  
Carqê gur û mehin bi hev re şert qirî bûn,  
gelo binahiya qijani zortir e.

Guri got: Şev reş e, şûv reş e, mih  
ker e, berx liber e, min ji hev qir dere...

Mehinê got: Hev li çardeh, erdeqî  
rast, lê dani bûn elbeq mast, tê de mûqî  
sîpi, min ji hev qir nas...

Heye qo bibêjin, çawan bû qo gur û  
mehin bi darê hev qetin, ma guri drêjî  
mehinê ne qir? Ne diwêre, jê ditirse. Carqê  
kesta ciwanîya wê qirî bû, mehin pê  
hesiya, bû firihîna wê, gur tirsîya û got:

Mehin e guhmisin e

Xwalê xwe ê gur dibizdine

*Çitqêj*

## DI VÊ HEJMARÊ DE :

Rûpel 3 stûn 1 — li şûna (serdestên  
me) û (serdestên wan) (serdestên xwe)  
û (serdestên xwe) bixwinin.

|                                 |                               |                                 |
|---------------------------------|-------------------------------|---------------------------------|
| Disan ji xwe davêjim derê te    | Bilahi ev gîş li te ya ya heb | me hovan li hevî biqî qedî      |
| Hezar sondî duxum bi serê te    | Vê rûsariyê tu bûye sebeb     | Da qem ji li halê hev diyar bin |
| Heya tu li me neqî duayê        | Her gavê ez wayî der bi der   | Bi tevgera hev rebendewar bin   |
| Yezdanê Gewre nede rihayê       | [bûm                          | Bi vî awayî Osmanê nadan        |
| Her ezê li ber derê te bim seq  | Li erdê ava ezî sê ser bûm    | Derdê di dilê wî biqî derman    |
| Heya qo raqim tola Xalid beg    | Vîn ne bû pakij biqim kirêjê  | Vê carê ji qêsa turq di mexf    |
| ***                             | Ma nexweş qarîn biqin nimejê  | Dengê top û kemberan bi         |
| Ew bû Hebibê te ê dilovan       | Derdê nexweşan ava heyate     | [serxt                          |
| Key roqê li min dibûn mih-      | Her lê digirim binim li ba te | Carqê qoça wanan ji barqî       |
| [rivan                          | Tu qesî bo min neqir delîlî   | Li ber nigê me tu tar û marqî   |
| Ew qesî ji li min bori qete jêr | Vêca min hewar e bi zelîlî    | Wê hingê emê tola xwe raqin     |
| Li dest vî emelê min ê bê qêr   | Ya Reb tu bi hekê Mistefa qî  | Himê wan di hindavde bi-        |
| Li pêşberê wî geleq rusarim     | ê gilaciyê li nav me raqî     | [lavqin                         |
| ii ho qo li gunehan î barim     | Tu pêleqe xîretê bi medî      | Dê xweş bihe qêfa Dê û Bava     |
|                                 |                               | Ger vê zû biqî mala te ava      |

*Osman Sebri*

## Du Dengbêj

Di wextê qevn de kesreçe bilind û xemilandi hebû. Rewşa wê diqet ser qulilq û mîrgên deştan, hetanî avên çem û robaran.

Çarnîqarên kesrê bi bexçeyên tîrreng û tîrbihn, gul û qulilqan girti bûn.

Fw bexçe weq faceçe zivîn û zêrîn û kesr di nêv de weq rûyeqî şerîn û tirijtav dibiriki.

Ji şehderwan û kulteynan avên zelal û qet xwe hildavêtin û bilind dibûn bal ezniyanan ve, weq qesqesoran reng didan û dilop diloq mîna mirariyan diqetin ser lêva gula sor, ser pora sosina zer û ser çavê xencelisqî ê reş de.

Li wê kesrê de miroveqî zalim rûdinişt.

Ewî zalimî ew kesr ne bi xurtiya xwe girti bû.

Lê Qurdistanê ew weq mîvaneqî ezimandi bû niq xwe. Qurdîstenê got:

— Ev misilman e, brayê me ye, nav beyna me de çî ferk heye, bila kesra me a mezintir û spehitir jê re bit û emê bîndestîya wî biqin.

Ew zalim di wê kesrê de li ser texteqî bilind û zêrîn û bi ebanos û hestiyê fil xemilandi rûniştî bû, girtin û berdand destê wî de bû. Xira û ser xwe çû bû.

Her fiqra wî bîbextî, her awira wî ern, her gotina wî xirabî û bernivîsandîna wî xwîn bû.

Rûjeqê du dengbêjên suwar diçûn bal kesrê wî ve, yeq bi ceyndiq û temeriyên zer ciwan ê din bi porên-spî pîr bû. Yê pîr ji ciwan re digot:

— Qurê min, stranên me ên speht û xweş bine bira xwe, zexmî û xurtiya xwe, stranên me ên bi qên û girin û bi şahî û şîr dane serhev, dengê xwe ê zirav û melûl hêdi hêdi berde, em diçin kesra qotê de zalimê me xedarê mîletê me rûniştîye, divê em frû dilê wî ê hişq û polayî binermijînin.

Zalim bi hevalbendên xwe ve di diwanxaneyê de civa bûn.

Zalim ser textî rûniştî bû weq ewre-qî reş, teniştî wî de jîna wî Sinemxan, jîneqê qurd mîna gulê geş.

Dengbêjan dane ji derî ve, ditin diwanxaneqê bi xeml û rewş, ji zilaman teji, lê b-deng, hatin pêşberê textî seqînîn.

Çavên bi ern û qinên qomê qetin ser ruyê dengbêjan, tinê du çavên delal weq du stêran li wan qetî.

Ê p-r dest û tiliyên xwe ên spî û zirav ser telên saze ve anî, ê ciwan bi dengeqî melûl û şewitî destpê qir.

Straneqê spehtî û bêhevî bû, straneqê delal û şerîn.

Ji buhar û lievinê, ji dilqetî û dezgîranê, ji şahî û şîrê distiran; ji her tîstê qo dilî nerin, hişî bilind diqe, ji her tîstê qo can pê diqeve, divêshe an brîndar dibe û dişewite û şîng pê diqelişe.

Dengbêjê pîr bi dengeqî kebe û giran li dengê degbêjê ciwan ê zirav û melûl vedigerand.

Weq strana paşin dest bi strana welatê Qurdistanê qirin û dax û birinên wî yeq bi yeq hildan.

Stran kediya Sinemxanê ji singa xwe guleq veqir û avêt bal dengbêjan ve. Entîya zalimî kermîçî, rûyê wî tîqre çû, ji çavên wî agir dibari, da ber kira û ji denbêjan re got:

— Ji jinên min di destê min de tinê ev ma, di vî welatî de we her tîst jehr qir, niho hoi dest jin û canê min ji diqin, hiş û dilê mîlet qet destê we, xelq ji bo navê qurdî dest ji jîna xwe berdidin, xwe bi mirinê ve girêdidin!...

Zalim ji cihê xwe rabû, şûreq dani dengbêjê ciwan û di qezeb û piştî wî re derqet; xwîneqê germ û sor ser singa wî de heriqî.

Bêdenq her du dengbêj ji diwanxanê derqetin. Du hêstir ji çavên Sinemxanê rejihan û weq du mirariyan qetin li ser tiliyên wê ên zirav û nerm.

## FERHENGQO

(Nivîsanoq)

Bi du manan e. Tevayîya nivîsevanên rûj-name an qovareqê, qoma nivîsevanan. Cih an mezela nivîsevanan. Hevînd ji nivîsanoqa Hawarê ye, yanî ji qoma nivîsevanên wê ye.

(Hevol)

Ol ew tişt e go mirov pê ewle û bawer e. Ola Zerdest, Ola Mûsa. Perîcar em jê re diyanet dibêjin. Hevol: yên go ji oleqê ne.

(Destrêj)

Pirseqe qevn e. Weqê ceqên me tir û qevan bûn û di şerî de qevanqêşan qevanên xwe bi hev re diqîşandin û tirên xwe berdidan jê re destrêj dihate gotin.

(Lavelav)

Ji lavalayîye têt. Liber gerîyan. Lavayî qirin. Weqê mirov ji Xwedê lavayî diqe û daxwaza xwe jê re dibêje ji wê daxwazê re (lavelav) têtê gotin.

Dengbêjê pîr hevalê xwe ê ciwan bir û ji kesrê derqetin. Bexçeyî de rengê xortî zer bû, cendeqê wî recifî qet erdê û mir.

Wê demê dengbêjê pîr destên xwe ên bi xwîn raberî ezmanan qir û got:

— kesra bêbext, paşîya te şewat, hilweşandin û xirabî be. Ji rewş û xemla te bila sih ji ne minê, qulîlqên bexçeyên te bila êdî nebişqivin... Bûqa buharê tucar utziqî te nebit, ji bêriya bîhu û reng, xweşî û geşiyê bimire, vemire! bila navê te wiuda bibe, xirbeyê te ji memine.

Himên xirbeyê te di sînga welatê Qurdistanê a spehî û delal de weq birineqê her bimine û şerm û ezabên esaretê bîne peş çavên Qurdistanê.

Dengbêj got xwedê bihist.

Ev çend sal in herû bereq ji diwarên kesrê diqeve. Diqîn naqîn pêq ve nacebire.

*Dr. Zamîran Xî Bedir-Xan*

## Çarinên Xeyam

Ji deftera jinê navê me dê rabe  
Dawî, destê ecêlî de mirin e, çare nabe  
Meygerê çeleng xweş, xweş bîne  
Emê bibin ax, daxwaza me şerab e

Hevalên canî ji dest derqetin  
Hemî li pey ecêl re qetin  
Civata jinê de hevalşerabên me bûn  
Çend zêde vexwarin û sermest raqetin

Fela rindan ji hevalan bibe gir  
Li dawa zilûda zahîdan biqeve agir  
Ew xirkeyê sed pine û ew hîrîya heşin  
Biqeve bin peyê dilrindan û bibe pîr

Qo Şeraba te heyê toba şerabê meqe  
Tobedar hezar car jûvanî dê biqe  
Gulê çara xwe ketand, bilbil diqe hawar  
Ma li dema weq wê tobe dibe qar

Hulê gul û şerabê şerabperest dizanin  
Ne ên tengdil û tengdest dizanin  
Nebîrewer ji nezaniyên xwe bêsûc in  
Vê şîverê de xweşîyeq e, mest pê dizanin

Dilê min her ji rûyê gulî re girêda ye  
Destê min her bi piyana şerabê dada ye  
Fz ji her pişqeqê behra xwe dibim  
Berî go behra min bi hemûyan hevda ye

Hawarî nanê pehtî li destê nepehtîyan qet  
Xweşîya dinê li destê bê qêran qet  
Ew çavên spehî go bergehê dil in  
Di ser sînga xulam û nezanan da raqet

Meyger gul û çîmen bûne sor û qar  
Bal bide pişt hefteqê ev dibin ax û jar  
Vexwe şerabê û gul biçîne bihneqê de  
Gul dibe ax û çîmen dibe jengdar

Zahîd got bihuşt bi hûrtîyan ronaq e  
Fz dibêjim şîliya tîrî çaq e  
Ya berdest bibe, ji yê bê, dest biqîşne  
Dengê deholê ji dûr ve paq e

## الطير وانوتر والشعر

على الاغصان طير الرض غنت  
 بالحاء عن الاوتار اغنت  
 وناحت بالنوى والرصد والت  
 فيالله ما بالرصد اولت  
 وغنتنا بلحن الكرد حتى  
 علمنا انها لا الكرد حنت  
 ولما ايقنت انا طربنا  
 عن التفريد قد رغبت فكنت  
 فقلت لصاحب الأوتار هذا  
 اوانك فالعادل ويك خنت  
 عن الأطيوار خذ لحنك فاني  
 عهدتك عندليباً بل واحيت  
 فاصلح عوده وبدا فأبدي  
 حجازاً والصبان حيث اصبت  
 وزنگارنا وعشاقنا رخيماً  
 واتبمه نهاوندأً وبيت  
 والتي العود من يده فقلنا  
 ولم هذا قتال بداي كلت  
 فقام الشعر بالالحاء فينا  
 مقام المنشدين وما تعنت  
 وانشد قطعة انشا سداها  
 بابداع كلحمتها تحلت  
 واودع في معانيها شعوراً  
 واخلاقاً مكارها تحلت  
 ونادى قومه الأكراد هيا  
 فموا وانطوا فالناس هبت  
 الا يا ايها الكردي صبت  
 عليك مصائب عظمت وجلت  
 فلوزلت على (سنجار) مادت  
 رواسيها الشوامخ بل ودكت  
 الى العلم القويم ونيل فضل  
 به الأسلاف من قبل استظلت

كتيبان : قسه‌ی بیشینان

ما مرسنا اسماعيل مفي

در دما در کتتا في هزماري ده چند نفشتين کتیبازوین  
 گناهه کو فارامه سپاسان لنبسه فاني وی دکن وخبانوی  
 پیروز دکن . . . زیر کو دفي هزماري ده چه نه مابه ام  
 ابروژی تني چند ما مکان د گهز بنين ستونين خوه .  
 - دوستی دوستم دوسته ، دوزمنی دوزمنم دوستمه .  
 - آشي له خيالك ، آشه وان له خيالك .  
 - وك موم شوقي بو بني خوي ني به .  
 - سال به سال خوزگه‌م به پار .  
 - كه چه‌ل حكيم بو وايه ، درماني مري خوه نه كرد

الى نيل المالبي بالعوالي

الى النهج السديد فسر تبت  
 وجار الناس في علم فاني  
 رأيت السالمين به ترفت  
 الى النشأ الحديث ايت نصحي  
 وقدماً قد بثت له فانصت  
 وعاهدني وعهد الحر دين  
 عليه والنصوص بذاك نصت  
 ولكن قلنا رعيت عهود  
 بهذا العصر والجبل المشت  
 لسان الشعر قال الناس طراً  
 على سنن الطبيعة قد تمشي  
 يعلم ثم فن وارقاء  
 يجد واجتهاد حيث جدت  
 واه الخامل الكسلان عضو  
 اشل بيتره الأيام يوت  
 فسمعاً ايها الكردي سمعاً  
 يقول قد بدا كالسيف مصت  
 الى العرفان ان لم تمش قلنا  
 الا تبت يداك يداك تبت  
 اللرموي الوافي

## سرخوہ ہونا مریشکا

- زربانی من شوکت بگ رہے -

لب و ہلاقی مہ غرزا  
روکی او چو ناف دیکا  
بس خوه بدن انیشکا  
مریشک تفتہ ہونہ کوم  
لشکر تفتہ ہونہ لک  
بیری خوه دانہ جولی  
طیران دی گو ناگہان  
تفتہ فرین ژمالان  
اوزی ل ہف ہونہ کوم  
ای سر بلندی آیران  
رابہ سر خوه تو میرو  
اف لشکری بی ژمار  
بوم کئی ژ گو تہ وان  
رابو ہدھد سرفراز  
گو رابہ ای تو بازی  
باز چو جم شامہ یانی  
گو ای خونده کاری من  
بوم گو تہ بازی خون خوار  
بازی رابو وہ کی شیر  
بازی طری ب ریشی  
دستی وی گرت وھژاند  
اولان سن نیرہ لی سن  
سزمن بورده نہ ایش وار  
بازی شہدا خوه آئی  
گو ب زور وب گازن  
باز گو کیہ سر عسکر  
ازم پاشا ازم میر  
بازی چو جم دیکی دی  
نشان گو پاشا و میر  
تفر ہونہ بوژ باشی  
بازی رابو چو بانی

دیکک ہبو شہرہ زا  
ژوان رہ گو ہیدیکا  
وَرِن یژن مریشکا  
بری خوه دانہ جم بوم  
من چیلک وھن کولک  
تغلی کوچ نف ابلی  
ہانی لشکر کی گران  
بیری خوه دانہ بالان  
یکی رابو گو تہ بوم  
وی پادیشاهی طیران  
ژ بو مہ ییزہ آبرو  
گلو ہیہ ژی زہ رار  
باکن باری پہلوان  
وی چو بلز گو تہ باز  
شاہ تہ ابرو دخوازی  
دستی خوه ل سر ہف دانی  
زول من کہ بازی من  
بلز رابہ ہرہ خوار  
فرك دا خوه ہاتہ ژیر  
ہاتہ جم دیکی پیشی  
نطقک ژیرہ در ژاند  
گو ام خلکی بد لیسن  
دیک غیدی لی دا دار  
دیک ژی داری خوه دانی  
ام حق خوه دخوازن  
گو تونہ زانی ای کر  
ازم شاہ و جہان گیر  
دی گو اوزی وہ کی وی  
کسی نہ گو از وہ ژیر  
حتا گہا ئی پا شی  
ل بر دستی بوم دانی

تلور تفت لی ہونہ کوم  
اف ہاتہ ژمالا خوه  
بو گو بازی دلاور  
گو تفت آغا وہ میرن  
بوم ہیدی رابو سرخوہ  
گو ب ناجا سری من  
راہن وک پہلوانان  
ہاتن طیرین دو براک  
گو ہون وہ رن بنیرن  
دیکان خوه دان انیشکا  
گو فرمانا مہ را بو  
ئی کو کشتن ئی کومان  
وان ژی وہ کی مہ کردان  
علوک و تو تک و قاز  
ہمی کتن کوخی رہش

قال یا ایہا القوم  
دثین استقلاللا خوه  
گلو کیہ سر عسکر  
بی وہ زیر ومدیرن  
ناجاخوہ داسری خوه  
کس نینہ ہمیری من  
دا ام ہرن سرفانان  
بان کونہ کورند وقراک  
کا ام ابرو چہ میرن  
بو قبر قبری مریشکا  
کوما وان ژہف بلا بو  
ہاتن گوندا بی گومان  
دستی خوه ژیر خوه بردان  
تفتہ ہونہ بہ لہن گاز  
چیرو کا مہ ژو رہ خوہش

بگر غوبی

دیلہ

ژدوچہشان دبارن تیر  
مسلمان بلی ہی پیر  
ژ بو چہین تہ آژ پروان  
دحیلاندہ تو ئی رھوان  
توبس یسکان بکہ چین چین  
ژحظ وقوسہ بین برہین  
ژہرمو کین تہ فی بک دنگ  
شفق دابہ جہا خرچنگ  
تہ آور دا بریندارم  
شف دوزی بہاوارم  
بخوازہ دیلہرا من تو  
حی شیرت ہیٹی تو  
ورہ زلفان بدہ بابی  
دنیرم بژن و بالابی  
بیہ شیوان لبر تائی  
تورنگین کہ بیزرائی

دنیای کوم ہسیر  
ژ بو ژینی دثین شیر  
ژ بوخمت دچم کروان  
بدست وی کتم داوان  
ژناف عالم توئی زیرین  
دینم ہر کہسہ اودین  
دیژن دیلہرا سرہنگ  
ژئی کونی ہلائی رنگ  
ژبی چاری کریدارم  
از بی نسان وآدارم  
دجہاندہ سرا نسر تو  
ژدوژی پر خویاتر تو  
ژناف عالم ہلین تابی  
بسہ قربان ورہ رابی  
توروزی نقشکی بائی  
بکز بوٹی دوی گائی  
مصطفی احمد بوٹی

مهاباد و اولاد دیا هاواری

دادی ! دادی هاواری  
گلکی از کیفخوش بوم  
فیگاف حالی من قنجه  
اف حال و سان بینه  
فرهنگا من پر دبه  
جه مدد ل فرکاک دبه  
آپی (هرچو) دیژه :  
هاواری پس نه هشت  
او میرین گلمی گویان ،  
دخون ب عقلمندی  
دگل ثی تونه بونی  
سپاسات پیشکیش دکم  
ککی (بوز) لسردکه :  
ام ، گش کردن اخویناترک  
آزیسه سرفکرا خوه ،  
بهسا من پر فره بو :

قدری جان

برخکی هاواری

هاوار هاوار دلالی تو رهینا چافانی  
نو خوری یا ملتی ریزانی م ریزی  
برخکی ته هات گها خوش مقام و پریها  
برخکی پر دلال خوه شجفات و خوه شفال  
کتبه ناف برازان عشیر که ناقگران  
خوه شجفاتن یشورن درشران ده مشهورن  
عشیر که سنگ ب پرچ بر خزی دکن دین هرچ  
او (بوز) ن پر دلان هفالان ره هفالن  
بلی (باز میش کر) هیه لی نه اف سوج بی مه به  
افه سوچی مزانات کوا ف حسن زودا نه دان  
بساطری ته هاواری بهر که رواری

میش اسماعیل

[سگان دین دویر و چاره چارریز دگرن . بری خورشید  
آغامری خوه دایه شفه ری . بری لوند آغا آل بی روهلاتی]  
لوند آغا - هفالنون ! ماگر که از ناف دروه بدم . هون همی  
میرین شردیقی و کاری خوه بیر بری نه . تنی ژا پرو پیدا  
شری مه ژشرین بوری گراثر و دژوارتر بین . ژلورا  
دقیق هون ژی ژبری خورتر و زختر بین . دلین فه دده  
گرچیکین وه چار . هفالنون ! بلا چافین مه هرگاف ل  
پیشی بی بین ، و کی ام پیشفه دچن ددن پی صرنی و گافا  
کوام خوه ددن باش صرن دکفه پی مه  
لی هرو کی رحمتی گوتیه ، هرچند ژمه ثبت دقتی ام جانین  
خوه پیاریزین و زوزو خوه مدن کشتن ، دا کو دژمنین خوه  
بی دژمن مهیلن . پیشفه زارونو پیشفه ، خوه دی ب مره به  
[سگان نفدا مارشا ژیرین دخوین و بری دکشن]

مارشا سگانان

ام برانه نفده کورن انی بلند سرافراز  
جهین مه نه شمار ، زفار ام ایلونه طبری باز  
ولاتی مه دی یامه به ام تف ژیره گوری نه  
هشیار بونه هرچی کورن دمین تاری بوری نه  
داخو ازامه حقی مه به دوزامه به سرخوه بون  
ام دخوازن سر خوه بین دمین دلی ته مان چون  
مه صند خواری سر بخنی خوه برومت و بخنجر  
ولاتی مه آزا بت ام بین ژی کدریکر  
مرن ، مرن ، مرن هبت فی ژینی ره بی سری  
تیدی به ، دلی به شومه کورده هیری  
خلوب لیدخن ، تفنگ تعین دنکه ، جنگه تو ! تو !  
شره ، شره ، شره لاونو شره تفه ، رقه لولا لولا .  
درشری ده وکی شیرن کس نایه . پاش . . . پاش  
پیشفه دچن خورنن مه تف یک دومی چار مارش مارش  
قیاد - ( دکفه دباری . خوه دگینه پاشی با سگمانین  
لوند آغا . تفنگ بی ملی وی ، دورینتا سرور بکی یستو  
بی وی فه به . دستوی ده کراس ) افه کراسی وی ئی بخوین  
[ پرده دایب ]

تشت دېننه - لي چاښين مه ژ توتشتي نه ترسيانه و دبر هر دشواري بي ده دلين مه خور ترو زخمتر بونه . ام نفدامالك يون - ژن ومير زارو زېچ نائف هف دامن - هر كسي كاري خوږه ، وظيفا خوږه كړه . نو كسي نه هښتبه كو لوما ژي پت دميراني فدا كاري بي ده هون ژهف در كتنه . روژن هبون ام يرچي دمان . شفن هبون ام ژمر مابي دقفلين - لي گلي و گازندنه دهات بيرامه . نه دهات بيرا تو كسي . هر كسي ژبونا ولات و ملتي خوږ هر زحمت دكشاند و پي شادبو . ژير كو هر كس بويه وري كارو خيانا خوږه يو .

كوردونون ! ام ابرو مالاخوه بگېزبنين . امي مالاخوه آ چارسالين بردن ، ژي در كفن . لي دفي گېاستي ده امي بين دوو - خلكي چكهلگر دربايي كړي دن بين ، بين نه چكهلگر خوږ بدن دشنا عجمستاني ، نائف كړدين عجمي . كو خوږه دي حز كر پېشده تر امي ديسان هفتو بينين . دفي نافي ده هرچي كو ژمه مر نه دين همي آفاهيا سرخوه بونامه . هرچي كو دمين ستون و ديوارين وي . آفاهيا بي هم نكاره بسكنه ، هم پتني پسر اردي ناكفه

[ خلك خوږه كه رد كن و هفتو دنه پرن . خورشيداغا پيان دژيوه . بژيشك پير بنداران مژول ده ]

پربندارك - ماچره ؟ از بېر چكهلگران ره ناچم ، يو پنامن سفكه

يكي دن - هكه خوږين ژمن دچه از هرم كودري ژي بريفه برم

لوند آغا - زارونو ! وختي مه هند كه ، دف ژ كرت و پستان بردن . پياپين كو دقوت بينه هلگر تن ژمه ره نه گر كن . دريژمكن ، دقوت هر كس قباخوه بقدر اخوه بينت قشم و منيژه - ( ژلوند آغاره ) ما آغا مژي نه چكهلگران . ته بېر چاښين خوږه ديت ، مه چادان شر دكر

فوند آغا - ( كچكان ممبيز دكه ) بلي خبرا وويه ، من بېر چاښين خوږه ديت ، هون چكهلگر وسگاتنن رندف . لي خورتن هنه بي نشكن . امي نشكن و ه بدن وان

كچك - ما ام نه خورتن . تومه پيرد حسيني . توژ كو

زاني كو ام هنگ خورتين ته نه ميرن . كاكې نه ، وان شاني مه بده

لوند آغا - چاښين من ، جاني من ، لي نيده يه [ كچك فدا گرگ نك دستگرتي بين خوږه ، خاطر دخوازن و دكفن نائف نه چكهلگران ]

هفتد - ( ژ دستي خورشيداغا درفه خوږل پيشيا لوند آغا داوچكېنه ) آغا ، از دم ژتره دو پرسان بكم

لوند آغا - توهيژ نكاراي نشنگي هلگري ، هين نه ، ده سالي بي

هفتد - هون ژي عجيبين لو ! از ژوه ره جاني خوږه پيشكش دكم . هون ژمن سالين من دپرسن . ماهون هانته هره تني ژبونا كشتي ، هكه ولي يه رابه من ژي بگژوه . نه مه گر وه مرن ژي دابه چاښي خوږه هنگي از بگيري كشتي

ميم ژي ما بگيري مرن ژي نام . دما كو تو بيري از دكف شوناته دمرم و ته دهيل ژبونا كو تو بگزي وولي بگيري وه تيم . ته سمح كو آغا او !

بژيشك - ژخوه او برو دستي بي منه

هفتد - ( درفه نك بژيشكي ) آبر از خلاص دستي ته مه ، من مهيله ، اف لوند آغا ظالمكه ، دخوازه من پشینه دشتي

بژيشك - مترسه ، تو ئي پير نه بې ئي

[ كارواني نه چكهلگران پري دكفه ، خلك ژهفتو خاطر دخوازن . قشم كتنه بن چنگي منيژي . ]

قشم - ( ژ منيژي ره ) خوږه زي ام كچ نه بو آنا

منيژه - ما هنگي ام افچند يشان فه گر بدابي دپون

ژنك - هون كچ نه بو آنا ، ام ژن نه بو آنا كي اف جاميرين ها دآين

قشم - بين كو آينه

ژنك - بين كو آين آن مر نه آن نما دتدين ، دقوت صبه هون ژي ژبونا دوصي بينين

منيژه - يادي دق ژمه بروه

[ پاشيا كارواني ژدياري كندا ده ]

لوند آغا - نيدي دمه ، دقوت ام ژي پري كفن بژيشك - نه ژخوه

خوه کوفی و گلی بین وان دعدلانندن از ژي کتم همبیزا  
چپرین دژمنان واث دانه هف

[ خلك نندا دکن ]

قشم - هفتدی همبیزد که ورا دیمسه توجی خورتکی دلالی  
هفتد - کچی اولی میژوه گریگین آغا دی بدخسه  
[ خلك دیسان دکن ]

پیره ژن - خوه دی ته بپهله ، کړو دژنی حالی ده ته  
ام کندانن

هفتد - دحالی مه ده چه هیه ، مه دژمن کفاند ، گه پجن  
رفاند ، بو کین خوه جفاند . ژ خوه تالانی یانثی ایلی داوته .  
ازی هرم ل بریشکی خوه بگرم . ( خوه دده شقهری )  
قشم - چه لاو ککچی دلال ویدله

منیژه - خوه دی دی بپهله ( ژ قشعی ره ) برینا گریگین  
چاوانه

قشم - ژ حالی وی خور یانه ، تونایینی حالی وی نه تو حاله  
گریگین - گه مده خوه هی ، ماتونزانی قشعه ، ژ خوه ره  
دیژه . تو نشتی من یننه ، نهو دکارم لهنکی هلگرم  
منیژه - خبرا قشعی به ، تونی چاوان بکاری نشکی  
هلگری ، تونکاری خوه هلگری

قشم - تو نزانی چه خونین ژته چوبه  
[ ژ شقهری ری پیژنا لنگان ودنگی میران تپته بهیستن -

لوند آغا وهقالین وی ]

جفانوک - ۱۷

نبن بری ، لوند آغا ، خورشید آغا ، بریشک ، هفتدو بیابین  
دن و پیشده تر فباد

لوند آغا - ( ل خلکی دنهیره وژ هقالین خوره ) مه تو وخت  
نینه کو ام وندا بکن . دثیت ناقل دست ب خباتا خوه بکن

خورشید آغا - بلی ، همانهو  
بریشک - دی روین ، ام باخینن

[ خوه ژی خلکی فدقینن وددن فجنککی ]

لوند آغا - ژ خوه رحمتی ری یامه شانی مه دابو  
خورشید آغا - ماژو پیغه ری هیه

بریشک - هنگی از و خورشید بکفن ناغ بیان . خلکی

چکهلگر ژنی نه چکهلگر قشینن وکاروانی نه چکهلگران  
پری خن

لوند آغا - ژخوه ائه ، توشیور و میشورا دن یننه  
خورشید آغا - تنی ، دثیت قدری ده بازده بیسان ژی

بشینن بر ب انیا شمر ، آر بکاریا فلیت بکن  
لوند آغا - نه ژخوه

خورشید آغا - ب بیان ره تونی کی بشینی  
لوند آغا - بلا گریگین یوان ره هره

بریشک - گریگین بو بنداره ، بلا او بته ره بی  
لوند آغا - هنگی فله میز ، هر دوزی هیژانه ، یلک ژی

نیدن چپیره  
منیژه - آخ

لوند آغا - ( غلوه دژفروه ) افه چه دنکه ؟  
فله میز - نه توتشته ازینی ، دنگی بو بندارکی ( ژ منیژی ره )

دین به  
منیژه - دنگی برینکی

فله میز - ( دثی منیژی دگره ) کچی ، دین به  
خورشید آغا - توزانی ، لی بن از بچوا ما چپتر دبو . تو

ل بیش از ل پاش . تو سگائین مه بگیتی کیری دث  
از ژی هرم پیشیا دژمن ب فلیت راحتا صبه ایفاری پیشیا

دژمن بگرم و پاشی دگل بیان بم خوه بگینم وه  
[ بریشک ولوند آغا ل هفتدو دنهیرن ]

لوند آغا - ( ژ خورشید ره ) ککو تو گلک و سبایی .  
دهر در آئی تنگ ده تو . لی هککه ته دل هیه

خورشید آغا - دلپون ژی هیه . ژبونا سلامتیا نقابی یی  
دثیت از هرم

بریشک - پزی نیر ژبو کیرابه  
منیژه - ( ژ فله میز ره ) ته دیت ژته میر تر هنه

فله میز - ( یمرن ) ژمن مز تر هنه  
خورشید آغا - نیدی دثیت ام دست بکاری خوه بکن

لوند آغا - ( ژ خلکی ره ) ژنون ا . میرنون ا اف بو نه  
چار سال ام نندا دقان جیایان ده ژبونا آزاهی و سر خوه بو نا

ولاتی خوه دخبنن . درناف فان چار سالان ده مه گلک



پيره ژن - كو دنكي تفنگان دورد كت  
 يو بندار - كو دنكي تفنگان دورد كت ، زى دخو به كو  
 دژمنان باز ددن و پين مه دردن پي . . .

كالو - خبراوى به خوه هي . نهو تو زاني چه كفه . دژمن  
 هره شه ، پين مه د كفن پي . جارن هه بـ سري بان بـ  
 سينكي هف دقبن . هنگي تفنگ و ك چونه . تقي زيقزقا  
 شلقا خنجرا نه . ( بدنكي نرم ديهورينه : )

لى خنجري لى خنجري  
 ققدرشى كالا نوري

از لته گريام دلالي اچاقرشى دلالي ، تو كني ، انيزيري كاني  
 ژنا كالو - مامن نه گوتبو تو خورفي بي ، مادماير دولايي بي به  
 كالو - پتي تو كهر به ، تو ژكو بزاني ، بلي بردولايي  
 ماز بيچيني ، ماتو ژكو بزاني وكي دنكي طوب و تفنگان  
 ديهيسم چاوان دلى من هلدا قيژه . هري مرن هيوآ كال يون  
 نه بوآ . خوه زى ! خوه زى ! لوان وختان ، لوان زمانان .  
 حتا كو ام نه دگهان سينگين هف مه تفنگ برنه ددا هفت .  
 نه ژباش تالده و ناف چيران . هرشت كردمانجي بو .  
 ژخوه عسكري رهش بـ كجار به نكار بو . ژ هفت باقي  
 وان زنده بو كو هلكشن چيان و بكفن وارين مه . كومه  
 خوه دگهان كوتارا چي اوان روپين خوه باددان . ژمه  
 قدبون ، حتا سالادن ، حتا هنگي كو ام د كبن دشتي  
 [ دنكي تفنگان بـ كجار دورد كفه ]

جفانوك - ۱۶

نين پري ، قشم ، منيژه ، گرگين ، فله ميزو پيشده ترهفتند  
 [ نهده ژشفه ري درد كفن . منيژه برينداره ، فله ميز  
 او هلكرتيه . گرگين ژي برينداره ، قشم كتيه بن  
 چنگي وي . برينين وان نه خدارن ]

كالو - آغانو خيره  
 گرگين - خيره آيو  
 پيره ژن - مالامني ، كچك ژي برينداره ، من دگوت  
 مچه ، لي گه نه داسن  
 بريندار - مامن نه گوتبو دژمن شكيا به  
 فله ميز - بلي شكيا به

گرگين - شكيا و كشيا روبروي دن ، پين مه دانه پي ،  
 حتا كو وي بين بازون هندا نوالادن

فله ميز - دژمن گلگ نيشيا ، دنوالي ده بكاره خوه بياريزم .  
 زى ، حتا كو خوه بعدلينه ژيره چند روژ دفتين  
 كالو - ژپين مه پرهاتنه كشتن  
 گرگين - كشتي پين دژمنان بـ تيرن  
 كالو - ژپران پر ژهند كان هندك

بريندار - پيسام ، گلو نيتا مزنين مه چه به ؟ ماژمه ره .  
 ژي تفديرك نابه دبـن . از بـكتام پشتي كفتري من دكار يو  
 تفديكي بشوليسم . لي چاوان خوه ؛ گهيسم حتاوي ده ري  
 فله ميز - ( بي حمني خوه ) كو خوه دي حزر كر ، اوژي  
 دبت ( ژي منيژه ره ) چاوان گلگ دنپيشي  
 منيژه - ما از كذگي ددستي نهو دهلماچاني ته ده دپيشم ،  
 تقي دترسم . . .

فله ميز - ژچي دترسي ؟  
 منيژه - نه ژ توشتي ، كو از بيژم ، مه به كو بچيدي  
 فله ميز - ناخيدم ، كايزه چه به ؟  
 منيژه - ماتو زاني ، بلي دترسم كرتومن ديسان يودي ،  
 ام ديسان ژهفت قفتن . ماچره ژمن قفتي ، ته نه دبت رخ  
 ته ده من ژي شرد كو . ته بـچوه دگوت ، بر كين من قت  
 شاش نه ديون ، دگهان آريمانجي ، نبيدي ام ژهفت قفتن نه ؟  
 فله ميز - نزام كچي ! كارزانه ، درب زانه . از چه  
 بيژم ، دنيا شره ، شر هروب آواكي به

هفتند - ( يدانگ وقير ژشفه ري درد كفه بدستي وي ره .  
 چند بوميه هنه ) باش ايفار آغانو ! هون چاوانن ، راحتن ،  
 نبيدي مترسن ، دژمن گلگي دورد كت . پشتاوي شكيا ،  
 زوزو نكاره فگره ( بومبان شاني وان دده ) اف سيهين هازي .  
 ژوه ره رپكر نه

[ خلك د كتن ]

گرگين - ته اف ژكو بچيدا كونه  
 هفتند - ككو هكه ناخيدي ازي بيژم ته  
 گرگين - قت ناخيدم ، هما بيژه  
 هفتند - وكي دژمن بازدا وهون كتن باشلا دستگرتي بين

لی بی بی ا ربی ا دو تاما خوہ لیسر  
 لی بگری ا لی بگری ، دلالی ا توری  
 وای لین ، وای لین پور کروی آخ ازی  
 [ دیار پیلکی فالاد مینہ . زانی باشردنگی طوب  
 ومترالیوزان تبت . هیدی هیدی دنگ نزننگ دین .  
 فاصدک ژشقری ده تی ود کفه دیاری لهورا خوہ  
 دنهیره کسی نابینه پیشفه دجه . دنگی تشنگان هیژ  
 نیز نگتر وخوردتو دبه ]

جفانوک - ۱۳

لوند آغا ، بڑیشک ، فاصدک ، هئند ، قشم ، منیژه  
 وپیاپین دن فدگرگن  
 لوند آغا - ( زقاصدره ) ته دگوت جه ل بین مه تنگ  
 بو به . دژمن کتیه نوالی ود کشینه پختافی  
 [ دنگ و پیژن هیژ نیز نگتر دین . چند برك لپختافی  
 د کفن . سگاتک بر بندار دبه ود کفه بڑیشک لی دتوه ،  
 یکلی دیتو ژهی . . . . ]

لوند آغا - هر چند ای فی کروی فالاد بکن لی نهونکارن .  
 مه هیژ کارو باری خوہ نه کر به . ژو پیشفه دفی حالی دهم  
 چاوان پشناخوه بدن دژمنان ودرباسی کروی دن بین . ژلورا  
 دفت ام بب نیریشه کی دژمنان ژر چیران هلکن وپاقرن  
 روبری دن . دی خورتو ! زارونو ! هرچی کو زیوائی  
 وی تنکه بلا لپاشی بی بیبت ، نیریش زارونو نیریش . . .  
 [ تفداخوه دژن شفه ری . لوند آغا د کفه پیشی بی .  
 پیادبزن دکن کو ژهفت در کفن . بریندار گهانه  
 جانکشی بی ا ]  
 بڑیشک - ( لهورا خوہ لکچکان دنهیره . رادهیره  
 تشنگا کشتیکی ) از کو دژانم برینان درمن بکم دفت بژانم  
 برینان ژی فکم ( دوده شفه ری )

جفانوک - ۱۴

قشم ، منیژه ، پیشده ترخلکی تفل هفت  
 قشم - دژمن دیسان خار بو به  
 منیژه - عمری صه بی حار نه درپژه  
 [ دنگی تشنگان لسهرف تبت . گوله د کفن دوری ،

گره گرا بالافران ژی د کفن نافی . قیرین ، آخ  
 ونالین . ژا لی بی روزا قابی خلککی تفل هفت : ژن وزاروه  
 کال و کوکم ، چند بر بندار د کفن دیاری . هن لسر  
 لنگان . هن ژی بب ز کیشی خوہ دگین هفالین خوہ .  
 ژنوالی فہ دنگ تین . گه نیز بنگ دین ، گه دور .  
 بالافرتین ، دچن ، بومیان دافیزن . گرتنهک . . .  
 بالافرتک بر ب ژر دبه ود کفه نوالی . . . ]

منیژه - مام چره سکینه . بر بندار نه مانه کوم لوان  
 عقاته بین . پرافی بب برینین خوہ کتیه . تین مایی بی مه  
 ژی دکارن . آن اوی صاغ بین آن خوہ ؛ گین هفالین خوہ .  
 نیدی جهی مژی چیره ، افی باشره ( رادهیره تشنگاسکافی  
 مری وده شفه ری )

قشم - ما اژته کنکی بب تی دهیل ( دده بی دی )  
 پیره ژنک - کچی ا کچون ! کوفه ؟ کوفه ؟ خوہلی  
 لری وه مبت . مالاپی . . .

جفانوک - ۱۵

تین بری ژ دو کچکان پیشه  
 کالهک - ( ژ پیره ژنی ره ) توژی دنگی خوہ پیره  
 پیره ژن - ژخوه من تشکنه نه گوت . افه من دنگی خوہ  
 ژی بری  
 کالو - خوہ دی او ! تو برهماخوه یکه . لبرفی حالی  
 چاوان هداراته تبت . هکه ته مروین دیندار دفتین ، آمن .  
 هکه ته میرین قنج ، خدان بخت ورومت دفتین دیسان آمن  
 بیره ژن - ( بدننگی ترم ) خبراته به برا . لی کسی یشولی  
 خوہ دی تزانه

کالو - ( اوزی بدننگی ترم ) بلی خوہ می ولی به . لی  
 اف شول پیداری چافانه  
 [ دنگی تشنگان هنکی دورد کفه ]

بر بندارک - هی ، از قربانا دست ولپین وه بم . بین مه  
 پیشفه دچن . دژمن پشنا خوداوان  
 پیره ژن - ما تو ژکوزانی خورتو ؟ تو ژی وک مه لهری ،  
 تو کسی نابینی . آن ناف دمه ددی  
 بر بندار - یادی ، ماتونابهسی کودنگی تشنگان دورد کفه

دژمن شيكياو خوه داپاش . سگانين مه خوه گهاندنه چپرین مه .  
 فيجا دژمنان ديسان بری خوه دان شکفتی . لی شکفت  
 نیدی لوان راندبو . هانن وکتن نی . شکفت وهژده  
 چندک کتته دستی وان  
 سرور بگ - د نوالی ده

لوند آغا - دژمنان عسکری خوه بشوندا کشاندن . نوال  
 وکه بری به . تودنگ و بیژن ژي نایی . سه مری پین مه  
 و قدری صد چند کین دژمنان لی مقاته نه . دگری شیران  
 ده ژبر کو توستینگین سگانین مه نه مانه ، دژمن گوله و  
 بر کین خوه دافیزه روی آخ و کفران . مه مری کانی بی  
 ژدستی دژمنان درنجستبو . فی پاشی ديسان ژمه زمت  
 کر نه . لی مه او چند چند کین وان خستنه نافی کو دئی  
 کانی بی ری رقیه واقف صور دهر که ...

سرور بگ - دهر دزی ده میرانی ، دهر دزی ده کردانی .  
 لی دژمن سر دست ، ام قلس و پیکس ، ژلورا دهر دزی  
 ده بندست . بلی میرانی قنجه ، دهر تشق ، نمازه دشری ده  
 میرانی شرطی پیشینه . بلی میرانی گیانه . لی ژبونا کو  
 گیان بلقه ، تف بگره ژیره دست و لنگ و ژوان دستان ره  
 شور ورم دفتین . نه بیان نه چک . چار مه دئی کری  
 ده دور گرتی ، هرو پیا چک کیم دین . لشانوان توانایی .  
 آقا کو مری خوه نه دایه کانیکی ، روژکی دی بیچکه .  
 ( دنگی وی دگهیره ، یفین وهشکی ) آغانو ! قراراده چه به ؟  
 نیدی دمه ، دثیت هون قرار که خوه بدن

لوند آغا - بگ ، اصل توئی . هکه قرار دثیت ، ديسان  
 توزانی . ته چاوان امر کو امی ولی بکن . ما کنگی مه بی  
 امر پیا ته کو

سرور بگ - لی هیه کو ازنه مام  
 [ همیان خوه کهر دکن ، دنگ ژتوکسی نایی . بژیشک  
 دکفه نیزنگی سرور بگی ، زنداوی دبه دستی خوه .  
 بژیشک بی ماده ]

لوند آغا - بلی بگ توچی امر دکی ؟  
 سرور بگ - بی من ، دثیت هون خلکی چکهلگر ژبی  
 نه چکهلگر فقتن . زادوز بیج بری خن بلا بکنن دشتا

عجمستانی هرن ناف کردین اردلانی . نین چکهلگر ژئی  
 کری درباسی کری دن بین و حتا پاشی بی  
 لی بین . خوه گران بفروشن . بلی خوه رند بپسارین  
 زوزو خوه مدن کشتن . ژهر گاشی بیتر میری . میر کژ  
 بین ونه خوه کژ . دا کو دژمنی خوه بی دژمن مهیلن و د اردی  
 کردستانی ده آگری سرخوه رابونی مدن نمراندن ( دنگی  
 وی تیته برین ، نمادلفه )

بژیشک - ( خوه دگهنه وی ، مری خوه دکه سینگای ،  
 چافین وی هسترد کن ) چو ، هری سروری مه چو ،  
 ستونا مه آبلند وخورت هلویشا

[ قباد وهفند خوه داقیزن لنگین وی ، کچک دگرین ،  
 چافین خلکی هسترد کن . پیلکی دئی حالی ده دمین ]  
 لوند آغا - هثالو ! سروری مه چو . هروکی بژیشکی مه  
 گوتیه بایه کی نه بخیر ستونا مه آبلند . وخورت هلوه شانده ،  
 کردنی مه دسر سری مه ره خست ، لی دثیت ام کرنی خوه  
 را کن ، قدن وشوپا سروری خوه وندامکین

برانوا نه ژمن نه ژئی ژکسی دن تیت ، هروکی دثیت پسنی  
 سرور بگی بدت و لبر بکفت . هکه ام دخوازان گسانی  
 وی شابکن دثیت ام بختن ووصیتاوی بینن چه . دژیناوی  
 ده ام ب امری وی هه دچوت ، پاش مرناوی دثیت ام  
 یوصیتاوی فه هرن . ( آلی ژ شکیری دبه و ب سرور بگی  
 داد که ) بگو ! دژینا خوده ته او هلد گرت ، دمرنا ته ده  
 دثیت او ته هلگرت

[ لوند آغا ، بژیشک ، قباد و پیا بین دن دارو بستی هلینن ،  
 دایتین سر پی بین خوه ، هیدی هیدی دچن ، خلک و  
 دن پی وان - قشم دافیزه سر : ]

وای لین ، وای لین ، پور کری آخ ازی  
 سرورو ! سرورو ! سروری قومکی  
 شهیدی ، بلندی ، شهیدی بهشتی  
 لته خست نه بیچاف برکی کورکی  
 سروری ، گرامی آخ یله وای ازی  
 بختیشی دایکی ! دو نلمی پور کوی  
 رشا خوه گر بدن ، سرور چو گورنی

— گانی پیشین — رهنیا چافین کردستانی بو  
 سگانی دووم — نه میری گورنستانی بو  
 — گانی پیشین — ژبونا نامیرانی بی ، ژبونا قوماندنی ژدی یا  
 خوه بو بو

[ دوی دمی ده پیابک دکفه دیاری ، اب دستی خوه  
 ره دور بین وشدربا سروربگی دگره ، خوه دکهینه  
 دارو بستق وسراژنواپین خوه دسکنه ]  
 جفانوک — ۱۱

تین بری ، قباد پاشی هفتد  
 قباد — (ب دننگی بگورین) آخ از بی ، از گوری من  
 دگوت خوه او چند مده پیش . ما م صهین ته نزام ژبوجی  
 یون . ته کری بی خوه چاوان بی سری هشت . از گوری  
 من دگوت از گوری باسری ته بیه ته از کرم کیلا گورناخوه .  
 بگو ! بگو ! بگی زراف مرن ژبوته هیژ گلک زوبه . دنیا  
 دن راحتی به . تونه میری راحتی بی . تومیری شرو قوما  
 ندنی بی . اف چیا ، گر و گاز تتی یدنگ و ناقیدانا ته  
 شین وسرخوه ته بی ته چیانزم ، روبرار ژووا ، ازمان بی روز  
 وناقه . تو ب مرنا خوه گلک تشنان ژمه دی کو ابرو  
 ژهردمی یتر ژمه ره گر کن . توقبا خوه بی مرنی دینی  
 لی ام نایین . تونه بی خوه بی ، تویی مه بی . مروفین وک  
 ته نه قصرن ، کاروانسراین . حق روشننا هر کسی لی هیه .  
 بگو ! بگو ! ته هرشت ، دی ویاث ، زارو زیچ ژبونا  
 ولاتی خوه هشتن . نهو ولاتی خوه ژبوناچی وکی دهیلی ؟  
 مانابه بیراته وکی ام بری دکن ، دو تقاما ته ژتره چه دگوت .  
 درخوست بیه ره وره . ته نه دهشت . ژته ره دگوت :  
 « تو من ژبونا ولاتی خوه دهیلی ودچی ، ما از ته ژبونا کی  
 بیلم وهرم کر ؟ ولاتی من ژی تویی ، برده از ژی هرم  
 ولاتی خوه ، از ژی بر ته ره بیه »  
 هفتد — ( دکفه دیاری ، لیدورا خوه دنهیره ، لبردارو بستق  
 سراژنوبان دسکنه ، هر دو دستین سروربکی ماچودکه  
 و بدننگی زیز) آخ من تزافی بو کر مروف دکاره دوجاران  
 ژی سیوی مینه  
 قباد — آخ از چه دیژم . مازاتم چه دیژم . بگو ! بگو !

بگی زراف راه ، سری خوه هلده  
 سروربگ — ( چافین خوه زیف بل دکه ، لیدورا خوه  
 دنهیره ، چافی وی لقبادی دکفه . بدننگی نرم ) قباد  
 تو لهری ؟

قباد — بلی از بی ، ژبی نهینیا خوه هیژ همه ولهرم .  
 هیژنه مرمه  
 سروربگ — مدهیره ژی . دا کو کرامی من تی بجنون بی  
 مال ، بدی دو تقا ما من ، کری من تیده بجنوه دی بکن ،  
 زو بگهین و بیخن خزمتا ملتی . ملت نکاره گلک لـ  
 هیچی بی مینه . ژیره جانندا و جانبیزارن دثین . ژدی یلوی

ره هولی بیژه  
 قباد — ما چره از بی ، خوه دی حز بکه تو بجنوه کری .  
 خوه بجنوه دی بکی و بگهینی . برین ته نه خدارن  
 [ ژدنی سروربگی خون تیت و دیسان ژ برقه دجت ]  
 قباد — خوه زی من اف نه گوتانا . خوه زی من اف  
 دم نه دیتانا ، دترم پی دلی خوه خرا کریه  
 سروربگ — ( دیسان چافین خوه فد که ول هفتدی )  
 هفتد کری من تو ژ لهری  
 هفتد — بلی از بی لهرم . امرکی ته هیه  
 سروربگ — نه کری من ، لی هروک من ژتره بری ژی  
ژر بونا ڪو بك در ين حڪمي زارى ئي دن ده ميمت من ژر هر دو وان ره منهو وا مڪري خوه نندن وڙي ل زارى وان دا ورگړاندن ، بي ڪر بك يا آدن بيينه .

**دومليا سيور ڪي**

روڙي روزان ڊ ڊوين ڊ هاوار دا ڪوت . شاري دو پير و رماني . دوي ميان ڊ ڪرگين و ڊس لير ڪي جا ڊ مندي . لوي ڊندو فشان اينان .

را پيدا بي . ڪرگن خبلي ترسا . لوي آي ري فا :

— آزدو نو بورا توري لير ڪان

گركڙ جري فا : حتا حوت روڙي ڊندر

افه فرقين پنگهي دائيرا هر دو نيشتان . ڊ نيشتا ملا نزيو ده مه تقى تشتن ولي گهارتن ڪو برفه رنگين خوه نين بناتي وندا ڪرپون ورنند ند ڪتن وڙي .

\*\*\*

زارين زماني ڪردى نين پنگهي سسي نه . زارى ولاتي ژورين ، بي ولاتي ژيرين و زارى ڊوملى .

هرو ڪي ناسه زارى ولاتي ژورين ڪردمانجى به و ڊ ڪردمانجى پي ده فرقين زاراوا وشيزان هبه ژى زارى ڪردمانجى پي تو ڪياني شاني بيڪتيهه زمانڪي ڊده . لي زارى ولاتي ژيرين نه ولي به . ڊناف خوه ده ل زارتن دن بلاف دبه و چه چه ر هف فذفته ما مينا بابا ڪردى و لوري . ژو پيشه ڊ وي ولاتي ده زارتن دن هه پ گلڪي ژر زارى ولاتي ژيرين دورن و ڊ ڪفن نيزنگي زارين دن .

زاري ڊوملى : اف زار زماني ڪردين ڊوملى آن زازانه . ڪردين ڊوملى ڊ ولاتي ژورين ڊ روڙ آف اي ري ولاتي ده روشني نه . پ پراني تقلي ڪردمانجيان و ژر زارى خوه پيشه پ ڪردمانجى ژى ڊزانن . لگورا ڪو من سح ڪر ڊزاري ڊوملى ده ژى چند پرهه لي در پنگهي ده اف برين ها ڊدونه . ڊ نائف قلن هر دو پيران ده ڊ ڊنگاني و قواعدى ده فرقين اشڪره تپنه دپتن .

ڊ ڊنگاني پي ده : ڊ زارى سيور ڪي ده حرفا (ژ) يقاسي ڪردمانجى پي نين بهڙي ، ڊ هن پوسان ده تپنه دپتن . لي در ڊوملى بين دن ده مينازاري پالوي ده (ژ) يڪجاريه و شوناوي (ز) بك آن (ج) بك رابوبه . ژر لورا هڪه ژر ڊوملى يان ره ژر بر ڪو لئونا (ژ) يا ڪردمانجى (ز) ڊيڙن زازا هاته گوتن ڊوملى بين پالو و مادي ژر ڊوملى . بين سيور ڪي بيتر زازانه .

ڊ زارى ڊوملى ده پوسين هر زاري ڪردى تپنه دپتن ، ڪردمانجى بابا ڪردى مورماني ه . پ . . . و في زارى ده (ف) هه به و گلڪه . دبه ژر ڪردمانجى پي بيتر ژى . لي در هن پوسان ده في (ف)

لی نه کُر نه باق نه چون سنبولی ومولود نه کت چاپی  
 و خدی ژ عثمان افندی ره حزن نه کر کو کدا خوه  
 یخوین رهش بیست - ام فی چاپی ژبونا شا کرنا  
 گیانی وی پیشکشی وی د کن .

\*\*\*

ژ هیلا دن من دزانی بو کو نیک محمد علی عونی  
 افندی<sup>(۱)</sup> ژی نفیشتکه مولودی هیه - من ژیره شانده  
 ونفیشتاوی آتی - مه هردو نفیشت دانین برهف - مه  
 دیت کو دناقبوا وان ده کیم وزیده فرقه هه .  
 بری پیشین د دستبیکا نفیشتاوی ده ده بیت هه ،  
 دیامه ده تفی سسی نه - من اف ژ ملا نذیر ره  
 خوهندن - اوی گوت « بین بیتین زیده پاشی هاتنه  
 یسرخستن ، هر حال بکی ژ برخوه گوتنه »  
 دتی باینده از تشکی نایبزم - لی هرو کچی خوندفان  
 بخوهدی ببین د وژناوان بیتان ده خواری و گیانی زیده نه -  
 عثمان افندی بخوه نکار بو بیتن بی وزن آن خواری وژن  
 بنفیسنه - ژیره مولوداوی گواکه .

د گل فی هندی ام وان بیتان بی کوتو نشی وان  
 بگهیرین ، راست یراست د گهیرین هره :

بنامی واهیری نو آرد و آرمین  
 که مادست کرد ب نو گروه رنگین  
 شما حمدی خوه اللابیری بیارن  
 شو وروژ فاهی د ای د بقارن  
 پیغمبری ری صلواتی بوان  
 یم وتم دردی جی قر د بنالن  
 مثالی نادنی زانی ت مردم

(۱) محمد علی عونی افندی ژ خوه ندابین گردان  
 نین ولا تباریز و ملیتپورده - بخوهدی خلیسکی سیورکی به -  
 لصری د ازهری ده خوه ندیه - اف - ده سالن د دیوانا  
 قرانی مصری ده مترجمه - ل شرفناما کو فی پاشی بی  
 لصری هاته چاپکرن پیشگو تنسکه هیژا نقیساندیه -

ت جتیرینی گروهی توژی نوخم  
 که توزانانکی نو دنیا سنینو  
 بزان آذنی جایی جو نیو  
 و دارو ای چه کی جتیر بکارو  
 کی جتیر چی کارت ای و دارو  
 بسو توبه بیارن هی غدارین  
 دنیای د توحی هول بکارن  
 گاهد خوری آری بن بنالن  
 برژن حرسی چانرا بکلن  
 ببو غفیو گوناھی مایی فیردو  
 گوناھکاری کی عمری خو د گردو  
 صلواتی بوانن رند و بولی  
 بره سنن پید ما گان د رسولی

ژو پیغه د منهوری (منن) ده ، د گلک جهان ده  
 ناقبرا نفیشتامه و یا محمد علی افندی فرقهین دن ژ هیون .  
 مه اوفرک برپیل و د بین ره ویکو بیکو نشان کرنه .  
 لی فرقهین مینا پیش و پاشیونا پرس و حرفان و  
 گهیرینا جیوکان نه هیژایی نیشانکرنی بون - هرو کی د  
 بیت و مصرا عین ژ برین ده تینه دبتن .

چاغو قربان بی د فی اللای رسا  
 وقتا قربان بی د فی اللای رسا  
 کامکی آدر را خلاص خوری واشت  
 وا بوانو فی رسولی ری صلوات  
 کامکی آدر را خوری خلاص واشت  
 وا رسولی ری بوانو الصلوات  
 کردو اینان آرد باللای بول نیاز  
 کرد اینان و آرد باللای نیاز

او و عثمان افندی بهفت نه خوهمش بون . هچکو بربری بهفت د کرن . باش بلاقبونا مولودا هجی یوسف میلدارین وی دگوتن : « ملاقی وزانانی هولی ده . نه یب گالگالان... » آف گرتو پست ب گهی عثمان افندی فه زی د کرن . نه گرکه آم بیژن کو هر دو ملاژی کُرد و کُرد زمان بون .

وکی عثمان افندی آف بهیستن ژ ناسین خوه ره گوت : « هک زانانی ب نقیساند نامولودی بی از مولود کی ب زمانکی ولی بهنسیتم کو بی هیز تو کتیب نه هاتیه نقیساند ، نه ب ترکی ، نه ب کُردمانجی لی ب دولی ... »

تویی فی آوایی و ژ وی بربری اف مولوداها هاته پی . نک دلی من آف جارا پیشینه کو ژ بربرها دو کُردان تشکی قنج بر پی بو یه . عثمان افندی بار لیسورکی چو به رحمی . رحمتا خدی لی بیت .

دیشان لگورا گوتتا ملا نذیر عثمان افندی مولودا خوه ب پینج سالان بربرها مشروطیتی ، یانی دِ سالان (۱۳۱۹) ده نقیسانده .

مولودا هجی یوسف یانی آترکی ژ خوه هنگی کتیبو چاپی : لی با عثمان افندی نه دکت . جارکی نقیشته که وی شاندبون دیاربرگری ، او نقیشتا کو من یا خوه لیر نقیساند . لی ژ بر کو زانی بون بخوین بشوندا فکرا ندبون . هروکی دِ پلی وی ئی پاشین ده پترکی نقیساندی به : « بالخاصه سلام و ننادنصکره استفسار خاطر ایدرم : مذکور کتاب ولا بدتن کرو اعاده ابدلی . سببی اوقو یاماشلردر . باقی سلام . ۱۲ حزیران ۱۳۲۲ - امضا نایته خوهندن »

پشتی مشروطیتی پسامکی من ، فائز بگ بدرخان ، بو بو قیقمای پتورکی . با فی ملا نذیر هجی ابراهیم چو بو بالی . مولود شانی وی دا . پر نه آتوت فائز بگ هاته عزل کرن و فکریا ستیولی . مولود ژ ی بخوه ره بر کو بیخه چاپی . لی لستبولی ژ ی او نکار بون بخوین . هنگی فائز بگ ژ هجی ابراهیم ره نقیساند بو کو آن او بخوه آن کُری وی خوه بگهین ستیولی مولودی ژوان ره بخوین دا کو بکارن چاپ بکن .

— تو چاوان هینی دولی بی بو بی ؟  
— ژ د یا خوه هین بومه . پتی من ژ دیرشوی هاتیه سیورکی ، ل سیورکی دیا من مهر کر به . د یامن بخوه زازابه . کچا ملا سلیمانه ، ملا سلیم کُری حافظ عیسی به ، او ژ پسامی عثمان افندی ، مفتی بی سیورکی به . بانی از خوارزی بی زازانم . از بخوه د نف زازان ده مزن بومه . ژ خوه ل سیورکی بی دولی خبر ددن ، لی بی کُردمانجی ژ ی دزان . خلکی دورا سیورکی ژ ی زازانه . از تم دجوم گندان بر من هر گاف ژ خلکی را مولودا زازا کُرد خوهند . نیدی من زانی بو کو باش چند سالان راحتی سروشی خوه هاته . ملا نذیر بگیری من پهاتا . دولی زمانی دیادی ، زانی وی بو . لی بی زمانی باقی خوه ژ ی ، و که خوه ، پاک دزانی بو . د کاربو هر تشنن دولی بی ژ من ره ب کُردمانجی مانابکه . ملا بی من ملاکی زور ، ملاکی کتیب بر چنگ بو . مولودا زازاکی ، یا ملا بی باقی و خنج الاناما ملا خلیلی سعردی بیره بون . باش دوروزان ملا بی من ژ در ی فه دا . هر می کتیب دِ بر چنگ ...

ملا نذیر نقیشتا خوه دِ سالان (۱۳۲۱) دِ بازدهی ما نیسانی ده بخوه نقیساند بو . لی ایرو چاقین وی ژ بر بخوه ئی بیکی او چند تاری بونه کو دستنقیسا خوه نما دکاره بخوین . ژ لورا من ژیره هریت بکوبکو د خوهندن ، ازی مانه دکر زیر و زبیر د عدلانن ، من ژ ی بی هر دو حرفان ، عربی ولاتینی د نقیساندن . د دما نقیساندی و ب هینجتا هر پرسانو من بالا خوه ددا قواعدی ، دستورن زمانکی داتین درو بو پیل د نقیساندن . بی فی آوایی از دگام بنگی زاری دولی ژ ی من او ددانی بر کُردمانجی بی . ژ میلادن د قبا بو از بزائم و ژ خوهندقانان ره بدم زانین ، گلو آف مولوداها کنگی هاتیه نقیساندن و بی چی آوایی ژ عثمان افندی ره هلکتبو .

لگورا گوتتا ملا نذیر بی ژ ملا بین سیورکی ، پتافی هجی یوسف مولودک بزمانی ترکی نقیساند بو .

# هاوار

## کوفارا کردی \* مجله کردیه

### زاري دومي ومولودا عثمان افندي [\*]

بری چنداکی، برب خلاصکا ناری فه دجوم .  
دنیا له بویوتاری . من وهفالکی خوه مه خوه دا بو  
ین چراکی و مه فیتکک دخوه ند .

د پاش مه ره کالک دهات . عمری وی درورا پینچه  
وشپستی ده . سلاف یله کسر وخوه دا ناس کرن . ملا  
محمد نذیر کړی حبی ابراهیمی دیرشوی . بری پانزده  
روزان ژ ولایت هاتیو ولین د گریا کو ژیره آن برایی  
وی ره کارکی پیدا بکم . من گوت :

— قنجه ، صبه و ره مال أم فد کرن .

لی زمانی وی نه زمانی خلکی جعی بوطان بو . هیژ  
بیتر دجو سرزاری دشتا دیار بکری .

صبه تر کالو هات . یسر هاتیا خوه ژ من ره گوت .  
ژ بر ترکان ، ژ بر ستمکار بیباوان باز دا بو . د نای آخانتی  
ده من سح کر کو هر چند باقی وی دیرشوی بو لی  
بخوه د سیورکی ده ژ د بیا خوه بویه . ژ لورا زاری  
وی نه زاری جعی بوطان بو .

میقاتی من ملا ، ملاکی مدرسه دیتی بو . کیم و زبده  
بچرفین لاتینی ژی دزانی بو .

وکی من نای سیورکی بهیست ومن زانی کو محمد نذیر  
ملا به زاری دمی ومولودا زازاکی هاتن بیرامن .

ژ میژفه من دل هبو هنکی ب زاری دومی ژول بیم .  
تمازا مولودا عثمان افندی بیخم دست . وی ب یکی ره کو  
رند ب دومی یا سیورکی دزانه بخویم ، لبر بشفینم و بدم

[\*] کتیبخاناهاداری د ژان روزان ده مولودا زازاکی چاپ  
وبلاقی کر به . اف بنداما پیشگو تنکاوی مولودی به .

چاپکرن . ژ خوه د فی زاری شیرین ده ژو پیغه  
تشتکی دن نه هاتیه نفساندن . هاتیه ژی من نه دیتیه ،  
نه ژی بهیستیبه .


بلی ژزو فه به ازیل فی مه لودی د گریام . بری دوسالان  
نقشته ک کتیبو دستی من لی ناتقاف . ژ پیشی و پاشی بی  
چند روپل کیم بون ، نین مابین نیف چراندی و دهن  
جهان ده پرسین حشفاندی هیون . د گل فی هندی پیاکی  
از پی ژول بوم ، بکیر نه دهات . من ژی تشتکی  
هیژا و تکوز نه آتی در . ژو پیغه ژ من ره آریکارک  
ژی د فیلیا بو . آریکارکی ولی ، هرچی کو من زانی  
بو بکاره ژ من ره مانا بکه .

ملای من هر چند کردمانج لی سیورکی بو . من  
ژی پرسی هکه ب دومی دزانت . ژ خوه اولی ورازی  
لین فگراند :

— هنگ کردمانجی بی ب دومی ژی دزانت . ژ  
ژنکی ره ( جنیک ) ژ سرف ره ( سمدیم ) و آتی ره  
( آو ) دیژن .

لی دلی من لکوتنا وی رونه دشت . ژ بر کو  
بخوه کردمانج بو . گلک کردمانج هنه کو ب دومی  
دزانت ، لی د آخانتی ده هر دوزاران تفلی هف دکن  
وو که خوه تران بیژن . لی زازا این هنه کو د کردمانجیا  
وان ده تو کیانی نینه ، مینامه ب کردمانجی دزانت . ژ  
بر کو کردمانجی دناقرا کوردین ولاتی ژورین ده زمانی  
تقای بی به و ستران و دیلو کین زازان ب کردمانجی نه .  
بروی یکی ژ من ره بک د فیلیا بو کو دومی زمانی

دی و باقی وی پیت . من ژ ملی پرسی :



السنة ٢  
العدد ٢٣  
الطبعة الأولى  
٢٥ تموز ١٩٣٣

# هاوار

سال ٢  
شماره ٢٣  
شعبه  
٢٥ تیرمه ١٩٣٣

کوفارا کردی \* مجله کردیة


تبخسنییین کوفاری

|                    |                 |
|--------------------|-----------------|
| ج ٠٤٠ بدرخان       | زاری دولی       |
| جگر خوین           | صحیتی           |
| لاجی حهانی         | صحیتی           |
| دكتور ك ٠٥٠ بدرخان | هروکی هانه گوتن |
| هر کول آیزان       | کردو کردستان    |
| ج ٠٤٠ بدرخان       | الفابی یا کردی  |
| دكتور ك ٠٤٠ بدرخان | چارین خیم       |
| فریدون             | خوه ناس بکن     |
| أقین جیوه لك       | دلستی           |
| بزیشکی میران       | کله خرمی        |

مطبعة الترقی بدشق ١٣٥٢ م ١٩٣٣

# **TÎPGUHÊZIYA HER 23 HEJMARAN**

ji tîpên erebî: **Emîn Narozi**





## HEJMAR 2

### Gundê Nûava

A vên herikî... bax û baxçe... di nav van baxçeyan de her texlît darên bi ber, li ser van daran ji her cinsî çivîk pevdiçin û bi her zimanî dixwînin! Ji van çivîkan a ko kezeba min dişewitîne û hundir li min diperitîne; şalûl e. Bejin û xwendina wê ruhniya çavê min û qînata dilê min e.

Gundê me di nav van rezan ji panzdeh malan hevdudanî ye; wargehê me, mezela civata gundê me ye. Paşivan li ser wargeh, naveraojan di nav mêrga rezê me de em, di civin. Pirs û galgalên me teva pev xweş in...

Kula welat çima holê giran û ji bîr nabe? Heta niho me digot: Em bê der û poxan in, ji lewra hergav birînên me diaxivin û ji hesreta erdê bav û kalan em dîn dibin vêca me çi divê? Gund gundê me, bexçe û baxên me. Tekûz e; hertişt, hertiştê me!

Ma qê wusan e? Carekê werin, hundurê min verojin dilê min jê derînin û bi kêreke tûj çîni çîni bikin, wê gavê ev çîniyên dilê min ewê bêne peyivîn û pê ra bêne girîn. Lê dizanim hûn xwe nagirin hêstirê çavên we, ewê çemê Amediyê derbas bike. Şûnda hûnê bizanin ko ez, ne tenê dilketiyê xweşikiya şalûlî me. Ez dilketiyê dengê wê me ji ko jîyina me ya der li der di nav nikilên xwe da tewtew dike û bi vê dawî kilamê dawî tîne.

– Xweyî bin li gundê Nûava! Gundê we; mizgîn û hawara bajarê we!!

**Qedri Can**

### BERDÊLIK

*Ji Qedri Canê cambira ra*

Jiyîn xweş e bi xurtî  
Li Kurdistan bi kurdan,  
Bav û biran çi bikim?  
Hemû min tê bi derdan.

Min dil tucar nenali  
Min zar tucar nekali  
Bi dilhişkî bi lalî  
Singa xwe da ber rîman.

Min îşev dît xewna rast  
Deng û gazî çi xweş hat  
Digot rabin kurdino!  
Tev biran û tev xwehan.

Derban li me tu zanî  
Rim nine giş nezanî  
Xopan kirin kurdanî  
Ev tiral û nezanan.

Hawarê, xweş awa kir  
Dilê kurdan pê şa kir  
Zar û ziman ava kir  
Jîn û xweştî bela kir.

*Kariya Ereban 18-5-1932*

**Osman Sebrî**

## HEJMAR 3

### LAVELAV

Xudan mal î, xudan perde  
Cihê te giş, hemî erd e.  
Bi awazê tena denga  
Te xulqandî, te kir ava.  
Tu hem derd î, tu hem darû  
Te kir meh ro, te kir şev ro  
Te na xafa, te na xurde  
Tu davêjî dilan perde

\* \* \*

Ya Rebb tu yî, tu rehm û nûr î  
Tu destek î tu hesin û şûr î.  
Tu rehm î, tu efserê, mela yî,  
Gencîne yî tev, şeh û geda yî.  
Ya Rebb tu î tu, tu şahê dewran  
Textê te li ser Stêr û ezman.  
Textê te serefsêrên şehan e  
Bejna te ji çavê min nihan e.  
Ser çend şehan tu bûyî xunkar  
Lewra nedikir tu kes jî inkar.  
Ya Rebb tu hî tu padîşah î  
Tu merhema herbîrîn û ah î,  
Bexşende tu yî, lê derdimend im  
Serferşikî mam û jar û bend im.

**Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan**

### PÎROZNAME

**B**irayê gewre û xoşewîst Mîr Celadet  
Alî Bedir Xan!

Le paş destgûşîn. Demêk bû çawriwanî  
sitareyekê gelawêjî kurdeman dikird. Ta ko  
diwênê be çawî xwuman dî man ke ewêş  
kovarî "Hawar" ke çawî hemû kurdêkî ron  
kirdewe, hîwa man wa ye ko be tîrî pîrîşkî  
geş Kurdistan ronak katewe we hemû kur-  
dêk be dem em Haware we biçî ta bikewênî  
ser rêgayî rast we bo yekîrî kurdan hewl bi-  
deyin.

Bo nawî geş lawekî kurdî Iraqewe pîrozî  
"Hawar" tan pêşkêş dekem.

Rîca ekeyn le me û diwa hewl biden bo  
tewhîdî lehcat ta we ko hemû kurd wek yek  
îstîfade le Hawartan biken. Amade yin bo  
hemû xizmetkarîtan. Îtir yarîde û dewamî  
Hawartan le Yezdan teleb dekeyin.

**Hamid Ferec**

### BI HINCETA PÎROZNAMEKÊ

**H**erwekî di sitûna xwe de bêt dîtin, ye-  
kî ji xortên kurdên Îraqê, bi navê  
Hamid Ferec, ji Hawarê re pîroznamek

şandiye. Tê de ji ber xwe û ji ber hemî xortên kurdên Îraqê ve derketina Hawarê pîroz dicit.

Heta niho me Hamid Ferec nas nedikir. Ev cara pêşîn e ko em bi heyina wî dihesin.

Ewî ji me nasnedikir. Lê ji ber ko Hawar - herwekî Hawara her xortê kurd e - Hawara wî ye, Hamid jê re xweyî bû.

Hamid Ferec xortekî kurd, şagirdekî dibistanê, Hawar dikeve destê wî, pê bendewar û şa dibe. Ew roja ko Hawar ketiye destê wî jê re cejn e, cejneke mezin, cejna vejîn û vejandina zimanê kurdî ye. Tawil kiryarî Hawarê dibe û dilbendiya heval, nas, nenas, tevayiya xortên kurdên Îraqê dike û ji me re, ji Hawarê re pîroznamekê rêdike.

Ji hêla din xwe dide pêş, beremrê Hawarê, beremrê zimanê xwe disekine. Ji me dipirse, gelo çi xebat, çi kar heye ko pê xizmeta zimanê xwe, xizmeta nijad û milletê xwe bike.

Tu kes nikaribû ji Hawarê re diyariyek ji pîroznama Hamid Ferec, mezintir, bi qedir û hêjatir bişîne. Diyariya Hamid Ferec diyariyeke welê ye ko bi kirînê naye kirîn, bi daxwazê nakevit dest. Ew tişteki beha ye ko ji vîn û ji xurtî û dilbaweriya kurdaniya Hamid zaye.

Hamid Ferec herçend bi vîn û dilbawer e ew çend bi hiş û jîr e jî. Hamid dixwaze û rind dizane çi dixwaze û jê re çi divêt.

Herê ji me re şiretinen qenc û beha dide. Ji me hêvi dike û dixwaze ko em ji bona yekîtiya zimanê kurdî bixebitin.

Belê xebera wî ye. Ji xwe me, di pronivîsa xwe de ew esas, bi mada jêrîn ve danî bû.

2- sehîtiya zarên kurdî û ber hevdanîna wan . . .

Ji bona yekbûna milletê me welê jî diviyabû. Ji ber ko yekbûna milletan bi yekîtiya zimanî dest pê dike.

Bizmark yekbûna Almaniyayê li ser yekîtiya zimanê Almanî danîbû. Vê yekîtiyê Lûter jê re çêkirî û pêk anîbû.

Yekbûna kurdan jî bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe. Yekîtiya zimanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike. Yanî di yekîtiya zimanî de yekîtiya herfan gava pêşîn e.

Pesn û spas ji Yezdanê pak re Hawar elfabêya kurdî belav kir û ew gav avêt.

edin divêt herçî xwenda, xwendewar û zanayên kurd hene bi vê elfabêyê binivîstin û nexwenda ji hînî wê bibin.

### **Celadet Ali Bedir-Xan**

## **Ma çiman diçî?**

*- Ji Ekrem Beg re -*

Dilkeî me, dil im ez, dotmîr û fermandar î tu!  
Sal û hîv herdem tu î, hem rovejin hem rohilat,  
Dil im ez, dîla welatî; ez jî qurabana te me,  
Gevre [gewre] ye hêvîn û jîn, lê gevretir al û welat! . .

### **Diktor Kamiran Ali Bedir-Xan**

## HEJMAR 4

### EY KURDINE WUŞYAR BIBIN

Xakî Cizîr û Botan, ye'nî wulatî kurdan.  
Sed heyf û sed mexabin deymen bi Ermenîstan  
Wa rêgatan debeserê 'elatê Caf û Bilbas  
Ger mirduwin le germiyan, memnû'e biçne kwêstan.  
Kamî kiç û hetûwî şêrîn bi raydekêşin.  
Hawar debene berkî peş me dexîl û aman.

Sertan le qur hilênin werin halman bibînin  
Çonîn le destê zulmî bédîni dûr le îman.  
Em qiseye ke kirdim nagate çend salî tir  
Em halte debînin yek yek bi çawî xotan.  
Herçî we ko beyanim bo kirduwin be tehqîq  
Peyda debin segane kam qor bikeyn be serman.  
Lem bikne îtîfaqê peyda biken be merdî  
Ferqî nebê şîwan cotyar û mîr û gawan.  
Ger hîç nebê be oyin tabî' be dewletê bin.  
Bêgane çak e, dujmin nek dujminî le xoman.  
Romî weku benî mûn kes piştyan pê nebestê.  
Kewtûne dawî xoyan pejmurde mawin heyran

Kiwa! Walî Senendûc, begzadekey Rewandiz  
Kiwa! Hakimanî Baban, mîrî Cizîrî Botan  
Kiwa! Ew demey ke kurdan azad û serbixwo bûn  
Sultanî mulk û millet sahibî ceys û îrfan  
Coşêk biden weku heng tedbîr biken be bédeng  
Esbabî şer peydaken top û tîfing û hawan  
Haçî kesêke bê kes bo êwe qor dipêwê  
Gwê lê de kî zerîfe nayken bela le xotan

**Hacı Qadir Koyî**

## GOTINA WELAT

Welatê min digotî min: Birazî  
Li nezmê guh bidêre ger dixwazî

Cegerxwînê kurê min tu ji derda  
Silavan zû ji min bigihîne kurda

Bibêje ez keçîk bûm ta ko bûm pîr  
Nedî min xwe wekî vê salê esîr

Serê min bû spî, pûş û pelax e  
Li jêrî min çu nîne xeyrî ax e

Ji çavên min diçin sed av û sed co  
Ji min êdî dikin gazinde zaro

Xerab bûye ji min sed xan û qonax  
Nemaye bo yetîman xeyrî yek max

Nekarî bête nik min merdê rêwî  
Heçî nik min hemî zarok û sêwî

Kuranê min ji xwuşkê xwe re pak in  
We lê pirsê li dapîra xwe nakin

Cizîr û Şehrezor û qit'ê Îran  
Hemî qîzê min in pîrê bi qurban

Cuwan in surperî ne serbilind in  
Gellek xûb û zerif û gewr û rind in

Efîf in pîr delal in berzewac in  
Gelek pak in we lakîn bêrewac in

Ricakar im ji te ey lawê kurdî  
Tu xwuşkê xwe nexî ber êş û derdî

Bide heryek cîhangîrek zemanî  
Wekî Yûsuf, Selaheddînê sanî

We lê bêje ji bo wî re cayan e  
Ev e xwuşka min e rind e cuwan e

Ji hersêkan tu kîjanê dixwazî  
Tu nasnakî ji bil navê mecazî

Sîdaq wan tifaq û îttîhad e  
Tu kê bigrî ji bo te ew mirad e

*Amûd: 11 Hezîran 1932*

## Cegerxwîn

## LAWIKÊ MIN

Gava ko fermana kurdan rabû em hêj  
Gnû zewicî bûn. Şevêkê tu pîr dereng  
mayî û gava tu hatî mal, di destên te de ti-  
fingeke nû û çend sed berik hebûn. Dilê  
min tirsîya û recîfî, min ji te re bi dengêkî  
lerizî digot:

– Gurgîn . . . dîsan çi heye? Te li min bi  
hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir; pa-  
şê bi dengêkî xurt li min vegevand.

– Dawet dest pê dîke.

\*\*\*

Di welatî de şêş meh şerekî zor çêbû, jin bi  
bûn zaro sêwî man. Kurd destpêkê de dij-  
min şikandin. Lê, paşî bi bêbextî hatine şî-  
kestin. Gava tu di şer de bûyî min ji te re

kurikêk anî. Êvarekê, ez li ber deriyê malê  
sekîni bûm, çavên min li rê bûn. Min dît tu  
hatî. Herdu destên te bi xwîn bûn. Di ser  
singa te de birîneke kûr û vekirî hebû. Te,  
ez himêz kirim û te got eskerên dijmin di  
ser şopa min de ne; bawer ke niho ew ê bên  
û min bigirin, megirî!!!

Tenê vê demê ji bîra meke. Paşê tu bi ga-  
vên lez çûyî ser dergûşa kurê xwe ê pênc  
mehî Tacîn, û te ew helanî û jê re got:

– Tacîn! Dilê te ji bona arîkariya kurdistanê  
ye. Xwîna te ji bona şer û rijandinê ye.

Te kurê xwe dikir nav dergûşê û eskerên  
dijminan dikiştin hundirê malê. . .

\* \* \*

Lawikê min! Îro pênc sal qediyane ko em, ji  
hev dûr hatine existin. Tu niho di kortalekê  
de bi çarsed camêrên kurd radikevî.

Xwedê dizane . . . çermê rû û sînga te pe-  
rçîfî û laşê te riziya.

Lê, Gurgîn. Bizane ko herşev berî here  
rakeve kurê te Tacîn zend û destên xwe ên  
nerm davêje ser situyê min û bi çavên xwe ê  
zelûl û bi keser li min mêze dike, min maç  
dike û ji min re dibêje:

– Dayê! . . . Dayika min bavê min re bini-  
vîsîne ko mezin bûme. Dilê min ji bo hejki-  
rina Kurdistanê ye xurtiya min ji bona arî-  
kariya Kurdistanê ye, xwîna min ji bo şer û  
rijandinê ye!!!

**Dr. Kamiran Alî Bedir - Xan**

## HACÎ QADIRÊ KOYÎ

Hacî Qadir Koyî şairê qewmî, berz û bi  
qîmetî kurd e. Le salî 1232 [1816] h.  
[hicrî=koçî] le gundî Gorqerec nêzikî Koy-  
sinceq hatuwete dinya, le paşan çûwete Es-  
temûl û le wê mêwanî kuranî Bedir-Xan  
paşa buwe û le salî 1312 [1894] le wê wefatî  
kirduwe. Hacî Qadir yekemîn şair e ke hel-  
bestî qewmî û millî danawe û be we xerîkî  
wuşyarkirdinewey kurdan buwe û lapeday  
helbestî xeramî pêwe dawê.

## Hevindê Sorî

## HEJMAR 5

### WELATÊ KURDAN

Kabira Merwane mal û xaneyî wêranî min  
Tê bige zanînî fen û kirdewe w îrfanî min  
Roleyî kurd im silahşor im le meydanî şera  
Alem eyzanê çulon bû Rostemî meydanî min  
Go biroy geşt û guzarî bax û baxatim bikey  
Her delêy Allahu ekber çend xwoş e seyranî min  
Awî bermawey min e niwey cîhan têr aw eka  
Bo Îraq û el-Cezîre rûh e em awanî min  
Mezr' ey kêlgey wulatim bo te enbarî cîhan  
Rizqê Îran û ereb te'mîn eka xermanî min

\* \* \*

Bo bilindî xwoy be qurbanî jiyani gel eka  
Giyani û malî hîç e la serkirde w goranî min  
Rû bida bo dîn û millet zereyê kurtî w be dî  
Giyani eden nakin tehemmul alim û şexanî min  
Ew kese bedbîn e ispatî cehil bo xwey eka  
Wa eka înkari zor û debdebe w dewranî min  
Laperey tarîxî alem şahid e bo dewrî min  
Diyar e hêştî taqî Kîsray dewletî Sasanî min  
Îddî'ayî 'ilmî musîqa emin ispat eka  
Rast û sigaw û beyat û lawik û heyranî min  
Piyawî wek Sultan Selaheddîn Eyyûbîm biwe  
Fexr e bo Îslamî alem kirdewey sultanî min  
Înqîlabî çonî pêk hêna le Îslam û ereb  
Mîr Ebû Muslim bû serkirdey gelî şerani min  
Nadîrî Efsari, Ebdulkerîm Xanê zenî  
Dwênê dengî da le alem setwetî şahani min  
Guftugoy ba intihay bê xatîmeş bê bem qise  
Nisbetî Arî bes e bo 'en'ene w inwanî min

**Ebdulxaliq Esîrî Kerkûkî**

## **Bironkara mezin û xoşewîst a hemîyan Mîr Celadet Alî Bedir - Xan**

**M**îrê Mezin! Kovara Hawarê pirdeng  
tund û qaîmî sin'et û fen, pilley nêrdewana  
çûna berew jor û serkevîna ezmana milletê  
kurdî beste ziman û mayeyî firehbûna gote  
û lawij berî bera rê lê hundabiwanî kur-  
manc û çiraya xwêndevaranî pir hoş be he-  
zar dilxweşî û kêf û stranînê me le horga  
(meclis) Îsmail Beg da xwend.

Gelêk bira û xweş hawalanî dilsojî rûniş-  
tibûn. Me ke be kenîn û kêf ve xwend.

We bo ev pîrozî û geyîştina Hawarê hor-  
ge xo me daye razandin be yadî rûhî pakî  
bira ciwan û saxî û selametî hê paşiyecî ma-  
wan û be şereftî mezin û xawer himetî me-  
zintan me dest kir be kêyf û şadî û ûd û ke-  
mançe û gramofon nêzîk sê seat me hogirî  
xwoyî berneda.

Kovara zarê kurmançî ko ta niha me ra-  
girtibû ji wan rojan da dê derkewêr. Me  
nisxey wan teqdim dekeyn. Êtir Xudê ha-  
wale we bêt, Mîrim.

**Seyid Hiznî**



## HEJMAR 6

### JI BONA HAWARÊ

**Ji bo Mirê zirav û giran û serfiraz û hunermend Mir Celadet Ali Berdir-Xan**

**B**ende go bi navê Cegerxwîn hatiye nas-kirin destê te maçî dikim û bêhejmar silavan li cenabê Alîşan dikim. Hebûna serê te li cihanê ji padşahê mezin dixwazim û bi van çend xweşxwanê jêrîn ez Hawara te pîroz dikim. Welê dîsa wek pîrozname Hamid Ferec nabe çiku wî ciwanmêrî berî herkesî Hawara te pîroz kir.

Hezar carî pîroz bitin ev Hawar  
Hezar ah û zarîn dikin lê ez im  
Gelek xûb û rind e weki gul'izar  
Ji wan bilbilan tê Cegerxwîn û jar  
Gulîstanê zarê me ye ey ciwan  
Dibêm: ax welat ax welat ax welat  
Ji bo bilbilê dilnexweş bû bihar  
Evîna te kuştim kirim tar û mar  
Çi mêwek şêrîn berê wê giha  
Welat pir xweş e çol û deşt û çiya  
Pesendîd e go min berê wê dixwar  
Li zozanên jorî di cihên avên sar  
Çi bostanekî pir xweş û pir bi av  
Di nîva welat min diye sê bihişt  
Heye tê de xox û bihok û hinar  
Kilêbî û Şaxê û çola Hesar

Li ber wê heye beşxweşek mezher  
Hesar gelek xweş e deşt û çiya  
Şahînşah û paşa ye û xwendkar  
Rez û bax û baxçe beroj û zinar  
Serfiraz û comerd e ew beşxewan  
Hawar e pir ciwan e keş e nûgiha  
Didî herkesî wî berê avîdar  
Gelek dilber û nazik û nazedar  
Hezar bilbilê dilşewar û bixwîn  
Qelen kême erzan e pêncsed qirûş  
Di nêv baxê wê da dikin ah û zar  
Bixwazîn ji Alî Celadet bi xar

### Cegerxwînê Kurdî

### GULBANKÊ HIŞYARIYÊ

Çavê xwe veke ji xwabê rabe  
Mêze ko welat hemû xerab e  
Carek li welatê xwe binêre  
Rovîgahê piştî çûna şêr e  
Ew deşt tijî ji mîrg û ava  
Roj tê de ji zû ve çûye ava  
Ew goh zimrudên di ser de  
Berf in dihelin û bax di bin de  
Ew baxê tijî gul û lale  
Muxî seherê li ber dikale  
Lewra ko refek ji kund û zaxan

Hêlîn kirine di nava baxan  
Bilbil ko bi zarê xwe dixwîne  
Zax jî ji xwe deng bi derdixîne  
Ber jî rebat e gihaye jêrîn  
Cîkê xwe yê jêr bi jor bigorîn  
Carek here ser çiya û zozan  
Bi awazekî jînê banke kurdan:  
Bêje hemû yek bibin bi hev re  
Canê xwe bidin biçûk û gevre

**Mela Eli**

## JI KURDÎ LI EREBÎ

### Şiroveya gotinên kurdî bo zimanê erebî

**D**i hejmara pêşî ya kovara me Hawarê de me got ko ew bes kovareke edebî û zanistî ye, mebesta wê yekbûna zaravayên kurdî yên cuda ne û hînkirina kurdan ya xwendin û nivîsîneke bi rêk û pêk e li gor biryarên ko hatine girtin.

Ta niha me gotinên biyanî bo hinek zaravayên kurdî ferheng kir.

Lê ji vê hejmarê û pê ve me biryar da ko di kovara xwe de sitûnekê ji bo ferhengkirina gotinên kurdî bo zimanê erebî veqetînin, ev yek li ser daxwaza hinek xwendevanên me yên hêja pêk hatiye. Nexwe ji niha û pê ve çî peyvên ko xwendevanên me ji me bivên em dê wan di bin sernavê "Ferhengok" de bicivînin. Em ji zatê wan hêvî dikin ko şiroveya temamê gotin û hevokên ko ji wan re zor in ji me bixwazin, da ko em di vî cihî de zû bersiva wan bidin.

[Wek ko ji nivîsê jî tê zanîn ew bi erebî bû min ew wergerande kurdî lê ji ber ko Ferhengokê bi xwe gotinên tekstê yên kurdî bi erebî mane dikir min tu pêwîstî bi wergerandina wê nedît- E. N.]

## Navê Roj û Mehan

**H**inek xwendevanên me ji me pirsana navê roj û mahên kurdî kirine. Li vir em vê daxwazaiya wan tînin cih û li jêr wan navan dinivîsin:

Di zimanê kurdî de ji bo mehan du cure nav hene. Cureyê ko tê zanîn navdana mehan bi navên wan yên serbixwe ne, lê cureyê duyemîn taybetî ye ko ew jî navdana wan li gor demsala wan e. Ev cure nav di stran û helbestan de bêhtir tê. [Ev nivîs ji erebî hatiye wergerandin lê ji ber ko navê roj û mehên kurdî li hember yên erebî hem bi ûpên Latîni û hem jî bi yên erebî hatibûn nivîsîn min wergerandina wan pêwîst nedît - E. N.]

## CUWABNAME

**B**o Newrozî muste'ar xawenî meqale zimaneke be ser lewhey "Bo Şairêkî Kurd" le jimare 24'emîn zarê kurmançî da neşir kiribû.

Meqaleyek ke hewt sal le me û pêş le tenqîdî şî'rêk da le defterî xatîratî xota nûsiwete îmro êxeyete sahey întişarewe û le cerîdey zarê kurmançî da 'erzî xwêndewaranî ekey. Erme himet û tewanayekî berz e, cinê teqdîr û teşekkur e.

Umêdim wa ye ke ew defterî xatîrate xezîneyekî zengin û rengîn û be î'ûbarî muhtewiyatî tuhfeyekî niwênî giranqîmet bê. Herçendî tenqîdekê be rastî me'qûl û meqbûl e belam eger aciz nebê dekêm: Ke bo neşrî ew tenqîde le intixabî ziman da isabetî nekirdiwe. Çûnkî tenqîdî fi'lek usûlen ya le wextî kirdinî ew fi'le da we ya le eqîbewe dekirêt. Eger wa nebûwaye tarîx bo ême nedebû be dersî ibret. Saniyen tenqîdêk ebê tewcîhî hedefêkî mu'eyyen bikrê. Eger wa nebi bê eksî seda emênitewe. We lem new'e tenîdeş ne, xwêndewaran le heqîqet agahdar ebin û istifade ekin û ne ew kesê tenqîdeş ekîrit le xwoy agah. Le ber eme bebî mudafeyê nefî mehkûm û bem tehrîşî elbette me'zûr emênitewe, min lêre da herze û gêlî nakem eger tenqîdekê muweccîhî minîş nebê, çûnkî tenqîd hel egîrêt le nûsinewey em cewabe da xwom her be musîb ezanim. Me'e ma fîh ê we tenqîdî şî'rêk eken ke hewt sal le mew pêş neşir kirawe û le miyaney tenqîd da efermoyet ke "Çi milletekî tîr heye le esrî fen û ilm da le zmanî irfan û sen'et da şaire pîr hoşekani le paş hemû ra-

bûradinêk le şî'r da basî (mujgan û çawî kal û lêwî al biken) Em sualetan le çî dereceyek da le gel heqîqet tetabîq eka le we behs nakem. Feqet wa ezanim ke heqîm heye tenqîdeketan muwecîhî xwom bizanim. Çûnkî min teqrîben heşt sal le me w pêş le şeşemîn jimarey xeztey "Umîdî Istîqlal" da xezelêkim neşir kirdiwe ke eme me'le'êke ye tê:

"Mari zulfîr nû ye çî xezney 'eqîqî al ebê

Tîrê mujgan pase danî dûrî çawî kal nebê

Diqqet efermoy ke 'ibareê "Mujgan û çawî kal û lêwî al û . . ." ke herfiyen le meqaleketan wergêrawe le gel met'î xezelekem çend minasebetdar e? Carê le pêş hemû şî'têk da 'erztan ekem ke min le w tenqîdetan zor mutehessîs û pê xweşhal bûm. Çûnkî dubarey ekem we qîsekanetan heq û rast e le gel emeyîş da "zemêkî te'ht el-medh" (avêtina bi pesindan); çûnkî du beşî meqaleketan dilalet le bilindî mewqî' (cih) û şexsiyetî munteqîd (rexnegîr) eka le nezer êwe da inca le ber emey min layiqî em teqdîrate nebûm demêk le nûsinewey cewab da mutereddid mamewe. Feqet fikrêk ke cesarefî cewab nûsinewe û (xwo tê helqlandinî) pê bexşêm ewe bo ke le teqdîrateketana weku tenqîdeketan namusîb in. We illa eger le ciher tenqîdeketanewe le edemî isabettan emîn nebûmaye mumkin nebû xwom bew şexse berze bizanim ke êwe tenqîd eken. Belê lutfen eger temaşey serlewhey xezeleketan bifermiwaye û tozî lê wurd bibûnaye we detan zanî ke ew xezele bû tecrîbeyekî qelem û le jêr meqsedêk da nusrawe çûnkî serlewhey "Bi Terzê Qedîmen" û bi 'l-xasse şî'r û meqalekanî pêş ew nusxeye kafiye bo izharî meqsed. Bem mûnasebetewe hikayetêkî biçûktan bo bigîrmewe:

– Serdemêk dîsanewe le xezeteyêkî biçûk da çend şîr û meqaleyekem neşir kird le şî'rekan da zorim se'î ekird ke lasay şî'ra tazekanî tirk bikemewe muteceddîd be mîş-kekanî weku tu zoriyan teqdir ekird. Feqet rojêk le mecellekê da be'z lew teceddud pir û raneyîş hazir bûn ke "Qedîmen Perist" yek hucûmî kirde serim û tenqîdî kirdim le ciyatî mudafe'e be uslûbî kon çend şî'rêkim neşir kird ke ew û em mîsalî ew e û lêyan me'lûm bû lew meydanêş da le "Qîr qaç" la nadem dûbare geramit we ser rey ewil nazanim halî boy ke xezelî "Bi terz Qedîmen" yîş reqrîben be meqsedêkî wa nusrawe? Ke wabû reng e me'zûrim bibênin. Eger le 3 ziban da (Kurdî, Farsî, tirkî) eş'ar û xezeliyatî bindet çaw pê kewetewe xwêndûtewe elber le meselekem têngêştûyî. Me,e ma fîh le rexmî emane û le rexmî ewe tê ke be xilaf eqîdeyêwe edebiyatî bê'îşq û bête'bîrî se'hîhî (edebiyatî bê xett û xal) le nezer min da weku (awêney mis) wa ye. Dîsanewe teqdirî berzî hisiyat û bilindî mefkûretan ekem. Çunkî min ezanim êwe kên?...

### Helim Rifqî

Herwekî me ji nusxa pêşî ve gotiye; Hawar, Hawara kurdan, Hawara her kurdî ye. Ji lewra me benda jorîn ko cûhabek e bilav kir. Heke "Newroz" dil kir û lê wegerand rûpelên Hawarê jê re ji vekirî ne.\*

Hawar

## ZARÊ KURDMANCI

Kovareke kevn e. Ev heft sal in xweyîyê wê ê xwedan vîn û himmet, mîrza Husayn Hiznî Mukriyanî kovara xwe di Rewandîzê re derdixênit. Mîrza Hiznî berî hingê li Helebê bû. Ji xwe re çapxanek saz

kir û bi xwe re biribû Rewandîzê. Zarî kurdmancî di wê çapxanê de tête çap kirin lê sed heyf û mixab in ko Zarî kurdmancî ji bêxweyîtî, ev du sal in rûpelên xwe li xwe girtibû û nikaribû derkeve.

Di bîst û siyê ûrmeh û 1932 û di roja şembê de ji nû ve vegeyriya jiyînê û derket. Tê de gelek ciştên qenc û bi fêde hene. Xêzên jêrîn ji bendeke wê ye ko sernama ser bihûrdiya (biserhatiya) kurdanî heldigre:

"Serbihurdî gevre û nawdaranî kurd le salî hezar û dusedê hicrî heta hezar û sêsed. Lem kovare da yek be yek ev piyawe gevranê basî ekeyn we deyxeyne ber çawî xwêndeware xwoşewîstekanî zarî kurdmancî.

We evane be kitêbîş teqdimîyan ekirî, le esrî sêzdemîn we heta esrî çuwarde bergî yekemîn û le ewilî em esrewe heta emro be bergî duwem nawunrawe."

Hawar hevala xwe ne a nûza lê ji nû ve za bi germiya dilê xwe himêz dike û tê xwehatina wê. Ji Yezdanê pak jê re jiyîneke dirêj daxwaz dikir û pê re ji xwendevanên xwe hêvî dikir ko kiriyarê Zarî kurdmancî bibin da ko ev kovara kurdî bikarîrî bijt û xizmeta mîlet û welatê xwe bikirî.

Hawar

## Ji xwendevanan re

Bendên xwendevanên me ko gihîştine Hawarê gelek bûne. Tevda û di nusxekê de nayêne belav kirin. Rûpelên Hawarê qim nakin. Ji lewre ev bendên ha bi dûrî dê bêne belav kirin. [ji] ber vê yekê divêt ko xwendevanên me li me megirin û li dorên xwe bisekinin. Hêdî hêdî, [ji] berê ve hemî ji dê belav bibin.

\*) Xuyaye ko di vir de tevlihevîyek heye çiku çendî ew di nav rûpelên hejmarê 7'an de hatine ji lê li serê van herdu rûpelan "rûpel 4, hejmar 6" hatiye nivîsandin.

## HEJMAR 8

### JI XANÎ RA

*Çend xeberekî Kurduwarîne digel rubê Ehmedê Xanî*

Xanî tu bes e bike hawarê  
Rabe tu biliv ji wê mezarê  
Bifikir tu bibîn diyarê Zînê  
Sor e wekî gul hemî ji xwînê  
Dûman û girî ji xan û manan  
Çawan digehête asîmanan  
Feryad û fixanê duxt û bûkan  
Zarî û hawarê van biçûkan  
Cewra weledê heram ê Cengêz  
Ne rez hiştine ne bax ne parêz  
Wêran kirine kelat û bajar  
Talan kirine mezar û bazar  
Cîkê zerî û delal û rindan  
Lê irira hirç û bûm û kundan

### LÊ

Bê hêvî mebe binêr tu carek  
Kurdên bi şîraq bibîn mubarek  
Îro qe nemaye wan nîfaqek  
Pêkve hemî bûne ittîfaqek  
Taûsî û Îsewî û Musilman  
Ji Sêwas heta bighête Loran  
Yek can û dil û yek hawar in  
Bi 'l-cumle li gaziye bi kar in  
Şeş sal e hemî bixwîn dibazin

Azadî û xwebixweyî dixwazin  
Ya dê bimirin we ya bijîn mîr  
Qet laîq e kurd bimînit êsir

*Bayezîd 15 hezîran 1932*

### Behmen Zerdeşt

### HIŞYARNAME

Hawar kurdino nekin nekin!  
Renca neyar jibîr nekin  
Şev û rojê hûn xew nekin  
Mêraniya xwe hûn zêde kin  
Hawar kurdino nekin nekin!  
Yekîtiya xwe winda nekin  
Namûsa xwe peymal nekin  
Hawar kurdino emê pir in!  
Çavên me kesî nabirin  
Naxebitûn pir xizan in  
Em bi qanûnan nizanin  
Hawar kurdino bilezînin!  
Zarokê xwe bixwênînin  
Bi qanûnan bizanînin  
Belkî doza me hilînin  
Hawar kurdino nekin nekin!  
Bi zimanê neyar gal gal nekin  
Zimanê kurdan hûn fire kin  
Keç û bûkan paymal nekin

\*\*\*

Herê lê herê lê herê lê zeriye  
ezê nexweş im nexweşê li tayê yo  
Bira cîkê min deynin li zozanê Mêrgemîrê  
li ber belekiya berfê yo  
Belkî keç û bûkê êla rengin  
bên herin seyrangaho  
Çelengewra min destê xwe bide  
bin serê min evdalê Xwedêyo  
De wayê de wayê feleka malçewitî  
xayinê [xayin e] me ra nayê

*Deştê Sirûcê 14 tebax 1932*

### **Lawê Findî**

## **EZ GORIYA BANGÊ TE ME**

Hawar hawarî kurd e  
Deng û gazi welat e  
Mizgîniya xwe nasîn e  
Hatî be dengê Hawar  
Qîz û kur pîr û ciwan

Hawar hate çiyayan  
Deşt û gund pê lerizan  
Bangî azadî kurdan  
Yekbûnî xweşî dilan  
Kewte naw mal û xêzan

Herdem be demî Hawar  
Pêk dekoşîş û hawar  
Huşyar debîna kurdan  
Ladeban şîna welat  
Ez goriya bangê te me

*Akre 28 hezîran 1932*

### **Mamoste**

## MÎR Û KEŞE

Carekê Mîrê Cizîrê derketibû gerê. Riya xwe xistibû Tora Hevêrkan. Şevêkê di gundekî Felehan de ma. Di vî gundî de dêrek hebû. Mîr çûbû ziyareta dêrê.

Ji keşeyê dêre re got:

– Ez ê ji te sê pirsan bikim, lê ne niho piştî sê mehan û ne li hir li Cizîrê, heke te li wan vegeyand ez ê te bikim pitrîq û heke te nezani vegeyand ez ê te ji keşetiyê bêxim û bikim dergevanê dêrê.

Mîr da rê û çû. Keşe kete texmînan. Keşero bi ro diçilmisî, ji sibehê heta êvarê riha xwe dikir nav destên xwe û vedikişkişand. Di dilê xwe de digot: "Xwudê tu ew Xwudêyê min ê çak î, ez jî keşeyê te ê rind im, ev çi bela ye ko te aniye serê min, ez ê çawan li Mîr vegeyanim?" Keşe xweyiyê pez û şivan bû. Halê keşe diket ber çavê şivanê wî jî. Carekê şivan ji keşe re got:

– Bavo, ev çi halê te ye? Çi dest daye te? Ji sibê herî êvarê difikiri û ber xwe dikevi, ka bêje xulamê xwe belku min tevdîrek jê re dit.

Ji xwe keşe li yekî digeriya ko derdê xwe jê re bêje. Rabû derdê xwe ji şivanê xwe re got, şivan kenî û got:

– Ma ev jî tiştek e? Mîr çi dikare ji me bipirse ko em nikarin lê vegeyanim? Qet xem mexwe, min bişîne Cizîrê ez ê bizanim lê vegeyanim.

Keşe pê qail bû û dilê xwe rahet kir. Sê meh bûn temam keşe şivanê xwe rêkir Cizî-

rê. Şivan xwe gihand Burca Belek û derket hafa mîr. Mîr bi kêf bû, ji şivan pirsî û got:

– Keşe, ka bêje di behrê de çend dilop av hene?

– Hejmartina dilopên ava behrê gelek hesanî ye. Tenê divêt tu emir bikî ko devên çeman bigirin.

Mîr kenî û got:

– Xweş cuhab e. Pirsiyariya diduwa, heke ez xwe bifroşim çend zêr dikim.

– Bîst û neh.

– Min ev seh nekir ev çi hejmar e?

– Mîrê min tu zanî ko Îsa Pêxember bi sih zêrî hatibû firotin. Herhal qail î ko jê bi zêrekî kêmtir bêî firotin.

Mîr ev jî eciband û jê pirsiyariya paşîn pirs kir:

– Keşeo, ka bêje min niho ez di dilê xwe de çi dibêjim?

– Ez xulam ev ji hemiyar hêsantir e. Niho tu dilê xwe de dibêji ko ez keşe me, ne? Lê ne welê ye, ez şivanê wî me, keşe li gund e...

## Koçerê Botan

### ZÎNINE XEW

Şewêkî ronak wek çihrey dildar,  
Asman bê pele, zewî xamoş bû,  
Cîrîwey estêre le dûr weku tar,  
Bo dilî birîndar zor be xuroş bû.  
Le laye şindî dilguşay şemal,  
Le laye bulbil mest boy gul,

Mini bêçareş gîrûdey xeyal,  
Badem pir ekird le xwênawî dil.

Hêndem xwardewe xwênî geş û sûr  
Nema tiwanay seyrî tebî'et,  
Bazim da, derçûm le cîhan, le xilqet  
Firişte asa firîm serewjor. . .

Katê mandû bûm, şabalim şika,  
Niştimewe le naw gul û gulzarê,  
Cêyekî tenha, nebû giyandarê,  
Mamewe bêkes, bêyar, bènewa.

Ta çaw bir bika her lalezar bû,  
Giyandarî tenya balindey bê xem,  
Tar û rubabî dengî huzar bû,  
Hiç bû le çawya baxekey Îrem.

Xistimye tîrsewe çolî û tenyayî,  
Hatewe bîrim belênî Yezdan,  
Bihuşte, wutim, êre bê guman,  
Nema lam îtir bîrî dinyayî. . .

Hawarim kirde Êzedê bêçûn,  
Firyadi resim bê lem wehşetzare,  
Ya rehberim bê bo rêgay derçûn,  
Ya ne halim ka lem ser û kar e.  
Nagah le penay darêkî berza,  
Hate derewe pîrêkî fanî,  
Serapa bergî spî le ber da,  
Pîrçêkî dirêj heta ser şanî,

Du çawî geş î beraq û pîrnûr.  
Rûyêkî beşûş royiştinêkî weqûr.

\*\*\*

Nizêk bo û lêm fermûy: "Ey role,  
To çît, çi kareyt, ademîzad î?  
Bendet, azad î, mat î, dilşad î?  
Çon rêt kewtûte em cêga çole?"

Wutim: "Min kurd im netewey Sasan  
Peristişkarê Azer û Êzed,  
Hatûm bibînim ehdi pêşînyan,  
Têbigem dewrî Dara w Yezdegird.  
Birêjim boyan firmêskî xwênîn,  
Hawar berme ber tacdarî Midya,  
Bila lêmewe, bikem zar û şin,  
Ta ko Hirmizman biga be fîrya."

Fermûy: "Ba biroyn bo lay Akbatan  
Le wê bibîne be herdu çawit,  
Giyanî pêşînyan, Mîdya û Keyan,  
Êstayş hewl eden bo berzî nawit."

\*\*\*

Be cote royiştin ta geyîne şarê,  
Pir le awazey şayî û zemawen,  
Pir le fireşte w perî şox û şen,  
Nemdî le nawya xembarî carê.

Le her la yarî, goyîn, cilêtîn,  
Le her la teqey nalî şore siwar,  
Le her la cilwey rûyêkî nazdar,  
Le her la lencey yarêkî şêrîn.

Le her la şorê saz û newayê,  
Le her la destey şoxanî xwoşgul,  
Le her la bangî, sêga w sebayê,  
Le her la çîmen, sehney xwoşgul.

Lewlawe koşkê berz û serazad,  
Pencey lê eda le gel kehkeşan,  
Serfirûy ebû mangî direxşan,  
Dax le dilî bo Babîl, Ur, Akad.

Desteye gurdî ciwan û cengawer,  
Poşide zirî û bergê asinîn,  
Gurz û rim be dest, cengî w dilawer,  
Dewreyan dabû, hûbûn be perjîn.



Pirsîm le rehber: "Kê ye xawenî,  
Em koşk û sera, em qesr û cah e?"  
Fermûy: "Nişîman paytextî şah e,  
Mufer ke xolî, dar û dewenî."  
Le paşê kir noş û spasî Yezdan,  
Destûr man wergirt bo xizmetî şa,  
Çûyine asîtanî Keywan le asman,  
Le taw debdebey serî sûr ema. . . .

Xwawendey Babil, qeyserî Roma,  
Fir'ewnî Misr û şahî Naramzîn,  
Hemû secde ber, zan û ber zemîn,  
Bo textî Dara w eywanî Kisra.

Şahî kişwergîr bom hate guftar,  
Fermûy: "Pêşkêş ke spasî Xusrew,  
Be kurdî bedbext, be kurdî hejar,  
Bire pê mujdey jiyaneîki new,  
Rojî her heldê firar eka şew  
Be rast egerê axir zinîne xew."

## Pîrot

## ÇEND PEND

Nakes hemî bûne mîr û axa  
Yê ev kirî mala wî ne ava

Rabe here nik heval û kalan  
Da tu nekevî newal û çalan

Dermanekî çêke bo birînê  
Da tu nekevî di nav nivînê

## DAXWAZNAME

Min di ruhnîkî hilbûbû ji Damas  
Şefeq dabû Cizirê û erdê Qafqas

Berê Burca Belek lê pirsîyar bûn  
Min gotî wan kî pênc herfê Hawar bûn  
Nedî Namî li nav kurdan yekî mêr  
Ji bo çapa Hawarê çêbikî zêr  
Silavê gewheranî le'le û dur  
Ji ber kurdê Cizirê hedyê rêkir  
Tu xweş hatî Hawarê ser serê min  
Te suhtî can û cergê dijminê min  
Ricûkar im ji mîrê xwe Celadet  
Wetenperwer xwedanê text û dewlet  
Tu roznamakî kurdî bo me çêkî  
Serê salê bi herfên nû verêkî  
Bes e Namî xebirdana go pir bî  
Wekî dur bî ewê her bê qedir bî

## Ehmed Namî

## MARŞA KURDÎ

Gelî biran werin cengê  
Bişoyin dil ji vê jengê  
Bibêjim ez heta kengê  
Nehin yek j' me bi vê rengê

Hawar heye em çi bikin?  
Werin da em xwe kar bikin  
Karê li çîyan kar bikin  
Da hûn ji xwe re kêf bikin

Gelî biran bigrin govend  
Bigrin cîkî delal û rind  
Binpenc bikin wekî esed  
Dê j' we bixwazin her meded

Kêf û xweşî her pê we ye  
Hûn vê bizanin her we ye  
Ev welat û cîkê we ye  
J' biyaniyan re bê fêde ye

Hûn çi bikin bêlome ye

Çavnêr in em l' destê we ye  
Bizanin ev şanê we ye  
Welleh û Billeh ev we ye  
Ez ko kurd im ez kurdî me  
Ji cîkê xwe re ez gori me  
Ne bêdost û bêxwedî me  
Gel ala be li serê rê me

Ez ko kurd im divê bikim  
Evan biran ji xew rabikim  
Ez bidim şîr wan gir bikim  
Bav û kalan pê sax bikim

Bav û kalên me pir baş in  
Lê em digel hev dilreş in  
Îro qewî em nexweş in  
Maçû dikim çavên geş in

Ez kurdiyê Şernexî me  
Xulamê Mîrê Botî me  
Herwest ji wan re gori me  
Celadet Alî begê me

Ey beg û ey mîr, ser û şah  
Wek xursîd, ewr û ba û mah  
Her ji me re pişt û penah  
Daîm ji we re her Ellah

**Mustefa Ehmed Botî**

## FERHENGOK

Çawa me di hejmara şeşan ya rojnameya  
xwe de jî gotibû, hinek ji xwendevanên  
me xwestibûn ko em hinek peyvên  
kurdî yên zor ji wan re bi erebî mane bikin.  
Me jî daxwaziya wan anî cih û ji bo vê yekê  
rûpelek amade kir. Lê ji ber ko tu daxwazî

ji xwendevanên me yên hêja çenebû me di  
hejmara heftan de ew mane nekirin lê ji nû  
ve, ji xortek ji kurdê Salihiyê nameyek ji me  
re hat ko ew bi tîpên kurdî yên nû nivîsan-  
dîbû û dixwest em hinek gotinan jê re ma-  
ne bikin. Di demeke kurt de ew baş bi ber  
ketiye û ji bo vê xwedana wî em wî pîroz  
dikin û jê re spas dikin. Herweha em ji te-  
mamê xwendevanên xwe yên giranbiha hê-  
vî dikin ko daxwaziya hemî gotinên ko ji  
wan re zor in ji me bikin.

[Ji ber ko ji vir û pê ve gotinên kurdî bi  
erebî dihatin manekirin min wergerandina  
wan ji erebî pêwîst nedit- E. N.]

## ZINÎNE XEW

Di rûpelê sisiya de bi vî sernamî şe'rek  
heye. Tê de çend nerastiyên çapê he-  
ne. Em ji xweyê wê hêvî dikin bila li me  
megirî ji ber ko em bi zarê Babakurdî rind  
nizanin, lê em jê û ji xwendevanên me yên  
din hêvî dikin bila bi du şîrên xwe bi xetekî  
rind, gir û pîrsan ji hev veqerandî binivîs-  
nin da ko em bikarin rind û rast bixwînin û  
bend û şîrên wan bê xeletî derînin. Neras-  
tiyên Zinîne Xew ev in:

Zinîne xew: Zinine Xew  
le laye şindî: lalaye şiney  
Ader û Êzed: Azer û Êzed  
le paşê kirnûşê: le paşîşê kirnûşê.

## EKSÎ SEDAYÎ HAWAR

Bo Xawenî Serberzî Kovarî Hawar:

Be xweş dil û gîşayîşî giyanewe çend nusxeyêkî kovare giranbiha ke tanim xwêndewe. Be rastî dilî teng ekatewe û bîrî wuşk helhatu aw dedatewe. Yezdan paydarta bi-kat!

Ewey ziyatir hêwa ebexşet û tèn edat be-tiwana; ew rêgay receddud û tazegiyeyeke kirdûtane be nîşane. Hewel gewahî eme wergirtin û bilaw kirdinewe tîpî (hirûfî) firengî ye. Be rastî bo jiyandinewey kurd û edebiyatî kurdî eme hingawêkî palewanane ye.

Le rojêk da ke cihan le naw şorişî û heray nemanî dinyêkî kon û damezrandinî dinyêkî taze da etlayewe, le rojêk da ke bawerêkî hezar sale legel bawerêkî çend roje da kewtîbiwe zoranzazî û le rojêk da ke sîberî humayûn Êzed û giyanitî pakî Zaratuştra le naw nêzey xwênawî wî rimî sor helgira û Îran zemînî be cî hişt û firîn debû barîgahî asmanî – a lew roje da zimanî kurdî – Avestaî be zulm û zor bergî şêrîn û nazdarî xwoy le ber daketra û cilêkî la'iyey le ber kira ke him pê kem bû û him lê nehat.

Em cile xeyr tebi'î ye legel xwoy da zor ser û sîpalî xiste naw hestî zimanêke man diwe, ahingî şîrîn û dilniwazî "Avesta"y şewand, giyanî zerdestî zwêr kird û bem çesne pereyekî bihadarî tarixî kurdî pêş Îslamî şardewe.

Niyazim niye lem çend di êre da bo tarixî konî kurd bilawnêmwewe we ya zamî dil bikolînêmwewe. Belam eme wey ewende bilêm ke keşfiyatî zimanşinasî û filolocî be tewayî be hemû kes pêşan edat ke ziman kertêk e le hestî me'newî millet, zadey millete û be we nûsawe. Û bew î' tibareke ziman wasitewey derxestînî bîr û hoşî millet e bê guman zimanî her milletêk le terz eda û me'na da firqêkî gewrey heye legel hê [ê] melêtekî tîr. Sereray emeyş tefawutî 'îrîq, muhît û istî'dadî esasî millet tesîrîkî zori heye le pêkhênan û rêkxistinî ziman da. Lem ruwewe hemû zimanêk hendî "karekter" taybetî heye ke le zimanêkî tîr ciyay ekatewe lam wa ye her bûye le zimanî firengî da be tîp (hirûf) elên: "karekter". Kurdî bêçare legel geli şîrî tîr da tîpekeşiyân pê wazeli hêna û eweşiyân bêre-wa nebênî. Şayanî dilxweşî û spas e ke paşê hezar û ewende sal wa hoşî hatewe ser netewey Sasan û Mîdyâ û bergêkî ciwan û be cî bo zimanekeman helebijêrit. Bem munasebetewe du şitim hatûte bîr ke eme wey bi-êxeme ber çawî karbidestanî kovarî xwoşewîst. Le paşî erk û xerîkbûnêkî çend sale yekêk le zimanşinasî qîmetdarekanî kurd – Tewfîq Wehbi Beg – le ser bîney Latînî tîpî bo zimanê kurdî helbijard, elfabetêkî le ser ew tîpe dana û gelê lawanî kurdî Îraq fêrî ew tîpe bûn û êste be kelkî ehênin. Ke çî le serêkî tîr ewe karbidestanî xwoşewîstî govarî Hawar çesne tîpêkî tîryan helbijardiwe ke legel hinekey Tewfîq Wehbi Beg rêk nake-wêt. Aya mumkin niye bo ewey rê be ser lê

têkçûn nedirêt. Komelêkî şareza lem du û-pe wurd binewe, ya yekikiyan helbejêrin we ya yekiyani bixen û be ew terme ûpêkî yek-reng bo zimanê kurdî daynin? Bîrî duwem le babet lehcey Kurdistanî xwarû û serû we-we ye. Herweku carêk govarêkî îngilîzîkî nûsîbû: "Tebî'eteş beramber milletê kurd xedar e" û be mewani'ê tebi'iyê Kurdistan be new'î le yek ciya kirdûtewe ke daniştwanî xwarû le guftugoy daniştwanî serû têna-gat û be tebi'et hal heta le yek têgeyiştin kem bêt dil le dil dûr ekewêtewe û yekbûn giran ebêr.

Lam wa ye pêş hemû ştek wezîfey xwên-dewaranî kurd hewl û teqeladan e bo yek-xistinî lehcekanî zimanî kurdî. Be lay min ew e govarî Hawar etiwane lem babetewe yarmetêkî başî bikat. Weku:

Bêguman le zimanî kurdî da hezaran kelimey wa heye ke le hemû lehcekan da maneyan yek e û ferqiyani niye. Heta bitwani-rêt meqalat bew kelimane binûsirêt ke muşterike û cigelwêş mesela hendî kelimey lehcey Babanî têbixirêt ke mumkin bêt Soran û Botan be qerîne têbigen û dîsan hendî kelimey way Kurdistanî şimalî be kelk bihunrêt ke kurdî cenûb biûwanin be qerîne le manakey halî bibin.

Nûsînî ferhengoke zor kelk e, belam eger manekey be kelîmat muşterike (ye'nî ewaney ke malê hemû kurd e û be taybetî hê lehceyek niye) binûsirêt îstîfadey gelê ziyatir lê ekirêt.

Min umêdim wa ye eger Hawarî xwoşewîst bo mudetêkî munasib le ser em rêgaye we birwa ûsa lehceyekî muşterikî kurdî da-ermzirêt û bo le yek têgeyiştin mecbûr nabên be kelkhênanî zimanêkî ecnebî.

**Pîrot**

## AX KURDISTAN

Hemd û sena bo ins û can  
Bo xaliqê kewn û mekan  
Xasma ko ev new'ê insan  
Daye jê ra eql û ziman  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan ax Kurdistan  
Çiqas selat û hem selam  
Ew bit li ser xeyrê enam  
Hem ehl û eshabê kîram  
Ev e riknê dîne Îslamê  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Heçî kurde mensûb bibit  
Bal xeyrê xwe mel'ûn dibit  
Bi nessê hedîs isbat dibit  
Bêbav û bêqîmet dibit  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Kanî welat bav û biran  
Kanî ew deng ka dilberan  
Kanî çiya kanî zozan  
Kanî ew berf kanî baran  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Heçî welat nahebîne  
Rûmeta wî herhal nîne  
Bal pêxember meqbûl nîne  
Namûsa wî yekcar nîne  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Kesê hubba welat nekit  
Ni'metê xwe wînda dîkit  
Ayet wusan hukûm dîkit  
Ji bo xwe re mehrûm dîkit  
Hubba welat ji îmanê  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Welatê me gul û reyhan  
 Jê têtin her bihna cînan  
 Em pê bûne mest û mestan  
 Hetta ebed axir zeman  
 Hubba welat ji îmanê  
 Ax Kurdistan, ax Kurdistan  
 Herçend welat wek şekir e  
 Halê zozan şêrîntir e  
 Ew şîr û mast hêj xweştir e  
 Bi hezaran jê çêtir e  
 Hubba welat ji îmanê  
 Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Eşqa welat dil şewitand  
 Can û ceger tev peritand  
 Sebr û eqil tevda revand  
 Qeweta pê tevda sitand  
 Hubba welat ji îmanê  
 Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Ah ji destê vê firqetê  
 Ah ji destê vê hicretê  
 Heta kengê vê xurbetê  
 Da em biçin nav milletê  
 Hubba welat ji îmanê  
 Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Ev gotina Suleyman e  
 Ew ji nesla Bedir-Xan e  
 Xudan derd û bê derman e  
 Felek jê re bêeman e  
 Hubba welat ji îmanê  
 Ax Kurdistan, ax Kurdistan

**Suleyman Bedir-Xan, 1911**

Herwekî Qedrî Can di hejmara Hawarê  
 Ha sisyan de nivîsandibû; Suleyman  
 Beg li Şaxê bi destên jendirmeyên<sup>o</sup> tirkî ha-  
 tibû kuştin. Şî'ra jorîn ya wî ye. Qedrî Can

ji ber dizanibû ji me re nivîsand, em jî ji  
 bona şakirina rihê wî li hire belav dikin.  
 Rehmeta Xwedê lê û li malbara wî bit.

**HAWAR**

**BERDÊLK**

*Ji Ebdubcaliq Esîrî Kerkîkî re!*

Ey bira şehbazê ewc î fen û hem îrfan î tu  
 Sed wekî İbn el-Esîrî gorî û qurbanî tu

Tirê xweşxwanê te suhtan can û dil ey kakî xworn  
 Natirwanim ez xwe ragêrim li ber xweşxwanî tu

Bax û bustanî xweş in scyrani lê kirdim seher  
 Cennet ul-me'wa ye şaxek ez rez û bostanî tu

Zab û Dîde avî Xabûr û Firar her la diqî  
 Avê Sûrî û İraq ez kanê Kurdistanî tu

Faris û rom û ereb muhtacê ded û danê min  
 Tacirê dunya hemû muhtacê şuxlê Wanê tu

Dîn û millet herdu fewtan kes li wan nabir xwedî  
 Hiç li xwo hûyari nabin alim û şexanî tu

Daîma cehl û nezani bo xwe isbarî ekin  
 Menfê'et hiç bo me nadin şex û mamostanî tu

Hê tiwanî mekteba min ger serfirazî bibin  
 Dê biji an dewleta Sasan we hem Keyanî tu

Sed Selaheddîn û pêsed wek Ebî Muslim hebî  
 Faîde hiç bo me nadin serwet û şahani tu

Guft û goytî pir xweş e her çûnî fermanî kirî  
 Nisbeta Arî bes e bo 'en'ene w' inwanî tu

Lazim e em hewl bidin bo îttîfaqî Kurdê me  
Buxtî û zazzanî min hem Sorî û Babanî tu

Hêwîdar im go xeta negrin li xwoşwanim çiku  
Ez ne meydan im bilêr ber şêwe û goranî tu

Lê silavan ez dikim daîm li Ekradê Îraq  
La cerem dost û heval û hogir û cîranî tu

Ger meha paizê paşê bê bi xêr û pir xweşî  
Lê hebin pare li nik min dê bibim mewanî tui

Ez Cegerxwîn im li derdan lew li min sotaye dil  
Melhema derdê dilê min lawik û heyranî tu

### Cegerxwînê Kurdi

## RASTIYÊ BIBÊJIN ÇENDÎ KO LI SER WE BE JÎ

### Ji bona Şêx û Melan:

Gelî seydan ezê çend gotina ji we re bibêjim, gerek hûn nexeyidin. Ji rê ve çiman em belengaz in û xelk dewlemend in? Lewra em nezan in. Çiman em gaza çox bi deh mecdîyan dikirin û em gaza şalê xwe bi deh qirûşan nakirin? Weha reng e kirin û firotina me tevde ji me re ziyane, ne kar e ev jî ji destê mela û şêxan tê serê me. Lewra carekê di nav we'z û gorinê xwe de ji me re nabêjin:

– Çiman em nezan in?

Lewra şêx û melayên me rojekê ji me re nabêjin ko ji xwe re dibistan û medresan çêkin. Eger çend medrese li welatê me hene ji dîsan seydayên me ji me re ji "zeyd-un qaîm-un" pê ve nabêjin. 'Ilmê hisab û hendese û felekiyat û hikmet û sen'et tev ji nav

me rakirine. Gelo "zeyd-un qaîm-un" ji me re çi dike? Em şanzdeh salan dixwînin, hêj nizanin erebî mijûl bibin û nikarin çend xebereyan bi erebî binivîsinin û zimanê xwe ji jî bir dikin û nizanin bixwînin. Ev jî ji destê şêxan hatiye serê me!

Çiman em serbilind nabin?

Lewra em wekî xelkê ji hevalê xwe ên belengaz re bi dilxweşî civatan çênakin. Melayên xelkê bi tevayî civat û xebatê ji milletê xwe re dikin, peran dicivînin, belengazê xwe pê xwedî dikin. Em, melayên kurdan ji belengazê milletê xwe dixwun û nadin. Gelo çiman li Ewrûpaê temaşa nakin we ya li melayên Misir û Hindê mêze nakin? Çawan ew ji milletê xwe re dixebitin. Ji Xwedê ne rewaya ko ji vî milletê belengaz bixwun û ji wan re nexebitin. Rojek heye ev nanê wan li me gilî biki. Di wê rojê de, em nikarin cuhab bidin.

Çiman em bi hev re ittîfaq nakin?

Lewra me nexwendiyê. Çiku peyaê xwende heqê hevalê xwe nas dike, wenda nake. Eger lawê gavanekî bi qelema xwe mezin bibî hevalê wî tev ji wî re kêmanî dibînin. Meger lawên axa bin. Ji ber vê yekê belengaz û mezinên di me bi destê neyaran têne kuştin û bi hev re ittîfaq nakin!

Çiman em bê tarîx û kitêb in?

Lewra em gazina ji mela û xwendewarên xwe dikin. Heta nuka ji me re kitêb bi zimanê me nenivîsîne, bi şûn xwe de hiştine. Hind û Efxan û Îran bi zimanê xwe dinivîsînin; çima em bi zimanê xwe nanivîsînin? Gelo zimanê me weke zimanê xelkê nabe we ya em bêkêr in? Zimanê me zimanekî sivik e, çalak e, çeleng e, fireh e. Her pîrsekî di hemberî pîrsê zimanê xelkê de heye. Ji zimanê xelkê siviktir e. Heçî ko bala xwe bidinê tavil bizanin ko zimanê me ji zimanê

xelkê siviktir e û xweştir e. Weha reng e zimanê me sivik û serbilindtir e; wisan e çiman em bi zimanê xwe weke xelkê kitêban çênakin?... Ax, ax tu [çi] bêji li bejna siwarê min tê.

## Cegerxwin

# LI SER YEKÎTIYA ZIMANÊ KURDÎ

— *Le bo Pîrotî xwoşewîst* —

**G**otinê xweyiyê benda "Eksî Sedayî Hawar" gelek rast û qenc in. Di ser wan re tu gotin nînin.

Herwekî me çend caran gotiye yekîtiya milletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî têtê pê. Di yekîtiya zimên de gava pêşîn ji yekîtiya herfan e. Yanî ji bona nivîsandina zimanê millerekî divêt zana û xwendewarên wî milletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabeyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabê bêne nivîsandin.

Ji hejmara pêşîn ve xuyaye ko armanca Hawarê a pêşîn û bingehî ev e:

## Di hertiştî de yekîti

Ev armanca ha ji me re bûye destûr. Heta niho em bi vê destûrê ve çûn, îro diçin, di dawiyê de dê biçin. Wekî niho, kiriyariya her rojname û kovarê ji bona welatê biyanîyan ji cihê çapkirinê girantir e. Lê Hawara ko di hertiştî de meylarê yekîtiyê ye kiriyariya xwe ji bona her welatê ko tê de kurd hene wek hev kirine. Bi vî hawî li Hawarê ziyarî dibê. Ji her ko heqê postê ji bona Sû-

riyê 10 santîm, lê ji bona Îraq û Îran û welatên Qefqasê 150 santîm e.

Lê em pê qail bûn da ko kurd di kiriyariya Hawarê de ji wek hev bin.

Belê em dizanin ko zimanzanayê bi qîmet û hêja mamosteyê giram Tewfîq Wehbî Beg ji bi herfên latînî elfabeyek çêkiriye.

Pey ra rokê me hevdu li Şamê dit elfabeyên xwe ji hev re dan zanîn û ew danîn ber hev. Di navbera wan de ferqin hebûn. Me dil kir di cih de elfabeyên xwe bigihînin hev û ji herduwa elfabeyek nû bibijêrin û belav bikin.

Hingê destbirayê min ê xwoşewîst û giram digot ko hîn ser elfabeya xwe dê bixebitûm. Ji lewra yekirina elfabeyên xwe me avêtibû dawiyê.

Di pey re Tewfîq Wehbî Beg çû Îraqê. Lê teşxelenin nexweş qewimîn ko ji bona herkeşt nas in. Digel vê hindê min jê re çend caran nivîsand, lê li min venegerandibû. Vê paşiyê me zanî ko nivîsarên min negihabûn destê wî.

Ji xwe derketina Hawarê ji bona vê yekê dereng maye. Hawar di meha gulanê de derket. Min ruxseta Hawarê di bîst û şeş çiriya berê 1931ê de girt û karên derxistinê wê di pêşiya gicokê (şibatê) de pêk anibû. Çar mehan ez li hêviyê mam, da ko bi destbirayê xwe ve dest bi dest elfabêke welê derînim ko pêşdetir rê li duyîtiyê vemekit. Lê herwekî min jor ve got li min nedihat vegerandin. Jê bêtir ji min nikaribû ez li hêviyê bimînim.

Ji lewre me dest bi derxistina Hawarê kir û elfabeya xwe ji kurd û biyanîyan re dazandin. Îro di meydanê de tiştêkî çêkirî heye. Kovarek û elfabeyek. Elfabeyek û kovarek. Nik dilê min ji bona îro ya çêtir û rastir ev e ko em hêla xwe bidin û vê elfabeyê heta

hingê ko mehceta edlandinê bikevit pêşiyê  
û rê li me bigirit, pêşve bibin.

Digel vê hindê divêt ez careke-din ji bibê-  
jim ko em hergav meylidarê yekîtiyê ne û  
armanca xebata me yekîti ye. Em bi gavinin  
bi vîn û hişk ber bi armanca xwe ve diçin û  
nasekinin. Ji ber ko destpêkirina me ji xwe  
bi derengî ketiye. Em nema dikarin di hêvi-  
yê de bisekinin.

Gelek sipasan li Pîrotê delal dikim ko ev  
hinceta ha xiste destê min.

### **Xweyiyê Hawarê**

#### **Sîtûna Nûgihîştîyan:**

## **DILÊ MIN PIR DIŞEWITE**

Herê lê. Herê lê zeriye, ezê nexweş im nex-  
weşê nava cîyan,  
serê min evdalê nasekine li ser balgiya,  
dermanê min rebenê Xwedê ketiye qulê  
derziya,  
kesekî xwedanê xêran tunine bi destê min  
bigre min bavêje ser rêkê av anîyan, yekî  
xwedanê xêran derdê dil ditûbû, bi destê  
min girû ez avêtim ser rêkê av anîyan,  
min ê bala xwe didayê ji wê da tèn cotê du  
zeriyan,  
yekê ji wan zeriya got feqîro ev çî hal e tu  
rêdayî,  
ya dinê got lêlê porkurê ma tu nizanî ne ta-  
wî bû ne bawî bû, derdê kambaxê dil çetîn  
e bûye ba ketiye van hestîya,  
yek ji wan zeriya seba xêra xwe bi ser mi da  
xwar bû, minê kirî ez herime tewafa xala  
rûya;  
ji şabûna destê min kete hillî û morî mirca-  
nê ustuya,

hillî morî mircanê ustuya bi ser min evdalê  
Xwedê da diqetiya.

Vê zeriye îsmekê li min xwandî ez kirime  
morî avêtime nav inciya,  
şeva nivê şevê bû ez bi xwa ve hatim, ez û  
keleş gewra xwe ketin kêf û henek û laqirdi-  
ya,  
minê nizanîbû pîrekê di mal da hebû sî û  
sih diranê pîrê hebû, hersî û sih diranê pîrê  
ji dêşiya,  
hetanî sibê alî bi alî parxan bi parxan welê  
digeriya,  
weyla bê pîrê kelbê kezabê şeytanê fesadê fi-  
nûnê mel'ûnê: sibê şebekê [şevqê] rabû bi  
taxê da meşiya,  
keyf û henekê min [û] zeriya mina delalî ki-  
re dengî avête nav gundiya.  
Gundiye malşewitî kirine cirmekê mezin  
avêtine ustuyê me herduya:  
De wayê feleka malşewitî bêbext e bi me re  
nayê.  
Ez kor im ez kor im ez kor im, çû dewra  
Selaheddîn Sultan e,  
hatî dewra mûvan e,  
hûn rabin gelî kurd û biran e,  
em şera bikin li ser van dijminan e,  
dijmin dibêjin: "Kurd bexwedî mane",  
hûn bizanin em bi xwedî ne,  
xwediyê me Bedirxanî ne,  
em ê hildin evda [heyfa] Şêx Se'îd, Şeha-  
beddîn e.

### **Selaheddîne Serhedî**

#### **JI PISMAMÊ MIN WECDÎ CEMİL PAŞA RA**

**P**ismam weqta va benda te ko li Hawarê  
nivîsandî bavê min ko dixwend eşîra  
mey Berazan li dora bavê min pir rûnişti-



bûn bavê min jî bi dengekî zîz dixwend min bala xwe dayê hem bavê min hem jî civata wî hêstir ketine çavê gişkan e. Pismam ez jî weke te kurdekî kiçik im weke te ez jî pir li Hawarê hiz dikim. Hin caran di ciyê xwe da dixwînim. Xew min dixerbulinî sibe da hişyar dibim ko hin Hawar di destê min da ye. Tê bala min ko êvarê min xwendiyê. Ez di xew va çûme dîsa dest bixwendinê dikim li ser vê benda te ez û hevalên min em giş hişyar bûn me bi hev ra got: "Gelo mêzêkin Wecdî jî fena me kurdmancêki kiçik e lê bendek çiqas xweş nivîsandiyê". Ez jî weke te dibistanê biyaniyan de dixwînim, belê pismam ez jî tucar jê xweş nabim ji ber ko ne bi zimanê me ye. Ez hin kiçik im emrê min neh (9) û deh (10) in, weke te nikarim xweş binivîstinim, va pirsin ko min nivîsandî jî di rûpelê Hawarê da ko min benda te xwend jî gotinên te û kêfa min hat va pirsina min nivîsandin. Ev hişyarbûna min û hevalên min dîsa di ruyê kurdmancêkiçik ê mîna te ye. Paşê herdu çavên te maç dikim pismam.

Lawê Mirê Berazan: **Fewzî Mustafa Şahin**

### **Ji xwendevanan re**

Hawar Hawara te ye  
Deng û gaziya te ye  
Heke te Hawar divê  
Ari Hawara xwe ke

### MEŞHEDA ÎBRETÊ

– Şêx Evdrehmanê Garisî çû rehma –

Melayê min û Şêxê min melayê erdê Kurdistan  
Şehîdê erd û ezmanî şehîdê Gozge û Botan  
Ji bo millet; ji bo kurdan; feda bûyî, tu qurban î  
Şehîdê eşq û îman î; şehîdê rezm û mêranî  
Welatê te, melayê min, welatê pak, Kurdistan  
Ne Gozge bû, ne Şernex bû, welatê te, ne jî Botan  
Ji bo namûs û camêrî, ji bo millet feda bûyî  
Ji mîrên te, ji mêrên te, ji nişka ve cuda bûyî  
Riya millet û dinê de, bi mêrxasî tu bûy qurban  
meqamê te bihuştîne, bi emr û gotina Qur'an.

Di ezmanê umîdê de, tu bercîs bûy tu kewkeb bûy  
Ji bo yar û ji bo dijmin, ji bo kurdan tu bêkerb bûy  
Riya dîn û welatî de qelemkêş bûy û şûrkêş bûy  
Ji bo millet ji bo kurdan bi ezm û rezm ji cih rabûy  
Ji bo laşê te Şêxê min mezar e axa Kurdistan  
Dinê tîrba te Şêxê min û gorna te dilên mîrani.

Ji bo kurdan ji Gozge ew peyamek xweş diyarî bû  
Bi mêranî û camêrî bi hertiştî dikarîbû  
Ji bêbextî me safî kir, ji bêbextî xulam in em!!  
Ji bêbextî perîşan in, û bê dewlet zelam in em!!  
Çeleng bû mêr û jêhatî, bi tevdir bû û jîrek bû.  
Bi nav û deng bi xwîn û reng bi hertiştî mubarek bû.

Bi şewrê te bi pîrsa te bi 'ilm û ref'et û xîret  
Tu bûy rêber û tîrba te hemî reh meşheda îbret

Birîndaran te derman kirin birîndarek tu koştî ax!!  
Ji nû ve hêstir û matem ji nû ve can û dil kambax!!  
Bi mêranî û gernasî tu bûy seyda tu bûy rêber  
Delalê mêr û camêran delalê Rebb û Peyxember.

Bi mala te, eşîra te hemî millet birîndar in  
Girîn û ax û zarîn e, girîn û ax û hawar in  
Tu seyda bûy, tu bûy bavek tu bûy gewre tu bûy armanç  
Feqîhên te birîndar in, birîndar in hemî kurdmanç  
Ji nû ve şahiya dijmin, ji nû ve gur û seh şa bûn  
Bi tîrba te, lê Şêxê min hezaran kurd ji xew rabûn.

Tu al î, gewre yî ey Şêx, tu roja hêviya millet  
Tu al î, gewre yî ey Şêx; tu kanî bûy ji bo hîmmet  
Tu al î, gewre yî ey Şêx tu tîrba qudsiya kurdan  
Bi zanîn û bi camêrî dê rabe êdî Kurdistan.

Mirina te û penda te vejînin milletê kurdî!!  
Feqîhên te peyayên te bijînin milletê kurdî!!  
Tu al î gewre yî ey Şêx hişê mîr û feqîhan bûy!!  
Serê te j' axa Kurdistan rihê te j' axa Botan bû

Tu al î gewre yî ey Şêx tu ala meşheda kurdan  
Tu pelgê zîv û zêrîn î ji dîroka dilê xortan  
Tu dîroka şehîdan î tu serborîna Kurdistan,  
Sibê qurbana Şêxê min dibin sed destên Cengiz Xan.

Delalê axa kurdan î delalê axa Kurdistan  
Tîmûrleng qet nekir wisan nekir wisan jî Cengiz Xan  
Tu sultanê dil û çav î, tu sultanek hunerwer bûy  
Bi şûr û 'ilm û şîranî tu seyda bûy tu rêber bûy  
Melayê min bibêjim çi ji pîrsan pîr mezintûr tu!  
Melayê min bibêjim çi ji canan pîr mezintûr tu!  
Tu çûyî pîr jê sêwî man, dilê millet jî ma bate!!  
Melayê min bibêjim çi dilê min bûye tîrba te!!

**Diktor Kamiran Ali Bedir-Xan**

## SÎNOR

Kurd e dezanî le ko cîgir e xizmanî tu  
Go ger e bo te bilêmlê cîgehê xêlanî tu  
Kêwê Ter[s]ûs û 'Emeq hewze Îskenderûn  
Xerbiye ta Behrî Reş sînore meydanî tu  
Behrî Reş û Erdehan awî Aras e bizan  
Heddê şîmal e eme bo kuç û colanî tu  
Ehlî Wan û goli Ormî ta serê awî Aras  
Sînori rojhelat e hibûke û keywanî tu  
Hewaz û Kêwî Hemrîn Jengar û rê Misêbin

Sînore bo cenûbî baxçe û baxanî tu  
Le nawî em sînore diwanze wîlayet heye  
Delên diwanze milyon nifûsê kurdanî tu  
Haşa dirû ye û te ra nifûsiyan nenûsra  
Degate bîst milyon binûsray qewmanî tu  
Le derye em sînore le Enqere w Xurasan  
Bilûs û Ezirbaycan le wêşe xizmanî tu  
Ey wetenê xwoşewîst nawîm ew ca ke bîst  
Mindalêkî sawe bûm debûme qurbanî tu  
Witey welatê kurd e le ser ziwaniyê wird e  
E êrey em hale te delîlî îmanî tu

Min Mela Ebdulxalik Esîrî şa'irî kurdan  
im em xezeleke be xelet û pelet û natiwaw  
le axirî "Şerefname" de derc kirawe bi nawî  
Hacî Qadirîwe. Hê Hacî Qadir niye hê  
min e. Lawanî kurdî Kerkûk û Suleymanî û  
Koyê agayan le mehe le çapderî Şerefname  
le me daxtay niye. Tehqîqeman kird karê  
kiye. Ewanîyawey xome we lem meceley  
"Ronakî Hawar" le çap dira herkesî le lawanî  
Kerkûk û Suleymanî Koyê wesîqeyekî  
heye ke Hacî Qadire binûsî bo îsbatî amadem.

### Seyid Huseynzade Ebdubraliq Esîrî

**W**ekî ez li Misrê bûm Rojekê Muhammed Elî Ewnî Efendî ê Sêwerekî hate nik min û ji min re got:

– Ferecullah Zekî Efendî dil dike Şerefnameyê ji nû ve çap bike. Pê re nûsxeke çapnîvîs heye ko di sala 1860'î de di Petersburgê (û li ya Mînof Zerînof) daye çapkirin. Nik min ji nûsxeke destnîvîs heye ko min di kitêbxana Helebê de li ber nûsxeke din nivîsandibû. Em ji te hêvî dikin tu ji bi me re bixebitî û arîkariya me bikî. Bi te re Şerefname bavê te heye. Em dil dikin van hersê nûsxaan dênin ber hev û ji van hersisêyan nûsxeke durust derînin.

Min tavil herê kir û me dest bi xebatê kir. Pêlekê borî. Hin hevalên ko li Sûriyê gehabûn hev ez vexwendim Sûriyê, min Şerefname bavê xwe ji wan ra hişt û hatim Sûriyê. Muhammed Elî Ewnî Efendî ji dût ve ji arîkariya min dixwest lê rê pê nediket, destê min nedigîha.

Rojekê çend şîrên Soranî ketine destên min dibin hemîyan re li şûna îmza herfên "Z. Ş." hebûn. Tê de yek hebû ko li ser tixûbên Kurdistanê bû. Sernama "Xezelî Şêx Evd el-Qadirê Koyî" heldigirt. Jê re gellek kêfa min hatibû. Hingê Muhammed Elî Ewnî Efendî û Şerefname hatin bîra min. Min di dilê xwe de digot: "Ev li Şerefname têt" û cih de min ew li hev tewand û bi nivîsarekê ji Muhammed Elî Ewnî Efendî re verêkir ko bixin Şerefname. Min dixwest ko bikeve pêşîya Şerefname, lê xistin paşiyê.

Berî du hîvan Muhammed Elî Ewnî Efendî hatibû Şamê û çend rojan bûbû mêvanê min. Di wê çendê de ji Elî Ewnî Efendî re ji Misrê ji Ferecullah Zekî Efendî reş-belekek hat. Tê de reş-beleka Seyid Ebdulxaliq Esîrî efendî ji hebû.

Hingê xuya kir ko ev şî'ra ha ko nîshet bal Evd el-Qadirê Koyî ve (rehmeta Xwedê

lê bit) hatibû kirin ne ya wî ye û şîra Evd el-Xaliq Esîrî ye. Vêca min biserhatiya qesîda sinorê herwekî li hire gilî dikim ji Elî Ewnî Efendî ra got. Ewî jî ji Evd el-Xaliq Esîrî re nivîsand. Ji û pê ve ez li kaxizên xwe ên kevn geriyam û şîrek ji wan şîrên ko îmtza "Z. Ş." hildigirîn peyda kir û da Ewnî Efendî. Ewî jî ji Evd el-Xaliq efendî re şand. Vêca xuyaye ko ew "Z. Ş." pê listiye û em şaş kirine, lê rastî bi derengî bikeve ji rojekê xuya dibe. Herwekî di vê mesele de jî piştî sê salan xuyabû.

Em ji Evd el-Xaliq Esîrî Efendî hêvî dikin bila li me megire. Ji ber ko me diviyabû em şîra wî belav bikin ne ko navê wî ji şîra wî bidizin. Mekir û avan di "Z. Ş." de ye. Ev mirovê ha ji bona me nenas e. Heke Evd el-Xaliq Efendî nas dike bila lê bigere.

Ev jî mesela Hafîzê Şîrazî jî pêşdetir çû. Hafîz carekê di civatekê de rûniştibû. Yekî şîrên wî dixwendin û digot: "Ez Hafîzê Şîrazî me" Hafîz ser ve gotinê rabû ser xwe û ji civatê re got:

Min dizê şîran dîtibûn lê hêj dizê şîran nedîtibûn.

Mêrikê me şîr jî dizîn, şîr jî dizîn, xweyiyên nû jî afirandin.

### Xweyiyê Hawarê

## ŞEHÎDÊ GEWRE

*Şêx Evdirehmanê Garîsî çû rehmetê*

Rohilat heta roava  
Mala Xwedê hezar car ava  
Xelk pîr bûn iro bûn zava  
Ko bikin ji şêrê girtiye dava  
Şêxê min tu yî şehîdê millet  
Şêxê min tu yî, tu şûrê hîmmet

Şêxê min tu yî, xweyê seadet  
Şêxê min tu yî, tu çûyî bi rehmet

Bo jina milletê kurda  
Te hîmmet kir hemî erda  
Te tov kir paş xwe ve derda  
Heye carek li me peyda

Şêxê min sibe şefeq da  
Şêxê min çî ye li me peyda  
Şêxê min ez im pepûk li derda  
Şêxê min ji te re reş girêda

Em navê te dikin ala  
Li çîyan û nivê nala  
Tu bi cejna di her sala  
Tu radibî ji nav ava çala

Şêxê min sibe xuyabû  
Şêxê min girî l' me rabû  
Şêxê min jîn nemabû  
Şêxê min pîrsa te rabû

**Mustefa Ehmed Boti**

## XELÎL RAMÎ BEDIR-XAN

Di sêzdehê vê hîvê de, di roja pêncşemê, berî nivro saet şeş û nîva de Xelîl Ramî Bedir-Xan, li Beyrûtê di xaniyekî du mezelîn û yek tayîn de çû rehmetê.

Xelîl Ramî Beg ser xwe bû. Hêj nekerîbû nav cihan. Li ser kursiyekî rûniştî qehwa sibehê vedixwar. Ji nişka ve di xwe re çû. Xelkê dora wî welê bawer kirin. Lê di rastiye de dilê wî ji bona Kurdistana xwe nema lê dixist.

Emrê wî gihîştibû dora heftêyî. Xelîl Ramî yek ji kurên Mîr Bedir-Xan ên paşin bû. Nimînendeyê nîşekî welê bû ko libatên



(azayên) wî gelek kêr bûne. Ew çend ko belku îro tevda nagihin çaran jî.

Ji ciwaniya xwe ve dilê Kurdistanê, paleyê serxwebûna welatê xwe bû. Beriya niho bi çil û pênc salan digel birazyê xwe Evdîrezaq Beg - ko bi emir jê mezintir bû - derbasî Kurdistanê bûbû. Ji Kurdistanê Îranê ketibû dora Colemêrgê. Li wê herdu jî xwe dabûn dest û ketibûn zindana Sultan Ebdulhemîd.

Di sala hezar û nehsed û nozdeha de mureserîfê Melatî bû. Bi du birazyên xwe û hevalên wan dabû çiyê. Di pê re wek hemî kurdên welatî jî Tirkîyeyê derketibû hatibû Sûriyê. Heta paşiyê, emrê xwe li Şamê û Beyrûtê borandibû. Dil dikir li Şamê ber caxên tîrba bavê xwe bimire. Lê Xwedê jê ra hiz nekir. Li Beyrûtê çû rehmê û li rex birayê xwe - Xalid Beg Bedir-Xan - hate veşartin.

Rehmê ji zimanê xwe pê ve bi tirkî, erebî û farisî jî dizanibû. Herçend tirkî rind dizanibû jî lê ji awayê axaftina wî xuya dikir ko tirkî ne zimanê wî ye. Ji ber ko zimanê wî lê qenc neşikiyabû.

Xelkê dora wî ev jê re digotin. Nedienerî, lê kêfa wî dihat û ji wan re çiroka hînbûna tirkîya xwe gîlî dikir:

- Wekî ez deh salî bûm, min nû dest bi Tirkîyê kiribû. Birayên me yêr mezin ji me kişikan re digotin: "Êdin divê hûn jî hînî Tirkîyê bibin". Carekê em li ser taştîyê bûn. Evdîrezaq Beg li rex min rûniştibû. Çênîkî goşt ji destê min ket erdê. Min dil kir ez bi tirkî bibêjim. Hîn tê bîra min çawan min xwe da fehm kirin: "Goşt duşdî ser kulav" ev digot û ji dil dikenî. Xwedê gunehên wî bixefirîne û rehma xwe lê bike.

## HAWAR

## TABÛTA BIXWÎN

*Şex Evdîrehmanê Garisî çû rehmê*

Li erdê dinêrim dilopên xwînê  
Didime ser şopê çî bibînîm ez  
Dar û ber, kevir û kuç giş dikin şînê  
Bê hemdî canê xwe diqîrînim ez

Tabûtek di nava ewrekî bixwîn  
Melekan kişandin ezmanê jorin  
Tîrsekê da ser min libitîm ricîftîm  
Ber çavê min reş hat dilborîn im ez

Ew tabût, tabûta Evdîrehman bû  
Ser dinya derewîn ew yek mêvan bû  
Ger terkî heyat bû, cennetmekan bû  
Bi rehma wî şa bin hemî kurd û ez

Lê sed heyf ji bo te ey Rehman Şêxim  
Çiqasî kurd hene ji bo te bêxim  
Têlekî gaziyê, û lêxim (û) lêxim  
Ew hawar hindik e jê têr nabim ez

Şehadet, me nedîr wisan bi îbrer  
Cîneyet, xîyanet wisan bi rîqqet  
Ji bona mirovê xwedanhemîyyet  
Tarîxa roja te şîn! Qeyd dikim ez

## Qedri Can

## Diktor Ehmed Beyreqdar

Di bîst û çarê vê mehê dê, roja duşembê piştî nivê şevê ji kelata zanîn û hunerê aleke nûbar û rengîn berbijêr bû û ket axê.

Herê, diktor Ehmed Beyreqdar, ev xortê delal û hêja ko derxika jîna wî hêj bîst û pênc bihar nebihûribûn û şax û pelên wî

tenê bîst û pênc caran bişkivî bûn piştî nexweşiyêke xedar û rencûr - ko sê mehan ajo-tibû - çavên xwe li xwe girtin û ket rêya ax-retê.

Diktor Ehmed Beyreqdar bi heyina xwe ve ji me re bû jînekê kin, derdekî dirêj, canekî-kîçîk, birîneke mezin, û çû. diktor Ehmed Beyreqdar nemaze ji kîsî taxa kurdan çû. Ew taxa stewr ko berî sed salan li raserî Şamê hatiye danîn, heta niha ji me re tenê du bijîşk dabûn: Diktor Muhemmed Xidir Beg Alarşî - Xwedê emrê wî dirêj bike - û rehmetî diktor Ehmed Beyreqdar.

Diktor Ehmed Beyreqdar ji eşîra Bera-zan, berî herîştî û digel herîştî kurdekî pak, dilxurt û xwedan bext û rûmet bû.

Heçî ew nasdikirin tenê carekê ji ew dîtî-bin ber mirina wî ketin, şîna wî girtin û re-şa xwe girêdan.

Ji zarûtî û lawîniya xwe ve bi xebat û xwedan şeref û rûmet bû, xebateke zor di-xebitî ko li pêşîya heval û hogirên xwe be. Rûmet û himmeta wî nedihîşt ko kes li pê-şîya wî bibe.

Di lawîniya xwe de di taxê de rûdinişt. Sibê bi bangê ve radibû. Cilên xwe werdi-girtin û dida rê. Pîrî car xurîniya xwe jî ne-dixwar. Diya wî a rehmetî gazîndan lê dikir û jê dipirsî:

- Çîman lawo bêxwirinî diçî?

Ehmed lê vedigerand û digot:

- Yadê ditirsim dereng bimînim û bajarî berî min xwe bigihînin dibistanê.

Bi vê vîn û xebatê ji dibistanên techîz û sultanîyê yekemîn derket û ket tibbiyê. Di tibbiyê de jî zûka xwe da naskirin. Ket rase-rî hevalên xwe.

Li veşartîna wî ji herêzê xelk hatibûn. Mamoste, heval, nas û hevpişeyên wî tevda pê ra rawestîyan.

Jê ra ji wî xortê delal û çeleng ra çeleng,

gul û kulîlk anîbûn. Tabûta wî kiribûn nav kesrewan.

Tabûta wî bi rê ve, di ser piştî û milên he-valên xwe re hêdî, hêdî diqeliqî, çend caran derxwîna tabûtê vebû. Te digot, Ehmed di bin rê tam diditê. Herê tam dida, derxwîna tabûta xwe vedikir, ji bona mirinê bi gelekî ciwan bû. Çavên wî li dinyayê mabûn, ew dinya ko hêj jê ra bi tevayî nenas bû. Des-tên wî jê nedibûn, dil dikir derxwîna tabûta xwe veke, xwe zer ke bikeve ser lîngan û li jînê vegere. Lê heyhat! Mirin dest dabûyê, êdin veger nebû... Li rêke welê ketibû ko mirov bêhemdê xwe dikevê û bihemdê xwe ji nikare derkeve. Wekî tabûta wî giha serê gir, ket hawîra Şêx Xalîdê neqşebendî, hil-girtiyên wî ew danîn erdê, xelk li dora wî rêz bûn. Bi saetan vegotin û gotin, giriyan û giriyanandin. Herê jê ra heyf bû.

Ma çawan heyfa mirov jê ra nayê, ma çawan mirov ber mirina wî nakeve... Îmtîha-na xwe qedand, diktor derket ko nexweşan derman bike, wan nehêle zû zû bimirin. Lê mirinê bi têhna wî girt û sê mehan ew eşand, ne ew bi xwe, ne hevpişeyên wî nik-ribûn vî arîkarê nexweşan vî berberê mirinê derman bikin, û ji destê mirinê xelas bikin.

Ma çiqas zû? Çiqas bilez dilê mirinê lê bi-jiya. Panzdeh salan pê de ajot, çand û tov kir. Wextê durîne hatibû. Das bi destê xwe re, ketibû zeviya xebata xwe lê mirinê nehişt ko berxûrdarê xebata xwe bibe. Bêndera xwe rake û li ba bike, jê hebekî an diduwan bixwe.

Hêj şehadetname xwe nesitandibû, ne ki-ribû bêrika xwe jî. Heqê wî da herîştên wî pêk anîbûn. Nexweşiyê lîngên wî birîn û ew xistin nav cihan. Ev resmê ha li şehadet-nameyê bihata zeliqandin. Efsûs... wek di-yarî û bireke paşin li rûpelên Hawarê ket...

Ey xortê delal û hêja me tu siparî mihri-

van. u dilovaniya Yezdanê pak. Te dinya ji  
xwe re û dost û nasên xwe re reş kir, Xwedê  
axreta te spî û ava bikit.

## HAWAR

Ji lewra ko Diktor Ehmed Beyreqdar ji  
Kurdmancên Şamê ye bivênevê xelkê Ta-  
xa kurdan bi vê bendê eleqedar bibin. Tê  
de pirsin hene ko ji bo hemiyan nenas in.  
Ber vê yekê me ew pirsên ha jêr ve bi erebî  
îzah kirine

kelat: qel'e

al: 'Elem

derxik: nesbet

jiyîn: 'heyat

rencûr: mihnet

nemaze: xasseten

stewr: 'eqîm

tax: 'hey

bişîşk: tebib

mamoste: ustaz

rûmet: şeref

hevpişe: zemil

wergirtin: el-lebs

pirbicar: 'ela el-ekser

dibistan: medrese

vîn: îrade

hawîr: muhit

efsûs: weyl

mehrîvanî: er-rehm

dilovanî: eş-şefq

## ZARÎNEK

Agir bi Kurdistanê ket  
Lewra dikir Hawar e dil  
Sed bax û sed bostanê ket  
Manendê bulbil jar e dil

Pêtek ji Kurdistanê hat  
Mêlak û cergê min dipat  
Eman welat eman welat  
Bawer bikin xwûnwxar e dil

Bawer bikin ey yarê min  
Haval û hem guhdarê min  
Hergav û herêvarê min  
Naxweş û hem bêzar e dil

Bêzar û pir naxweş e ew  
Kincê siyahgûn poş e ew  
Geh sine geh seydoş e ew  
Geh Heyderê Kerad e dil

Geh şah e ew geh bêkes e  
Geh kurd e ew geh faris e  
Geh berber e geh çerkes e  
Geh türk e geh tatar e dil

Geh Rostem e geh Hatem e  
Geh padişahê Deylem e  
Bê yar û dost û hemdem e  
Lew mest û gerdexwar e dil

Geh çol e geh zozan e ew  
Geh Dêrik e geh Wan e ew  
Geh şaxeke wesatan e ew  
Geh Mûş û geh zinar e dil

## Cegerxwinê Kurdi



### GAZINDA XENCERA MIN

*Ji ustadê min ê xweşewist û bêja Tewfiq Wehbi beg ra*

Ji zû ve ye min lê nenihêrtibû. Di ser banê kitêbxana min re; di quncikeke tarî û bi toz, tanişkî û xwêl hilavistû bû. Kî zane ji kengê ve min ew nekiriye destê xwe. Pîrhevokên mezela min di ser wê re tevnên xwe ristine. Ji jor ve lê fedikrin, carinan datînin, di ser qevda wê re diçin, şopên xwe dihêlin û hildikişin hêlinên [konikên] xwe. Berî çend rojan qelema min keh [ko] bûbû. Min ê ew tûj bikira. Li kêrika xwe geriyam, neket destê min. Min çavê xwe li dora xwe gerand û li tiştêkî digeriyam ko bikare qelema min tûj bike. Çavê min bi xencerê ket. Rabûm ber wê ve çûm. Wekî min destê xwe lê dirêj kir, pîrhevokên dorê bi min, bi biyaniyekî hisiyam, lingên xwe ên kevcalîn, di ber serên xwe re borandin û heryekî bi alîkî ve bazda.

Xencera min a jengîn ji kalanê xwe bi zorê, wek dengêkî nexweş derdiket; dixurî û dikehî. Ew çend jeng girîbû ko min ew kir nav kaxizekî û firikand, jê tozeke zêrekevn difûrî û difirî.

Min qelema xwe da devê wê. Nedigest ne jî jê dikir. Di nav destê min de asê bûbû. Dil nedikir ko bi vî rengî xizmeta min bikit. Min xencera xwe kir pêşiya xwe û lê nihêrt.

Jenga wê bi nivî bûbû. Bi rengêkî nîvsor dest bi çirîsinê kir, hin bi hin rengê xwe guhart û yekcar sor bû, sorekî xwînsor. Hingê min zanibû ko xencera min ji min xeyidiye. Dixwaze gazindan li min bike. Min ew dîsan bir destê xwe û jê re got:

– Xencera delal, te xêr e, mebit ko tu ji min xeyidî bî, ma min çî bi te kir ko tu ji min bixeyidî?

Zimanê xencera min geriya, li min vegevand û bi dengê xwe ê foladîn lê sitemkar û ziz got:

– Ma lê, ji te xeyidîme, ma çawan ji te naxeyidim. Te ez avêtim nav kitêb û kaxîzan, te ez kirim hogir û hevala bermayên qaşûlên dar û qirş û hevsera caw û potikên zibilgehê. Ne li min dipirsi, ne jî li min dinihêrî. Heta niho min deng nedikir, min xwe di dinyayê de tayhebûyî dihesiband.

Lê êdî min nikaribû ez xwe ragirim. Belê nema dikarim, ji ber ko tu dixwazî min bêxî şûna hesinê solingen û bi min qelema xwe tûj bikî, pelên kitêbên xwe vekî. Tu dixwazî barê keran bikî piştî şêran.

Ez ko polayê esil, hesinî dibanîm, pêşiyên te ez dikirim perasuyên mêr û mêrxas û gernasanan û ez bi goşt û dil û cergî bi xwedî dikirim, tu dixwazî min bi dar û qaşulan bi xwedî bikî û şiv û taşîya miñ wek kerekî ji zil û ka bî. Nene min hirçî bihêle û wan qirş û pelên hişk meke devê min. Ez ne çarlingê giyaxwur lê şêrê goştixwur im.

Belê ez xencera duban, folayê nêrîz, tu min davêjî nav kaxizên reş û belek ko ne ew

bi min ne ez bi wan dizanim.

Belê dizanim îro ketî pê nivîsandinê, pê sehîtiya kurdmançiyê. Ji sibê heta êvarê carinan heta nivê şevê û yek carinan heta qere berbangê bi pîrsekê, nivîrsekê mijûl dibî. Heke mê ye heke nêr e, heke nav e, heke pironav e, an veqetandek û hevghianek e. An ne di eslê xwe de kurdî ye yan ne ji zimanekî din hatiye girtin û pêşdetir hatiye kurdandinû welê por û pirç û simbelê xwe sidpî [spî] dikî. Di salekê de deh salan dijtî û li raserî emrê xwe di biharê de berfa zivistanê didî barandin. Lê belê kêfxweş î û di dilê xwe de dibêjtî ez ê milletê xwe bi xwendin û nivîsandinê, bi vê kurdmançiyê vejînim. Milletê min dê bibit xwedan kitêb û xwedan zanîn û welê bigihêt miraza xwe, dê bibit serxwe û kama xwe bizanît, bibit kamiran. Xelk nema dê bikarin bêjin ko zimanê kurdan nîne. Zimanê wan tenê zimanê axaftin û dan û sitandinê ye. Lê dê bibêjin kurd ji wek xelkê xwedan ziman û xwedan kitêb in û zimanê kurdî zimanekî hêja, dewlemend û tekûz e. Kurd milletekî kevn in û dahatiyên Medan in.

Herê te daye pê Ehmedê Xanî, tu dixwazî ko wî karê ko Xanî nebinû serî tu bibî serî. Ewî gotibû:

Da xelk nebêjîtin ko Ekrad  
Bê me'rifet in bê esl û binyad

Tu dixwazî ko bête gotin:

Xelk tev dibêjîtin ko Ekrad  
Bi me'rifet in bi esl û binyad

Ji lewra ji bona vê yekê te ez avêtim piştguhê xwe, te ez ji çav û dil dût xistim, te ez kirim zirtexana pîrhevokan, ew kêzikên bê

çerm û goşt ko heroj di ser min re baz didin, çivan didin xwe û dikin min di bin tevn û şopên xwe de binixumîn û qeşêrin. Lê nabit, tu tîşt, ne ziman, ne xwendin ne nivîsandina te bêyi min naçe serî. Bidî eqlê xwe heta niho tu û milletê xwe hûn çawan mane, çawan we zimanê xwe winda nekiriye û îro dizanin pê biştexilin. Heke ez nebiwama ji zû ve te û milletê te we ê zimanê xwe winda bikirana.

Ji xwe çend caran, ma dil nekirine zimanê we jêkin. Zimanê we berî hezar salan zimanê dirê [dêrê?], zimanê hukûmetê bû. Ji hingê ve pê diberizin, hezar carî pê ketin. Hercar ez li ber we sekinîm û min zimanê te parast, lê ne qelema te.

Heke ji min ne bawer î li dora xwe fedikire, tu wê bibînî ko herçî ji min dût mane, hatine ketine bajarên zimanê xwe winda kirine û îro nedizanin bêjin "lo!" ne ji "lê!". Ji ber ko peyayên bêçek wek mirovên bê neynok in, kêç ji bi wan dikarin. Ji lewra ez benî qedrê min bizane, ji min dût mekeve, min ji xwe dût meêxe û bi min ne qelema xwe lê parsuwên dijminên xwe jêke!...

Xencera min li hire gotina xwe qedand. Min dil kir ez lê vegeînim. Lê nedixwest ji min bibihîze, rabû ket kalanê xwe, xwe ker kir û guh neda min.

**Celadet Ali Bedir-Xan**

## EM ÇIMAN BI ŞÛN DE MANE

Hûn zanin ko di weqta Ebdulhemîd da di nav kurdmancan da alayê Hemîdîyan çêkirin, çiqas reîsê eşîran hebûn giş kirine zabit, şûr lê girêdan û bi zabitî ko çend

peya bikuştta hebis nedibû. Çiqasa talana xelkê banîna tiştekek lê çenedibû. Talan kuştin ma ji ku da danîn? Tebîî ji kurdman-can dikirin bi xwe bi xwe ji hev du dikirin hûn zanin di bin hukmê Romiyan da tu millet ji milletê kurdmancan mezintir xurtir nîn bû. Romî ditirsiyan ko kurdmanc îttifaq bikin yek, istîqlala xwe bistinin. Çawan yekî wê çaxê bi zorê tiştekek nikanîbû bikira, anî va Hemîdiya danî ko vana bi xwe bi xwe bi hev kevin, hevdu bikujin talan bikin ko îttifaqa wan nebe yek.

Ji we ra sebebê wê bibêjim. Hûn hiro dibinin ko zabitê nexwendî heye, yek ko kanîbê bi zabitê bê dibê kî panzdeh, bist salan di dibistanan da bixwînê, hingê dibî mûlazim. Feqet Alaya Hemîdiyan himan di ciyê xwe da dibû paşa û qaymeqam, bi yek başî. Bi vana dîsan karîbûn van rutbana bidina ko fikrê Romiyan heba kanîbûn di nava Kurdistanê da bin, li herderî dibistanê danîna zariwên wan bidana xwendinê, ev zarûna paşê kanîbûn bi zabit û qaymeqam û paşa bûna, lê nekir ko wanî bixwendina hobi-bûna. Ji Romiyan ra çenedibû hîro wê istîqlala xwe bisitandina. Ji ber vê yekê dibistan dananîn û Hemîdî çêkirin. Hûn zanin wan zabitê Hemîdî gişkî nexwenda bûn.

Li ser nexwendina wan ji we ra meselakê bibêjim:

Li deşta Sirûcê sê Alay hebûn. Alaya eşîra Bijan hebû, di wê alayê da du zabit hebûn vana herdu ji min dîn. Yek menla 'Îsê bû yek ji Ehmê 'Îsê Henûş. Qaymeqamê wan meaşê wan distand nedida wan li ser vê yekê herduyan bi hev re gotin: "Ma çima meaşê me nadine mehbûsî hene (meqbûz) mutfîş (mufetûş) haû em ê herine cem ko meaşê me bidine me. Na ko nedane me em ê herine zirgêli" (Erzincan) îşte mirovên

wanî dikirin zabit şor lê girêdidan.

Lazim e ko em zaruwê xwe bidine xwendinê bira zaruyê me bi xwendina xwe bibin paşa û axa. Bira nola Menla 'Îsê; Ehmê nebin zabitê nexwendî.

Ez hêvî dikim ko çiqasa kurdmanc hene gerek zaruwê xwe bidin xwendinê.

**Mîrê Berazan: Mustafa Şahin**

## LE BO ŞEHÎDEKÎ

Min hêvî heye ji vê reşbelekê ko herî nav tîlî û pêçiyê mîrê me maç bikî û bi zimanê kurdî daxwaza min jê re bibêje. Yek ji wan daxwazan ev e ko te'ziya şehîdê weten le çiyayê Arnûs Şêx Ebdurehman Efendî li hemî kurdan bikî. Zêde li birayê min Cegerxwîn û li ehlê civata Hesîçê. Xwedê rehma xwe lê bikî û li hemî miriyê xwendevan û guhdêran. Daxwaza din ev e ko vê carê tu çermê Hawarê bi kaxiza reş çêkî û herfên Hawarê û navên têxistiyê kovarê bi hibra sor binivisîni. Çiku wekî mêrekî baş û hêjayî ji mala yekî bimirê chlê malê reşa xwe li ser girêdidin nexasim wekî vî wetenperwerê gelek hêja bû û reşgirêdan ji adet e di nav kurdan de. Mîrê min belkî te seh nekiriye. Îro temamê kurdan li ser xwûnfiroşê weten mehzûn in. Ji çavên wan xwûn tê şeva şehîdbûna wî çerxa felekê li ser mehzûn bû û reşa xwe girêda we nedît di çardehê cemazulûla de hîv xirabû wê şevê zatê wî ê şerîf û muqeddes ji derve bû Mîrê min.

Em gellek bi silavên Cegerxwîn kêfxweş bûn we lakîn kêf ji me re nemaye. Me got:

”Eleykumusselam we rehmetullahî we be-  
rekatuhu silavê wî ser çavan û ser seran em  
ji silavan lê dikin û-le çawabûna we û wî di-  
pîrsin û dibêjin”:

Bilcumle silavê gewheranî  
Namî li berîd û berqê danî

Avxweşî dikî bi gulg û beybûn  
Pê hediye dikî ji bo Cegerxwûn

Ez gorî te me keko Cegerxwûn  
Tu vê hunera kelmê mewzûn

Berdêlkî tu ji bo Herîrî  
Nezm û xezela te ya Cizîrî

Wextê ko dikî li me silavan  
Destbestî dikin bi herdu çavan

Çawa yî bira ji min re bêje  
Çaxê min tu dîtî pir ji mêj e

Ji hev dûrî kirin Xwedaê gewre  
Dinya li me îro têkde ewr e

Kes nîne di emêrê wê xeberdî  
Hînkên dikujî hinan diberdî

Çerxa feleka çiyayê Arnûs  
Heta vedihê ne bo te me'nûs

Gazî ke şehîdî bo xwe rake  
Mêvanekî pir ezîz û çak e

Çawa tu bibêjî ew hebîb e  
Qedrê wî bizane lê xerîb e

Hêdî wî şiyar bike w xeberde  
Lewra bi birîn û ah û derd e

Jê re tu bibêje hem binûse  
Namî ji te dest û pa dibûse

Derdê te çi ye welê dinalî  
Kes nîne li te bikî sualî

Sebrê tu bike welê ne nal e  
'Ewn û kerema Xwedê li bal e

Yek nîne herî bibêje Nafîz  
Êdî ko li Misrê bûye ramîz

Dermanekî bo Şehîdî çêke  
Dijwar e birîn tu zû verêke

Rûmet me nema li rûyê amê  
Dê neqlî bikin biçîne Şamê

### Ehmed Namî

**M**e şehadeta Şêx Evd Rehmanê rehme-  
tî zû ve bihist, reşa xwe girêda û şîna  
wî girt. Hejmara Hawarê a yazdehem nis-  
bet bal navê wî hate kirin. Herhal heta niho  
ew hejmara ha gihîştîye destê te û bend û  
şî'rên ko ji bona Rehmetî hatine nivîsandin  
te xwendine. Digel vê, heçî ko dil bikin ji  
bona Rehmetî fatîhekê bixwînin rûpelên  
Hawarê jê ra vekirîne.

### ZIYARETA HAWARÊ

Tu bulbilê serê darê  
Here ziyareta vê Hawarê  
Bibî Celadet inê carê  
Bistîn ruxseta vê Hawarê

Lo bulbilo kû da hatî  
Mizgîn heyê xudan xelat î  
Bi ser dilê min re hatî  
Tu xerîbê nav welat î  
Tu kurmanc î nizam Tat î  
Tu xerîb î ji kû da hatî  
Ez bulbilê alê xerzan  
Xeber anî nav Berazan  
Bibin hêlîna quling û qazan  
Ko hûn herne ser mirazan

Tu bulbilê nava çem î  
Sosin û gul herdem î  
Fena kurdê bi elem î  
Jêhatî dest bi qelem î

Tu Kamiran Alî Bedir-Xan î  
Hîv û stêrka nav kurdan î  
Tu ruhniya hemî çavan î  
Fena gula nav baxçan î

Em ji hemî rabin kar e  
Ko em ji çêkin diwar e  
Keç û bûk bibin sitar e  
Ji bona xweş nebe kêfa neyar e

Ez kurdekî Milî me  
Bi eşq û dil şewîtîme  
Ji Alî Bozan hêvî me  
Milî me neî Berazî me

Ez bulbilê serê Tilê  
Ez Melkîşî me ser mînberê  
Bixwînim azanê selê  
Bi qaîda kurdê berê

### **Mustafa Milî**

## **HAWAR E**

Ji serhedan hat pepûk  
Gazî anî ji dext û bûk  
Di ser wan re berf û pûk  
Ne mezin man ne piçûk

Kurdino xwe kir tar û mar  
Tevda mane di nav ar  
Hêvî ji Rebbê Settar  
Gazind ji kurdên neyar

Gelî biran çî bi we hat  
Ko we wêran kir welat  
Kanî bajar û kelat  
Ne wêran bû rohilat

Ne hûn dibên em tîne  
Heta kengê bi pî ne  
Çavên me hêj li rê ne  
Kanî hûn kengê tîne

Gelî werin Hawar e  
Werin gelî Hawar e  
Hawar e xweş Hawar e  
Ma ji we ra qet ne ar e

### **Lawê Findî**

## **NALENALA DIL**

Hawar hawar lo welato  
Berf û baran bi ser de haro  
Ji xelkê wetîne bû mirato  
Bonî rokê roj lê hilato  
Em dibên em muhacir in  
Weke berfa li pala gir in  
Hem dibarin hem dibhûrin  
Em dibêjin qet namirin

Di milletê xwe nabihûrin  
 Şor û dîrokan digerin  
 Me pê kitêb çêdikirin  
 Li nav kurdan belav kirin  
 Şora welat ji bîr nekirin  
 Ev kitêba me Hawar e  
 Zivistan çî gelek sar e  
 Hûn berhev kin qirş û dar e  
 Ko li me bûbî sitar e  
 Kurdino meirsin pêşî bihar e  
 Em hemî tevde dinalin  
 Li ser welatê xwe dikalin

**Ismail Hebeş**

## KEW Û QITIK

**D**ibêjin, carekê kew û qitik nik hev rûniştin, ser axaftina dinyayê dipeyivîn ka çî heye çî nîne û دنیا bi çî awayî dibore, hikmeta wê çî ye? Xelkên wê hin dewlemend in û hin jar û perîşan û hin navhêncî ne [navincî].

Ên dewlemend ji xwe re kêf dikin û tena rûniştine. Ên jar û perîşan dilên wan kul e û di bin tehnê xelkê de ne û melûl in, û tişteki ji dinyayê nizanin. Ên navhincî carinan kêfxweş û carinan dilgîr û dilşikestî ne.

Anî yekê ji wan got:

– Dewlemendî û jarî û hertişt bi vîna Xwedêyê bilind e. Ema hikmeta wî ev e: Ê ko ji xwe re dixebite, kar dike, hîni zimanan û destxetan dibe, li dinyayê digere, welat û cihên xelkê dibîne, çav didewan û kêferatê dike û ji xwe re hîn dibe. Ew dewlemend dibe, kêf dike û serfiraz e û çavê xelkê li destê wî ye. Ji lewre heta mirov nebîni jehmet

[zehmet] nabîni ne'met. Ma dem weha ye û em jî weha dizanin gerek herkes gora hêlê xwe bixebite û xîretê bikêşe. Da ko çavê xelkê li destê wî be. Ne ye wî li destê xelkê. Dibêjin: "Roviyê gerayî ji şêrê negerayî çêtir e" digel vê hunermendiya şêr û mezinahiya wî li ser hemî heywanan re û digel kêmayî û pîsatiya rovi ji her heywanî ew ji wî çêtir kirine.

Herkes weke şêr û rovi ye û herkes bi mal û peran tê naskirin. Nemaze hînbûna zimanan û destxetan. Û dinyayê de evên ha tenê xweyên xwe bilind dikin û dest ji wan bernadin û herwext ji wan re heval in û destgîr in. Wan ji deravê teng û mezin dertêxin. Ev kesê weha be wê her navhincî be. Kêma dibe û boş nabe. Ev jîna weha jîna seyikî dibêjinê. Em kengê ji vê jîne xelas bibin û ji vî deravî derkevin.

Anî kew û qitik axaftin kirin ser boşbûn û kêmbûna mirovan û heywanan, hikmeta wê çî ye?

Anî kew got:

– Belê ya qitik ez jî gelek batil dimînim ev çî hikmet e. Em êla kewan hindik in û hûn êla qitikan boş in. Digel vî qasî her mêkewekê ji me deh û diwanzdeh hêkan dike û hûn qitik ji du hêkan pê ve nakin.

Qitikê got:

– Hikmeta wê ev e. Heçî em êla qitikan in em êleke boş in û pir in, ji lewre em diçin girava behrê de hêlinên xwe çêdikin. Û dibin rêz weke şelîta mihendizarên ko erdê pê qeys dikin. Û weke rêza qulingan ko hewa re difirin. Û yek dikeve pêşiya wan ên din dikevin pey wê. Û hergav paş xwe ve dinêre ko kengê yek ji wan ji rêzê derkeve û bixurime da gazî bikîtê "Were bikeve rêza xwe de da xelk ji erdê me nebînin û nebêjin ev qulingên he ji hev enirîne, çûn li erdê

danîn, em biçin wan bikujin". Em hîvê de du hêkan dikin gava yek ji me ne hazir be hevalê me ê dî çavê xwe dide hêk û hêlinên me. Heta em bèn bikevin ser de. Hevalê me nahêle tîstek ser hêk û hêlinên me ve bê. Heta ko hêka me ji cihê xwe biqelîqe û bixurime û pê nikilê xwe hêdî hêdî, ûne cihê wê de. Da em jê neenirin û gava em tèn hevalên me bi nikilên xwe û çengên xwe ax û toza ser pišta me diwerînin. Gava heywanek biyanî tê nêv me de ji bo kuştina me û ji hevçûna me, em hemî hev re lêdidin û ji nav xwe dertêxin û em hesîdê [hesûdiyê] nabin hev, ka hêka kê mezintir e û ya çîçoka kê cantir e û rindtir e, ji ber vî qasî em parazî ne û gelek in û boş dibin. Û hûn hindik dibin û piçek in, hikmeta wê ji ev e:

Hûn êla kewan êleke hev re dilrêş û bêbext in. Û ne xêrxwazê hev in û digel hev ne rast in. Wextê mêkewên hewe hêlinên xwe çêdikin û rûdinin ser de heryekê deh panzdeh hêkan dikin. Lê çaxa mêkew ji xwe re derdikevin ji bona xwe bidin gevzikê û biçêrin, hûn nêrekew hêkên wan ji wan didizin û dişikênin û kaşan de gêr dikinê, ji bona ko hûn carekê dî wan bîfsikînin. Û laşê xwe bi wan sivik û nerm bikin. Û dema neyarên hewe teyrê bazî tê dadide hewe hûn hemî xwe vedişêrin û ferxikên xwe dihêlin jê re. Ew jî wan binpenc dike û dixwe. Hûn dibêjin: "Bila em parazî bimînin dilê wan e. Em ê sibehê hevqasê dî dê çêkin. Mêkewên me gelek in. Ma em ê kejê ji wan bibirin" û car heye hûn sed in û neyarên we yek tenê be ew bi hewe dikare. Û hewe ji hev bi der dike. Heke heryekê ji we carekê lê bixure û bike qîr ew ê bi xwe bitirse û bicifile û çav tariyê bikeve. Hêdî derbek dî nayê hewe nagire û naxwe û hewe nahêle bê dondan. Hikmet ev e ko em gelek in û boş

dibin hûn hindik in û kêma dibin.

Ey gelî bira û pismaman bazara me jî weke bazara kew û qitûkê ye. Gerek em ji xwe re îbretê ji wan bigirin. Ûtiq hewe sax bin û her bijîn.

**Mustafa Ehmed Boti**

## SULTAN SELAHEDDÎNÊ EYYÛBÎ

**E**nsiklopediya mezin ji benda Selaheddîn Era holê dest pê dika: "Ev Kurd..."

Herê Selaheddîn kurd bû, ji me bû, ji mezinên kurdan bû, hêj bêtir û rasttir kurdê mezin û mirovê mezin bû. Ji xwe mezinahî bi mezinan çêdibe. Ko mezin nînbîn mezinahî naye pê, mezinahiya milletan jî holê ye. Millet bi mirovên mezin û bijarte mezin in. Ew millet mezin e ko mezinan ditêne pê, mirovên mezin jê derdikevin. Ji milletê kurdan gelek mirovên mezin derketine. Herwekî Şarmoy - zanakî Rûs - gotiye. Ez ê çend pirsên Şamûrî [Carekê Şarmoy û carekê jî Şamûr derbas dibe. - E. N.] bi kurtî, biguhêzime hir: "Û milletin hene bi cengawerî û dilaweriya hin serdarên xwe, xwe dane naskirin û ji hin dewletên Asya û Afrîqayê padişahin dane. Kurd ji wan in. Navê kurdan hêj di pêşiya zemanê kevn de bi derbên Rostem û pêşdetir bi kîşwerkêşayiyên Selaheddîn û birayê wî Melik el-'Adil, bilind û geş bûye. Ji van pê ve ew milletê ha mezinên din jî gihandine. Herwekî Kerîm Xanê Zendî ko di nivê babilîska hevdehem de malbata Zendî daniye, û zanayê mezin Îbn el-Esîriyê Cizîrî û Ebû el-Feda, ji mîrekên Eyyûbî, û diroknivîs zirav Îdrîsê Bidlîsî..."

Milletê kurdan Selaheddîn di heyameke welê de anibû dinyayê ko dinya bûbû du ber û li hev ketûbû. Di deşt û bilindcihên Ewrûpayê de bi hezar, bi lek û kirûran xelk gihabûn hev û berên xwe dabûn welatê rojhilat.

Milletên Îsa dirêjî milletê Muhemmed kiribûn. Bi salan ve pevçûn, lehiyên xwînê herikîn, bi hezaran mirov hatine kuştin. Milletên Îsa milletên Muhemmed çê kirin. Hindik ma bû ola Muhemmed ji navê hila-niyana. Ji du olên dinyayê ên mezin yek noq bûwa, a din ew daxwarina. Bi kurtî ola Muhemmed diçû winda dibû. Êdin xelkê baweriya xwe pê ne aniyana.

Hingê ji welatê Serhedan, ji çiyayên Kurdistanê, ji sinên [Li gor cih gere "serçên" bûya lê xuyaye ko dê bi şaşî "sinên" haîibe nivîsîn. E. N.] zinarên me rojek hilat. Selaheddîn...

Milletên Îsa çê kirin. Ola Muhemmed parast, xelas kir û ji nû ve danî, ji lewra jê re Muhemmedê duwem jî tete gotin.

\*\*\*

Niho em bi kurtî jînenigariya Selaheddînê xwe bêjin. Selaheddîn ji welatê Serhedan ji kurdên Rawendî ye. Bapîrê wî digel du kurên xwe Şadî Necmeddîn Eyyûb û Esed ed-Dîn Şêrkoh, ji welatê xwe guhastibû Bexdayê û jê çûbû Tikrîtê. Li wê cih hûbû. Bapîrê Selaheddîn di Tikrîtê de çûye rehetê, pêşdetir birayê mezin, Necmeddîn Eyyûbî ko bavê Selaheddîn e bû dezdarê Tikrîtê. Di sala (1137/532) di Tikrîtê de Selaheddîn hatibû dinyayê. Paş du salan hakimê Mûsilê Emadeddînê Zengî ji Tikrîtê derbas dibû. Necmeddîn di hin tiştan de arikariya wî kiribû. Emadeddîn, Necmeddîn û mirovên xwe bi xwe re birin. Û piştî vekirina keleha be'lebekê ew kir dezdarê wê.

Selaheddînê zaro jî bi bavê xwe ve guhas-



tîbû Sûriyê. Xwendina wî a pêşîn di Be'lebekê de ye. Pêşdetir li Şamê ber destên meLAYÊN mezin de xwendî ye. Li Şamê di diwana Nûreddîn de bi xwedî dibû.

Di sala (558/1162) de Esed ed-Dîn Şêrkoh diçû hawara Misriyan. Biraziyê wî Selaheddîn jî pê re çû. Esed ed-Dîn du carên din jî çûbû Misrê. Di herdu caran de biraziyê wî pê re bû. Di cara siyem de li wê cih bûn û li Misrê man. Sal pêncê û şêstê û çar bû [diviyabû 564/1168 bûna lê diyar e ko 5-a pêşî jê kêr maye. E. N.]. Hingê 'Adid ed-Dînillah, xelîfeyê Fatîmiyan ê paşîn li ser kevilê xilafetê rûdinişt. 'Adid ed-Dîn, Şêrkoh xistibû şûna Şawer û kiribû wezîrê xwe. Selaheddînê xort jî ber destê mamê xwe dixebitû. Piştî salekê Şêrkoh çû rehmêtê û Selaheddîn kere dewsa wî û bû wezîrê 'Adid ed-Dîn.

Di sala (567/1171) de bi mirina 'Adid ed-Dîn Selaheddîn bû melîkê Misrê. Herçendî Selaheddîn bin destê Nûreddîn dihate hesêb jî di rastiyê de bi serê xwe bû. Paş du salan Nûreddîn jî bê zar û zêç çû rehmêtê û welatê Sûriyê jî bi tevayî ket bin destê Selaheddîn.

Dewleta Selaheddîn jî Kurdistanê diçû heta welatê Tunîsê. Selaheddîn hîst û du salan hukum kir û di sala (589/1193) de li Şamê çû rehmêtê. Emrê wî gihîştibû pêncî û heftan. Li Şamê di nêzingî mizgefta Emewî de veşartî ye. Selaheddîn di vî zemanê kin de welatên dewleta xwe hemî jî ava kiribûn. Avahîke welê ko xelkên Ewrûpayê jî wan nimûne digirtin.

Selaheddîn sultan bû, serdar bû, zana û şair bû. Ser hertiştên dinyayê serwest bû. Tebabet jî dizanî bû. Dibêjin ko berberê wî qeranê Îngilîstanê Rîşarê dilşêr di wextê şerî de nexweş ketibû. Halê wî xedar bû. Bijîşkên Qîran nikaribûn Qîranê xwe derman bikin. Selaheddîn bijîşkên xwe şandibûn

balê. Ew jî bi ser nexweşiya Rîşar venebûn. Hingê Selaheddîn bi xwe, ket şeklê bijîşkan, çû nik Rîşar û dijminê xwe derman kir.

Selaheddîn jî wan mezinan bû ko qedrê wî ne tenê mirov, dost, millet û bin destên wî lê dijmin û neyarên wî jî dizanibûn û heta îro jî *dizanin*.

Di sala (1898/1316) de wekî împeratorê Almanan hatibû Şamê qesda tirba Selaheddîn kiribû. Berî ko bigihe cîrbê jî gergeroka xwe peya bû û pêleke dirêj bi peyatî çûbû. Her ev Selaheddîn, mirov û serdarê mezin Selaheddînê me bû. Selaheddîn kurd bû. Ji bona mezinahiya milletekî ma Selaheddînek ne bes e?

### Celadet Alî Bedir-Xan

## XEWNA HIŞYARIYÊ

Ax welato ax welato  
Roja me zû lê hilato  
Bav û birên me çawan in  
Çima xeber jê nehato

Îşev min dît xewnek bi tîrs  
Tu keremke ji min bipîrs  
Ez carekê dest pê bikim  
Da tu bibîn çiqas bi 'hîrs

Bayekî reş hate ji jor  
Li ser min kire borebor  
Bi girîn da kaxizekî sor  
Di nav hebûn du tayên por

Ez çûme cem pîrek zeman  
Min got: Falîkê vekî eman  
Min daye der tev rûh û can  
Derdê min re bibê derman

Pîrê bo min rabû ser xwe  
Piyana avê da ber xwe  
Li avê xwend li min nêrî  
Disa serê xwe da ber xwe  
Kaxiz bi xwîna beran bû  
Herdu ta porên xwehan bû  
Mana wan kûr û giran bû  
Ji fala pîrê nihan bû

Biraên me têne kuştin  
Bi xwînen xwe têne şuştin  
Xwehan porê xwe şandine  
Yanî "çima hûn rûniştine"

Îro laşim pir diêşe  
Qenc dizanim ji çi dêşe  
Lê çi bikim derman nîne  
Tali' tune bextê reşe

Dermanê ko ez keş dikim  
Bi heyvîna xwe geş dikim  
Ji dilbirinên wek xwe re  
Pelên Hawarê reş dikim

Qedrî bibêje û binale  
Şinê girêde bikale  
Namûs nema, rûmet nema  
Ev çi derd û ev çi hal e

### Qedrî Can

## GOTINA RAST

Begler û paşa û axa û rîspî û muxtar  
Xwedanê Burcê Belek bax û rez û cot û cobar

Heryek bi dibkweşî û serfirazî û bêhuşî  
Li cihan dijin bi vî terz û haway bêzar

Qet kes li me zaroka pirs nakit carek îro

Herçendî em ji naçarî dikin qêrîn û hawar  
Em kurd îro belengaz û jar in û bêxwedî ne  
Kurdistan qumaş e welê nîne jê re xerîdar

Di destê me de heye pertalekî taze û pir çak  
Lê herwekî Xanî gotiye pir kesad e bazar

Ger hev negirin em kumanc bi tebaî û yek dil  
Bê fêde îro ev çîrok û gotin û eş'ar

Ger heryek ji cihê xwe huşyar bibit û bigirî şûr  
Karin û ji wan tê lê we lakîn bûne sersar

Em kêmxistin şêx û mela û axa û begleran  
Lewra em îro ji hukûmetan nayêne hejmar

Berê em hukûmeteke cîhangîr bûn li dinya  
Werte temaşê bike eywanê Kesra neqşê nîgar

Bi vî terzî şêx û mela û axa begler tev  
Nema me bixapînin em tev ji xew bûne hişyar

Em minetê ji mela û şêxa û began nagirin  
Em belengaz bûne serfiraz û ji hev re xemxwar

Lê hukûmetên Ewrûpa ji me re destûr nadin  
Da em bigirin li Kurdistan wek felkê dîwar

Em canê xwe didin qet terka Kurdistanê nakin  
Lewra îro xweş e deşt û newal çiya û zinar  
Hemî gul û yasemîn û binefş û naz û rihan  
Hincaz û mişmiş û xox û tirî û hem nar

Şebeş û ecûr û gundur û tirûzî û qawin  
Şîngu mazi û gulaz û xiro û gwîz û çîvar

Derya û gewher û kîmya û gaz û kanî feqet  
Aş û avî û bostan û zevî û mêng û rûbar

Îro şêx û begler û paşa dixwun lew xem naxwun  
Xwarina wan birinc e xwarina me çi ye savar

Ew radizên di burca de li nik zerî û gewran  
Em li nik pêxwasan radikevin di kancikê tar

Xanikî min heye pir kêr e welî çal (bijen)  
Dirêjî û pehnî çar gaz heye bi gazê necar

Li alikî nivîn û koz û mirîşk û firax in  
Li aliyê dinê agir û serşok û hem çend dar

Ez nadim bi avaniyê Selaheddînê kurdî  
Ko li Şamê ji me re bûne fexirgeh û asar

Li nav kurda me ne welî Hacı Qadirê Koyî  
Li welatê Roman di binê zindanê de pir jar

Kurdistan pir xweş e çawa ko em dibêjin hergav  
Eynik û Eyndar Pêkand û Minar wek textê  
xwendkar

Binêrin li Ewrûpa û Amerîka û Asya  
Hûn nabînin ji bil me kurdan belengaz û etar

Em ne ê vî qasî ne we lakin bê xwedan in ey  
birano roj di cîkî teng de li me çûye êvar

Em bi hev re bêtişq in lewra em kêr in îro  
Ji herçar terefan de dest xistiye nav me exyar

Êzîdî çî ye Nesranî çî ye weha reng e Cû  
Qê ev ne kurd in we ya xud em ne bavek in  
herçar

Alem tev bûn xwedanê ser'et û dewlet û hikmet  
Em kurd mane tenê belengaz û pir jar û bêkar

Bes e eger hûn mezin ranabin em ên hûr rabin  
Ji berê de mezinan şûr avêt biçûkan da dar

Cegerxwînê jar ta deh rojan bêjî û binivîsînî  
Xelas nabin gotin û şîret aciz dibin guhdar

**Cegerxwînê Kurdî**

## DERDÊ SADO

**D**i wextê şerê mezin de bû. Em bi malî-  
tî di Girê Mîran de bûn. Girê Mîran  
gundek ji gundên me ye. Tê de heftê heştê  
mal hebûn. Bavê min li Xarpûtê di hepsa  
tîrko de bû. Hingê ez zaro bûm. Gundekî  
me ê din jî hebû, jê re digotin Qenter. Qe-  
derê deh mal tê de hebûn. Herdu gund nê-  
zîkî hev, hima bi hev ve bûn. Li Qenterê  
kurikekî keçel û tîredîni hebû. Jê re digotin  
"Sado". Em zarokên Girê Mîran hebûn  
pênçe, şêst zarok. Ez bi xwe sereskerê wan  
bûm. Hemî jî ber destê min bûn. Li Qente-  
rê Sado bi serê xwe bû. Min dixwest ez wî jî  
bikim ber destê xwe. Lê Sado berberî bi  
min dikir.

Ez ê hersibe rabuwama min ê zarokên  
gund hemî bidana hev û biçûma ser Sado.  
Min ew saft bikirana. Gava Sado çav li me  
dikir hima dida kiçkanê xwe û dirêjî me di-  
kir. Yek dido ji me dida ber xwe û dikete  
pey wan, heta ko ew biwestandina an serê  
wan bişikandana.

Em ên mayin di cihê xwe de disekinîn û  
li wan difericîn. Paşê ko Sado aqîliya xwe ji  
wan dikir dîsan berê xwe dida me. Yek di-  
duyê din jî dida ber xwe û mîna ên pêşin li  
wan jî dikir. Yekî bi aqil di nav me de nîn  
bû ko ji me re bêjî: "Gidyano gava Sado pê  
yekî ve ket hima ên din hemî dirêjî wî bi-  
kin. Lê werin hev bigirin û serê wî bipercî-  
iqînî". Mêze eqlê me ev qas nedibirî ko  
em tevdîreke wulo jê re bînin û jê xelas bi-  
bin. Bû nêzîkî salekê halê me û Sado bi vî  
kari bû. Me kir nekîr Sado saft nekîr. Ji ber  
kêmaqîliya me. Me nizanî bû tevdîrekê jê re  
bibînin. Ez niha didim ber çavê xwe û dibî-  
nim ko eqlê me kurdan mîna eqlê min û  
eskerê min e, belê em pênçe şêst zaro bûn û  
me bi Sado nikaribû. Ji ber ko diduwan ji

me şerê Sado dikir û pênçe û heşt rûdiniş-  
tin û li wan difericin.

Kurd jî dido şer dikin, pênçe û şêst rûdi-  
nin heta ko herdu safî dibin. Paşê diduwê  
din radibin. Hingê em zaro bûn kes nîn bû  
ko şîretêkê li me bikî da ko em tevdira Sado  
bibînin. Lê kurdino! Malxerabino va ye em  
ji we re dibêjin heke hûn bi hev re dirêjî Sa-  
do bikin hûnê serê wî bikin bin lingên xwe,  
heke ne Sado her bi we ê bikarî. Ji min ba-  
wer bin, ez niha carinan difikirim û diqehi-  
rim, ji xwe re dibêjim, mal ava min çiman  
hingê ev tevdir ji Sado re nedidît.

Lê çî bikim eqlê zarokî bû hew eqlê min  
dibirî. Kurd jî hêja mîna min û hingê zarok  
in. Lê paşê ko mezin bibin ew jî mîna min  
dê poşman bibin û bêjin: Way bavo çawan  
bû ko berî bîst sih salî me xwe ji Sado rihet  
nedikir.

Ax ji derdê eqlê biçûk ko tiştêk jê ve xuya  
nakî. Ax ji derdê Sado, vî derdî em kuştin.

**Cemilê Haco**

## ZARO DELÊN

*Nemaze zaruyên welatê jêrin*

Welatê kurdan tev xêr û bêr e  
Hemî maden e tev ziv û zêr e  
Lê çî bikim îro maye ji xelkê re

Welatê kurdan hemî çîmen e  
Egîd û şêr û piling tê hene  
Hemî heval û kurbavê me ne

Pêşî li dinya du dewlet hebûn  
Yek jê Faris bû ew em bi xwe bûn  
Tirk û ereb û ecem tinebûn

Em ne ereb in ne tirk û rom in  
Xwedan paşa ne leşker û kom in  
Îro xirab in bin destê bûm in

Gunhê me çî ye bo çî deynakî  
Pirsê ji halê me kurdan nakî  
Em kêm ketine tu me ranakî  
Koma milletan ma qê tu ker î  
Çavê te kor e tu li me nanêrî  
Yan kal û kût î tu li me nagirî

Ev ne huryet e kotek û zor e  
Lê hûn dizanin dinya bi dor e  
Fetek li jêr e fedek li jor e

Xelkê em kuştin avêtin çeman  
Begler û paşa di nav me neman  
Koma milletan em man û em man

Koma milletan hûn pûlperest in  
Derheqê me de hûn qewî sist in  
Xelkê bi dostî em îro xistrin

Xewka me nayê em qet ranazên  
Em ji we dikin hêvî û gazin  
Em jî heqê xwe hergav dixwazin

**Cegerxwînê Kurdî**

## KULA DIL

Dilê min têr e, têr derd û birin  
Mêj ve derketim ji welatê xwe dûr  
Dilê min herê tev kul e bixwîn

Cerga min agir girî û pêt e  
Dûr ji mala xwe reben derketî  
Min hedar nabe qet nabe bê te

Min ne gund ne mal ne jin ne zar e  
Min divêt welat welat û welat  
Bê te ev jîn li ser min bar e

**Evdirehman Fewzî**

## JI KIRIYARAN RA

Hawar e, ey Hawarê  
Çiman wusan dinalî  
Sed heyf û sed mixabin  
Bê ziv û zêr û mal î

Tu yî Hawara kurdan  
Di her mekan û erdan  
Ehyeyte fikrê qewmî  
E ,a min el-xeyalî

Gelî biraê kurdî  
Kesê Hawar divêtin  
Divê Hawar xwedî kîç  
Bi her awa û halî

Hawar e hey Hawar e  
Ya eyyûh es-sukara  
Eştû el-fulûse ,ubben  
Fî sefhê il-mecalî

Çi şerm e ko Hawara  
Me ta ebed nemînit  
Hawar keç e ciwan e  
Xweşbûk e şardesalî

Ya eyyûh al-Kerad  
Aqet len al-bîlad  
Înn el-kerîme min qed  
Eştâ bila sualî  
Paran bidin Hawarê  
Da ko bi serxwe bêtin

Bigerî di erdê Şamê  
Kêmayî bê zewal î

Hatem yek e bi tenha  
Kurdên me tev de Hatem  
Hawar e mesel bêjin:  
Ka Rostemê ji Zal î

Hawar dîrefşê Kawe  
Kaxid qumaşê sade  
Jê re baran bişînin  
Kurdino bi dilhelalî

Ne hewce ye ko bêjim  
Çêtir ji min dizanin  
Hawar çiqas delal e  
Nakit li me delalî

Wellahî bûm Cegerxwîn  
Ji derd û êşê kurda  
Kesê dibêjî kurd im  
Guh bidin ber meqalî

## Cegerxwînê Kurdî

## MA EM TENÊ

Çehvên belek dêmên bi reng  
Ma em tenê bê nav û deng  
Roj û hîv wek zêr û ziv  
Ma em tenê dimirin gelek

Avên zelal xortên delal  
Ma em tenê bê şox û şeng  
Hergav û wext herkes bi rext  
Ma em tenê bê tîr tîfeng

Herkes bi xwe rabû ser xwe  
Ma em tenê bê keç gedek  
Herkes bi şîr têne bi qîr  
Ma em tenê bûn ax û jeng

Dijmin siwar lê em peyar  
Ma em tenê bê dest û çeng  
Bexçe cenîn herkes dixwîn  
Ma em tenê der kinca teng

Roj çû ava xelk bûn zava  
Ma em tenê wextê dereng  
Mêrg û zevî em giş revîn  
Ma em tenê jorê quling

Stêr lehîzî erd lerizî  
Ma em tenê perê kereng  
Hîv derket kes neraket  
Ma em tenê wek ava ping

Bulbil û gul dil kirin kul  
Ma em tenê bê şer û ceşg  
Deşt û çiya berf bariya  
Ma em tenê wek tayê beng

Herkes şemal em bûne kal  
Ma em tenê bê rewş û reng  
Herkes bi keyf em man bi heyf  
Ma em tenê sotîn pereng

**Mustafa Ehmed Boti**

## BISERHATIYA REŞOYÊ DARÊ

**D**ara bajarekî mezin û kevn e. Di çiyayê Mêrdînê de ye. Wî wextî hakimê wê Berdewêl bû. Lê niha gund e. Çend mal kurmanc bi axayê xwe ve tê de ne. Berî şerê mezin êvareke zivistanê, reşhîvê axa bi gundiyên xwe ve li odê rûniştûne. Şikeftike pir mezin û kûr li wir heyê. Ev şikeft di zemanê berê de zindana Berdewêl bû. Axê ji civata xwe re got:

– Heçî îşev here hepsa Berdewêl, darekî di nivê wê de daçikîne ez ê keça xwe belaş bidimê.

Hema Reşo nemerdi nekir ji hidame de rabû, got: "Axa ez ê herim" axê destê xwe dayê soz qerar bi hev re dan. Reşo rabû berê xwe da hepsê û çû, heta giha devê hepsê. Xwe bi pêplûkan re berda xwar; çû binê hepsê. Mê berê jî got: "Mixareke pir mezin û kûr e. Mirov bi roj here hundirê wê sehwa digirê. Heçku kûr û tarî ye. Vêcarê Reşo dil kir ko darê xwe daçikîne, dît pêjneke li paşîya hepsê hat mîna ko yek erdê bikole. Hema darê xwe danî û ber pê çû. Carekê dît gurîna tiştêkî ji cihê pêjnê hat û li ber wî ket. Ew jî lê tewiha. Rahîşuyê. Dinihêrî, gava destê însanekî jêkirî ye. Ewî jî nemerdi nekir dest zivirand û baskî cihê pêjnê de avêt. Hew dît careke dî ew gurîna hat û ew dest li sînga wî ket, Reşo bala xwe dayê ko bazbidê hêj xirabtir e. Hima nav di xwe da û dirêjî paşîya hepsê kir û got: "Ez bavê filankes im" çawan hisa xwe kir dît ko ji paşîya hepsê pîrekek hisa xwe dikê dibê: "Reşo metirse ez im"

Reşo dinihêrê gava ew jina wî ye. Dibê: "Pitê çî îşê te li van deran heyê?"

Jinik – Ka tu rûne, ez hal û hewalê xwe ji

te re bibêjim. Paş ko tu ji mal çûyi odê, Hisoyê pismamê axê qesda mala me kir dawa şuxla ne qenc li min kir, min kir ne kir xwe jê xilas nekir. Paşê min gotê tu li vir bisekinê, ez ê herim pişta sitarê, cilên xwe deynim û bêim. Qê Xwedê wilo emir kiriye. Got: "here" ez rabûm çûm pişta sitarê, min ra hişt bivirekî tûj û ji nişka ve ez li ber sekinim, min ew bivir li qafê wî da, hew min dît kete erdê. Hêdika ez ber laşê wî rûniştim, min hûr hûr kir, kire têrê û min anî vir. Ko ez wî veşêrim. Da ko kes wî nebînin. Ez hatim li te rast bûm. Mesela min ev e, ka tu bêje hatina te li vir ji bona çi ye?

Reşo – Hal û hewalê min ev e. Şertê min jî keça axê ye. Lê ji bona xatirê te êdî min nema divê.

Paşê herdu rabûn laşê Hiso veşartin û derketin derve. Reşo berê xwe da odê. Jinik jî çû mala xwe. Reşo li odê rûnişt lê pir madê wî nexweş e. Hin ji ber dawa xîretê û hin jî kuştina mêrekî kete stuyê wî.

Axa – Reşo ez dibînim tu pir bêmad î. Xwedê zane tirs pir gihaye te.

Reşo – No ez benî. Lê heke tu bext bidî min ez ê bêmediya xwe rastî ji te re bêjim.

Axa – Bêtirs bêje wekî te kurê min jî kuştibê, ez di te bihurtim.

Reşo – Ez benî hal û hewalê pîreka min û Hiso ev e, vêca bextê te çawa qebûl dîke bîke.

Axa – Te qenc kir û dîsan ez ê keça xwe bidim te.

Were serê te li şûna Hiso sax bit.

Reşo: Min bi serê xwe keça te qebûl kir û dîsan li te vegerand.

Belê pir mêrên mîna Reşo di me de hene. Lê mêraniya wan ji hevdu re ye ne ji biyanîyan re ye.

**Cemilê Haco**

## XUYABÛNÎ KURDÎ

Îro herkesê ko çîçikek tarîx xwendiyê û Nebzeyê [ji] ehwalê alem xêberdar e rind dizanî ko her hukûmet her cîns her qewin, her eşîr bi îttîfaqê û bî'yekbûnê gîşriye dereceyê bilind û xuyabûnî ey yaran dête bîrî we ko li îptîdaî seltenetî Ebdulhemîd, padşayî tirkan wî çaxî Rûmêlî Şerqî wîlayetek bû. Feqet zêdeyê sukkanê wan Bulxar bûn, li ma beynê xwo qerarek dan îttîfaq kirin ehd û peyman kirin mezin û piçûk mîr û axa ticar û esnaf zengîn û feqîr destê xwe danê destê hevdi xwe bi xuyandin dan. Ez [ji] îstîbdadî tirkan xwe xelas kirin hukûmetek teşkil kirin pîr û cahil mezin û biçûk bin lîwayê îstîqlal top bûn. Sond xwarin eger li ma beynê wan da yek merî muxalefet bika gî bi carekê dijminê wa muxalîf bin wa wê mehû bikin bi sayeyî wa yekbûnî îro Bulxar hukûmetekî mezin e rind e zengîn e. Xudanê fabriq e û senayî' e me'arifê wan pîr e gî munewwer in û her dewlet xatirê wan dizane. Ey yaran erazî me pîr e nifûs me pîr e em qewmekî cesûr û necîb in em te'hemulî her germ û serdê dibin çira em daîma li paş her cîns û qewm mayiyî? Çunke li welat û gundê di me de me'arif kêm e senayî' kêm e. Çi ra em mîna enasirê dîn xwe nikanin bixuyandin bidin. Eger musa'ede difermûn cewabî wê jî ez bidim bêyekbûnî û bi hew ra î'tîmad nekirin.

Wa ye kî 'illetêk e 'illetêkî mezin e kewn e mezin e. Gerek em xwe bi xwe ra wa 'illere derman bikin pêş hertiştêk dermanî wa 'illere lazim e. Paşê ger ke em destê xwe bi hew din belê bi sêdaqet bi hew din şev û roj se'î û xîret bikin ji wa xud kamê em dûr bîbin em li paş hevdi zû hevdi nekin.

Lazim e em bi çawê dûrbîn li meriyê xwe bigerin li meriyê xwe dibêm ye'nî meriyê munewwer meriyê mer'arif meriyê karguzar meriyê sadiq em wana li îçê xwe bibînin. Em derxine meydanê 'emeli em îûmadê xwe bi wan din be mal û be can li paş wa meriyane bisekinin mîna çiyayekî mezin mîna qel'eyekê mehkem mîna sedreke haş zehîrê wan bin. Feqet be bê xered û 'îwed.

Bes e ê din. Ey gelî kurdan ey gelî bira-yan îro çar sed sal in em li cehaletê da li esaretê da êdîn çurumîş bûyin, mehew bûyin nabadîd bûyin bes e êdîn. Bes e yekbûnî xuyabûn lazim e eger mîna ez xered dikim wer bikin emîn bin wa kalkalanî min mîna şe'rî rehmetî Şêx Rizay Talebanî yê Kerkûkî dibe. Şe'rî Şêx Riza:

"Bi himmet rojî bi muradî minîş elbet digerî çerx

Em miçe qerarî niye kahî cike ke bûk"

Îskender Begzade: **Ehmed Hemdî**

## BELÊ EM MAN

Sibe zû ye bav li der ma  
Ez nesax im çav li rê ma

Bihar hat û nema sir ma  
Em bê mal û perîşan ma

Biharên têr giya ter man  
Ji nav dostan em bêyar man

Bihar hat û giya zer man  
Ji nav xelkê em bê ser man

Keç û xort giş bi sereş man  
Ji nav xelkê em bêbext man

Birinên me bê derman man  
Ji ber şinê em bê xû man

Peyayên me li çolê man  
Ji nû dijmin bi leşker man

Pehîz hat û gurê har man  
Ji nav xelkê em bê ref man

Zivistan hat çiya berf man  
Ji nav xelkê em rûreş man

Hawar hilket bira paş man  
Ji nav xelkê em bênav man

**Mustafa Ehmed Botî**

## XEMÊ ZALIM

Lê Xemê zalimê Dêrsim e xweş Dêrsim e  
Ji êvara Xwedê da ava çan û kaniyan xume xume

Va xainan lê rebenê wa ez kuştime  
Li hanber dijminan ez diperpitime

Lê Xemê zalimê çiya li çiyayê dilîlandin  
Xezalê çolan karê xwe radikirin û digerandin

Bazan çêlîkê xwe her dikirin difirandin  
Van dijminan em ji mîran diqedandin

Ji salê sê meh payiz e  
Kurd hemû çima zîz e  
Dijmin li hanber dilîze  
Ka keç û gor û sis e

Gul û miskîn in li ser kaşan  
Xeber heye ji serbaşan



Bibin agirê devê maşan  
Ko hûn hilînin întiqama laşan

Serheda xêrmedî wê bi dar e  
Tê da têye qilqek avê sar e

Van neyaran em kirin tar û mar e  
Metirsin ko em peyan e Celadet siwar e

### **Miho Mili**

## **ŞÊR Û PILING Û ROVÎ**

Şêr û piling tev de çûn  
Leqay scriyek penîr bûn

Vê jî xwar û wê jî xwar  
Herdu li hev dane dar

Yekî jî ê dî re got  
Herdu rabûn bûne cot

Go: em herin cem rovî  
Li seydayê weş û kovî

Ewê me li hev du bîn  
Çavê Şeytênî derîn

Rovî go: de rabin zû  
Ji mi re bînin terazû

Wan terazû anî ber  
Rovî penîr danî ser

Alik pîr û yek hindik  
Yek bû giran yek sivik

Parîk jî a giran bir  
Ew j' a dî bû siviktir

Geh ev xwar û geh ew xwar  
Heta ko ma ben û dar

### **Cegerxwinê Kurdî**

---

Hawar Hawara we ye  
Deng û gaziya we ye  
Têl û kehkên vi sazî  
Arîkariya we ye...

### **Hawar**

## ŞÊX Û AXA Û MUNEWWERAN

**D**ilê min de heye go [ko] ez li vir çend xebera ji bûyî welat û milletê kurd û ser xebata go berî niha bûye û niha û pêşde bibî bibêjim. Umrê min gihaye pêncê salî, min gelek germ û sermayê dinyayê û gelek tengî û firehî dîtine. Û ji rexê di min gelek tiştê ser welat û tiştê tê de bûne bihîstine û hin bi çavê xwe jî dîtine.

Ez dibînim go vî wextî hinek ji xortê me ê xwenda divên ji boyî welatê xwe bixebitin. Gelek kêfa min ji wa re tê, Xwedê wa fihêtkar mekî.

Ev xortê ha ji xwe re "munwwer" dibêjin, yanî mirovê xwenda. Ji xwe berî niha divêbû ev xortên me rabin û ji boyî filitandina welatê xwe bixebitin, çima go xwenda ne, zana ne. Heke heta niha nexebitîne ji xwe sûcekî mezin e.

Lê ji rexê di ez dibihîzim go ev xortên me ê munewwer ji şêx û ji axa ne razî ne û eleyhdariya wa dikin, ev ne tiştê rast e.

Dibêjin go; "Şêx û axa fikrê millet xerakirine û malê wa dixwun û ew belengaz kirine." Di vê gotina de go dibêjin, hebek rastî jî û nerastî jî heye. Heçî go halê Kurdistanê qenc nas dikin, dîzanin heçî hereketê ko di kurdistanê de çêbûne biçûk, mezin, qenc, xerab dîsa bi destê şêxa û axa çêbûne. Xortê me ê munewwer go hebekî dixwendin xwe nebihîstî dikirin, diçûne wa bajarê mezin û dûr û xwe li kurdîtiyê nedikirine xwedî.

Heke wa jî xwe tevî şêx û axa bikirina û

bi wa re xebitî bûna fêdeke mezin wê jê hasil bibiwana. Çima go ew xwenda bûn zana bûn, lê nekirin.

Em bêne ser mesela rehmetiyê Şêx Se,îd go paşiya hemuwa çêbûye.

Gelo çima serxwerabûna Şêx Se,îdê rehmetî neçû serî?

Ji ber ko kurmanc bûbûne du ber; berekê destê hukumetê girtibûn, berê pê re hindik bû. Çima ko tirka digote kurmanca: "Ev Şêx Se,îd rabû ji boyî pereyê Îngilîz ber hukûmeta Îslamê asê bûye. Xelkê weke me nezan û nexwenda me behwer dikir û bi destê xwe mala xwe xera dikir; çima go nezan û nexwendî bûn.

Ji rexê di wextê go eskerê kurda bi ser bajarê Kurdistanê de digirtin gelo ew xortê me ê munewwer, xwenda li kû bûn, çima bi xelkê re nedirabûn û nedihatî jî me re nedigotin: "mesela me wulo ye, ev jî bo xelaskirina Kuradistanê û kurda ye". Heke halo bihatana û bigotana em jî nedihatî xapandin û me ê ji millet û welatê xwe re xizmet bikirana, çima go em kurd in welat jî welatê me ye, ev e sûcê munewwera.

Belê Şêx û axa jî bi sûc in, lê divê hûn jî bîr nekin ewê go rabû şêx bû, mela bû û ê ko pê re jî bûn axa û pisaxa bûn. Lê heyfa min tê go yekî munewwer pê re nebû. Heke xortê me ê munewwer û xwenda pê re hebûna, jî rexekî bi sînga xwe arîkarî bikirina û jî rexekî bi zimanê xwe ji xelkê re bigotana, fêdeke mezin wê jê hasil bibiwana. Çima go wî çaxî qeweta tirko tiştê hindik bû di Kurdistanê de.

Êdî tîro ne ew dem e go em lewma û gazi-  
na ji hev bikin lê gelf xortê me ê delal, pêlê  
mayî ji yê bihurî bêhur in. Halo zanibin  
go felata Kurdistanê bêyî şêx û axa nabî, çî-  
ma Kurdistan du ber in. Berek jê bi şêxê  
xwe ve girêdaye, bi sebeba diyanetê û emrê  
wa naşikînin û berê dî bi axayê xwe ve girê-  
daye. Ji ber go ji roja go hîmê Kurdistanê  
hatiye danîn çavê xwe halo vekirine, halo  
dîtine.

Ji lewra divê ko munewwerê me wa tiştê  
zanibin, ji bedêla go 'elyehdariya wa bikin  
bi zanîna xwe arîkariya wa bikin û tevde bi-  
xebitin, çîma go armênca wa û derdê wa  
yek e.

Lêbelê qusûra şêxê me, axayê me jî heye.  
Hinek ji wan dibêjin heçî xortê munewwer  
û xwenda hene bêdîn in. Bi vê gotinê gelek  
neheq in, bi xwendinê û bi mekteba kes bê-  
dîn nabî. Ev tiştêkî wulo ye go tînê Xwedê  
pê dizanî. Zîlamê xizmeta welatê xwe û mi-  
letê xwe bikî her kî bi ew muqeddes e. Ji  
lewra divê herdu alî jî 'elyehdariya hev ne-  
kin û pev re bixebitin û rojêke berê welatê  
xwe xelas bikin. Ev cem Xwedê jî cem evda  
jî wê meqbûl bin. Ji xwe şuxul bi vî awayî  
diçî serî.

**Serekê Eşîra Hevêrkan: Haco**

## BÊRIYA WELEÛ

Axa Cizîra Botan  
Seyr e ji bo me xortan

Şîrnex û Şax û Hevlêr  
Tijîne Xort û esmer

Hemî tev de bilûrvan  
Rewşen ji bo me kurdan

Hemî ehlê civat in  
We lêkin bê ribat in

Hemî merd in dilovan  
Hemî şehbaz û segvan

Hemî mîr in wekî şêr  
Jin kofî ne bi ser zêr

Tev ehlê govend û xêl  
Jin kofî ne biskbitêl

Tev çavreş in tev xezal  
Tev rêşî ne pir şemal

Tev gerdên in bi morî  
Ez ji wan re bim gorî

Tev gerdên in wekî mar  
Ma hin hene nebin yar

Tev ronî ye wekî hîv  
Hemî spî ne wekî zîv

Xabûr û hêzil û şet  
Tevde dibin bi yek xet

Xweş e bostanê Zînê  
Rabin da em biçînê

Hemî kurd in ne tenê  
Xwe davêjin sotinê

**Mustefa Ehmed Botî**

## DELALA ÇAVREŞ

Ronahiya çavên me  
Te peritand dilê me  
Bê te naye sebra min  
Te agir da mala min

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Çeleng spehî bi naz î  
Tev bedew û niyaz î  
Sûda ji-min dîstînf  
Ah-ji derdê evînf

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Nazik e hem delal e  
Bê enbaz û heval e  
Hergav ew e li bal e  
Herkes ji wê dinale

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Rengê te rengê beybûn  
Di herderî di herşûn  
Navê te ye dixwînin  
Dilên me tev bixwînin

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Ez nizanim herim ku  
Derdê xwe ez bibim ku  
Hawar li ku gazî ku  
Hemî şîn e şadî ku

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Sînga wê deşt û zozan  
Pêşîra wê av rewan  
Ew e ji me re av û nan  
Tu yî tu yî Kurdistan

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Ba wê heye xweş derman  
Hekîmê me Kamiran  
Mîrê me ye Bedir-Xan  
Hakim hekîmê Botan

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

Mîro tu zû bişîne  
Dermanê xwe weşîne  
Em sêwî ne dipê ne  
Halê me tev birîne

Delalê! Çavreşa min  
Bê te nayê xewa min

**Evdirehman Fewzî**

## CUHABÊN KOÇERÎ

**D**ibêjin ko wextekî dido ji kurên Bedir-Xan Begê, ji Stenbûlê harîbûn Kurdistanê. Riya wan ketibû ser bajarê Tanzê. Tanzê yek ji bajarên Botan e. Dîtin ko zilamekî pîr wê tê û qesta wan dike û gopale wî di zenda wî de ye. Hat silav kir û çû destê wan. Herduwan jê pirsîn: Tu çi kes î?

– Ez xulam ez koçer im.

Ji hev re gotin: xelk dibêjin Koçer bê eql in. Em ê sê tiştan jê pirs bikin. Ka wê çawan li me vegeirîne.

– Herê mamê koçer rîknê Îslamê çend in?

– Rîknên Îslamê yek e, heçî rojî û nimêj in tirko derdane, heçî hec û zîkat in me kurdan derdane. Navbera me hemiyana maye kelîma şehadetê. Ji lewre rîknên Îsla-

mê yek in.

– Xebera te ye mamê koçer, aferîn ji te re.

– Mamê koçer pirsra diduwan jî ev e, her çî koçer çîre hinde vir û derewan dikin?

– Belê, heta wextê bav û kalikên we, wextê şerî'etê bû. Dizî û kuştin û bêbextî nebûn û kesî nediwêra van tiştan bike. Û herkes bi kêra xwe dihat ceza kirin û pê şerî'etê diçûn. Lê niho ketiye destê tîrko de, ew dibînin me digirin, dikujin, dişêlînin. Çiqas em rastiye bibêjin û sond bixwun, ji me bawer nalkin. Lê wekî em derewan û bêbextiyan li wan dikin noka ji me bawer dikin û ewle dibin ji lewre em hîni derewan bûne. Çunkî herçî hevalê qirîkê bit wê her nikilê wî di nav... bit.

– Aferîn Mamê koçer, ka li pirsra sisiyan jî vegeerîne. Ma hûn koçer çîre hinde dengê xwe bilind dikin?

– Heke dengê me bilind e ev ne ji me ye. Heçî dengê me bilind' daye sebeb ya wî ye. Divêt jê bête pirsîn.

**Mustefa Ehmed Boti**

## Kitêban

### GORANÎ

Vê paşiyê kurdê Merîwanê jî kovrîra me re Kitêbek bi navê Goranî rêkir. Em gelek spasana lê dikin, xebat û koşişa [têkoşîna] wî pîroz dikin û pêşgotinka wî pêşkêşî xwendevanên Hawarê dikin:

"Le ber ewey Goranî zor tesîr ekate ser hisiyat û şî'ûr be hêway ewey ke be hisiyatî berz û paketane we neslêkî necîb û fedakar pê bigeyenin bo em welat û millete bedbex-

te û be umêdî ewey ke le mewla Goranî naybetê mektebî kîçanîş bînînin em kitêbe man pêşkêşî xwuşke xoşewîstekanî wilatê kurd kird"

Me çavê xwe lê gerand. Tev de nalîn û zarîn, seranser kovan û ax û keser e. Kovana welatê jar, kesera milletê bi derd û bê derman e.

Her lajeya wê gul e, lê gulek e reş û zîz e, jê bihna yar û neyar jî têt. Tê de rengê dost jî û gûnê [reng] dijmin jî heye.

Kitêba "Goranî" wek gulîstaneke ye ko tê de hertexlît kulîlk û behnûn hene. Mirov di ber wan de ecêbmayî dimînit û nizanî kujanî ji xwe re bibijêrit. Kêfa mirov jî hemiyan re, ew çend têt ko dil dike bi tevayî gîşkan biqurîfîne û ji wan gurzekî pêk bîne. Lê sed mixabin rûpelên Hawarê nikarin wî gurzî hilînin. Ji lewra me tu jî ji kovara xwe re neguhastin.

Lê ji ber ko em lolô kurd in, kêfa me gelek jî loloyê re têt û hertiştê ko tê de lolô heye bi me xweş e. Di paşiya vê kitêbê de lawikeke pijderî heye û jê dengê loloyê têt. Ji ber vê yekê em wî lawikî datînin ber çavên xwendevanên xwe:

Xweş Amedî ne sed caran le min xweş Amedî ne.

Etu were kuskê xencerê de bavê xwot biterazîne  
Etu were bîst û heft rîyalan le birûkî min helbisîne  
Înca eger min dak û babî xwem lê yan pirsîne  
Ca sert e min delêm le geredîlaney malî xalim lê kewtîne  
were lolô lo hayê delalê lo wayê zerde esmerim.

Heke diwana Şêx Rizayê Talebanî hariye çap kirin em ji kurdê Merîwanê hêvî dikin bila ji me verêkit.

**HAWAR**

## KANÎ AXA KURDAN

Ez sond dixwum tu bizan  
Roniya erd û ezman  
Ji ax û ava kurdan

Keskesora bihar î  
Evîn û dost û yarî  
Peyda bûne ji kurdan

Birûsk û tev gurijîn  
Birîndar û dilhezîn  
Ji tûr û qîrê kurdan

Çiqas şahî xemrevîn  
Pehîz bihar û havîn  
Hemî ji kêfa kurdan

Çi te'îm û çi destxet  
Çi hikmet û çi dewlet  
Hemî ji qewmê kurdan

Çi şebaz û hunermend  
Çi govend û neqş û bend  
Belâv bûne ji kurdan

Çi comerd û mêranî  
Çi şabaş û nişanî  
Hemî ji eslê kurdan

Çi kelat û çi xelat  
Çi esil û çi malbat  
Ji dest û eslê kurdan  
Çi segvan û neçîrvan

Çi dengbêj û bilûrvan  
Hemî hene nik kurdan

Ewr û sahi her xweş e  
Werin biçin Laleş e  
Kanî axa me kurdan

## Mustefa Ehmed Botî

## DU BEND

*Ji Ehmed Hemdî Beg re ye*

**B**egê giran û hêja û birayo serbilind Ehmed Hemdî beg! Begê min te gotiye di benda xwe de, "Gerek e em bi çavê dûrebîn li mêrên zana û karkir û guzar bigerîtin û em wan derxin meydanê û bi mal û can li ber wan mirovan bi rawestin weke çiyayekî mezin li pişt wan xwe bidin daçikandin". Eger dehên din weke te hebin û weke te bêjin hinga em karin bi herawayî kar bikin çawa ko Ehmedê Xanî gotiye:

Ger dê hebûya me ji xwedanek  
Comerd û ciwan û nuktezanek  
Min dê elema kelimê mewzûn  
'Alî bikira li banê gerdûn

Lê nabînim yekî dewlemend li civatekê  
rûnê û bêjî ez kurd im û bi mal û canê xwe  
ez di ber kurdan de çikandî me û ji wan re

çiyayekî mezin û bilind im, ji te pê ve. Lê ji Xwedê hêvîdar im ko ev gotina te ji dewlemendên kurdan re bibî navtêdan û destûr. Belkî hemî pê hişyar bibin. Em ji bi dibxweşî rênçberiya wan dewlemend û serbilindan bikin. Belkî bi darê belengazan û xameya xwe nedevanan û berê dewlemendan em bi-jîn û serbilind bibin.

Belê Begê mino, heta îro bi hezaran mirovên zana ji nav me rabûne û ji me re xe-bat û karên bêjimar kirine we lakîn ji belengazî û destengî xwe ji kurdîtî dût û derxistinê yan ji derd û kul û jana dewlemendên me kurda mirine û yan bi destên bedkar û nezanan hatine kuştin. Îro ji hene ew mirovên ko tu dixwazî we lakîn ez bawer dikim ko ev gotina te bicih neê ew mirov ji dê xwe ji neçarî ji kurdîtîyê dût û derxin yan xwe bi destê neyaran bidine kuştin. Lê Begê mino zikê min tijeye ez nikarim bipeyivim.

## XEYALÊN CEGERXWÎN

**C**end gotinên tewş û kevnar bidime zanîn ji Osman Sebrî Efendî re. Ji cem xwe ez dibêjim:

Îbrahîm:

bira: kek,

hîm: kevirê mezin, yanî birayê kevirê mezin

Kesra.

key: serek û mezin

sera: eywan, yanî mezinê eywanê

Keyxwa:

key: herkes zanî çî ye

Xwa: mezin, yanî mezinê mezinan.

Zardeşt:

zar: ziman

deşt: rast, yanî rastgo

Nûhnûh: yanî çîhan nûh ava kiriye, gelek caran "h:HH. ." û "h:. ." bi hev têne guherîn wekî niha spehî û spe'hi.

Kurdmanç:

Kurd: pehlewan û xwûnrêj

manç: reş çawa ko em dibêjine genimê pîrî reş "mencik" û dibêjine tîriyê reş û nebaş "mencolik" û dibêjine me "Qere Kurd" û em dibêjin em kurdê reş in.

Pîroz: yanî roja te xweş bî

pî: spî

roz: roj,

pîr: rîspî, pî: spî, rî rîş û mû.

Keyqubad; key, qubad, zana çawa ko em dibêjin "filankes qubed e".

Keyxwesrewê perwîzer:

keyxwesrew: yanî serê eywanê

perwîzê: pîroz, yanî mezinê xudanê serayê, pîroz ereb dibêjin: "Mûbarek" em jî hêj, dibêjin: "kêxwesrewê mûbarek".

Xwarzî:

xwah: xwuşk

zi: jê, yanî ji xweha min zaye weha reng e birazî.

dotmam:

dot: keç

mam: ap yanî keça apê min.

pismam:

pis: pişt

mam: ap, yanî ji piştî mamê min

texterewan:

rewan: du mane jê re hene yek jê navê yekî ji kesrewiya, ya din çûna xweş e yanî textê kesra yan textê çûnxweş.

çiya: yanî ji hev qetandî û ci ci.

mizgîn:

miz: mujde

gîn: gîr yanî mijdê digirî û tîne "r" û "n" bi hev tîn guherîn wekî niha dezgîn û gur-

gîn û xemgîn

qenc: yanî mezin çawa ko em dibêjin:  
"qencê serê filankes hev çendî ye" gelek ca-  
ran bi mezinayî tê xwendin.

**Cegerxwîn**

## ZERÊLE

Zerîlekê hêlîna xwe li ser sipîndarekê çê-  
kiribû. Roviyekek hebî, hersal wextê ko  
teyrî ferxên xwe dertanîn û dibînin parîk me-  
zin lê hêj bi firê neketibîn, dê biçuwa binê  
sipîndarê bisekîniya û pikê xwe bavêta ser  
qurmê wê û bakira:

– Zûka ferxikê xwe ji min re bavêje, he  
ne ez ê bêem te ji bi wan ve bixwum.

Teyr ditirsîha û di dilê xwe de digot qê  
rast e, dikarit bê. Radibî ferxikê xwe jê re  
tavêtin. Çend salan rovi bi vî awayî hîle lê  
dikir û zerêla belengaz dihişt bê zêdahî yanî  
bê dundan. Heta rojekê qijîkek hat nik ze-  
rîlê û jê pirsî û got:

– Ez çiqas dînihêrim ev çendî û çend sal  
in tu zêdahîya te nabînim û tu her dilşikestî  
yî ev ji çî ye?

Zerîlê bi dilekî birîndar axînek kişand û  
got:

– Hal û hewalê min û heywanekî ev e,  
hersal têt ferxikên min dixwêt.

Wextê qijîkê holê seh kir, zanî ew heywa-  
nê hîle û ker rovi ye. Qijîkê gotê:

Ez ê şîretekê li te bikim, ma tu nizanî ew  
nikarit bêt serê darê. Ewî pê hîla xwe li te  
kiriye. Tu niho du kevirên mezin bistîne  
nik xwe. Dema dîsan wek hersal hat û ba  
kir jê re bêje: "Devê xwe veke da ez ji te re  
bavêjim". Wextê devê xwe vekir jor de tu  
kevirêkî ser çavê wî de da dev û dimax lê bi-

şikên û tu jê xelas bibî.

Zerîlê got ev xweş xeber e lê gelo rast e.  
Rovî wek hersal hat binê darê û ba kirê.

– Zûka ferxikên xwe bavêje, lê he ne ez  
hatim serê darê

Zerîlê bi tirs ba kir: "devê xwe veke da ez  
bavêjim".

Rovî devê xwe vekir, zerîlê jor de kevir  
ser çavê wî de berda, dev û dimax lê perç-  
iqîn. Rovî ser xwe re nihêrî û axînek kişand,  
ket rê çû. Hewî hêdî nikaribû ne ferxikên  
zerîlê ne ji yên tu heywanên din bixwêt.

Îro halê me kurdan ji weke halê zerîlêyê  
ye. Em bawer dikin qê rast e neyar dikarit  
hillkişit heta serê zinarên me. Ji lewra em ji  
wek zerîlêyê tirsîhane. . .

**Evdirehman Fewzî**

## STRANA ÇIYAYÎKÎ

Hişê min aza ye, dilê min bêbend  
Mînet min navê qet min nedit merbend

Bager, bandev û berf, çiya, kaş, pal, zinar  
Ew heval û hogir in, bi min dost û yar

Wek ruhniyê aza me, wek reng û deng  
Min mînet nexwest, lewra ez mam dereng

Qertel û baz him [im], li ser berf û çiya  
Stêr kulîlkên min in bi mêrg û giya

Xwedê rastî ye, hew... heqê min Xwedê  
Heqê min delal e wek bav, bira û dê

Bager, bandev û berf, çiya, kaş, pal, zinar  
Ew heval û hogir in, bi min dost û yar.

**Dr. K. A. Bedir-Xan**



### ŞÊX Û AXA Û MUNEWWERAN

**D**i Hejmara Hawarê a panzdehan û di vê stûnê de, bi sernama jorîn benedekê Haco Axa derketibû. Herwekî hevî hebû yekî ji xwendevanên Hawarê lê vegerand.

Ji xwe di herkovarê de munaqesheyên holê çêdibin û ev tiştekî qenc e. Ji ber ko fikra herbirê xelkê pê dixuye, millet pê bendewar dibe û di nav gotinên herdu aliyan de li rastiye digere.

Ji xwe Hawar wek kursiyekî ye ko herkes lê dikare hilvekişê û fikra xwe ji bêje. Tenê bi vî şertî ko herdu alî ji hawîra edebî dermekevin.

Herwekî me benda axê belav kiribû, benda jêrîn jî belav dikin. Heke axa, an herçî ko meylidariya fikra wî dikin, li Evîn Cîwelek vegevandine rûpelên Hawarê ji wan re jî vekirîne.

Lê tiştek heye. "Evîn Cîwelek" navekî veşartiyê. Herwekî di Hawarê de gelek bend û şî'r bi navên veşartî belav bûne û belav dibin jî.

Li gora usûleki çapxanan û rojnaman herçî ko bi navên veşartî dinivîstin navên xwe ên rastî ji rojnamê re didin zanîn û rojname bi wan dizane lê tucaran wan belav nake. Ji lewra jî niho û pê de herçî ko bi navên veşartî dê binivîstin divêt navên xwe ên rastî jî me re bidin zanîn. Herwekî ji

Evîn Cîwelek pê ve xweyiyê navên veşartî hemî jî dane. An ne nivisarên wan nayên belav kirin, ew jî li kovarê nikarin bigirin. Ji ber ko bi xwe bi usûlî ve neçûne.

### HAWAR

### REŞBELEKA MERIYAN

**M**e benda Şêx û Axa û munewweran xwend. Gerek e em rastiye bibêjin. Belê em lê pir ecêbmayî man. Me di dilê xwe de digot axayê me êdî poşman bûne û dixwazin ji bona rahetiya millet û welêt bixebitin û pê gunehên xwe bidin efû kirin. Ne ko li ser munewweran rabin û loma ji wan bikin. Mîna Axê gotiye em qala mesela Şêx Seîdê rehmetî bikin. Herçî li ser Şêxê rehmetî çûn, pê ra şer kirin û nehiştin îşê rehmetî biçe serî û kurd îstîqlala xwe bistînin gelo ew axa bûn an munewwer bûn. Dîsa îro herçî muçahidê me ko li welêt bi bêbextî têne kuştin gelo bi destê axa yan munewweran dimirin.

Lê ez naxwazim vê behsê dirêj bikim. Çima ko îro ez dixwazim ji ya xwe bêtir fikra miriyan bêjim. Belê fikra miriyan fikra şahîdê munewwerê kurdan. Lê hûn ê bêjin tu çawa dikarî fikra wan ji me ra bêji. Belê he-ta niho digotin; ji miriyan tu xeber r. şahiye

û nayê ji. Min ji wirga dizanibû. Lê iro ez ê reşbeleka miriyan di rûpelê Hawarê de belav bikim.

Bêşik e ko ev xebera ew ê gelek xwendevanan ecêbmayî bihêle...? na, gelî xwendevanan, nemaze, biraên kurd, qet ecêbmayî nemînin. Bi bawerî û bê tasewas bixwînin û bizanin, jê îbretê bigirin.

Belê ji çend rojan carekê bi xewnê an bi xeyalî diherim dinya dinê û pirsê miriyê xwe dikim. Çawa ko duhî bi şev dîsa bi xeyalî, min guzergahek li nav miriyan çêkir.

Heyhat, çi bibînim? Çi qasî Yûsuf Ziyain, Fuadin, Kemal Fewzain, Extiîn hene reşaxwe girêdane di şînê da ne. Piştî pirsiyariya hal û ehwalê me ji benda axê qal kir tevda xeyidibûn binêr ji min ra çi gotin:

"Ey Evîn Cîwelek! Êdîn pir meyê cem me. Heta vê hingê tu ezeb bûyî. Lome ji te nedibûn. Lê iro ji te re axakî keçek anî. Belê Cîwelek wê keçê bera me de. Hêj hetanî iro dê û bavan keçê wirga nehanine dinê. Pir xweşik e li te pîroz be. Lê Cîwelek bala xwe bidê, porê keçikê bi şehekî wirga hatiye şekirin ko di nav mercanê diranê vê de çendek jî diranên maran bi cih bûne.

Belê axayê me di nav benda xwe a hebguheranî de çend ji diranên maran bi cih kirine. Dibêje: "Weqtê ko eskerê kurda bi ser bajarê Kurdistanê de digirtin, gelo ew xortê me ê munewwer, xwenda li kû bûn?" Li aliyekî din netêkilbûna xwe ji nezaniya xwe derpêş dike. Ger cenabê axê nizanibû û ji ber vê yekê têkilî şerê serxwebûnê nebû, çawan dibe cihê me dizanibû. Em li ku bûn, dixebitîn an nedixebitîn? Ma herkes zane axayê me hingê li ku bû û çi dikir. Ne gerek

e em bibêjin. Heke niho dixwazin bidin rêya me bèn cem me, bila kerem kin cihê vala cem me gelek heye, lê bi vî şertî, neqeba ko em tê de hatine bila bèn...

Axa bi xwe dibêje: "Êdî iro ne ew dem e ko em loma û gazinan ji hev bikin" ger wirga ye çima bi xwe dike û li me radibe. Dawî hêj di pêşiya me de ye. Ger xebitîn em li wan nagirin. Lê bila bi van gotinan di bin axa sar de rûhên me me'ezibînin. Ji bona iro ev bes e..."

Gelî xwendevanan! va ya gotina miriyan. Ko rê pê ket em ê dîsa fikra xwe bibêjin. Lê ya çetir ew e, şûna ko em loma û gazinda ji hev bikin tevda bixebitîn û vî welatî û milletê belengas xelas bikin.

## Evîn Cîwelek

## DERSXANE

Me hemî dil dikir û dixwest ko kovareke me hebit. Dîsan herkesî lê yek bûbû, elfabeya kurdî a nû divêt bête belav kirin û herçî xortên kurd hîmî wê bibin.

Bi sed renc û dişwariyê û paş xebateke şeşmehîn, me destûra kovarekê bi navê Hawarê sitand. Hawar di nav me de daket. Bû hawar û gazî. Herçend heye ew çend li welatê kurdan û biyaniyan hate belav kirin. Şabaş û pîrozî, li we û lê, deng û pêjn, her-tişt... hemî qenc, hemî rind, tev spehî û delal...

Lê tiştê hebû. Diviyabû ko Hawara kurdan bijît û bi ser kevit. Hawar dihate Hawarê. Lê gerek bû ko bihatina hawara Ha-

warê jî. Jê re pergîvan û gazîvan diviya bûn. Herkovar û rojname, nemaze kovareke weke ya me bi du tiştan dikarît bijtî. Sermiyan û xwendevan. Em ê îro tenê qala xwendevanan bikin. Lê bi vê hincetê me dil heye berê pêşîn hinekî qala nivîsevanan bikin û jê bîkevin qesta xwe a bingehî. Ji xwe nivîsevan ji xwendevanan têne hilbijartin û berekê wan in. Wekî hejmara Hawarê a pêşîn derket, me di dilê xwe de digot ko paş çend hejmaran nivîsar li me welê bibarin ko em ê di bijartinê de ecêbmayî bimînin û pişkê bavêjin ser. Lê welê nebû. Hêviya me neçû serî. Ji çend şî'r û bendikan pê ve tişteki xurt û bi goşt negihaye destê me. Digel vê hindê me bihna xwe fire dikir û digot, xwendayên me hêj kar nebûne, roja barkirîne jî nişka ve bi ser wan ve girt, hîn xwe pêk diînin, qelemên xwe - wek şûrê ji kalani - ji diwêtên xwe sibe yan dusibe dê bikişînin.

Ji xwe hejmarên pêşîn ji bona hînkirina elfabêya nû û awayê nivîsandinê, bi çend bendên ko bi herdu herfan dihatin nivîsandin, derdiketin. Heta îro jî ew awa dom dikir û carinan jî hin bend bi herdu herfan têne çapkirin.

Lê di wî çendî de hin nivîsarên nûgihîştîyan dihatin û digihane me. Bivênevê heqê nûgihîştîyan jî di Hawarê de hebû. Ji xwe Hawar jî me bêtir ya wan bû. Ji ber ko em yê îro û ew yê dawiyê ne. Ū jî me re diviyabû ko em wan bigihînin û bi xwedî bikin da ko bikêrî millet û welatê xwe bîn. Ji lewra dilê me hebû, em jî wan re, ji nûgihîştîyan re sitûneke cihê vekin. Herwekî me vekiribû.

Lê bi zemanî ve me dit ko di Sûriyê de ji van pê ve tu xwendayên welê nînin ko pê da di sitûnên Hawarê de tiştin bi kêr û bi awakî qenc û rast, bi kurdmanciyê xwerû, bikarin binivîsin. Wekî em kurdmanciyê xwerû dibêjin jî qesta me ne ew e ko tê de pirsên erebî nînin. Bila hebin, lê divêt awa kurdî û pirs kurdandî bin. Belê me got bila tê de pirsên erebî hebin. Lê ne ew çend û welê bêfêsal ko şûna "Ber vê yekê" "Bîna-en 'ela zalîke" bête gotin.

Diyar e ko kurdên welatê jêrîn jî me derketine û bend û şî'rên hêja nivîsandine û dinivîsin. Ji xwe welê ji diviyabû. Çiku kurdên Îraqê di welatê xwe de ne, nêzingî milyonekê ne, nemaze ji berê ve di bajarê Suelymaniyê de bi kurdî dinivîsin. Ji û pê ve ev deh sal in di dibistanên xwe de bi kurdî dixwînin. Lê em di Sûriyê de ji aliyekî kê in, ji aliyê din di nav me de - xelkê cih û derkefî - xwenda hindik in. Hebin jî hêj rind hînî nivîsandina kurdmanciyê nebûne. Belê divêt hîn bibin, ji ber ko bi zimanekî nivîsandin ne tenê bi zanîna wî zimanî tête pê, lêbelê divêt mirov bi wî zimanî hînî nivîsandinê bibit.

Belê di encamê de me dit ko nivîsevanên me ên îro ev in û ne hinekî din in. Ber vî deravî de me tavil qerara xwe da û rûpelên Hawarê jî her texlît nivîsaran re vekir. Welê jî gerek bû. Ji aliyekî xelk hînî xwendin û nivîsandinê dibû, jî milê din çend nivîsevan dihatin gehandin. Ji û pê ve Hawar zeviya zimanê kurdîyê ye. Divêt bi vê zeviye her texlît tov bêne werkirin. Hin hebûn ber destê me de bi xwedî û hînî nivîsandinê dibûn. Bivênevê ev jî ên din derketin. Lê ên

mayîn jî hêdî hêdî, bi xwendina Hawarê û bi teshîhên ko me di nivîsarên wan de dikirin awayê nivîsandina xwe bi gelekî edildandine.

Seh kirine ko li şûna "Min ji ber xwe got" "Ji ber xwe min got" nayê gotin, di zimanê axaftinê da bihata gotin jî di zimanê nivîsandinê de ne rast e. Di san rind kete serê wan ko mirov nikare "Mehîn min" binivîsîne lê gerek e wekî tête bi lêv kirin "Mehîna min" binivîsîne û heke mehîn ji yekê bêhûr in, di hin şîwan de, "Mehînê min" bête gotin jî, di zimanê nivîsandinê de divêt "Mehînên min" bête nivîsandin. Ji ber ko a pêşîn yekejimar "mufred" a paşîn pîrejmar "cem" e. Belê bi vî awayî Hawar bû dibistana nûgihîştîyan û tê de çend xortên me kêr û zêde hînî nivîsandinê bûn û îro dibin jî. Ji xwe, madam nivîsevanên me ên îro ev in û nivîsevan ji nav xwendevanan tene helbijartin, diviyabû birekî Hawarê bikeve destê wan. Mîna ko ketiye jî. Me jî destûr da. Em ê pêleke xweş li ser vî awayî bi-sekinin jî. Pê çend xortên me hînî nivîsandinê dibin û Hawar dikeve nav xelkê û rast bi rast dibe kovara wan.

Ji xwe ev şî'r û bendikên nûgihîştîyan ne bêkêr in jî. Ev nivîsarên ha ji bona me, ji bona herkesê ko çavên zanîn û zanahiyê lê hene û xasîma ji bona nişîa tê gelekî hêja û bi fêde ne. Di wan de awayên gotinê welê hene ko ji gund li gund diguhêrin û bi lêgerînê nakevin dest.

Ji xwe biserketin û tekûzbûna zîmanekî weke zîmanê me bi çend awayê xebatê tête pê. Bi nivîsarên zanayan, bi nivîsarên wan mirovên ko hima xwendin û nivîsandinê

dîzanin û herwekî bi xwe dibêjin û diaxivin û ji devê xelkê dinivîsin, bê ko tu tiştê wê biguhêrinin diguhêzînin rûpelan.

Ji û pê ve tişteki dîn jî heye ko hîm û bîngêhê hemîyan e. Ew jî daba (edebiyata) xelkê ye, stran, çîrok h. p. Di vê baberê de xwendevanên Hawarê qet nexebitîne. Herçendî me ji wan re çend çaran got û nivîsand jî. Heye li xwe dananîne mirovekî nezana, dengbêjekî an mitribekî bibin pêşberî xwe û gotinên wî danivîsin. Belê çêtir dîtîne ko ji ber xwe binivîsin. Lê ne welê ye. Ev texlît nivîsar jî hertexlîtû bêtir bi kêrî me tîn û hêja ne. Ji ber ko tê de ji aliyekî awayê gotinê îro û ji milê dîn awayê gotin û pîrsên çend sed salin hene ko îro di zîmanê axaftinê de nînin û yekcar wînda bûne. Belê destê me de çendyek hebûn. Me ew belav kirine. Lê ew ne bes in. Ev kanî hinde kêr e ko bînya wê zû bi zû naye dîtin. Kurdistan jî perçeyên holê têjiye. Bi salan ve bête nivîsandin kuta nabin.

Me li ser meseleya nivîsaran û di dora wê de - ko pê re girêdayî ne - hin tişt gotin. Em niho vegerin li ser dersxaneyên xwe, li ser qesta xwe a bîngêhî.

Hejmarên Hawarê bûne hîfdeh. Bivênevê çend xwendevanên me hene û çendek xwe bi xwe hînî xwendinê dibin, Lê ev ne bes in. Ji kê bête pîrsîn - nemaze ji mirovên xwenda - hûn çî ra van kurdan hînî xwendinê nakin. Cuhaba wan cuhaba nekêrhatîyan e. Hema ji we re dibêjin: Ma em çî bikin kanî dibistana kurdan, ev çend dewlemendên me hene bila yek ji wan rabe û ji me re dibistanekê ava bike h. p. . . belê xebêra wan e. Îro dibistanên me nînin û dew-

lemendên me ji guh nadin.

"Madam heta îro ji nav me ew dewlemendên camêr derneketine ko bi derbekê hezar zêran bidin û ji bona milletê xwe dibistanan û binyanên xêrê çêkin" (ji pêşgotinka nîzamuna ma civata xêrê). Em ji bi derbekê nikarin dibistanan çêkin. Gelo em heta çêbûna dibistanan di hêviyê de bimînin? Heke welê, hingê millet hêj gelek nexwendî û nezan dê bimînit. Gelo jê re tevdir heye? Belê heye û gelek hêsanî ye. Ew ji vekirina dersaxana ne. Li Beyrûtê qederê dused mal kurdên Omerî û dora Mêrdînê hene. Ji xwe re hemaliyê dikin. Diktor Bedir-Xan herçî xortên wan - tê de hin sih û sih û pênc salî ji hene - gehandine hev û dane xwendinê. Paş ko şagirt gihane hejmara bîst û pêncan Diktor Bedir-Xanî ji hukûmetê ruxseta dersxanekê xwest û girt. Îro li Beyrûtê bi awakî resmî û ji aliyê hukûmetê nas kirî, dersxaneke kurdî heye, tê de ji sihi bêtir kurd dixwînin û mamhosteyê wan Mustafa Ehmed Botî ye.

Îro ew li ser xwendayên kurdan wezîfe ye, ferz e. Û ferzeke 'cyn, lê ne kifaye: Vekirina dersxanan... ji 'Endyûrê heta Cerablusê bîvênevê çend xwendayên me hene, bila ji xwe re dersxanan, wek dersxana Beyrûtê vekin û vî milletê bextreş û belengaz ko ji nezaniyê bûye xulamê biyaniyan bixwînin û bigihînin. Heke divêt ji hukûmetê jî ruxseta wan bistînin. Bêşik e ko heger qenc hate xebitîn hin ji wan dersxanan sibe dibin dibistan. Ji ber ko ew ne li Beyrûtê, di erdeke welê de bêne vekirin ko xelkê wê kurdmanc in.

Herwekî Hawar tovê elfabêya nû bi erdê

werkir, dersxane jî dibin hîm û tovê dibistanan.

## HAWAR

### KURDISTAN BÊ DIBISTAN

Çi bikin ji te Kurdistan  
Te pir hene şehristan  
We lêkin bê dibistan  
Çi bikin ji te ey welat  
Dereng li te rojhilat  
Îro divêt pir xebat

Xebat xebata mêran  
Hûn wek piling û şêran  
Hûn tev çûyin bi kêran

Xebat xebat e zêrîn  
Hûn tev hiş û bi bîr in  
Hûn baş eger bi kêr in

Dinya roj e an şêv e  
Kurdistan tu biaxêve  
Ez westiyam mam rê ve

Rê dwir e an dirêj e  
Kurdistan tîştêkî bêje  
Dilê min tev qirêj e

Kurdistan hêj tu sax î  
Xelk komik in tu şax î  
Kurdistan tu tev dax î

Dinalim ez herwextî  
Ez im zîlamê rextî  
Pê sax kim al û textî

Ma al û text ew çî ne  
Heçî hebit yek jin e  
Dizanit derdê min e

Al bilind e di herwext  
Dixwazit zanîn û rext  
Dibê ez im bext û text

**Mustefa Ehmed Boti**

## **TOLA KARWÊN**

Kur û keç jin û zaro bi rêketin diçin  
Tazî rût, laş bi birin berf û herî li bin

Ciwan, kal, şîmij gedek, yek hawî ne bédeng  
Rêwî ne li wan tarî, gon bûne zer bêreng

Karwanek, karwanekî ziz, diguhêzin, diçin  
Diguhêzin, ji kû li kû, diçin bê ser û bin

Nenas e ji kû tèn, di vî halê ecêb  
Rencide, êş û keser, hevalê wan xerîb

Şewat e, lehi ye, ji ber çî bazdan revîn  
Hin hene, di nav wan de porgij gişê wek dîn

Serqot in, pêxwas û rût, heta navran û çip  
Rê asê, kevir û kuç, pêşiya wan tev şip

Derketî, derketî nehiştine êl, welar  
Eşîrin, tê de hene, tor in û çend tar

Çiwelek, cotkar û beg pismûr, axa û mîr  
Mela ne, şêx û seyda yek awa ne bin nîr

Destbestî, girêdaytî mil bi werfî, zencîr  
Merbend û kelemçe ne, karwanekî hesîr

Peya ne neynok ketî pehnî bûne qeşem  
Ji ferş û zinar û lar da tèn, diçin çem çem

Peya ne bi xwe peya lê muhafiz siwar  
Jendirme eskerê reş ji pêl û pêr û par

Onbaşî û çawîş û yek mulazim li ser  
Geh bi lez geh bi bez diçin bi kaş û ber

Destan de tajang û şor milên wan ve tiveng  
Tajangan dirweşînin bi dengê ring û vîng

Şîlfên wan xwe dipêçin li rû gerden û ber  
Ko jê bûn ji şopa wan tev xwînin têne der

Qêrînek, nalin û ax ji karwanî ko çû  
Jenderme nav didin wan "Hey kafir kurd  
Yürü"(1)

Şev û roj rêve diçin, bê weçan û vesîh  
Kal û pîr û xort, keçik tev xuyane wek sîh

Rêwiyek deborî û dil kir ko seh bike  
Lê hate vegerandin bin de qet pits meke

Kurd in û Kurdmanc in, diçin bê armanc

\*\*\*

Bêxweyî, bêxwedî ne, Xwedê hiştê reben  
Birçî, nêz, ne gezo ye, tu xwedê ew bikin

İsa ji, Muhemmed û Mûsa ji nas kirin  
Berê xwe çend caran li te ji nas kirin

Ne niho ji mêj ve tu nas kirî ev qewm  
Ne heyf e sed mixabin qet seza ye ev lewm

Yezdano mebe tu ji bûyî hevalê xurt  
Bêguneh û bêşûc, tinê kurd in kurd

Çûn çûn çûn, di ber di ser newal û gaz û gir  
Armanca bê armanca heyîna xewiyane kir

Rê li wan hate girtin, berfende, pûk, êşot  
Zipik û teyrok û berf datînin ser rût û qot

Li kavilê gundekî siwar bûbûn peya  
Di nav pêlên berfê de siwar bûbûn winda

Hespek yê mulazimî hebû esîl, kihêl  
Deştî bû qet nedibû, çiya pûk berf û pêl

Yekî kal, ji karwanî lê hebûye kulav  
Mulazim ji onbaşî re rabû got: "Hey seba"

Kulavî here bîne, hespê min pê dake  
Zinê wê lê bihêle lê hefsarî rake"

Zabit û jendîrme esker bin banekê xwe dan  
Kur û keç jin û pîr tev de mabûn bêban

Ji der ve nav berfê de bin zîpikê de man  
Hewraniyê şeva reş tenê lihêf û ban

Sibetir hildihar roj bi tjangê çawîş  
Dikete nav karwanî li wan dikir êrîş

Çawîş got zabitî : "Efendim îşte halo  
Geberdî gittî kalo hîç dêmedî lolo" (2)

Henekê xwe pê kirin, kalê rebenê tazî  
Berfê de mabû bê kulav hate dîtin mirî

Zabitî got: "Ulan be, ev kurdekî çak e  
Ne bi xwe be ji lê kulav bi kêrî me hat pak e"

Tev rabûn, peya siwar, bi rêketin pêş ve  
Diçûn lê êdî reben, hin jar diman pêş ve

Zabitî dît ko karwan, hin bi hin dibû dirêj  
Westa û bê derman, rêwîngî bûbûn tev gêj  
Çare çar û sê bi sê rêz girtibûn bo rê  
Wek berê rêz nediman, fîrk dibûbûn herê

Gavên nû diketin navbera xêz û rêz  
Ji çaran û sisêyan, hin li paş û bê xêz

Mulazim ji xwe diviya ji dil û can dixwest  
Herçend heyê ew çend hejmaran bike rast

Ji xwe kar ew nebû ko bi ser keve Tûran  
Ji lewra diviyabû ko kêr bibin pûran

Zabitî got onbaşî, çawîş û eskeran:  
"Arkadan yandan sûrtin, duşurûn be topdan" (3)

Destan de tjang û şûr dirêj li karwan kirin  
Herçî şîmij û gedek bin lingên xwe birin

Zarîn rabû û nalîn, ji karwanê dilreş  
Rengê sor li erdê bû, belav pînî û beş

Mejtî tev perçiqîne, xuyane çend serf  
Cerg û dil sîng û ber, bûbûne gîş herf

Tvingên xwe rast kirin, didan ji pêş û paş  
Teq û req vizz û vingîn li wan dihate baş

Yek du sê çar diketin, ser çaw bixwîn kambax  
Tenê ji jinan dihat dengê zarîn û ax

Dimirin mêr ne deng e ne ax û zar nalîn  
Paşila hev diketin hevdu ra gor in hêlîn

\*\*\*

Cih gelî û newal bû, herf diket pêl bi pêl  
Çarnîkar û hawîr giş devî zinar û rêl

Moran û mij li dorê, rê dihate girtin  
Zabit û esker gişan, ev halê xerab dîtîn

Tîrs û lertz ket dilê wan, mirinê nêzîng dîtîn  
Nîvmîrî karwanê xwe, hima li wê hiştin

Zabitî da pêşiyê, esker ji paş ve çûn  
Tevî hev di berfê de, bi lez winda dibûn

Ber cendekan direvîn, ji ba û berf û pûk  
Geh li daran diketin, geh li kelem û rûk

Karwan ma cihê xwe de, geh nalîn e geh ax  
Pir ne ajot nîvmîrî qefilîn bûn tev ax

Bi rojan ve berf barî, bû kurşe û qeşa  
Hêj dihat û dibarî seranser û pê da

Karwan di bin de ma, girek rabû bilind  
Heykel ji karwanî re, spehî, hulû û rind

\*\*\*

Belê ew cih newal e, Sîpan di ber û serê  
Sîpanê Xelatê ye, Tirba Xecê li berê

Siyabend û Xecê tê de, herdu spîndar diyar (4)  
Nawbera karwan û tîrbê kêl ji wan re ew dar

Zivistan paş ve mabû, dinya bûbû buhar  
Spîndar bi ser ketin, şîn bûbûn beyar

Gakovî weke hersal ser spîndarê gihan  
Ko ketin bi darê hev tola xwe gî berdan

Belê şîn, spîndar şîn, şax û çiqil li pêl  
Lê di ber karwanî de, ber tîrba wan de kêl

Nexwarin li hev harin û deng li wan kirin,  
Em di we bihûrtine, spîndarino werin

Em bûne dost û bira, tola me jî yek  
Tola me tola karwên, karê me gurtz û çek"

#### Celadet Alî Bedir-Xan

1) Kurdê kafîr bimeş!

2) Cehimî mir kalo û qet ne got "lolo".

3) Ji paş jî rex bajon, tevde biqedînin.

4) Çîrçîroka Siyabendê Silvî nas e. Li gora wê Siyabend gakoviyek kuşt û di dema ko ew şerjê kira lingên wî şemîtîn û ket li ser sixê dareke hişk. Paşê Xecê jî xwe berda li ser sixî, six di bin wan de şikiya û herdu laş ketin newalê. Li şûna wan du spîndar rabûn û şînbûn. Ji ber ko Siyabend û gakovî bûbûn dijminên hev û spîndar jî li dewsa wan rabûbûn gakovî hersal dihatin û pelên wan dixwarin.



## XWE BINAS...

**B**elê xorto xwe binas, lê ne ser pelekî, xwe qenc, bi dehkere û bingeh binas.

Xorto! Heke te hejmara Hawarê a pêşîn xwendiyê, divêt bizanî û bête bîra te ko min ji Hawarê re bi vî deng û awayî dest pê kir û di xêza wê a pêşîn de gotibû:

"Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Herkesê ko xwe nas dike dikare xwe bide naskirin". (Hawar, sal 1, hejmar 1, rûpel 1, yekşemb, 10 gulan 1932)

Îro ez vedigerim ser vê gotinê. Tu îro ji berê ji wê çaxa ko ev xêzên ha hatine çapkirin xwendatir û zanatir î. Belê ezê îro van gotinan ji te re rave kim, ji hev derêxînim û mana wan bidim zanîn û te ji te re bidim naskirin. Da ko tu, hûn bi tevayî, bikarin xwe ji biyaniyan re, ji cihanê re bidin nas kirin.

Heyina te, heyina milletê te, tenê bi hatin nasînê têre pê. Hetanî ko tu meyt naskirin, xwe medî nasîn, di nav koma milletan de cihê te nîne.

Ev kitêboka ha ji bona vê yekê hatiye nivisandin. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin.

Tu kî yî? Ji kîjan millet û nîjadî yî? Zimanê te çi ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di çi halî de yî? Jê çawan dikarî bifilîti?

Qenc bixwîne, rind bala xwe bide, hin berên wê jiber bike. Paş ko te ev xwend û seh kir, nas û hevalên xwe re bide xwendin û ji nexwendiyarî re bi xwe bixwîne û bide zanîn.

Heke te holê kir, bi gotin û pendên min ve çûyî, tu xortê min î, xortê milletê xwe yî, sezayê şabaş û pesn î. An ne... ji xwe destên min ji te dibin.

## Pendên Ayina Kurdaniyê

Xorto! Jîna te, jîna milletê me bi herawayî rojêke qewemandinê ye. Lê ev roj ne mîna rojên din e. Saetên wê ne bîst û çar lê bêhejmar in, roj tê de bi carên bêpîvan diçir ava û hiltêr.

Tu di roja qewmandinê de zayî, tê de dijî, heye ko di wê rojê de bimirî jî. Ji xwe tu ji jînê bêtir ji bona mirinê hatî dinyayê.

Ev jîn ji me re gerek e ji bona ko em di dema xwe de wê bidin ber çavê xwe û bimirin.

Xorto! Tu çilê milletekî kevn, nijadekî mezin î. Pêşiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de rakerî ne. Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Arîyan î. Lê îro ne tu yî, dilê, reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û bindest î.

Lê te sond xwariyê, li ser bext û xencera xwe. Sibe tu yî aza serefraz, bextiyar, kamîran, serdest û bi serxwe bî. Te ev rê ji xwe re bijartiye û tê re diçî. Hêj gelek neçûyî. Tenê çend sale in ko tu tê de yî. Carinan diçî, carinan disekinî şaş dibî, ecêbmayî dimînî, li dora xwe dinihêrî, xwe bi tenê dibînî, didî nependiyar.

\*\*\*

Ev pêlek e em tevde bi riya çiyakî asê ve diçin. Herçend em ji cihê xwe ê pêşîn dûr di-

kevin hawîr, çarnîkar fire dibin, ba tê de xurt e, pêşiya me pê da bandev û bahos e.

Belê rê, rêke asê, bi kevir, pêşiya me lat û ferşinin zinar, kop û gaz in. Lingên me de ne sol, ne pêlav dimînin. Carin hene, em kirasên xwe diçirînin û ji lingên xwe ên birîndar re pêreşkan çêdikin.

Bi destên me re çîmên hesinî hene. Serên wan dikevin kuç û berên rê. Ew wan dialêsî, bi rêva û pê ew kurt dibin, em di ser wan re ditewihin, piştta me du ta dibit. Lê herçend çîmên me kîn, piştên me du ta dibin rêya me jî ew çend kurt dibit.

Rojin hene li me tarî ye, roja me girtîye. Lê em bi ruhna hiya dilên xwe hawîrdora xwe dibînin.

Şevî hene xew li me diçit, lê em di hişyarî û di ramana armanca xwe de canên xwe divesihînin.

\*\*\*

Xorto! Te ji dîroka milletê xwe, karek li ser xwe girtîye. Ew barekî giran e. Ji xwe barên giran para mêran, para mêran barê giran in. Te ew li piştta xwe kiriye û daye kaşa çiyayên ko bi rê ve bilindtir û asêtir dibin.

Di wan de ne berravîne şevêrê ne jî şop û rêça pêşiyên diyar in. Em bi xwe, bi ling, dest û neynokên xwe di wan kaşan de rênin nû vedikin, şopa xuşnok û dewlikan dihêlin û pêş de diçin.

Di paş me de karwanekî dirêj, rêwiyên bê hejmar hene ko di wan neqeban re dê biborin.

Herçend hildikişî û ji deştê dûr dikeví, diwestî, lê ew çend zexm û xurt dibî. Hawîr diguhire, uştînin welê dibîni ko bi te nenas in. Ji dûr ve leylanan de, dinyake nû, ji bo te nû bi xwe kevn lê jibîrkirî, dibîni.

Ew der gulîstan, gulgeşte e. Tê de avên zelal diherikin, mêrgên rengereng wek kes-

kesorên ezmanî diçirîsin. Darên wê tev kesk û bişkivîne, xelkê wê delal, ciwan û xurt, herçî mêr zava herçî jin hêj nû bûk in. Ew dinya tu bi xwe yî, ew çurdanî ye.

\*\*\*

Carinan lingên te dişemitin, dikeví xwişeyan, di şawan re diçit, di ber zandoran re di-sekinî, li kûriya wan dinihêrî. Çavên te şevêrê tên, xilmaşî dibî, dilê te jibîr ve diçe, pêlekê li wê dimîni. Erd qelaç e, şînahî ne diyar in. Di dora te de tenê çend pel tihnav hene. Bi bihna wan di xwe dikî der, hişyar dibî û didî rê.

\*\*\*

Xorto! Te berê xwe daye mizgefteke welê ko ji awîze û fanosên wê tenê ruhniya xweşiyê diherike. Tu tê de di ruhni û tariyên wê de bi xwe bihesî bîr bibî, bîrewerî heyina xwe bibî. Tu ê bizanî ko heta niho neyî-nê de bûyî.

\*\*\*

Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekinî ye. Di şeklê mirovekî de ye. Tu lê dinihêrî, ecêbmayî dimîni.

Herê tu dibîni, dest, ling, mil, pol, parsû, paruhan hertiştên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berpaş diçit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş. Ji ber ko ji aliyekî pêş ve, ji aliyê din paş ve tete kişandin.

Tu zanî çira xorto? Lewma ko herdu ling ne yek in. Navbera wan de yekîtî nîne. Di-vêt, tu bixebitî van herdu lîngan bi aliyekî ve bilivîni.

\*\*\*

Xorto! Çarnikar girtiye. Di aliyeñ rojhilat, rojava û nivro de sê milletên din hene. Çav û guhên xwe bel kirine li te fedikirin. Lê ne ji bona qenciye. Hersê ji dijminên te ne.

Tu îro di bin nîrê wan de yî. Te dişidînin. Bi xwe ditirsîn. Ditirsîn ko serê xwe rakî. Ji xewa xwe a giran û kevn hişyar bibî û hertiştî bîr bibî.

Belê tu hêj ciwan î, zaro yî, nezan î, hov î. Lê bi xurtiya milên xwe bi wan dikarî. Ew gihaştî ne, pîr in. Mezin zexm û xurtirbûna wan nemaye. Her weku tu zêde bikî ewê kêr bikin. Gava pêlên direxkan şin dibin, yêñ darên kevnare diweşin. Digel xurtiyên xwe ditirsîn. Ji ber ko xurtiya wan derevkî ye. Bi top û tivingan e. Lê bi xwe bi laş û canên xwe kal û komik in.

Belê xorto ew dixwazin ko tu ji wan re bibî xoşikî. Kirine serê xwe te daxewin. Zimanê te jêkin û yêñ xwe bi devê te ve bikin. Da ko tu nikarî kurdaniya xwe bi lêv bikî. Lê tu metirse. Ew nizanin ko avên erdê bi ziwakirina pingavên ruyê erdê naçike.

Disan nizanin ko kurd ne avzê in, kanî ne. Bi dagirtina çem û rûbar bête girtin ji serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber bendan de dipingire, rojekê li wan tete hev di ser wan re diherike û wan di bin pêlên xwe de hildiveşîne.

\*\*\*

Xorto! Tu ji bona hişyariyê dixebitî. Millet nivistiye. Di xew de ye. Ji lewra tete kuştin. Yêñ te di xewê de bûn. Ewan bi ser yêñ te de girtine. Ma mirovên hişyar ko di xwe dikin der tene kuştin.

\*\*\*

Xorto! Rêya te dirêj, armanca te hêj dûr e. Lê tu bi rê ketiyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe ji. Armanca te aramanca çend nîşan e.

Ne tenê armanca te û nîşan te. Gelek rêwiyeñ din de bèn û bidin ser şopa te. Her rêwî rîya armancê kurt dikit. Ê nû ji wê dest pê dikit ko pêşiyê wî li wê hiştiye. Rêya te ji ya nîşan din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketine. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji pola bit, destê te hesin.

\*\*\*

Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji derve dijmin dirêji me kiriyê. Ji her milî erîş. Di hundurê kelê de şerekî din, bê eman û ji ê pêşin mezin û diwartir heye. Şerê me bi hev du re ye. Di mal de ji dijmin.

Herê Xorto! Birina me a mezin û xedar dexts e, berberî ye, jana dextsê ye. Em sîngjar in. Ji derve serma li me dixê. Li hundur em bi janê dikevin. Di nav xwe de em çend ber in. Berekî kiçik serê xwe daniye li ser sînga milletî, Li hilavêtina dilê wî guhdar bûye û ji xwe re bê deng û pêjn dixebite. Li dermanê nexweşê xwe digere.

Berekî din heye, li wan temaşê dike. Peyayên vê berê dibînin ko wan tiştek aniye pê û hero ditînin. Li wan didexisin. Hingê ew ji dil dikin tiştekî bikin. Lê mîna tiştê çêkirî an jî çêtir nikarin binin pê. Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkîroxan bikin û ê çêkirî pêşve bibin û bi ser xî. Lê dexsa wan nahêle. Ax ew jana xedar bi pêşira wan girtiye, wan diêşîne, dukuje.

Ji ber ko çenekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên diñ ji çêkin. Çiku ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çênabe. Û holê çavê xwe didin xirabiyê. Ji nekêrhatiya xwe bi tevr û bivir li ser avahiyên ko hînekî din lêkirine, radibin. Li wan dikevin, lê bivir û tevrên wan ne li avahiyên lê li ling û ejnûyên wan dikevin.

Tu zanî Xorto ew wek çî û kî ne?

Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stuyê xwe re tewandiyê û li sînga ezmanê zelal tîf dike. Tu bi xwe bîr dibî ne, ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyên wan. Ji xwe rêvîn bûn, yekcar dibin seg. Belê xorto! Dexisiyê tu kuştî, berberiyê tu mirandî, belaviyê tu kevandî. Hin hene dixwazin bixebitin, lê tu kes naxwaze li ber destê yekî din de bixebite. Dil û çavê herkesî di ser destiyê de ye. Herkesê dixwaze bibe axa, lê çavê tu kesî di peyatiyê de nîne. Ji lewra di nav me de axa nînin û herkes axa ye. Lê tu ê holê nekî. Tu bi awakî din bixwedî bûyî û hatî gehandin. Belê tu jî li mezinahiyê bigerî. Tu jî dê bixwazî bibî axa. Lê ne bi vî rengî.

Xorto! Guh bidêr. Rind bala xwe bide. Berê pêşîn tu ê bêxî serê xwe ko tu xulamê millet û paleyê welatê xwe yî tu ê xizmeta wî bikî û ji bona wî bixebitî. Dîsan tu ê bizanî ko axayên rastîn ew in ko xulamîya milletê xwe dikin, ên din tevda axayên derewîn in.

\*\*\*

Dema ko tu dixebitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebitin an ne. Herçî ko dixebite karê xwe pêk ditîne [tîne] û karê tu kesî bi xebata yekî ditir naçe serî. Herdar bi pelên xwe sayedar e, ne bi pelên darên dorê.

Tu ne bi tenê yî. Di dora te de hinên din jî hene ko dixebitin. Heke te tiştêk pêk anî li dora xwe fedikire [fekire], li tiştêkî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûz bibit. Hûn hemî ji bona avahiyekê dixebitin. Her kî ji we himê wî daniye Xwedê jê razî bit. Pesn jê re bit, heqê wî ye. Hûn jî herin dar û qirş, herî û kevirî peyda bikin. Dîwar an banekî wî çêkin. Navdidaniyê bidin. Lê ne ko bidexisin.

\*\*\*

Tu ketiyî cînariya yekî ko avahiyek bi du

mezlan aniye pê. Tu di xwe re wê xurtiyê dibînî ko bikarî avahiyêke çend tayîn û mezelin ber pê bikî. Li avakirina mala mezin bi xerabkirina a kiçik dest pê meke.

Belê Xorto! Di dewra xwe de kêmanî û zêde, kiçik û mezin, civat, kom, civanokan dê bibînî.

Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di hertiştî de, nemaze di karên nû dest-pêkirî de, pirê caran, kêmanî heye. Heke te ew kêmanî ditîn, hima dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmanîyan biedilînî.

Hilweşandina sitûnekê hêsanî niye. Hûner di rastkirina sitûna xwêl de ye.

\*\*\*

Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin.

Lê heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkîroxan bikî hingê bi ên çêkirî şa û kêfxweş bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona milletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne.

Xorto! Te dit ko bazekî kevroşkek girtiye. Mebêje, ma girtina kevroşkê jî tiştêk e. Lê bêje te xezalek girtiye. Ji bona ko baz li xezalê bigere û bide pey wê. Xorto! Min got heke tu nikarî çêkî. Lê bawer bike, ewle be ko te dil hebe tuyê bikarî jî. Herçî ko dixwaze dikare jî.

\*\*\*

Wekî tu dixebitî dexesker ji dora te kêmanabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe.

Heke di riya xebata xwe de şemîtî û ketî, tu zanî ew ê çi bikin. Mebêje ko ew ê bênd bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî neşikiyaye.

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welaqparêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Ên dexisok tu zanî dê çî bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa wan nahêle. Ew ê bêjin: Ma evî çî kiriye, ji bona xwe xebitîye û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev jî tiştek e.

\*\*\*

Xorto! Herçî ko bi te berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji xwe di dewra gelekî de strîf bi hezarî ne.

Ew di nav xwe de nexweş bibin, pev biçin jî, li te dibin yek, destên xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmtir in. Kêmaniya wan wan digihîne hev.

Ji xwe di tebişê de jî welê ye. Tiştên qenc û hêja hindik in, nehêja û bêkêr zahf in.

Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespên kihêl hebin, di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarên reş hene. Li nik xelkê gundî ne piraniya garanê, lê hindikayiya hespên kihêl bi qedir û hêja ye.

\*\*\*

Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko eleyhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayên nekêrhatî û mirov ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û kutkuta wan e.

\*\*\*

Xorto! Xebata te mîna dengêkî ye. Ma deng bi pîskirinê têtê vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pîskirinê natirse ew ê her bilindtir, çira te ko bi pêjnê nalerize ew ê

her geştir bibe.

\*\*\*

Keçê! Di van gotinan de para te ne hindik e. Keçê! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, diya wî xortî yî ko min şîret lê kir û kar û xebata wî şanî wî da. Belê keçê, ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew lorand. Di dawetê de te jê re tililand. Di roja qewmandinê de te nav di wî da. Ji xwe tu berekê wî yî.

Keçê! Min ji te divêr, tu xortê min welê bixwedî bikî û bigihîni ko li pesn û şabaşan seza bit û lome jê mebit. Keçê! Tu di her kar û deravî de arîkara xortê min î. Tu ê pê re bijî, pê re jî bimirî.

**Celadet Ali Bedir-Xan**

## CUHABA DAYIKÊ

*Ji nûxuriyê xwe Qedrî Can re*

Qedrî Qedrî canê min  
Kurikê min çavê min  
Nivîsara te giha  
Xweşmeqam û pir biha  
Herê zîz e bi kul e  
Xweş bihn e ew sorgul e  
Hem deng e hem laje ye  
Xweşkelam e bêje ye  
Silav e hem pergî ye  
Peyamek ji rêwî ye  
Bexikê min dikalî  
Li maka xwe dinalî  
Ji dayikê dûr ketî  
Nalîna te kûr ketî  
Belê nûza newzar î  
Lê dikevî terad î

Şhlewend î siwar î  
 Xortê min î li kar î  
 Herçend dûr î û çûyî  
 Nûxuriyê min lê tu yî  
 Naçit ji bir nûxurî  
 Bi kurên din û nevî.  
 Dilê xwe her xweş bike  
 Bihnûna xwe geş bike  
 Ji paşila dê derketî  
 Nav birakên xwe tu ketî  
 Tu ketî nav birazan  
 Eşîreke pozberan  
 Êlek e ev gelek kevn  
 Xudan rêzik xudan tevn  
 Li Sirûcê serhedan  
 Peyda dibin li Îran  
 Xweş civat in di mekş in  
 Di şerî de şûrkêş in  
 Birazî ne biraz in  
 Wek xezalan dibezin  
 Eşîreke sîng bi pirç  
 ko mezin bûn dibin "hirç"  
 Spêhî, çeleng û boz in  
 Henîbilind bi poz in  
 Hin pirsên wan bibehîn  
 Xweş meqam e Mem û Zîn  
 Ferhenga xwe bike pir  
 Lê mehbêje "Yazmîş kir"  
 "Gorişmîş bûn" jî hebe  
 Tu eva ha qet mebe  
 Hêştir dibên deve here  
 Ev pirsêke kevnar e  
 Kurdmanciyeke xwerû ye  
 Şukrê meke gezo ye  
 Bi xatrê te kurê min  
 Bi te ve ye dilê min

## HAWAR

## ŞEHNAMA ŞEHÎDAN

*Yên ko piştî Şêx Seîdê rehmetî şehîd bûne*

### Bir: 1

Dixwazim ey dilo jaro bi çakî  
 Heîrî mîrên welatê me tu rakî  
 Bibêjin ey şehîdê dîn û millet  
 Bes e rabin serê roja me derket  
 Beg û axa ji we îro digazin  
 Bes e rabin wekî mîran, merazin  
 Dilo jaro ji Xalid beg re bêje:  
 Bi serbestî tu yek nutqê birêje  
 Bibêje: Xalido Rabe dereng e  
 Hemî kurdan bi hev re daye deng e  
 Ji wê rabe here bêje: Fuad Beg  
 Ji kurdmanca re rêzan î tu bêşek  
 Qelem fêde dikî îro tu rabe  
 Xewa şêrîn ji bo me pir ezab e  
 Di vî wextî kesî wek te nezaye  
 Belê çi bikim ji min îro cuda ye  
 Dilo Bêje: Kemal Fewzî tu kanî  
 Tu dixweş be bi van rojê ciwani  
 Dizanim ko di vî wextî tu rabî  
 Welatê me ji xwînrêjan cuda bî  
 Dilo Yûsuf Ziya rake ji gorê  
 Bere kuştin bi carek bidne dorê  
 Ji bo kurdan bikin cehd û ebat e  
 Hela rabin sibe îda welat e  
 Riza rabe cihan bûye serevraz  
 Di dinya mane tenha em belengaz  
 Binêrin hûn cihê textê Şerefxan  
 Xerab bûye ji destê lawê Tûran  
 Eya Salih Begê Hênê helist e  
 Welatê me li ser te jar û mest e  
 Bi destê xwe tu bigire şûrê kurdan  
 Bi dev bêje ji bo me we'zê Quran  
 Dilo rabe bibêje: Hacı İxtî  
 Bira rabe xwedanê text û bext î  
 Kurên te tev dikin qêrîn û hawar  
 Ji kurda re hemî bûne fedakar

Li cî rabe ji cî rabe Heqî Beg  
 Li şûn bazan dixwînin hacî legleg  
 Welatê me xela rakir li şêran  
 Niha seyd e ji bo kundê şikêran  
 Were Xeyrî Begê rabe ji Dêrsim  
 Ji te halê welatê xwe bipirsim  
 Herê ew Me'den û bax û rezana  
 Gelo rast e kete destê nezana  
 Bes e Rasim tu rabe ey Efendî  
 Bixwîne tu ziman û zarê Zendî  
 Binêre xweş li vê cehd û xebatê  
 Ji rojava hetanî rojhilatê  
 Ji Hîzanê tu rabe ser xwe Burhan  
 Tu burhan î ji bo dewa me kurdan  
 Bi navê te dikin cehd û xebat e  
 Netîca me belê tola welat e  
 Wehe rabe Mu'ellim tu ji Pîran  
 Ne Pîran e belê pîr e ji derdan  
 Gelek jar e ji ber derdên kurên xwe  
 Xerabê xan û man in hundurên xwe  
 Teyib Alî werin carek şiyar bin  
 Qelem bigrin li şînbozan siwar bin  
 Belê zanim ko em pêk ve bibin yek  
 Emê gogê herî xelkê bibin şek  
 Were rabe Suleyman lawê Ehmed  
 Welatê te hemî zozan û serhed  
 Bes e rabe ji bo te hatî ferzend  
 Belê ferzendekî Rostem hunermend  
 Were rabe Effî Beg wek egîda  
 Li meydanê bidin xar û cîrîda  
 Eşîra Heyderan û hem Celalî  
 Ji meydana kemalê mane xalî  
 Bibêje Yûsufo rabe dereng e  
 Li heralî binêre qal û ceng e  
 Welatê te hemî mêrg û bihuşt e  
 Delalê min tu rabe çaxê geşt e  
 Dilo Xalid Begê Yûsuf bibîne  
 Ji xew rake Kerem Beg pê re bine  
 Bibêje ey hunermend û serevraz  
 Tu rabe bo te hazir bûye daxwaz

**Cegerxwin**

## ŞÊR Û GAYÊ ZER

**D**ibêjin carekê sê ga hebûn. Yek zer bû,  
 yek reş bû û yek spî bû. Hersê heval û  
 hogirên hev bûn. Bi hev re şîr xwaribûn. Û  
 di xweşî û firehiyê de mezin bûbûn. Û he-  
 yiya xwe dabûn hev. Û ketibûn nav qami-  
 şekî asê de. Ji bo paraztina xwe ji dehban.  
 Çend caran gurî û hirç û piling li wan der-  
 ketin, çûn ko wan bikujin. Dîtin ko hersê  
 hev re hevalbend in û xurt û zexm in û har  
 û hêç in. Newêran xwe li wan bidin û biqew-  
 wimînin. Tu rê ji bo kuştina wan nedîtin,  
 Zivirîn çûn nik şêrekî. Û jê re qise kirin û  
 gotin: Sê gahê wisan li filanderê de hene.  
 Em çûyin wan bixwin me newêra xwe li  
 wan biqewimînin û me tu rê ji kuştina wan  
 re nedît.

Şêr got: rê û elac li nik min û ez dizanim.  
 Şêr çû sehîtiya wan kir, dît ko wisan e her-  
 wekî jê re hatiye gorin, newêre xwe rast rast  
 li wan bide biqewimîne. Şêr rûnişt û mel-  
 heza kuştina wan kir ka bi çi awayî têne  
 xwarin. Rê dît û hêdî hêdî bi hendekekî ki-  
 çik û çavên sist û nizim giha nik wan. Kêfx-  
 weşî li wan da û got: Ma hûn nizanin ez çi-  
 qas ji we hiz dikim û heyran dimînim. Ez  
 hatime da em tev de rabin û rûnin û bibin  
 çar bira û hev re bijîn.

Hersê ga li hev şewirîn û gotin: Em sê ne  
 û ew yek bi tenê ye ew bi me nikare bila di-  
 gel me be, û bi havalîtiya wî qaîl bûn. Çend  
 rojan vêkre borandin û li hev ewle bûn û  
 zanîn ko bûne dostên rast. Rojekê şêr gayê  
 spî û zer nependî kirin û pesnê wan da û  
 got: Em hersê spî û zer in û nêzîkî hev in û  
 ji yek rayî ne. Ma ev gayê reş û pis digel me  
 çi dike û ne ji ra û xwîna me ye û zêde ye.  
 Û hevaltiya wî ji me re nabe û em hersê bi  
 kêrî xwe tîn.

Bûne yek û ê reş kuştin. Şêr bi çûna reşo

şa bû û çavên xwe bel kirin. Hefûkî dî şêr zero nependî kir. Û jê re got: Ey dest bira ez dibînim tu ji spiyo gelek spehîtir û xurtir, zexmtir û eqilûr î rayê min û te dimîne-hev. Ma em nikarin xwe biparêzin spiyo zahf dixwe û çêre xelas kir. Lê em mane welê. Divê ew ji nav me derkeve da ko xweşî hemî li me bimîne. Sipiyo jî kuştin. Piştû çend rojan. Nûka hiş û eqlê zero hatin serî û zanî ko havalîtiya şêr ne ji dostanî û hejkirina wî ye jovan bû lê jovanî dest neket. Û bîra hevalên wî hat birê û zanî vêca dora kuştina wî ye. Ji lewre zanî tenê nikare şêr. Û tu rê ji bo xelasiya xwe nedit ji destê şêr. Pê lingên xwe ax dikola û serê xwe dikir. Qorî û girî û hundirê wî şewitû. Şêr lê nêrît û got: Erê birayê zero ma tu çira diqorî û digirî. Û axê serê xwe de dikî.

Zero got: Giryê min ji bê tifaqiya min û bêbextiya te, ne dostaniya te ye, roja ko reşo hat kuştin. Ez hatim kuştin û roja sipiyo çû ez çûm. Ez dizanim îro dora min e jî.

Şêr lê zivirî û pencek lê da kulabên xwe gihand ser kezeba wî û got: Dostaniya min digel te û biran ev e zero.

**Mustefa Ehmed Boti**

### Ji Ecêbên Dinyayê:

## HIRÇÊ JINDARÊZ

Ji berê ve têtê bihistin ko hirç hijî jinan dikin. Di vê babetê de gelek çîrok hene. Nemaze di nav çiyayîyan de çîrokinin welê zehf in.

Vê paşiyê di Eqcedaxê de hirçekî keçek rewand [revand. Li gora gotinê mesele holê qewimiye: Keçikeke gundî, bi navê Fatê, di rêlekê de dar dibirî. Ji nişka ve hirçek lê

derket. Bivênevê keçik zehf tîrseha. Lê hirçê nehişt ko tîrsa keçikê dom bikit. Xwe xiste nêzingî wê û dilê wê rûnand. Jê re da sehkirin ko ji mêt ve hejî wê dikir û lê digeriya. Keçik himbêz kir û bir şikefta xwe. Bûka xwe tê de cih kir. Ji pelên daran jê re nivîneke bûkîn raxist. Qederê şeş mehan bi hev re man. Zavayê dexisok jina xwe qet bi tenê nedihîşt. Hero hima saetekê derdiket debara malê dikir û dihat. Ji bûka xwe re goştê xav, himê û her texlît fêkî dianîn.

Lê rojekê hirçekî din bi wan hisiya û da şopa hirçê zava. Ji ker ve hat û xwe ji ber deriyê şikeftê teland û li hêviyê ma. Heta ko hirçê din digel selika xwe derket û da rê ko here sûkê. Hingê herdu berber dirêjî hev kirin û pev çûn. Mideke dirêj li hev xistin. Di wî çendî de dilê Fatê ji bîr ve çûbû.

Piştû demekê dilê Fatê di xwe kiribû der. Ji der ve tu pêjn û deng nedihatîn. Hêdî hêdî çû heta devê şikeftê û dît ko hirçan hevdu dirand û kuştûbûn.

Fatê bi hawarî xwe gihande gund û biserhatiya xwe ji xelkê xwe re gilî kir. Lê nihêrîn û ditin ko keçika reben avis mabû. Di zikê xwe de kutîkekî şeş mehîn digerland.

### **Giyayê goştîxur em mirov hem giyaxwur hem goştîxur in.**

Hin heywan jî wek me ne. Lê piraniya wan an goştîxur an giyaxwur in. Yê ko giyayê dixwun goştî naxwun û yê ko goştî dixwun devê xwe nadin giyayê. Lê giya bi xwe ne wek me, ne jî wek heywanan e rast bi rast ne giyaxwur ne jî goştîxur in. Awayê jina wan weke din e. Herwekî ji me re nas e giya rayên xwe berdidin bin erdê û bi wan xwarina xwe dimijîn û dijîn. Digel vê hindê di welatê Amerikayê de giyayek heye wek gur û rovî rast bi rast goştîxur e, goştî dixwe: Ev giyayê ha giyayekî spehî û bi ku-



lîk e kulîlkên wan spî, bi mû nin zirav dor-  
girtî ne. Hin hene kulîlkên wan ji jor ve qul  
û mîna devekî ne. Derxwînên wan jî hene.  
Mêş tîn li wan datînin. Hingê kulîlik aveke  
hinguvîn berdîdî û mêşan tê de dixeniqî-  
nin, derxwunên xwe li xwe digirin û hêdî  
hêdî goştê nêçîrên xwe dihêlinin û dadix-  
wun.

## Xeberguhêz

## ROJA NÛ

Kî qasî me dilhişk e, ew dilnêrm  
Kî qasî me sar e û wek me germ  
Mal, mindal, bûk, zaro nema kes  
Bawerî, tol, kîn û şor ma ne bes  
Xwedê dil nexwest, hêsin afirand  
Destê me bi xencer û şûr şidand  
Şerê me sor e destê me pola  
Dost re gorî ne, dijmin re bela  
Tîrsa me ji Xwedê ye; hew... camêr  
Zinar û çûyin mejî xurt û nêr  
Rabe, bikuje, bîmire, felar...  
Êdî dibînim, di kene welat...  
Tîştîne mezin çêbûn, dê çêbibin;  
Dibînim dest pê dike, rojeke din...  
Rojê nû bo dinyaya Kurdistan  
Rengîn bû ezman û rengîn çîhan  
Şerê me sor e, destê me pola  
Dost re gorî ne, dijmin re bela

**Diktor Kamiran Ali Bedir-Xan**

## WELATÊ KURDAN

Kurdistan xweş e çihê kalikan  
Tev xwîn dirêjin newal û çalan  
Hevalno rabin tev dost û biran

Hildin avdeynê ji van neyaran  
Geliyê Zîlan geliyekî teng e  
Ber dost û yaran nema tu reng e  
Çiyên serhedan çiyayin delal  
Zar û zêç tê da bi ax û nal nal  
Çiyên serhedan hemû zozan in  
Sed heyf ji bo me em giş nizan in  
Bîrîna min kûr qet li min mepirs  
Çima tu wisan bê qehr û bê hirs  
Çûme serhedan ji bona giştî  
Ji vê Hawarê çî dengê xweş tê  
Vê Hawarê ez dikim bibînim  
Gul û nêrgîzan pê bireşînim  
Li nava kurdan jî bigerînim  
Reşê van bûkan jî pê hilînim  
Ma tu bîr nabî ey lawê kurdan  
Pêşiyê te zor bûn li hemû erdan  
Ekbetan çihê Şehmerşahê me  
Kî Axsarşah e ew jî ji me ye  
Keyqubad belê ew jî ji me bû  
Pir eqilmend û milleterperwer bû  
Astiyax herê ew jî ji kurdan  
Welatê Medan bilind û bi şan  
Welatê Medan welatê kurdan  
Zendi ziman in em çilê Medan

## Hesen

\*) Di van rojan de kitêbeke bi vî navî de  
bigihêt çapê. Em çend rûpelên wê diguhzi-  
nin sitûnên xwe û pêşkêşî xwendevanên  
xwe dikin.

## DENGEKÎ ZERDEŞTIYAN

### Di heqê Kurdan de

Birayên me ên Zerdeştî, li Hindistanê di Bombayê de kovarekê bi navê "Iran league" û bi zimanên îngilîzî û farişî derdixînin. Kovara Zedeştiyan di hejmareke xwe de qala serxwerabûna milletê kurdan kiriye û di heqê me de çend pirsên bi heq û dilovan nivîsandine. Em wê benda ha jêr ve werdigêrin zarê xwe.

"Ji bona îro welê xuya dibe ko serxwerabûna milletê kurdan hatiye kevdin, û hin welatperwerê vî milletê kevn û bi rûmet an di meydana şerî de an di bin darên meşneqê de, xwe dane kuştin. Belê zîz e, mirov bifikire ko ji bona anînciha azahiya millî ko ji sê milyonan bêtir giyanên dilaver lê lavelar û daxwazkar in, tevdirêk nayê dîtin.

Ev camêrên ha çend caran berê xwe dane civata milletan jî, lê hercar jî destevala vege-riya ne. Li ber vê deravê de, mirov bivênevê difikire ko ev civata bilind ne di pêkanî û parastina bingehên heq û rastiye de lê di lutfkarî û mildariya zexman de xurt e.

Digel vê hindê tirk bi xwe dikarin riyekê peyda bikin û bê ko tu kêmanî û talûke bigihînin xwe daxwaza vî milleû bînin cih û wî razî bikin. Ji xwe ne rast e ko mirov bixwaze biceribîne milletekî xurt ko peyayên wî tevda ji dîyên xwe cengawer zane, heta dawiyê di bin nîrî de bihêle."

### HAWAR

## BI XWALÊ XWE VE

Em dibin diz. Li me dibe hîveron. Geli biran, heval û hogirên min. Çima deng ji we nayê. Xelk zewicîn, em tenê bê jin man. Ji bextê min re dinya weha bû. Bes ji derdê we. Êdî mû bi zimanê me ve hat. Qer ne xema we ye. Me cilika bînamûsiyê kişandiyê serê xwe. Axayên me mezinên me di ber me da xwe kuştine. Dîsan qer ne xema we ye. Belê ev hemî ji bêaqiliya me ye, em nabêjin kanî welatê me, malê me mil- kên me? Ez nizanim gelo ev ji mîraniya me ye yan ji bînamûsiya me ye.

Welatê me xweş e, delal û rind e tev zîv û zêr e. Çi fêde lê xwedî nine û weke pezê bêşivan.

Welatê me kaniya qîz û xortan e. Welatê me hemî hinar e. Xortên di wan fena gurê har e. Qîzên wan tevda gerden bi morî ne.

Min ban kir, min got: Qîzino! Xortino! werin. Fena gurê birçî, min dî xwalê [xalê] min cegerbixwîn derket.

Şah e şahekî bê ço. Suwar e, suwarekî bê hesp. Hingê min got: bes e xwalo! Ji eqildaran re gotinek bes e. Ji dînan ra sed gotin jî hindik in.

Êdî kezeba min reş bû, ji derdê Hawarê. Bi şev û bi roj xew li min nine ji mitalan. Geli kurdino li civata Hawarê miqate bin da em heyfa bav û birakên xwe hilînin. Da ko kêfa keç û xortên me bînin. Ji bona ko kêfa neyaran li me neyê. Em dibîniş em mu- hacir in. Welatê me ji xelkê re bûye mal û

milik. Zivistan hat li me sar e. Ji ber ko em  
ji hev dût in. Werin werin bikevin nêzikî  
hev. Canên me di hilma hev da germ dibin.  
Dê em fikirin li cih û warê xwe.

\* \* \*

Dêrika xopan bişewite ne tu war e  
Bi ro germ e bi şev sar e  
Qeteroka û kambax cih û sekana dost û yar  
e.

Lo lawiko! Min bihistî te yek xwesit  
Ez ê bêm dawera te bi taqekî spî bi dilekî şî-  
kestî

Ji mi çêtir be li te pîroz be  
Eger ji mi xerabtir be  
Çekê te tev xwîni bê ber vî destî.

Lo lawiko ti lê firî  
Bavê te diçû kara min û te dikirî  
Heta bavê te dihat xelkê şîranî û mehrê di-  
birî

Çi perçak ewrê ser Mêrdînê  
Kewê gozel dixwend ser hêlinê  
Ya ko hatiye ser serê min û Hawarê  
nehatiye serê tîrba Mem û Zînê.  
Çi perçak ewrê ser dengizê  
Gulê pal vedabû nêrgizê  
Ezê terka Hawarê nakim  
heta xwê şîn nebê qantir nezê.

### Nezîr Lewend

## SERHEDAN

Li Serhedan heye ceng  
Dengê lawan tev bi şeng  
Ji kulîlkên renga reng  
Ne zil maye ne jî beng  
Dil diêşe ji derdan

Xwelî li me ey kurdan  
Bigrî Miço tu bigrî  
Xerab bûye Serhedan

### Miço Melê

## ŞEHNAMA ŞEHÎDAN

### Bir: 2

Were ey Şêx Seîdê pir munewwer  
Bes e rabe tu îro ey dilawer

Zemanê te ne ew çax e tu razî  
Bi serbestî tu heqê me bixwazî

Belê wextê tenq û top û şûr e  
Ezîzê min necata me ne dût e

Tu Ebdulqadir î şêxê li Nehrê  
Di alem de tu meşhûr î bi fexrê

Kerem ke rabe ser xwe ey tu serwer  
Ji bo kurda tu rêzan û tu rêber

Tu Şemseddînê roja dîn û millet  
Ji Qamişlû tu rabe pir bi himmet

Belê zanim ko qehra te ji dojeh  
Were cergê neyaran pê bisojeh

Were Şêx Ebdullahê Melekanî  
Şehîd î tu di nava melekan î

Li zozanan binêre tu li xwînê  
Li canê me tu nabînî birînê

Were Şêxê me Eyyûbê bi semax  
Binêre tu li Zozanê Qerejdax

Hemî gund û hemî kanî hemî war  
Xerab bûne ji destê zulmê nayar

Werin rabin gelî Şêxên di Çanê  
Binêrin hûn li vî axir zemanê

Felek bêbext e lewra xûz û xwar e  
Heta îro bi kurda re neyar e

Were Şêx Ebdullahê Narikî zû  
Binêre tu li me yek carekê zû

Welatê me wekî aşê neyara  
Serê kurda dihêrit her bi bara

Were ey Şêx Şerîfê sahibê dîn  
Ji kurda re belê zanim tu dûrbîn

Tu bawer be hûnê rokê bibîn  
Em ê heyfa we dê carek hilînin

Dilo jaro here nik Ebdurehman  
Ba ew şêx û şehîdê dîn û îman

Tu geh bigrî tu geh pê re binale  
Belê şêxê te pir qenc û delal e

Hezar hêstir bi yek çavî birêje  
Edeb bigre li ber wî jê re bêje

Cegerxwîn bo te her pesindar e  
Hezar rehmet li gorna te bibare

Ji Tepê rabe ser xwe ey tu Seyda  
Rihê şêrîn ji bo kurdan te keyda

Çilo sebra te tê îro di gorê  
Birayên te ketin bin destê zorê

### Bir: 3

Were Batûyan Emer Axa delalo  
Li halê min binêre ey tu xalo

Ji bo we pir fihêt û ar û şerm e  
Kurên Cengîz bi carek têne ser me

Were rabe Fetahê Hacî Delfî  
Welatê te hemî zozan û gelî

Binêre tu li welatê jêr û jorîn  
Hemî kurd in kurê Behramê Çopîn

Temer Axa ji Hizolê tu rabe  
Binêre tu li bextê me xirab e

Belê îro hinek yar e ji bo me  
Belê çi bikim ko êvar e ji bo me

Were Yûsuf Begê Zazî bi gorî  
Bidêre guh Hawarek tê ji Sûrî

Heçî kurd in wekî Rostem kurê Zal  
We lê çibikim nehin halû nehin mal

Were rabe tu Seyfullahê Hêni  
Tu dê halê welatê xwe bibînî

Welatê te kete destê neyara  
Heçî kurd in li ser şax û diyara

Dilo jaro bi Yado re xeberde  
Bira rabe mecala qewmê kurd e

Were carek li kurda em binêrin  
Hemî xort û piling û şêr û mêt in

Were rabe ji nav Boran tu Gurgîn  
Tu dilxweş be ji bo te hatî mizgîn

Birayên te şiyarbûne bi carek  
Di nav wan de nemaye qet neyarek

Erê Sebrî kurê Faro tu kanî  
Gelo dîsa li ser şax û çiyar î

Belê zanim di gorê de dinalî  
Tik û tenha û jar û bêheval î

Ji Erxen rabe Şewqî pir bi şewq î  
Ji kurda re tu dilxweş û bi zewq î

Binêre tu li welatê me diyar in  
Hemî kurd in li ser wana firar in

Ji nav qewma tu rabe ey Muhammed  
Hemî kurd in ji nik te ta bi Serhed

Wekî te ew hemî şêr û piling in  
Bi yek carî bi qîl û qal û ceng in

Heso Têlî Birahîm Beg tu rabe  
Li zozanê Araratê xuya be

Bijî dîsa bijî dîsa Birhîm  
Ji kurda re tu yî dîsa Bira hîm

Dilo bêje Elican û Seyidxan  
Şehîd in hûn belê xwîna me kurdan

Belê zanim cihê we pir bilind e  
Bira rabin xewa şêrîn ne rind e

Ji Tewfîq û hevalên wî re bêje  
Heçî kurd e wekî we xwîn dirêje

Bi qurbana we bin sed şah û kêxwe  
Digel mal û eyal û zaruyên xwe

Dilo bes bes xelas nabin îbarat  
Hezar rehmet li zozanê Ararat

Hene tê de şehîd û şêx û xazî  
Ne wek şêx û şehîdanê mecazî

Belê sondê dixwum carek bi Laleş  
Bi Zardeşt û bi roj û hîv û ateş

Bi Ehremen bi Hurmizganê Yezdan  
Şiyar bûne belengazên di kurdan

Tiving çûye niho dor hate xame  
Xewa şêrîn li çavê me heram e

Binêrin hûn li zozan û diyara  
Hemî sor in ji ber xwîna 'uzara

Keç û duxt û ciwan û qîz û bûkan  
Ji derdê me ketin dengê pepûkan

Ne bes kuştî ev in lê em nenas in  
Di Goran de di Loran de çiqas in

Ji wan dûr im wekî kor im di tarî  
Hezar rehmet li gorna wan bibarî

Belê roja ko kuştin çûn weqat e  
Çi xweş roj e wekî cejna welat e

Ji wê rojê Cegerxwîn û Cegersoz  
Bi qurbana we bim îda we pîroz

### CEGERXWÎN

### XEWNA RASTIYÊ

Rojekê ez rakerî di xewa şêrîn de bûm.  
Min dît dengê hat guhê min û ez ji

xewê hişyar kirim. Min serê xwe rakir keçek di ser min re sekîni ye û ji min re digot: "Ey xortê kurd! Êdî bes e, ji xew rabe, mêze ke hemû heval û hogirên we bi mirazê xwe şa bûne. Hûn tenê li şûna waran mane. Çavên xwe veke, qenc guhdariya min bike. Ez ê ji te re çend gotinên kurdewarî bibêjim. Lê bi vî şertî ko tu van gotinan ji hemî kurdan re bidî zanîn: Ez keçeke kurd, nûgihîştî, çar-deh salt me. Keziyên min sor, çavên min belek, bejna min zirav e, li biskên min avên, gul, nêrgiz, yasemîn, rihanan reşandîne. Gava bayê kur tê li biskên min dixîne. Bihna wan li ser hemû milletan hukum dike. Ez keçeke welê me ko çiqas xortên dinê hene hemî qesda min dikin, dixwazîne carekê rêya xwe bi ser xîni û min re didar bibin. Lê sed heyf ji çiqas babilîskan ve ye ez ketime destê neyaran. Îro ji guhpahnên bêbav ew biskên min ê delal û pir bi bihn didin ber pozên xwe, pê berxwedan û kêfxweş dibin. Min, ji bona felata xwe, bi hezaran, xort sergerdiyên kurdan di nav sîng û berên xwe da xwedî kirin, îro jî xwedî dikim. Min ji wan hêviyeke mezin dikir, min di dilê xwe de digot: Rojek dê bê, ev xortên hêja, hunermend dirêjî neyaran bikin, kezî û guliyên min ji destê neyaran dê biderxînin. Hawar! Beriya çend salan, rojekê min bejna xwe girêda çavên xwe kildan, biskên xwe hine kir, çavnihêriya xortên kurdan kir. Birekê ji kurdan dirêjî neyaran kirin bi hezaran kuştin serdarê neyaran kirin xwure guran û hirçan. Lê, hinek ji kurdên bêbext derketin, nehiştin bi mirazê xwe şa bibin. Îro jî guhdariya we dikim û bi şev, rojan karê min girt, ji çavên min hêstirê xwîni derhikin.

**Ş. HESEN**

## SEBAT

**D**i zemanê berê de du hukumdar neyarê hev bûn. Ji van herduwan yekî mêr bû ko ew jî tim qels bû. Herçiqas bajota ser neyarê xwe dîsa li berê din debar nedikir. Ev hal pênc, şeş çaran qewimî. Nêrî ko şolê wî naçe serî, dev ji şerê bêkêr berda. Rojekê di nav baxçeyê xwe da, li ser darekê pîrhevokek dît ko çiqasan hêlinê xwe çêdike li aliyê din ba xerab dike. Lê vê pîrhevokê dev ji şolê xwe bera nedida dîsa dest bi çêkirina hêlina xwe dikir. Ew serdarê ko ev hal dît jê îbret girt û dîsa leşkerê xwe civand û ajot ser neyarê xwe. Vêca Xwedê jê re li hevdu anî, dijminê xwe şikand. Ho birano! Divê em jî bêhêvi nebin; dev ji xebata welatê xwe bermedin. Da ko Xwedê ji me re jî li hev bîne. Hêvi! Hêvi!

**Şahîn Mustafa Şahîn**

## BIYANIYEKÎ DI KURDISTANÊ DE ÇI DÎTINE

Nasekî min ji min re gotibû:

– Ma te ha jê nîne, rojnamenivîsekî Ew-rûpayî ko di Kurdistanê de geriyaye bi rêbîwarî hatiye Şamê. Nasê min ev tişt ji min re gotibûn, lê cihê nivîsevanî şanî min nedabû. Paş ko min riya xwe bi çend mêvanxaneyên Şamê xistin min mîrikê xwe bi cih kir û xwe da naskirin.

– Hawar, ne? Belê wekî ez li Kurdistanê bûm hin welatîyên we ji min re gotibûn ko di Sûriyê de kovaraek bi vî navî derdikevit. Min gelek dil dikir wê bibînim.

Min çend hejmarên Hawarê bi xwe re

anîbûn. Min ew danc wî. Çavê xwe li wan gerand û gote min.

– Dilê te heye ji min hin tiştan li ser welatê xwe bipirist ne? Hin tişt hene ko min ji divêt ji te bipirsim. Pirsiyariya te a pêşin ne ew e ko min di Kurdistanê de çi dîtîye?

– Herê ew e...

– Min tiştinî welê dîtine ko ji te û ji wan pê ve ko rind nas dikin tirk çi ye tu kes, xasima peyayekî Ewrûpayî, nikare bawer bike. Herçî ko min dîtine bawer bike berî du hezar salî jî di dinyayê de çenedibûn.

– Hukûmeta Enqerê [Ankarayê] nahêle ko biyanî, nemaze rojnamenivîsek bikeve erdê Kurdistanê. Çawan bû ko te pêk anî û derbasî Kurdistanê bûyî?

– Xebera te ye, belê tu kesî nahêlin. Ne tenê biyaniyan xelkê cih jî bê destûra wezaretaxîyê nikarin derbasî welatê kurdan bibin. Lê berê ewilî min negotibû ko ez rojnamenivîs im, paşê hin hemşeriyên min hene ko ji mêj ve li wê derê ne. Bi destê wan lê dîsan bi hezar dişwariyê derbasî welatê we bûme.

Qederê şeş mehan di Kurdistanê de mam. Tu nizanî di nav wan şeş mehan de min çi ezab dîtine. Tenê ev çend bêjim ko di tirkan de ne tenê hisên mirovîni lê tu tişt nemane. Di dinyayê de tiştin hene ne tenê ji destê mirovan lê ji destê cenaweran jî der-nakevit. Lê ji wan têt.

Em di "... "nê de diman. Carinan rê pê diket ji bajêr derdiketin, ber bi rojhilatê ve diçûn di nav gund û eşîran de digeriyan û vedigeriyan cihê xwe. Digel vê hindê ez neçûme heta welatê Serhedan û deşta Mûşê. Lê hevalên me ko diçûn ji me re digotin, zulma ko li wê derê dihate kirin ji zulma ko di pêş çavên me de dibû bêtir û xerabtir bû. Herçî ko min di Tirkiyê de dîtine tevda li

deftera xwe nivîsandine. Gava ez vegerim herim welatê xwe herçî ko min di gera xwe de seh kirine û dîtine di rojnaman û kitêban de de belav bikim.

Çend caran li me qewimiye ko ji gundên ko em mêvanê wan bûn, jendirman peya didan hev û dibirin. Ew peyayên ha nema vedigeriyan.

Rojekê min tiştêk dîtîye ko tu car jî bîr nakim. Em bi rê ve diçûn. Kurdekî kal jî emrê wî di navbera pence û şestî de, pêş me ve dihat. Jendirmekî tirk, xortekî bîst salî, ji şiverêyekê li me derbû. Kalo bi kum û desmal bû. Di himbêza wî de zarokêkî du salî hebû. Jendirme xeberinî ne qenc jê re gotin û dirêjî wî kir. Bi rajanekî li ruyê wî dixist. Ruyê kalo diriya serê zarokî şikiya. Kalo serê xwe dida pêş û dixwest pê zarokê xwe biparêze. Dawî jendirme westiya û sekinî. Kalo serê xwe hilda. Me digot digirî, kî biwa welê bigota. Ne, nedigirî. Ruyê xwe dabû ezmên, li jendirme dinihêrt û lê dîkenî. . . çi bêjim. . .

Gundek hebû pirê car em diçûnê. Di wî gundî de dostekî me hebû. Kurdekî sed û du salî. Nizanim çawan bû pêlekê em neçûbûn gundê xwe. Me bêriya dostê xwe kiribû. Sê çar heval me gotina xwe kiribû yek û em çûbûn ziyareta dostê xwe. Kalê me kalekî ser xwe bû, bi kep û dest, diranên wî hêj hebûn. Hertişt dixwar û hergav devkenok bû. Wê rojê dîsan bi dîtina me şa bûbû. Lê nikaribû wek hergav ji cihê xwe rabe û derkeve pêşiya me. Dil dikir ko rabe lê lingên wî nikaribûn laşê wî hilgirin. Lingên wî werimî bûn. Te digot qê piyê wî nepixandibûn. Me jê pirsî. Kalo biserhatiya xwe gilî kir:

– Berî panzdeh rojan jendirme hatibûn gundî. Sîleh didane hev. Sîleh li ku, dewletê

serê kemilê me hemî sipartîne nuqtê. Me cem xwe kêr jî nehiştine. Herçî xortên lewend, wan girêdan û bi xwe re birin. Ew nema vegeriyan. Hûn jî dizanin xortinin welê venagerin. Dor giha min jî. Min got: Heyran nîne, qurban nîne. Guh nedan ez avêtim erdê, lingên min hildan û qedere pênce çu li min xistin. Ji lingên min xwîn vedizikî. Ne xema wan bû. Dilê min borî, ez hiştim erdê û çûn. Ji hingê ve di nav cihan de bûm. Hêj duhî rabûme ser xwe. Lê hîn nikarim bi rê ve biçim. Li min megirin ko ji ber ve ranebûme. Me jê pirsî ma çire ew çend li te xistin?

– Ji ber ko ez kurd im.

Lê pir ne ajot bi çavê tîrsê li dora xwe nihêrt û got:

– Ne, ne ez şaş bûm. Berê berê, ez kurd bûm. Niho ez tirk im. Di vî welatî de herkes tirk e.

Reben hêj ditîrsî dibe ko ji me jî.

Ma tiştêkî welê qet hatiye ditîn û bihîstin. Bi sed salên xwe kokimekî welê ko tu lome jê nabit û bi du salên xwe ên mayîn zarûkekî şirmij. Çawan destê mirov li wan herduyan radibit.

Ma ne bes e. Nizanim kîjanî bêjim. Welatekî welê ko destûra wan ev e. Hêdî be ez ji te re bi tirkî bêjim: "Türk en büyük millet, Türkiye de yaşar Türk, yok başkası". Lê ewle be êdî Tirkîya nikarît bijît. Heke ez bêtîrs van tiştan dibêjim ne bêsebeb e. Ez çûm Stenbulê jî min halê wan li wê derê jî dît. Xwe ew çend bilind kirine ko nema dikarin ser lingan bisekinin, divêt bikevin.

Ji û paşê, ewî hin tişt ji min pirsîn û nik xwe nivîsandin. Me destên hev guvaşt û ji hev veqetîyan.

Ji ber ko camêr bi xwe dil nedikir ko navê wî, niho bêdî berder kirin ez wî veşartî

digirim. Lê gava bi xwe di welatê xwe de bîrên xwe belav kirin hingê em ê wan biran digel navê nivîsevanî biguhêzînin stûnên Hawarê.

## Herekol Azizan



## HEJMAR 20

### HEVIND

#### Temaşa (1) Perde

|            |                        |
|------------|------------------------|
| Serwer Beg | Ji torinên Serhedan    |
| Lewend Axa | Serekê eşîrekê         |
| Xurşîd Axa | Serekê eşîrekê         |
| Bijîşkek   | Pisaxakî Madenê        |
| Gurgîn     | Pisaxayek              |
| Felemêz    | Birayê wî              |
| Qeşem      | Destgirtiya Gurgîn     |
| Menîje     | Destgirtiya Felemêz    |
| Qubad      | Xulamê Serwer Begê     |
| Hevind     | Sêwiyekî diwanzde salî |

Qasid, zar û zêç, kalik, pîrejinek, birîndarin, Segman û xelk

[Di vebûna perdeyê de pehnava [navsera] çiyakî Kurdistanê xuya dibe. Dûre devî û zinar in. Cih cih şikêr û ferş, di alîkî de holîkek, di ser holîkê re aleke kurdî li pêl dibe. Ji aliyê rojavayî şevêrêyek dirêj dibe û pehnavê digihîne newalê. Ji dûtir ve serên çiya yên bi berf diyar in. Di ber devê holîkê de Qeşem û Menîje (Menîce) rûniştîne dihênjin.]

#### Civanok - 1

#### Qeşem, Menîje [Menîce]

Qeşem - (Di xwe ditîne der û ji Menîje re) Xwehê dinivî?

Menîje - (Bi hilfirînekê çavên xwe vedike) No, lê nizamim çî li min qewimiye. Serê min giran bû, dilê min borî.

Qeşem - (dikene) Ji xwe xew çî ye?

Menîje - Ne xwehê, xew li ku, ma divê demê de ez çawan binivim. Birîndarên me çawan in?

Qeşem - Dengê wan nayê. Bawer ke rahet in. Ê sêvanok şikestî heta sibehê dinalî û ji pesna xeber dida. Çî xortekî delal e, dibêjin ew çend jî mêr e. Birînen wî xedar in. Ne yek ne dido. Heft heştek in.

Menîje - Ji xwe berê sibehê de, tu ne li hir bûyî, birîndarinin din dianîn û dibirin şikeftê. Bijîşk bi wan re bû. Kete holîkê lê nihêrt, serê xwe hejand û ji min re got: Bê fêde ye halê wî ne tu hal e, gelek namîne.

[Ji dûtir ve dengên wek guregura ezmanan tê bihîstin.]

Qeşem – Guh bide, top dîsan dest pê kirine. Mala minê yên me, hesin û agir dîsan dê bibarin ser serê wan. Topên me ji hebuwana ne xem bû. Dido ji dijmin standibûn lê gule nemane. Mitralyozên me hene lê çi fêde, şûna topê nagirin.

[Ji holikê nalînek têt, keçik dibezin û dikevinê. Paş gavekê nalîn nizim dibe û li şûna wê xirexirek tete bihîstin, pêleke din ne nalîn e ne xirexir e. Keçik ji holikê derdikevin, çavên wan hêstir dikin.]

Menîje – Çû, reben çû. Me nizanibû ji ku ye, ji kîjan eşîrê ye. Tenê digotin xelkê Dêrsimê ye. Dêrsim li ku, Serhedan ku. Reben hatibû mirina xwe

Qeşem – Ne xwehê hatibû şerê welatê xwe

Menîje – Belê şerê welatê xwe, rizgariya welatê xwe. Welato! Welato! Welatê xopan, neyarên te zehf, dostên te kêm in. Dostên te tenê em in, keç û kurên te. Em ji qels bêçek, bê tu tişt. Çarmedora me girtî; ji heralî riya me birî, ji hermilî dijmin. Çarnikar neyar, neyarê xurt, herkes yarê neyar, dostê zexm. Belê Menîje welê. Me çi digot reben çû, gelo di dilê wî de çi hebû. Ma tişteki wî nîn bû ko bibêje

Qeşem – Hebû, di dema paşin de, weki ketibû cankêşiyê, tişteki digot

Menîje – Belê dil dikir ko bibêje, lê nekaribû lêvên wî nedigihan hev. Navek di ser lêvên wî re digeriya, lê ne dihate der.

Qeşem – Bawer bike navê keçikekê bû.

Menîje – Bi min digot Zîzê.

Qeşem – Bi min Zînê.

Menîje – Navê destgirtiya xwe digot. Kî zane destgirtiya wî ji çi keçikeke delal û çeleng e. Ax dinya, hêj serê xwe nekiribûn balgehêkî. Herê herhal delal e. Ma nabêjin keçên Dêrsimî gellek sipehî ne, kej in, çavbelek in. Ax heke yên me ji di vê dem û saetê de...

Qeşem – Menîje çire holê dibêji, Xwedê mekit.

Menîje – Ma Xwedê mekit ji heye. Tu nabînî gol e ji xwe re kiriye adet hima xort û zava û destgirtiyên dibijêre. Li xwe danayine dest bide pîr û kokiman.

Qeşem – Te xêr e Menîje, çire îro holê bêmade yî û tiştinî ne qenc û ne bixêr dibêji?

Menîje – Tu dixwazî ji te re rastiyê bibêjim, lê nizanîm çawan bêjim te. Dilê min de tişteki heye. Belê tişteki ji min re dibêje...

Qeşem – Ax li min...

Menîje – Ax...

[Keçik dikevin himbêza hev û bi deng digirin. Demekê di himbêza hev de dimînin. Qeşem xwe ji himbêza Menîjeyê vedike hêstiran ji ruyê xwe dimale. Menîje ecêbmayî lê dinihêre].

Qeşem – Megrî xwehê megrî. Ji me re şerm e ko em ji yên xwe re bigirin. Herçî ko di şerî de ne tevda birayên me, mêrên me ne. Hemî yên me ne. Girîn hebe divê em ji bona hemiyên bigirin. Li ber ketin hebe divê em li ber wan bikevin ko di mêranyê de ji ên dîtir kêmtir bûn. Belê li ber wan bikevin ko di cihê xwe de xwe nedane kuştin, ji mirinê revîn, ruyên xwe reş kirin û sax man. Yên me di pêşiya hemiyên de diçin. Ji mirinê narevin. Hegeger heta niho sax mane û sax in jî, ne ji wê ye ko xwe nedane kuştin, lê mirinê nediwêri dest bide wan.

## **Civanok - 2**

### **Ën berê û Hevind**

Hevind - (Ji şeverê li wan derdibe. Li dora xwe dinihêre, dikeve holikê, derdikeve, ji keçikan re) Keçino penbû li ku ye? Ka çend pakêtan bidin min.

Qeşem - Nik me nema. Here şikeftê, li wê heye. [Hevind bazdide ber bi şikeftê diçe.]

## **Civanok - 3**

### **Qeşem, Menije**

Menije - Belê, belê xebera te ye Qeşem. Xwedê neke yên me nemerdfî bikin, ji xwe kê kiriye, ma nayê bîra te di şerê Zerketê de topa di nav neqebê ki sitandibûn. Ne herdu biran, ne yên me, Gurgîn û Felemêz.

Qeşem - Çawan nayê bîra min. Ma tenê hingê, di herşerî, di herderavê teng de xwe bi mêraniya xwe nedane naskirin

[Dengê topan xurtir dibin]

Menije - Guh bide Qeşem, dengê topan nêzing dibe.

Qeşem - Top di cihê xwe de ne, ba guheriye, ji lewra.

Menije - Heke hêj nebûye jî dê bibit. Qeşem ez welê dibînim ko di van çiyayan de ava me nemaye. Ma tu nabîni tenê di rojên paşîn de balafirên dijminan ji dehcraan bêtir li me firriyan û guleyên xwe avêtine heta pehna me. Ma nexuyaye, vê carê likra wan xirab e. Bîne bîra xwe. Ev bûne çar sal em di van çiyayan de asê ne. Belê hergav req û req e şer e. Lê ne holê, çend roj şer, paşê çend rojên din jî rahatî. Vê carê ji çar mehan bêtir e êrîşa dijminan dest pê kiriye weqt nizane bisekine. Berê şer di quntarên çiyê de dibû. Dijmin hêdî hêdî hilkişiya û xwe gihandiye bilindcihan. Ma berê deh rojan berikên dijminan qet li pehna me diketin. Lê niho pehna me ji çeperê xerabûr bûye. Ji aliyê din mezinan digotin zad ji xwe yekcar nemaye, berikên segmanên me jî ne gelek in. Hero kê m dibin.

## **Civanok - 4**

### **Ën berê, Hevind**

Hevind - (Di destê wî de çend pakêtan penbû dikeve diyarê. Li keçikan dinihêre, bi ken dibêje wan) Keçinon we xêr e, ez dibînim hûn herdu jî madekirî ne. Bawer bike tirs gelek gihaye we. Metirsin, ez kekê we me.

Menije - Dê, tu jî biqêş. . . [Hevind di şeverê de winda dibe.]

## **Civanok - 5**

### **Ën berê, ji Hevind pê ve**

Qeşem - Çire dixeyidî Menije, bi Xwedê zarokê delal e.

Menije – Bêlê, êz jî dizanim, ma dema yariya ye. [Ji dûr ve guregura balefiran tête bihistin]

Qeşem – Ev dîsan Dêwên Guhderzî û balafir, herwekî di çirokan de digotin.

Menije – Fedikire [fekire] Qeşem rast bi rast bi ser me de tên.

[Keçik li ezmên dinihêrin, balafir nêzing dibin, li dorê gule dikevin. Paş bîsrekê li pehnavê jî. Qeşem û Menije xwe li erdê dirêj dikin. Sê çar bombe ser hev dikevin holikê. Dinya toz û rarî ye. Çav çavan nabîne. Balafir heta qedandina bombeyê xwe di ser pehnavê re digerin. Gaveke din vedigerin qerargeha xwe. Dinya hêdî hêdî vedibe, holik hilweşiyaye, di cihê wê de çalîn xuyane. Ji birîndaran yek jî nemaye. Di nav şikêr û zinaran de hin serî mil û hestî têne dîtin. Ji newalan ve dengê tevingan. Desterêjeke xurt. Ji şeverê çend peya derdikevin, di nav şikêran de disekin, Gurgîn û Felemêz di nav wan de ne]

## Civanok - 6

### Qeşem, Gurgîn, Felemêz, çend segman û esker

Qeşem – (Ji cihê xwe) Gurgîn tu yî, Felemêz.

Gurgîn – Qet melive, cihê xwe de bimîne.

Felemêz – Menije li ku ye?

Qeşem – Ew jî li hir e di nav keviran de

Gurgîn – Xwe dirêj bike (ji hevalên xwe re) kanî esker, dabûn pey me.

Felemêz – Ev e tên.

[Ji şeverê qederê deh panzdeh eskerê reş derdikevin, segmanên kurdan û esker dikevin bêdarê hev. Li hev dixin. Ji eskeran sê çarek têne kuştin. Eskerên din jî tên. Herdu alî xwe ditelînin, şer e. Paş pêlekê piştmerên kurdan e.]

Yekî ji piştmeran – Hey guhpehninon min hesp bere ser mêlaka dêya we da ew!...

[Çend desterêjen din, esker direvin, segmanên kurdan didin pê. Dengê tivingan hêdî hêdî dûr dikeve. Diyar vala dimîne. Cendekê kurdan û eskeran tevî hev li erdê ne]

## Civanok - 7

### Qeşem paşê Menije

Qeşem – (Ji cihê xwe serê xwe hildide û ban dîke) Menije, menije (ji xirexirê pê ve tu deng lê venagerîne. Careke din ban dîke) Menije, Menije, keçê (xwe bi xwe) mala minê çi lê qewimîye, mebe ko. . . (dîkeve nav cendekan lê digere. Menije di nav keviran de deverû vezeliyaye. Qeşem wê dibîne. Xwe lê ditewîne û dikişîne hambêza xwe. Ruyê Menije bi xwîn e. Qeşem ruyê wê dişot. Menije hêdî hêdî xwe dilivîne. Birîna wê sivik e. Menije radi-be ser xwe.) Ax keçê dijminan tu nekuştî te ez kuştim. Hindik mabû ez dîn dibûm. Bê te min ê çi bikira, ax keçê ax. . .

Menîje – Dilê xwe runîne, tu tiştê min nîne, birîneke sivik. Lê min ji te re negotibû halê me ne tu hal e. Tu nabinî dijmin xwe gihandiye heta pahnava me. Ma ji hir û wê ve çi heye? Em ê herin ku. Çar sal tivav. Ew çend şer û xebat ew çend xwîn. Jin, mêt, pîr, zar û hewqas kuştî û mirî. Ma hemî ji bona vê paşiyê. Ji bona ko em pehnava xwe berdin destê dijminan. Ji xwe destê me de ev gir, ev gir maye. Geliyê Zilan û Tendûrek ketine destê dijminan. Di nav Kurdistanê de tenê ev gir maye ko di serê wê de em di dora wê de dijmin têne kuştin.

Qeşem – Hêj rastir di destê me de tenê ev der maye ko em dikujin û welê têne kuştin. Di derên din de kurd nayêne kuştin. Lê wek pez û dewaran têne şerjêkirin

### **Civanok – 8**

#### **Ên pêşin, Hevind**

Hevind – (Ji şeverê dertê) Bûkinon, ji we re kefarete be (ji Menîjê re) mala minê birîndar î (madê wî diguhêre) birîna te ne xedar e?

Menîje – Tiştêkî sivik

Hevind – (Li dora xwe dinihêre) Ka ala me xuya nake, çû ko? [tevda li alê digerin, ji nav keviran derdixînin; diedilînin û ji nû ve dadiçikînin serê şikêrekê]

Hevind – Bi vê bumbardumanê dijmin em gelek êşandin, min digot qê tenê di çeperan de, lê dibînim ev der jî. Divêt ez herim nik Qubad (xwe dide şeverê)

### **Civanok – 9**

#### **Qeşem, Menîje**

Qeşem – Belê me çi digot.

Menîje – Min ê bigota, ji xwe nayê bîra te, berî çend rojan ew xortê bi cilên teng ko dibêjin li Ewrûpayê xwendîye, rojnameke dijminan dixwend û ji dora xwe re digot: "Belê xebera wan e. Ev şerê ha, şerê me digel wan ne wek şerên zemanê berê ye. Berê, me li ser qemçûr an mîriyê şer dikir. Carin hebûn ji bona xwînîyekî jî. Lê îro ji bona welêt û heyina xwe şer dikin, diqewimînin. Belê ev şerên ha ko çend sal in di welatê me de dibînin şerînin bi zarmanî in. Ew xistîne serê xwe mala me ji destê me bibin. Ew mala ko ji mêj ve ji pênchezar sal ve em tê de ne. Ew mala ko gelek neyar û dijmin hewandine, lê tu car nehiştine ko ew tê de cih bibn û warên me ji me bistînin. Biyanî, wekî dihatin welatê me û vedigirtin me xwe dida çîyan. Û li jor ve li çûn û hatina wan dinihêrt. Lê îro ne welê ye. Hildikişin çîyayên me jî, nahêlin em di ser wan de ji bisekin. Ji lewra, ji bona me du rê ninin. Rêyek heye. Divêt em dijminê xwe ji mala xwe derînin û xweyiyê mala xwe bibin"

Qeşem – Belê Menîje welê digot. Xebera wî ye jî. Qesta wan qelandina me ye. Dilê wan heye navê me ji dinyayê rakin.

[Ji şeverê pêjna lîngan têt. Keçikan xwe ker dikin û ber bi pêjnê ve diçin. Birek birîndar xuya dibin. Hin di dar û bestan de hinên din di piştê mêran de hilgirtû. Dar û bestan pêşî dêdînin erdê, keçik diçin ser. Li birîndarî dinihêrin û wek mihînen veciniqî xwe didin paş]

## Civanok – 10

### Ën pêşîn, Serwer Beg, du segman û peyayên din

Herdu keçik bi hev re – Ax, ew e, xortê cilteng.

(Birîndarên din dibin şikeftê û cendekan ji diyarî kaş dikin)

Segmanê pêşîn – Serwer beg bi xwe ye.

Segmanê duwem – Qurbana mêraniya xwe ye.

Segmanê pêşîn – Berberê hezar mêrî bû.

Segmanê duwem – Serek bû, serekan re serî bû.

Segmanê pêşîn – Xwenda bû, zana bû.

Segmanê duwem – Bi her awayî hêja bû.

Segmanê pêşîn – Xelk pê disekinîn.

Segmanê duwem – Dijmin jê dilerizîn.

Segmanê pêşîn – Ruhniya çavên Kurdistanê bû.

Segmanê duwem – Ne mêrê gornistanê bû.

Segmanê pêşîn – Ji bona mêraniyê ji bona qewmandinê ji diya xwe bûbû.

[Di wê demê de peyayek dikeve diyarê, bi destê xwe re dûrebîn û şexderba serwer Begê digire, xwe digihîne dar û bestê û ser ejnuyên xwe disekine.]

## Civanok – 11

### Ën berê, Qubad, paşê Hevind

Qubad – (Bi dengêkî bi girîn) Ax ez benî, ez gorî min digot xwe ew çend mede pêş. Ma em seyên te nizanîm ji bo çî bûn. Te keriyê xwe çawan bê serî hişt. Ez gorî min digot ez goriya serê te bibim, te ez kirim kêla gorna xwe. Bego! Bego! Begê zirav mirin ji bo te hêj gelek zû ye. Dinya din rahetî ye. Tu ne mêrê rahetiyê yî. Tu mêrê şer û qewimandinê yî. Ev çiya gir û gaz tenê bi deng û navtêdana te şîn û ser xwe ne. Bê te çiya nizim, rûbar zuwa, ezman bê roj û tav e. Tu bi mirina xwe gelek tiştan ji me dibî ko îro ji me re gerek in. Tu qîma xwe bi mirinê ditînî lê em nayînin. Tu ne yê xwe yî tu yê me yî. Mirovên wêk te ne qesr in, karwanseray in. Heqê rûniştina herkesî lê heye. Bego! Bego! te her tişt, dê û bav zar û zêç ji bona welatê xwe hiştin. Niho welatê xwe ji bona çî û kê dihêlî? Ma naye bîra te wekî em bi rêdikekin, dortmama te ji te re çî digot: "Tu min ji bona welatê xwe dihêlî û diçî, ma ez te ji bona kî bihêlim û herim ku? Welatê min jî tu yî, berde ez jî herim welatê xwe, ez jî bi te re bim"

Hevind – (Hevind dikeve diyarê, li dora xwe dinihêre, li ber dar û bestê ser ejnuyan disekine, herdu destên serwer Begê maçî dike û bi dengêkî zîz) Ax min nizanîbû ko mirov dikare du caran jî sêwî bimîne.

Qubad – Ax ez çî dibêjim. Ma zanim çî dibêjim. Bego! Bego! Begê zirav rabe serê xw hil-de.

Serwer Beg – (Çavên xwe niv bell dike. Bi dengêkî nizim) Qubad tu li hir î?

Qubad – Belê ez benî, ji bê fihêtiya xwe hêj heme û li hir im. Hêj nemirime  
Serwer Beg – Memire jî. Da ko kirasê min ê bi xwîn bibî mal, bidî dotmama  
min, kurê min tê de bi xwedî bikin, zû bigihînin û bexin xizmeta milletî. Millet nikare ge-  
lek li hêviyê bimîne. Jê re canfeda û canbêzarî divêtin. Ji diya wî re holê bêje.

Qubad – Ma çîre ez benî, Xwedê hez bike tu bi xwe kurê xwe bi xwedî bikî û bigihîni.  
Birînên te ne xedar in

[Ji devê Serwer Begî xwîn têt û dîsan ji ber ve diçit]

Qubad – Xwezî min ev negotana, xwezî min ev dem nedîtana, ditirsim pê dilê  
xwe xira kiriye

Serwer Beg – (Dîsan çavê xwe vedike û li Hevindî dinihêre) Hevind kurê min tu jî li hir  
î?

Hevind – Belê ez benî li hir im. Emrekî te heye.

Serwer Beg – Ne kurê min, lê herwekî min ji te re berê jî gotibû, serê xwe ji çeperê gelek  
dermexîne, te seh kir?

Hevind - Belê ez benî dermaêxînim.

## Civanok - 12

### En berê, Lewend Axa, bijîşk û çend peyayên din

Lewend Axa – Beg çawan e?

Qubad – (Bê hemtê xwe) Rahet e.

Serwer Beg – Hûn bi xêr hatine axanon. Segmanên şikeftê çawan bûne? Ditirsim dijmin  
li wan hatiye hev, dil ketine.

Lewend Axa – Belê ez benî dijmin li wan hatibû hev, lê dil neketine. Ji xwe di şikeftê de  
bîst û pênc peya hebûn. Qederê dused eskerê dijminan bi ser wan de girtibûn. Yên me vê  
paşiyê du metralyozên dijminan xistibûn destê xwe. Bi êrîşekê li dijminan bûne der. Ji du  
sactan bêtir bi hev çûn, dawî dijmin şikiya û xwe da paş. Segmanên me xwe gihandine çep-  
perên me. Vêca dijminan dîsa berê xwe dan şikeftê. Lê şikeftê êdî li wan ranedibû. Hatî û  
ketinê. Şikeftê û hijde cendek ketine destê wan.

Serwer Beg – Di newalê de.

Lewend Axa – Dijminan eskerê xwe bi şûnde kişandin. Newal weke berê ye. Tu deng û  
pêjn jê nayê. Sih miriyên me û qederê sed cendekên dijminan lê miqate ne. Di girê şêran  
de ji ber ko tu sîngên segmanên me nemane, dijmin gule û berikên xwe davêje ruyê ax û  
keviran. Me serê kaniyê ji destê dijminan derxistibû. Vê paşiyê dîsan ji me zemt kirine. Lê  
me ew çend cendekên wan xistine navê ko devê kaniyê ritimiye av sor diherike. . .

Serwer Beg – Di herderî de mêranî, di herderî de kurdanî. Lê dijmin serdest, em di her-  
derî de qels û bêkeys, ji lewra di herderî de bindest in. Belê mêranî qenc e, di herîştî, ne-  
maze şerî de mêranî şertê pêşîn e. Belê mêranî giyan e. Lê ji bona ko giyan bilive, tev bigere  
jê re dest û ling û ji wan destan re şûr û rim divêtin. Ne peya ne ne çek. Çar meh di vî girî  
de dorgirtî, hero peya û çek kêr dibin. Li şanû [şûna] wan tu nayê. Ava ko serê xwe neda-  
ye kaniyekê, rojekê dê biçike. (Dengê wî diguhêre, bi vîn û hişkî) Axano! Qerara we çi ye?

Êdî dem e, divêt hûn qerareke xwe bidin.

Lewend Axa – Beg esil tu yî. Heke qerar divêt, dîsan tu zanî. Te çawan emir kir em ê we-  
lê bikin. Ma kengê me bêemriya te kiriye.

Serwer Beg – Lê heye ko ez nemam.

[Hemiyar xwe ker dikin, deng ji tu kesî nayê. Bijîşk dikeve nêzingî Serwer Begê, zenda  
wî dibe destê xwe. Bijîşk bêmad e]

Lewend Axa – Belê Beg tu çi emir dikî?

Serwer Beg – Yê min, divêt hûn xelk ê çekhilgir ji yê ne çekhilgir veqetînin. Zar û zêç bi  
rê xîn bila bikevin deşta Ecemîstanê herin nav kurdên Erdelanê. Ên çekhilgir ji vî girî der-  
basî girê din bibin û hera paşiyê lê bimînin. Xwe giran bifiroşin. Belê xwe rind biparêzin zû  
zû xwe medin koştin. Ji hergavî bêtir mêrê mêrkuj bibin û ne xwekuj. Da ko dijminê xwe  
bê dijmin mehêlin û di erdê Kurdistanê de agirê serxwerabûnê medin temirandin (dengê  
wî tete birîn, nema dilive)

Bijîşk – (Xwe digihîne wî, serê xwe dike sînga wî, çavên wî hêstir dikin) Çû, herê serwe-  
rê me çû, stûna me a blind û xurt hilweşiya.

[Qubad û Hevind xwe davêjin lingên wî, keçik digirîn, çavên xelkê hêstir dikin. Pêlekê  
di vî half de dimînin]

Lewend Axa – Hevalno! Serwerê me çû. Herwekî bijîşkê me gotiye bayekî ne bi xêr stû-  
na me a bilind û xurt hilweşand, konê me di ser serê me re xist, lê divêt em konê xwe rakin,  
vedin û şopa serwerê xwe winda mekin.

Birano! Ne ji min ne ji kesekî din têt, herwekî divêt pesnê Serwer Begê bidit û li ber bi-  
kevit. Heke em dixwazin giyanê wî şa bikin divêt em bixebitin û wesiyeta wî bînin cih. Di  
jîna wî de em bi emrê wî ve diçûn, paş mirina wî divêt em bi wesiyeta wî ve herin. (Alê ji  
şikêrê dibe û bi Serwer Bagê dadike) Bego! Di jîna xwe de te ew hildigirt, di mirina te de  
divêt ew te hilgirit.

[Lewend Axa, bijîşk, Qubad û peyayên din dar û bestê hiltînin, datînin ser piyên xwe,  
hêdî hêdî diçin, xelk didin pey wan. Qeşem davêje ser:]

Way li min, way li min, porkurê ax û ez ê  
Serwero! Serwero! Serwerê qewmekî  
Şehîdê, bilind î, şehîdê Bihuştê  
Li te xist ne bi çav berikê korekî  
Serwerê, geram î ax li me way ez ê  
Bextreşê dayikê! Dotmamê porkurê  
Reşa xwe girêdin, Serwer çû gorinê  
Lê bêyî! Rebenê! Dotmama xwelîser  
Lê bigrî! Lê bigrî, delal î! Torin î  
Way li min, way li min porkurê ax ezê

[Diyar pêlekê vala dimîne. Ji eniya şer dengê top û mitralyozan têt. Hêdî hêdî deng nê-  
zing dibin. Qasid ji şevêrê de têt û dikeve diyarê li dora xwe dinihêre kesî nabîne pêşve diçe.



Dengê tivingan hêj nêzingtir û xurtir dibe]

### **Civanok - 13**

#### **Lewend Axa, bijîşk, qasid, Hevind, Qeşem, Menije, û peyayên din vedigerin**

Lewend Axa – (Ji qasid re) te digot çih li yên me teng bûye. Dijmin ketiye newalê û dikişîne pehnavê [Deng û pêjn hêj nêzingtir dibin. Çend berîk li pehnavê dikevin. Segmanek birîndar dibe û dikeve bijîşk lê ditewe, yekî dîtir jî. . . . ]

Lewend Axa – Herçend em ê vî girî vala bikin lê niho nikarin. Me hêj kar û barê xwe nekiriye. Ji û pê ve di vî halî de em ê çawan piştta xwe bidin dijminan û derbasî girê din bin. Ji lewra divêt em bî êrîşekê dijminan ji çeperan hilkin û bavêjin rûbarê din. Dê xortino! Zaron! Herçî ko ziravê wî tenik e bila li paşiyê bimînit, êrîş zarono êrîş. . . [Tevda xwe didin şeverê. Lewend Axa dikeve pêşiyê. Peya dibezin dikin ko ji hev derkevin. Birîndar gi-hane cankişiyê]

Bijîşk – [Li dora xwe li keçikan dinihêre. Radihêje tivinga kuştiyekî] ez ko dizanim birînan derman bikim divêt bizanim birînan jî vekim. (Dide şeverê)

### **Civanok - 14**

#### **Qeşem, Menije, pêşde terxelekekî tevî hev**

Qeşem – Dijmin dîsan har bûye

Menije – Emrê seyê har ne dirêj e

[Dengê tivingan li ser hev têt. Gule dikevin dorê, guregura balesîran jî dikevin navê. Qê-rîn, ax, û nalîn. Ji aliyê rojavayî xelkekî tevî hev, jin û zaro, kal û kokim, çend birîndar dikevin diyarê. Hin li ser lingan in. Hin jî bi zikêşkê xwe digihînin hevalên xwe. Ji newalê ve deng têt. Geh nêzing dibin, geh dût. Balafir têt, diçin, bomban davêjin. Gurînek... bala-firek berbijêr dibe û dikeve newalê . . . ]

Menije – Ma em çire sekinîne. Birîndar nemane em li wan miqate bibin. Piranî bi birî-nên xwe ketine. Ên mayî bê me jî dikarin. An ew ê sax bibin an xwe bigihînin hevalên xwe. Êdî çihê me jî çeper e, eniya şer e (radihêje tivinga segmanê mirî û dide şeverê)

Qeşem – Ma ez te kengê bi tenê dihêlim (dide pey wê)

Pirejinek – Keçê! Keçino! Ku ve? Ku ve? Xwelî li serê we mebit. Mala min ê. . .

### **Civanok - 15**

#### **Ên berê ji du keçikan pê ve**

Kalek – (Ji pirejinê re) tu jî dengê xwe bibire.

Pirejin – Ji xwe min tiştêk negot. Eve min dengê xwe jî birî.

Kalo – Xwedê! Tu bi rehma xwe bike. Li ber vî halî çawan hedara te têt. Heke te miro-vên dîndar divêtin, em in. Heke te mêrên qenc, xudan bext û rûmet divêtin dîsan em in

Pirejin – (Bi dengêkî nizim) xebera te ye bira. Lê kes bi şolê Xwedê nizane.

Kalo – (Ew ji bi dengekî nizim) Belê Xwehê welê ye. Lê ev şol bi darê çavan e [Dengê tivingan hinekî dûr dibe]

Birîndarek– Hey, ez qurbana dest û lepên we bim. Yên me pêş ve diçin. Dijmin pişta xwe da wan.

Pîrejîn – Ma tu ji ku zanî xorto? Tu ji wek me li hir î, tu kesî nabînî. An nav di me didî.

Birîndar – Yadê, ma tu nabihîsî ko dengê tivingan dûr dikeve.

Pîrejîn – Ko dengê tivingan dûr diket

Birîndar – Ko dengê tivingan dûr diket, jê dixuye ko dijmin bazdidin û yên me didin pey . .

Kalo – Xebera wî ye xwehê. Niho tu nizanî çî kêf e. Dijmin di re ve, yên me dikevin pey. Carin hene bi seriyên bi sîngê li hev diqelibin. Hingê tiving wek ço ne. Tenê zîqezîqa şilfa xenceran e (bi dengekî nizim dihorîne:)

Lê xencerê lê xencerê

Qevdreşê kal nezerê

Ez li te geryam delalê! Çavreşê delalê! Tu kanê, enî zêrê kanî.

Jina Kalo –Ma min negotibû tu xurufî yî, ma dema berdolaviyê ye?

Kalo – Pîrê tu ker be, tu ji ku bizanî, belê berdolavî maziçînê, ma tu ji ko bizanî wekî dengê top tivingan dibihîsim çawan dilê min hildavêje. Herê mirin hebiwa kalbûn nebiwa. Xwezî! Xwezî! Li wan wextan, li wan zemanan. Heta ko em nedigihan sîngên hev me tiving bernedîda hev. Ne ji paş talde û nav çeperan. Hertûşt kurdmancî bû. Ji xwe eskerê reş yekcar bi me nikaribû. Ji heft bavê wan zêde bû ko hilkişin çîyan û bikevin warên me. Ko me xwe digihand kuntara çiyê ewan ruyê xwe badîdan. Ji me vedibûn, heta sala din, heta hingê ko em diketin deştê [dengê tivingan yekcar dûr dikeve]

## **Civanok – 16**

### **Ên berê, Qeşem, Menije, Gurgîn, Felemêz û pêşdetir Hevind**

[Tevde ji şevê derdikevin. Menije birîndar e, Felemêz ew hilgirtîye. Gurgîn jî birîndar e. Qeşem ketiye bin çengê wî. Birînen wan ne xedar in]

Kalo – Axanîno xêr e?

Gurgîn – Xêr e apo.

Pîrejîn – Mala min ê keçîk jî birîndar e, min digot meçe, lê guh neda min.

Birîndar – Ma min negotibû dijmin şikiyaye.

Felemêz– Belê şikiyaye.

Gurgîn - Şikiya û kişiya rûbarê din, yên me dane pey, heta ko wî bibin bajon hinda newala din.

Felemêz – Dijmin gelek êşîya, di newalê de bikare xwe biparêze jî, heta ko xwe bi edilî-ne jê re çend roj divên.

Kalo – Ji yên me pir hatine kuştin.

Gurgîn – Kuşiyên dijminan bêtir in.

Kzlo – Ji piran pir ji hindikan hindik.

Birîndar – Pismam, gelo niyeta mezinên me çi ye? Ma ji me re jî tevdirêk naye ditin. Ez biketam piştê kevirekî min dikaribû tivingê bişolînim. Lê çawan xwe bigihînim heta wê derê.

Felemêz – (Bê hemdê xwe) Ko Xwedê hezkir, ew jî dibit (ji Menije re) çawan gelek diêşê.

Menije – Ma ez kengê di destê te û di hilma canê te de diêşim, tenê ditirsim.

Felemêz – Ji çi diirsi?

Menije – Ne ji tu tiştî, ko ez bibêjim, mebe ka bixeyidî.

Felemêz – Naxeyidim, ka bêje çi ye?

Menije – Ma tu nizanî, belê ditirsim ko tu min dîsan berdî, em dîsan ji hev veqetin. Ma çire ji min veqetî, te nedît rex te de min jî şer dikir. Te bi xwe digot, berikên min qet şaş nedibûn, digihan armançê, êdî em ji hev veneqetin ne?

Felemêz – Nizanim keçê! Kar zane, derb zane. Ez çi bêjim, dinya şer e, şer hero bi awakî ye.

Hevind – (Bi deng û qîr ji şevêrê derdikeve bi destê wî re çend bombe hene) Baş êvar axano! Hûn çawan in, rahet in, êdî meursin, dijmin gelekî dût ket. Piştî wî şikiya, zûzûka nikare vegere (bomban şanî wan dide) ev sêvên ha jî ji we re rêkirine.

[Xelk dikenin]

Gurgîn – Te ev ji ku peyda kirine?

Hevind – Keko heke naxiyidî ez ê bêjim te.

Gurgîn – Qet naxeyidim, hema bêje.

Hevind – Wekî dijmin bazda û hûn ketin paşîla destgirtiyên xwe kofî û guliyên wan edilandin ez jî ketim himbêza çeperên dijminan û ev dane hev [xelk tevde dikenin]

Qeşem – (Hevindî himbêz dike û radimîse) Tu çi xortekî delal î.

Hevind – Keçê welê mebêje Gurgîn Axa dê bidexise. [xelk dîsan dikenin]

Pîrejî – Xwedê te bihêle kuro di wî halê de te em kenandin

Hevind – Di halê me de çi heye, me dijmin kevand, guhpehn revand, bûkên xwe civand. Ji xwe talaniya tevê êlê dawet e. Ez herim li bijîşkê xwe bigerim. (Xwe dide şevêrê)

Qeşem – Çi lawikekî delal û bi dil e.

Menije – Xwedê wî bihêle (ji Qeşemê re) birîna Gurgîn çawan e?

Qeşem – Ji halê wî xuyaye, tu nabînî halê wî ne tu hal e.

Gurgîn – Guh medê xwehê, ma tu nizanî Qeşem e, ji xwe re dibêje. Tu tiştê min nîne, niho dikarim tivingê hilgirim.

Menije – Xebera Qeşemê ye, tu ê çawan bikarî tivingê hilgiri, tu nikarî xwe hilgiri.

Qeşem – Tu nizanî çi xwîn ji te çûye

[Ji şevêrê pêjna lîngan û dengên mêran tête bihîstin. Lewend Axê hevalên wî]

## Civanok - 17

### Ën berê, Lewend Axa, Xurşîd Axa, bijîşk, Hevind û peyayên din û pêşdetir Qubad

Lewend Axa – (Li xelkê dinihêre û ji havalê xwe re) me tu wext nîne ko em winda bikin. Divêt tavil dest bi xebatê xwe bikin.

Xurşîd Axa – Belê, hima niho.

Bijîşk – Dê rûnin, em biaxivin. [Xwe ji xelkê vediqetûnin û didin quncikekê]

Lewend Axa – Ji xwe rehmêtî rêya me şanî me dabû.

Xurşîd Axa – Ma ji û pê ve rê heye.

Bijîşk – Hingê ez û Xurşîd bikevin nav peyan. Xelkê çekhilgir ji yê ne çekhilgir veqetûnin û karê wan ê neçekhilgiran bi rê xin.

Lewend Axa – Ji xwe ev e, tu şêwr û mişêwra din nîne.

Xurşîd Axa – Tenê, divêt qedere deh panzdeh peyan jî bişînin ber eniya şer, arîkariya Filît bikin.

Lewend Axa – Ne ji xwe.

Xurşîd Axa – Bi peyan re tu ê kê bişîni?

Lewend Axa – Bila Gurgîn bi wan re here.

Bijîşk – Gurgîn birîndar e, bila ew bi te re bê.

Lewend Axa – Hingê Felemêz, herdu jî hêja ne, yek ji ê din çêtir e.

Menîje – Ax.

Lewend Axa – (Li xwe dizivire) ev çi deng e?

Felemêz – Ne tu tişt e ez benî, dengê birîndarekê (ji Menîje re) dîn mebe.

Menîje – Dengê birînekê.

Felemêz – (Devê Menîje digire) keçê, dîn mebe.

Xurşîd Axa – Tu zanî, lê bi min ez biçûwama çêtir dibû. Tu li pêş ez li paş. Tu segmanên me bigihîni girê din ez ji herim pêşiya dijmin bi Filît ra heta sibe êvarê pêşiya dijmin bigirim û paşê digel peyan bêm xwe bigihînim we.

[Bijîşk û Lewend Axa li hev du dinihêrin]

Lewend Axa – (Ji Xurşîd re) keko tu gelek westiyayî. Di her delavê teng de tu. Lê heke te dil heye...

Xurşîd Axa – Dilhebûn ji heye. Ji bona selametiya tevayiyê divêt ez herim.

Bijîşk – Pezê nêr ji bo kêrê ye.

Menîje – (Ji Felemêz re) Te dît ji te mêtir hene.

Felemêz – (Bi em) Ji min mezintir hene.

Xurşîd Axa – Êdî divêt em dest bi karê xwe bikin.

Lewend Axa – (Ji xelkê re) jinino Mêrmino! Ev bûne çar sal em tevda di van çiyayan de ji bona azahî û serxwebûna welatê xwe dixebitin. Di nav van çar salan de me gelek tişt dîtine. Lê çavên me ji tu tiştî netirsiyane û di ber her dişwariyê de dilên me xurtir û zexmtir bûne. Em tevda malek bûn. Jin û mêr zar û zêç nav hev da diman. Herkesî karê xwe, wezîfa xwe kiriyê. Tu kesî nehiştiye ko lome ji bibit. Di mêranî û fedakariyê de hûn ji hev derketine.

Rojin hebûn em birçî diman. Şevin hebûn em ji sermayê diqefilîn. Lê gilî û gazindî nedihat bîra me. Nedihat bîra tu kesî. Herkesî ji bona welat û milletê xwe her zehmetî dikîşand û pê şadibû. Ji ber ko herkes bîrewerê kar û xebata xwe bû.

Kurdinon! Em îro mala xwe biguhêzînin. Em ê mala xwe a çar salîn berdin, jê derkevin. Lê di vê guhastinê de em ê bibin du ber. Xelkê çekhilgir derbasî girê din bibin, yê ne çekhilgir xwe bidin deşta Ecemîstanê, nav kurdên Ecemê. Ko Xwedê hizkir pêşdetir em ê di-san hev du bibînin. Di vê navê de herçî ko ji me mirine dibin himê avahiya serxwebûna me. Herçî ko dimînin sitûn û diwarên wê. Avahiya bê him nikare bisekine, him bi tenê bi ser erdê nakeve. [Xelk xwe ker dikin û li hev du dinihêrin. Xurşîd Axa peyan dibijêre. Bijîşk birîndaran mijûl dibe]

Birîndarek – Ma çîre? Ez bi çekhilgiran re naçim, birîna min sivik e.

Yekî din – Heke xwîn ji min diçe ez herim kuderê jî bi rê ve bimirim.

Lewend Axa – Zaron! Wextê me hindik e, dev ji kurt û pistan berdin. Peyayên ko divêt bêne hilgirtin ji me re ne gerek in. Dirêj mekin, divêt herkes qîma xwe bi qedera xwe bînin.

Qeşem û Menîje – (ji lewend Axa re) Ma Axa em jî ne çekhilgir in. Te bi çavên xwe dît, me çawan şer dikir.

Lewend Axa – (Keçikan himbêz dike) Belê xebera we ye, min bi çavê xwe dît, hûn çekhilgir û segmanin rind in. Lê xortin hene bê tiving in. Em ê tivingên we bidin wan.

Keçik – Ma em ne xort in. Tu me pîr dihesibînî. Tu ji ku zanî ko em hînge xortên te ne mêr in. Ka kî ne, wan şanî me bide.

Lewend Axa – Çavên min canê min bê fêde ye

[keçik vedigerin nik destgirtiyên xwe, xatir dixwazin û dikevin nav neçekhilgiran]

Hevind – Hûn jî ecêb in lo! Ez ji we re canê xwe pêşkêş dikim. Hûn ji min salên min dipirsin. Ma hûn hatine hire tenê ji bona kuştinê, heke welê ye rabe min jî bikuje. Ne heger we mirin jî daye çavê xwe hingê ez bi kêrî kuştinê meyim jî ma bi kêrî mirinê jî nayêim. Dema ko tu bimirî ez dikevim şûna te dimirim û te dihêlim ji bona ko tu bikujî û welê bi kêrî we tîm. Te seh kir Axa!

Bijîşk – Ji xwe ew berdestiyê min e.

Hevind – (Direve nik Bijîşkî) Apo ez xulamê destê te me, min mehêle, ev Lewend Axa zalimek e, dixwaze min bişîne deştê.

Bijîşk – Metirse, tu ê bi min re bêyî. [Karwanê neçekhilgiran bi rê dikeve, xelk ji hev du xatir dixwazin. Qeşem ketiye bin çengê Menîje]

Qeşem – (Ji Menîje re) Xwezî em keç nebiwana.

Menîje – Ma hingê em ev çend bi van ve girêdayî dibûn.

Jinek – Yên ko anîn an mirine an nema dîtînin, divêt sibe hûn jî ji bona dusibê bînin.

Menîje – Yadê dev ji me berde [paşîya karwanî ji diyarî kuta dibe]

Lewend Axa – Êdî dem e, divêt em jî bi rê kevin.

Bijîşk – Ne ji xwe. [Segman dibin du ber û çar çar rêz digirin. Berê Xurşîd axa serê xwe daye şeverê. Berê lewend Axa aliyê rohilatî]

Lewend Axa – Hevalno! Ma gerek e ez nav di we bidim. Hûn hemî mêr in şerdîtî û karê xwe bîrbirî ne. Tenê ji îro pê da şerê me ji şerên borî girantir û diwartir bibin. Ji lewra di-

vêt hûn ji ji berê xurtir û zexmîr bibin. Dilên we dido û gurçikên we çar. Hevalnon! Bila çavên me hergav li pêşiyê bibin, wekî em pêş ve diçin didin pey mirinê û gava ko em xwe didin paş mirin dikeve pey me. Lê herwekî rehmêtî gotiye, lê herçend ji me têt divê em canê xwe biparêzînin û zû zû xwe nedin kuştin, da ko dijminên xwe bê dijmin mehelîn. Pêşve zarono pêşve, Xwedê bi me re ye. [Segman tevda marşa jêrîn dixwînin û bi rê dikevin]

### **Marşa Segmanan**

Em biran e tevde kurd in  
Enîbilind serevraz  
Cihên me ne şehar, zinar  
Em êlo ne teyrê baz  
Welatê me diya me ye  
Em tev jê re gorî ne  
Hişyar bûne herçî kurd in  
Demê tarî borîne  
Daxwaza me heqê me ye  
Doza me ye serxwebûn  
Em dixwazin serxwe bibin  
Demên dîlî neman çûn  
Me sond xwarî ser bextê xwe  
Bi rûmet û bi xencer  
Welatê me aza bibit  
Em bibin jî kerbiker  
Mirin, mirin, mirin hebit  
Vê jînê rê bê serî  
Êdî bes e, dîlî bes e  
Şerm e kurd re hesirî  
Top lê dixin, tiving teq in  
Deng e ceng e to! To!  
Şer e, şer e lawno şer e  
Teq e req e lo! Lo!  
Di şerî de wekî şer in  
Kes namîne paş... paş  
Pêşve diçin xortên me tev  
Yek du sê çar marş marş

Qubad – (Dikeve diyarê. Xwe digihîne paşiya segmanên Lewend Axa. Tiving bi milê wî, dûrebîna Serwer Begê bi stuyê wî ve ye. Destê wî de kiras) ev e kirasê wî ê bi xwîn

[perde datêt]

## CUHABA LAWANÎ LI DIYA HAWARÊ

Dadê! Dadê Hawarê  
Roma, nan ji ber xwarê  
Gelekî ez kêfxweş bûm  
Ji ber te pirsiyarê  
Vêgav halê min qenc e  
Ev erd ji min re genc e  
Ev hal wisan bimîne  
Paşê tu car ne renc e  
Ferhenga min pir dibe  
Hero zêdetir dibe  
Cemed li vir kak dibe  
Meqas ji cawbir dibe  
Apê Hirço dibêje:  
"Ji Mîr Celo re bêje  
Hawarê pesin nehişt  
Kiçik kir kesê hêje  
Ew mirên gelyê Goyan,  
Ko siwaran berî peyan  
Dixwun bi eqilmendî  
Gerek ev bibin beyan  
Digel vê tunebûnê  
Digel vê qasibûnê  
Sipasan pêşkêş dikim  
Bi awê eşîrbûnê"  
Kekê Boz li ser dike:  
"Ji me re serwer meke  
Em, giş kurd in! Xwîna tirk  
Ji bo me rehwan bike"  
Ez bême ser fikra xwe,  
Gotin û armanca xwe  
Bihna min pir fireh bû  
Bi gotinên diya xwe

### Qedri Can

## BERXIKÊ HAWARÊ

Hawar Hawar delal î  
Tu ruhniya çavan î  
Nûxwêriya millet î  
Rêzan î hem rêber î  
Berxekî te hat giha  
Xweşmeqam û pirbiha  
Berxikekî pir delal  
Xweşçivat û xweşheval  
Ketiye nav Berazan  
Eşîreke navgiran  
Xweşçivat in bi şûr in  
Di şeran de meşhûr in  
Eşîreke sîng bi pirç  
Pir xwezî dikin dibên hirç  
Ew Boz in pir delal in  
Hevalan re heval in  
Belê "yazmiş kir" heye  
Lê ne ev sûc yê me ye  
Ev e sûcê mezinan  
Ko ev hiss zû da nedan  
Bi xatirê te Hawarê  
Biherike rûbarê.

### Hebeş İsmail

## SERXWEBÛNA MIRÎŞKAN

*Ji birayê min Şewket Beg re*

Li welatê me Xerza  
Dikek hebû Şehreza  
Rokê ew çû nav dîka  
Ji wan re go hêdîka  
Bes xwe bidin enîşka  
Werin bêjin mirîşka  
Mirîşk tev de bûne kom  
Berê xwe dane cem bûm

Leşker tev de bûne lek  
 Hin çeleng û hin kulek  
 Berê xwe dane çolê  
 Tevlî koç û tev êlê  
 Teyran dî go nagihan  
 Hatî leşkerkî giran  
 Tev de firîn ji malan  
 Berê xw dane balan  
 Ew jî li hev bûne kom  
 Yekî rabû gote bûm  
 Ey serbilindê Îran  
 Wey padişahê teyran  
 Rabe ser xwe tu miro  
 Ji bo me bêje îro  
 Ev leşkerê bê jimar  
 Gelo heye jê zerar  
 Bûm kenî û gote wan  
 Bakin bazê pehlewan  
 Rabû hudhud serfiraz  
 Wî çû bi lez gote baz  
 Go rabe ey tu baz î  
 Şah te îro dixwazî  
 Baz çû cem şah li banî  
 Destê xwe li ser hev danî  
 Go ey xwendekarê min  
 Zû li min ke barê min  
 Bûm gote bazê xwîn xwar  
 Bi lez rabe here xwar  
 Bazî rabû wekî şêr  
 Firek da xwe hate jêr  
 Bazê terî bi rêşî  
 Hate cem dikê pêşî  
 Destê wî girt û hejand  
 Nitqek jê re dirijand  
 Ûlan sen nerelisin  
 Go em xelkê Bedlis in  
 Sizin burde ne îş war  
 Dik xeyidî lê da dar  
 Bazî şehda xwe anî  
 Dik ji darê xwe danî

Go bi zor û bi gazin  
 Em heqê xwe dixwazin  
 Baz go kiye seresker  
 Go tu nizanî ey ker  
 Ez im paşa ez im mîr  
 Ez im şah û cîhangîr  
 Bazi çû cem dikê dî  
 Dî go ew jî weke wî  
 Tevan go paşa û mîr  
 Kesî nego ez wezîr  
 Nefer bûne yuzbaşî  
 Heta giha yê paşî  
 Bazî rabû çû banî  
 Li ber destê bûm danî  
 Tilûr tev lê bûne kom  
 Qale ya eyyuhelqewm  
 Ev hatine ji mala xwe  
 Divên îstîqlala xwe  
 Bûm go bazê dilawer  
 Gelo kiye seresker  
 Go tev axa û mîr in  
 Bê wezîr û mudîr in  
 Bûm hêdî rabû ser xwe  
 Taca xwe da serê xwe  
 Go bi taca serê min  
 Kes nîne himberê min  
 Rabin wek pehlewanan  
 Da em herin ser vanan  
 Hatin teyrê du birak  
 Ban kirin kund û qirak  
 Go hûn werin binêrin  
 Ka em îro çi mên in  
 Dikan xwe dan enîşka  
 Bû qîr qîrê mirîşka  
 Go fermana me rabû  
 Koma wan ji hev belabû  
 Ê ko kuştin ê ko man  
 Hatin gunda bêguman  
 Wan jî wekî me kurdan  
 Destê xwe ji ber xwe berdan



Elok û rûtîk û qaz  
Tev de bûne belengaz  
Hemî ketin koxê reş  
Çîroka me ji we re xweş

### Cegerxwin

## DILBER

Ji du çehvan dibarin tîr  
Di dinyayê kirim hêsîr  
Musilman im belê bê pîr  
Ji bo jînê divêtin şîr  
Ji bo çehvên te ez perwan  
Ji bo xizmet diçim kerwan  
Di heyland de tu yî rehwan  
Bi dest û pê ketim dawan

Tu bes biskan bike çîn çîn  
Ji nav alem tu î zêrîn  
Ji xet û qewseyên burhîn  
Dibînim herkes e ew dîn

Ji her mûkên te tê yek deng  
Dibêjin dilbera serheng  
Şefeq daye heta xerçeng  
Ji vî konî hilanî reng

Te awir da birîndar im  
Ji bêçarî kirêdar im  
Şev û rojê bi hawar im  
Ez bê nîsan û adar im

Bixwaze dilbera min tu  
Di cîhan de seranser tu  
Hemî şêr in havî tu  
Ji rojê pîr xuyatir tu

Were zulfan bide bayê  
Ji nav alem hilîn tayê  
Dinêrim bejn û balayê  
Bes e qurban were rayê

Bibe sîwan li ber tavê  
Tu rojê neqşekî bavê  
Tu rengîn ke bi zêravê  
Bikuj Botû di wê gavê

### Mustefa Ehmed Botî

## Kitêban: Qiseyê Pêşyan

## Mamosta Îsmail Heqî

**D**i dema derketina vê hejmarê de çend nivîstên kitêba jorîn gihane kovara me. Spasan li nivîsevanê wê dikin û xebata wî pîroz dikin. Ji ber ko di vê hejmarê de çih nemeye em îro jî tenê çend mamikan diguhêzînin stûnên xwe.

– Dostê dostim dost e, dijminê dijminim dostim e

– Aşî le xeyalek, aşewan le xeyalek.

– Wêk mûm şoqî bo binê xwe niye.

– Sal bi sal xwezîkê me par.

– Keçel hekîm biwaye, dermanî serê xwe ekir.

## SEHÎTÎ

### Le bo yekîtiya zimanê Kurdî

Nivîsevanê me ê delal û hêja Hevîndê Sorî di hejmara Hawarê a şanzdehan de ji bo yekîtiya zimanê kurdî enkêtek vekiribû.

Li gora şertên enkêtî cuhab heta serê gulana vê salê bihatina hinartin û di Hawarê de peyda belav bubuwana. Belê çend cuhab gihane me. Lê ne ew çend ko me hêvî dikir. Nemaze ji Îraqê ji cuhaba jêrîn pê ve tu tişt ne gihîste kovara me. Ji ber ko Hawar ji zû ve ye naçit Îraqê û destê me ji kurdên Îraqê bûye.

Ev şeş meh in, hukûmeta Îraqê nahêle ko kovara me bikevit erdê Îraqê. Heta niho, bi hêviya ko hukûmeta Îraqê emrê Memnû'û rakit û ke berê destûra kovara me dê bidit, me deng nedikir. Me çend caran murace'et kir, me ji wan re da zanîn ko Hawar kovareke edebî ye û eleyhdariya Îraqê nekiriye û nakit jî. Me xwest, îro jî em dixwazin vê meseleyê bi qencî û dilxweşî safî bikin û bi hev mekevin. Lê heke nebû, hingê em jî fikr û gotina xwe ser vê meseleyê bibêjin. Lê êdî bila li me megirin, me bihna xwe şeş mehan fire kir. Herwekî bi xwe dibêjin, "sûc ê destpêkirî ye" (el-badî ezleme).

Niho em vegerin ser enkêta xwe. Herwekî me di hejmara şanzdehan de gotibû em cuhaban bi rêz û tarîxê ve belav dikin. Ev e cuhaba pêşin:

### Yekîtiya zimanê kurdî

- 1 -

Komelî bijar:- bo pak kirdinewey kurdî le kelîmey bêgane em komele be baş ezanim, ke ebê xwendeware bê firmanekan û be taybetî dewlemendekaniyan bêken.

Komele; çî hê bijare bî, çî hê derûniye bî be pare fermanî cî be cî ebê. Pareş be pîtak, temsil piyaneqo, zor baş pêk dê. Fermanî em komele ebê bikirî be pênc kertewe.

Ewaney ke kelîmey senetkaran edûzine-we ewaney ke = tûcaret ko ekinewe.

" " " Z a -  
nistî " "

" " " zîraet"

" " " Îş û karî da-

îrey hukûmet ko ekinewe. Hemû pelêkî em komele pêwîst e be ladî da bigerê û kelîmatî petî ciwanî kurdî biduzîtewe û çepelêk kelîmey ciwanî dûziyewe xelat bikirê kurdekanî xwarû be ciya, biraxoşewîstekanî jorûş be ciya bo peyda û xulk kirdinî em komele hewl bidin her komele be ciya kovarekî edebî derbihênî, muellîmanî kurd ebê bibin mubeşîrekî baş bo belav kirdinewey ew kelîmate ke be kovar belav ekirête we damezrînerekanî em komele paş xerîkbûnêkî zor qonxireyek biken bo nûsinî qamûsêk û herçî kelîmatêkî ciwanî jorû we xwarû heye lê bijêrin bêkine be qamûsêk.

2 - Ke ferheng (qamûs) amade kira ebê

şirketêkî metbû'at bikirî û asarî kon û taze  
çî edebî, îctîma'î, zîra'î, sen'etkarî, ticarî be  
kitêb binûsirî û xezete û kovar belav bikate-  
we be nîrxêkî herzan, ebê le bîrman neçî  
bonî çap û zengûxiraf cidden pêwîst ebo  
muwefeqiyetî em şirkete.

3 – Komelî bijar çî hê xwarû û hê jorû  
ebê serenc bidate ew hekîmaney ke kurt e,  
û pir mane ye we usûlî îmlay Tewfîq Weh-  
bî Beg û Bedirxaniyekan le yek bida, û xe-  
têk etiwanin be latînî binûsin ke serbestî bi-  
bin û udeba û şu'erakanî kurd bilaw binêri-  
newe û ewanîş ebê qedrê ew teşcî'e bizanin  
û we'z le ko le min al û çawî reş bihênin...  
Xwe bidine edebiyatî rojavayekanîş... Êtir  
hurmet bo dostekanî kurdî.

### Lawêkî Kurd

## Peyameke Cegerxwîn

*Ji Osman Sebri efendî re*

Bi gorî bim ji bo te ey birayê min tu kanî  
Ji dûrî ve te destê xwe di nivêr destê min danî

Bi min û te du destên bê çep û rast ey birader  
Belê herdu qewî jar in di yek laşê giranî

Me pîrî derdê kurdmancan ji çexa etlesa jor  
Nezanî bo tevan derd e belê lê me xizanî

Belê zêr e belê zêr e belê zêr e belê zêr  
Xwedanê wê çîngîr e bila kirêt dixwanê

Ji bo me ne eqîl fêde dikî ne xwendina pir  
Ji bo me çî divêtin da ji tirsan bidne banî

Fêke va ye mirim îro ji دنیا ez hilatim  
Bi gera xwe bi çexa xwe te daxwaza me nanî

Cegerxwîn im mirim ez çûm ji bo we Sebriyek ma  
Erê hemberê kurd e we lê bê we heya esmanî

### Cegerxwîn

## LI GORNISTANEK AMEDÊ

Îşev ji şeva pirtir bihna min teng bûbû.  
Disan derdê min serî bi derxistibû. Şaxên  
mor li kolana dev bernexûn diyar bûn. Ta-  
jan û tivancan ji dil xwe dirêjtî kilox dikir.  
Tezîne sar di binê lingan heya qotê serî di-  
çûn. Qefseng li min teng bûbû û têra dilê  
min nedikir. Wekî nexweşê ko ta li serî di-  
de min dixwest cilên xwe biçirînim. Xwê-  
daneke sar û zelqok bi eniya min ketibû.  
Min li derdê xwe kiribû der, lê mikuna wê  
tînebû. Kela gihana welêt... kela gihan we-  
lêt...

Min da xwe û rabûm – navbera mala me  
û behrê dused gav hebûn – ber ve behrê  
çûm (Hercar ko ev kela li min radibûn ez  
diçûm ber behrê. Ji ber ko derdê min û wê  
bi hev diman ko ûmî bi pêl e, hewîniya  
min pê dihat) hêdî hêdî diçûm go mîna pê-  
lên behrê, dengên wîrewîr û kan û zarîna  
teyrekê şevê di zik hev de wek lorika diyan  
li ber dergûşê bi canê min şadibûn. Dilê  
min fire û xweş bû, lê kela min pirtir radi-  
bûn, li min wilo qewimî ko piyên min pîrê  
car nedigihan erdê. Çengên min radibûn.  
Wê gavê min fîra teyran dixwazandin. Bi  
şêna Yezdanê gewre ba ket bin çengên min  
û firiyam. Difiriyam lê zûka ji teyran û ba-  
lafîran û kamîlkan difirîm. Bi wê çûyinê di  
saetekê de min dikaribû di ser hemû dinê re  
derbas bibim. Ciyê ez biçûyamayê nêzing  
bû di bihnekê de Filistîn, Şerq el-Urdun,  
Sûriye derbas kir û li tala serê kaniyê li sîno-

rê welêt raperim. Di navbera Mêrdîn û Wêranşehrê re min xwe gihande ser Diyarbekirê. Lê gava gihîştîme Diyarbekirê li hêla Derê Çiyan tîrêjek nûrê weka keskesorê lê sitûr bi ber çavên min ket. Çavên min deliyan hinekî ez wer mat mam paşî min xwe lê girt û çûm. Gava gihîştîme tîrêja nûrê weka perperokê ko per dişewitin ez di jor da hatime xwar û ketim. Hîn êvar û zû bû. Cihê ez ketî li pêşberî rawesteka balafirên Roman bû. Kilos (eskerê tîrko) di ser hêl û bin hêla min re derbas dibûn. Ez di cihê xwe de mam piştî demekê dinê qerîya [reş] û ker bû herkes nivist. Tenê dengêkî bi şên ji Dicle dihat. Serekî min doralên xwe çav kir li neyaran nîşan nemabû. Hîn tîrêja nûrê bi hemdê xwe şewl didan. Ji ber ko du mamên min ji di wê erdê de veşartîne min zanibû ko kî şêr li wir radizê... Şêx Seîdê Kal. Min hêdî hêdî xwe gihande tîrêjê. Vêca zimanê min hatibû girtin nizanibûm çî bêjim. Serekî min û dil li ber hev da kar bi min nedibû, min nikaribû du pirsan bi cih bikim. Wilo dest best berê min li tîrêjê û rawestiya bûm. Bîstekê bi şûn de zeman hebekî bi ger ket û min got:

– Ey ke'ba qewmiyeta min Şêx Seîdê Kal! Te... te... te zincîra dîliya qewmê min bi zexmiya dil, piraniya zanîn û rastiya xwe qetand. Weka şêr ko di qefesê de bi derkeve. Ev qewmê ko çarsed hinde sal in xwe ji bîr kiribû, xwe wînda kiribû, bênav û bêzanîn mabû, ketibû xewa mirinê, di wê xewê de ew şêr te hişyar kir. Neyarê ko dixwest me û navê me û zimanê me ji dinê hilîne te di destê wî da lê da û şikand. Ji roja ko te serî daniye û vir de kîjan kurd çî bike û li Kurdistanê çî bibe hemû kurê te ne çiku bingehê wî xanî te veda û himê wê te danî.

Heya ko dinê hebe ew kesên ko dibin navê kurdî û kurdîtîyê de bijîn minnetdarên

kir û qenciya te ne. Çiku ji wê rojê û vir de bavê kurdîtîyê yê paşin tu yî û dê her tu bî. Bende ji minnetdarê te kurdekî piçûk, bê kêr e. Ji ber ko Yezdan dilê min wek dilên birayên min ê kurd zexim çênekiriye ji tîştên piçûk û mezin zû diêşe. Diêşe lê ne êşeke nexweşî, êşek evînî... giş dibe agir. Agirekî wilo ko cenabê Zerdest li bê teşebûna wî vediciniqe... Can û cendek li min peritandîye, bihnêkê nikarim bê xem rawestim, giş şewat... sotin... jan... tajan... tîr... ti-vanc in.

– Ey qencê Xwedê! Qesda min dîtina welêt û vî erdê ko ji şêr û lehengan tîjî ziyaret kirin; û ji vê jana di dilê xwe re jî dermanek ji cenabê we xwastin bû. Lê evê tîrêjê perên min sotin û ketime xwar va me ka tu ji min re çî dibêjî?

Tu deng çênebû. Hat bîra min ko hê nizanin dinê qerî ye û giş nivistîne ji lewre tu cihab nedan. Dîsan min kire zarî.

– Ey gewretirê qewmê min! Tu . . . tu bi kesera dilên van şehîdên li nik xwe û bi kula dilê şehîdên kela xwê dikî ko cihabek wekî dilxwaza min bidî. . .

Dîsan weka berê dinê kir. . . tu deng çênebû. Car din bi dengêkî zîz layijim.

– Ey şehîdê gewre! Piştî mîrê ola Muhammed! Himê heyina kurdanî ye! Tu bi evîna xebata şehîdên ker û Seydxan û Elîcan dikî ko hinde min bê lîr nekî, ya ez nehêjayî vê daxwaziyê me?

Dîsan tu tîşt bi derneket. Êdî mecala min û xweragirtinê nemabû. Firqata girî ketibû qirika min bi hêl dengê xwe min kire gazî û zarî.

– Ey hişyarkirê qewmê min! Tu bi mêtariya di dilê Ferzende û Îhsan û bi gorna Birho dikî ko min evqas şerpeze nekî. Cihabek... du pirs... dilxweşiyek... çî dibe? Ma ez jî ne Kurd im.

Bi sehkirina hersê navên dawiyê ji rojhi-  
latê tîrêjê de deriyekî mezin ji erdê vebû û  
yekî mezin serê xwe bi derxist. Çi bibûnim  
ko Ezîz axayê Silopî ye. Min ew nasî lê wî  
ez nenasîm û ev xeber ji min re gotin.

– Bira ji bo Xwedê hinde meke qêrîn û  
zarîn. Îşev civîna mezin heye ko kes nikare  
bête nik me, ma tu ji riya Xwedê ketiye ko  
welê dikiye gazî. Hîn pir dirêjkî em ê xebe-  
rê bidin melekên. Doje nêzîngî me ye dê  
çend zebaniyan bişînin û bi agir bera te din  
û li nav çava te bidin heya dimirî lê te gu-  
neh e raneweste here mala xwe.

– Hey lo pepûko! Tu ji agir ditîrsî ma  
agir bi min çî dike? Agirê ko Xwedê êxistî  
dilê min heke berdim bila Dojeh jê bitîrse  
ko ew dê bê zebanî bimîne li wê bi şûn de  
ez dixwazim bêm civîna mezin bibûnim û  
şuxlê min heye.

Li ser van pirsan axê berê xwe da jêr û  
çend pirs gotin:

– Ma kesî te yê civakê li hir heye? Ko bi-  
karibî werî diyarê civînê.

– Erê Axa heke ew jî ne weka min sê ser  
bin du mamên min li hire hene. Xeberê bi-  
de Şukrî û Nûriyê Mirdêstî bila destûra min  
bigirin da ko werim nik we. Ma tu min nas  
nakî? Malava hinde em tev di hepsê de  
man. Niho ez leqayî te bûm tu li min radi-  
bî.

– Gava min tu ditî hê sîpe bûyî ji ber wê  
min tu nenasî. Li qisûrê menihêre tu ne bi-  
yanî yî dikarî werî. Bira! Ez dergevanê civî-  
na mezin im di êvarê de wilo emir dabûn ji  
ber wê min hinde tu kez kirî de kerem ke  
were.

Ez çûm, Ezîz Axa ez himbêz kirim û da-  
xistime jêr. Dîsan derî dada. Gava em dake-  
tin jêr çî binihêrim wira jî alemek lê aleme-  
ka ava. Rê, avahî, tevger tiştêkî ji eqil der  
bû. Hele kareba ji stêrkên ezmen pirtir bûn.

Berî hertiştî min pirsra şûncivînê kir. Gote  
min: Divê li ser rêzika me tu mamê xwe bi-  
bûnî ko qartekî bide te da ko bikarî biçî di-  
yarê civînê. Min pirsra mamê xwe yê Şukrî  
kir got: "Ne di nav civînê de ye niho li mal  
e, hat pirsra Hesen Xeyrî kir û daket ber  
Dicle". Gazî xortekî kir û qewitî lê kirin.  
Ezîz Axa ma li ber derî ez bi xort re daketim  
ber Dicle. Mamê min destmêj digirt gava  
çav li min ket hat ez himbêz kirim û dilê  
xwe li min xweş kir û destûra xort dayê,  
xort çû. Min pirsra mamê xwe yê din kir  
got.

– Ew li bihuştê dimîne herwekî li dinê ji  
siyasetê kanig diman li vir jî xwe welê kanig  
digiriye.

– Mamo ma vira ne bihişt e?

– No! Hire qada xebata welêt e. Dixwazî  
te bişînim nik mamê te here li bihuştê şehî-  
dan hêreke.

– Mamo te zimanê xwe yekcar guhartiye.  
Ez ditîrsim ko tu hîn li ser zaravayê welêt  
bî. Lê dinihêrim peyva te tekûz e.

– Erê kurê min! Heya du salan berê em  
herkesê li ser zaravayê welatê xwe diaxivîn.  
Lê pêrar ko tîrko Şêx Esedê Hevlêrî bi dar  
da kirin, hat cînariya me û bi tipetipa ca-  
mêr civatek ya zanîne hate pê niho li ser zi-  
man dixebitîn.

– Serekê civata zanîne kî ye?

– Serek Şêx Es'ed Efendî ye, nivîsevan  
Salih Begê Hênî û diwanzdeh jî libatên wê  
hene. Ev salek e bi pêkanîna ferhenga me-  
zin mijûl dibin.

– Tu zanî mamo! Turko zimanê me raki-  
riye?

– E, berî çardeh rojan min di hişyariyê de  
xwandibû.

Ma tu rojnameyên we hene?

– Bi navê "Hişyari" yê rojnameke me ya  
siyasî heye. Ew jî bû salek bi mîraniya Fuad

Begê bi hev ket. Fuad Beg gerînedeyê berpirsiyar e, Kemal Fewzî gerînedeyê çapxanê ye, Hesên Xeyrî sermîvîsevan e û Hacî Exî xebêrgihan e.

– Ma ji bo çi hûn Ehmedê Xanî nakine seroka civata zanîne?

– Ehmedê Xanî çavdarê tevayîya xebatên zanîne ye.

– Piraniya we dîmokrat in an aristokrat?

– Ji rojnamevanan pê ve hemû aristokrat in. Heryekê hicetek di bin çengan de ye hinde navmalekê.

– Mamo Ezîz Axa gote min civîna mezin heye dixwazim tu min bibî û ez bibûnim.

– Kurê min ez bi xwe naçim civîne heke dixwazî qartekî bidime te here.

– Ma ji bo çi naçî civîne?

– Lawê min vê derê melivîne. Pirsên rast ên tehl in. Dema tiştêk bê fesal dibe ko kê kirîye raste rast didime ruyan û giliyên wan jî bi sermîvekê dikim. Vêca çavên xwe li kirên hev digirin. Tu bi xwe dizanî bihna min jî teng e û xwe ranagirim. Dawî dilê hemû hevalan li min dimîne ji ber wê yekê heft sal in ko careke tenê çûme civîna mezin. Kurê min qene tu wer nekî. Hergav li ser axaftina welatê xwe were dîtin.

– Wey sed carî xwazî bi dilê te mamo! Qene heft sal in tu car ketîye civîne. Bi serê te ko di van heft salan de hê carekê jî neketime civîne. Min weka perçemekê perê xwe rûçikand hemûyan pirsên min tehl dîtin. Bi çav hej li min dikin. Lê min hîn diyarê civînan nedîtîye. Çiku hemû dizanin devê min nasekine. Ji ber ko li nik me jî çavgirtin heye ji lewre. De bila ew derd bimînin di cihê xwe de. He min bibe diyarê civîna mezin carekê li tevgera we binihêrim.

Mamê min da pêşîyê. Em bi rê ketin. Qesreke bê awa mezin hate pêşîya me. Min pirs kir, got: "ev qesra civata zanîne ye?" Û

me xwe gihandê, nuh ava kiribûn qesreke wilo mezin bû ko "Yıldêz" nayênin bîra mirov ez ecêbmayî bûbûm. Gelo tûbê qesra civîna mezin çilo bû? Em gihane derê qesra zanîne mamê min got.

– Kurê min dizanî? "Hişyarî" li hire bi derdûkeve.

– Ez benî ma niho vekirîye?

– E, vekirîye dixwazî em biçin Fuad Beg, hevalan, serêkî bibînin?

Min dilkirina xwe nişan da. Bi asansorê em hilkişin tebeqeya nozdehan. Çapxane li wir bû. Xortekî du mil li ber derê çapxanê rawestibû. Mamê min pirsê began kir wî got:

– Hesên Xeyrî Beg bi navê rojnamê çûye î civîna mezin guhdariyê dîke, begên mayî li hire ne.

Mamê min li pêş û ez li dû em ketin nava çapxanê. Dîktor Fuad bendek dinivîsand. Di dema destguyaşîrîne de çavê min lê ketin sernama wê "Cendekê Bê Serî, Destên Çûne" bû. Kemal Fewzî jî hejmara Hawarê ya hivdehan bi dest de bû "Tola Karwên" dixwand. Min pirsê Hacî Exî kir gotin; çûye welêt ji me re xeberan bîne piştî dil û xatîran Dîktor got.

– Malava qe hûn bi ser me de nayên. Divê hûn yekcaran li halê me bipîrsin û hinek jî bi mal werin.

– Ev e bi ser we de hatim û bi mal jî Bîrho bi malbata xwe ve, Şêx Evdîrehman, bîrek xortên ker, Seydxan, Elîcan û Tewfîq Axa bi hinde hevalên xwe ve nehatin?

– Erê tu hatî û ew hatin lê ne wekî daxwaza me. Tu bêcih û bêwar mayî hinga em ketin bîra te. Ev mîrxasên hanê jî neku ha bihatana . . . diviyabû serê wan di hîmê bîngêhê welêt ketana û cendekê wan bihatana vir. Gava hatin serê wan pê re bû. Diyar e ko li dest bîkêriya we ev şêrana mirin

û xêra wan jî negiha welêt. Hele Tewfîq Axa hinde giliyê we bi sermîvekê kiriye heke te bibînînin dîtirsim pîrsên gelekî sar li ruyê te xînin.

– Ji xwe min jî dil heye ko biçim diyarê civîna mezin. Ko çî bidine rûyê min ez jî dê welê bidime rûyê hevalan. Ma ji derbiderbûnê wê da jî heye? Xwedê dihebîni Hewaran kî ji we re tîne?

– Hacî Exû tîne. Ma dixwazi tu jî "Hişyari" kê bire [bibe] ji hevalan re?

Zor spasen dikim. Gelekî minêkar im ko yekê bibînim û bibim. Li ser îşareta Dîktor, Kemal Fewzî rabû bi nav çapxanê de çû. Min jî li çapxanê dinihêrî çî çapxaneke delal çî rêzikeke pak. Tu nema Kemal Fewzî vegeya hat "Hişyari" bi dest de bû. Xwerû bi herfên nuh bi derxistibûn heşt rûpel bûn. Ko çî giha destê min serekê min çav lê gerand. Çavê min bi şî'reke delal ket, lê min wezna wê nedianî der. Şî'ra Dîktor Fuad bi navê "Bijîşkê Welêt" bû. Lewma ji kurdên dinê dikir. Ne gewre, ne şêx ne munnawer dihiştin. Di paşiyê de spasen li camêrên serkur û derbend dikirin ko tê de şêrên wek Biro, Îhsan û Ferzende rabûbûn.

Hîn min dixwest bendek didoyên din jî bixwînim min nihêrî destek li milê min ket. Berê xwe dayê ko melekek e got:

– De rabe xorto! Şefeqê gewr kiriye divê tu ji goristanan bi derkevî.

– Malava çî zû hê niho hatim şuxlê min heye ez ê îro jî li vir bimînim û şevê tê dê herim.

– Nabe piştî şeweqê yekî li hir bête dîtin divê ew li dinê venegere û em jê berpirsiyar dibin.

Ji bona rastiya xebera melik min li çavên hevalan nihêrî. Kemal Fewzî serê xwe hejand got: "Rast dibêje". Min got.

– Ma cezayê mayîna min ew ko tim li vir

bimînim? Ji xwe ez jî minêkarê wê yekê me.

Xwedê zane melek zahf xeyidî bû ko li min sor kiribû.

– De zû rabe an ne ez ê gazî ruhstên bikim.

– De here lo! . . . Ma tu min bi ruhstên dîtirsînî? (Û vegeyime ser Fuad) Biral Bi yekîtiya Yezdan û bi keser û dilê we bit ko ez ne minêkarê çûyinê me. Min divê li nik we bimînim. Ne min civîna mezin dît û ne jî Şêx. Ma holê çûyin dibit.

– No. . . mayîna te ne rast e. Ma li vir çî heye heke welat e li dinê ye û xebat jî li wir e. Ji bona dîtina Şêx û civîna mezin şeveke din were.

Hîn pîrs di devê me de bû min nihêrî melekê me hevalekî xwe daye pê xwe û hat.

– Heke tu naçî ev e ruhstîn?

Ji ber ko carê di navbera Barzan û Birek pir de min ruhstîn dîtûbû jî min re nas bû.

– Here babo here! Ruhstîn dinasim. Û ez ne kesê ko bi virdîqan bitirsim.

Herdu melean li hev nihêrîn û gotin: "Bi rastî serê vî hişk e pîrs pê de naçin divê ruhstîn bi xwe were" û çûn. Kemal Fewzî gote min:

– Te ne qenc kir tu yê çûbûna gava ev gili bikin ruhstîn dê were. Divê em li wir bûna û hatina bêfêde çî lê tê. Li ser bêmediya hevalan êdî min nexwest li wir bimînim. "Hişyari"ya ko di destê min de min pêça ko têxim berîka xwe. Min dît destekî mezin dirêjî ber devê min bû. Min nas kir destê ruhstîn bi xwe bû. Destê min ê ko hişyari têde bê hemdê min li destê ruhstîn da û ketim rê.

Bi hilweşandina destê min re êşekê li dilê min xuya kir. Min çavên xwe vekirin ko li nêzika behrê li ser mêrgêkê razayî me û min piştê destê xwe yê rastê di rex xwe de li kuçekî daye û xwîna germ lê tê. "Hişyari jî di

destê min de tinebû. Şeweqê hîn nuh gewr kiribû.

*Mesû' keviya Deryaya Sor: 15 gulanê 1933*

**Osman Sebrî**

## Şin

### ÎLYAS EFENDÎ

**Kurê Hacî Osman Axayê Reşoyê Dêrikî çû rehmtê**

Îlyas Efendî kurê Hacî axayê Reşo yê Dêrikî di siseyê hezîrana vê salê di roja şembehê de çû rehmetê.

Li gora ko ji me re hate nivîsandin rehmetî bi mêvanî çûbû Amûdê. Ew çend hevalên wî heta derengê şevê di qehweke Amûdê de rûniştibûn. Wekî ji hev qetiyên Îlyas Efendî jî ser xwe û bi kêf bû. Mirin nedihat bira wî, ne jî bira hevalên wî. Cihê wî li geraja Amûdê çêkiribûn. Sibeir heta wextekî dereng xwe şanî nedabû. Hevalên wî çûbûne balê. Gava ketin mezela wî dîtin ko kurê Hacî Osman Axa, ji bona xewa xwe a paşin û abadîn [ebedî] xwe dirêjî nivîna xwe kiriye. Jê deng nedihat. Paş xwe re malek û welatek hiştibûn. Êdî deng ji wan dê bihata û ew ê guhdariya wan dê bikira. Rehmeta Xwedê lê û li malbara wî bit.

**Hawar**

### Bîreke Îlyas Efendî

Ji biserhatiya rehmetî tişteki tekûz û hêjayî nivîsandinê nizanîm. Lê ji bona şakiri-

na giyanê wî bîreke wî dê biêxim rûpelên Hawarê.

Îlyas Efendî ji giregîrên Dêrikê ye. Zû ve bi kurdaniya xwe hisiyaye û ji bona azahiya welatê xwe xebitiye. Min navê wî ji berê ve dibihîst. Ji min re gotibûn ko ketiye hepsê, derketiye pêşberî Îstîqlalê, cuhabên zîrek dabûnê û ho. Ji lewra ez nivîsandina jînenî-gariya wî ji wan re dihêlim ko pê dizanin û bi xwe di van stûnan de bîreke wî belav dikim. Belê, di çaxa serxwerabûna Agriyê de me gelek qala rehmetî dikir. Bi hin hevalên me ji welêt hevdu nas dikirin. Jê re dişandin û jê distandin. Bi wan re rabû û ew di cihê xwe de biqewimanda. Lê herwekî nas e tu kesî neqewimand wer li me qewimandin.

Pêşdetir em anîbûn Şamê. Hingê me bihîstibû ko Îlyas Efendî derbasî xetê bûye û hatiye Sûriyê. Lê hukûmetê ew wek hevalên din; nehiştibû ko li ser tixûbî bimîne û hî-nartîbû Dêra Zorê. Çend mehan li wê derê ma û paşê vegeriya Serê Kaniyê. Lê me hevdu nedîtibûn. Heranî ko ez, berî du salan ji bona çend rojan, çûbûm Hisîçê.

Li Hisîçê em di civarekê de rûniştibûn. Di nav me tu biyanî nînbû. Tev de kurd, tev de derketî. . .

Yekî ji min re gotibû ko dengê Îlyas Efendî spehî ye. Bi hincerekê min jê hêvî kir ko ji me re tişteki bibêjît. Li min vege-rand û got:

– Li ser çavan, ko min ji te re negot ez ê ji kê re bibêjim. Lê dengê min nîne.

Vêca min jê re got:

– Ez ê ji te re li ser deng û strana kurdan çîrokekê bibêjim. Wekî ez li Almanayê bûm rojekê profesorekî Alman ko bi kurdaniyê mijûl dibû û li ser kurdan gelek kirêb xwendibûn ji min re got: "Min di kirêbekê de xwend ko kurd gelek hijî mûstiqiyê dikin



û tu kurd nîne ko nizane bistrîne. Ez gelekî dixwazim tişteki ji mûstîqiya kurdan bibihîzim. Tişteki ji min re nanihûrîni? . . ." Ji ber ko min deng nîne min nikaribû jê re bistrînim. Ma ne gerek e ez bibêjim ko gelek şermisar ketim.

Îlyas Efendî hinek fikirî û ji min pirsî:

– Ewî çi gote te?

– Ji min re got: Li gora destûra ko her kurd dizane bistrîne, strandin wesfêki kurdaniyê ye. Madam tu nizani bistrîni di kurdaniyê de wesfêki te kême, tu kurdekî kêmwesfî.

Rehmetî ji dil kenî û li min vegeand:

– Ez çi bêjim te zora min bir (dîsan kenî û bi ser xist) di kurdaniyê de tu kêmaniya min nîne ez bi her wesfê xwe kurdekî tekûzim û ji me re çend kelim gotin û em pê şa kirin. Xwedê giyanê wî di axretê de û zar û zêçên wî di dinyayê de şa bikit.

Îlyas Efendî hêj ciwan û ser xwe bû. Çavên wî bi agirê jîriyê diçirsin. Eqilmend û xwedan tevdir bû. Rê pê biketa dikaribû xizmeta millet û welatê xwe bikit. Ji zêvariye, di nav belengaziye de mir jê bêtir heyf ji me re.

### C. A. B.

**P**aş ko me xêzikên jorin nivîsandin û dan çapê bendeke Cegerxwîn li ser rehmetî giha me. Weke xwe û jêr ve diguhêzînin stûnên xwe. Cegerxwîn bi zarekî ziz mirin û veşartina wî ji me re dide zanîn.

## ÎLYAS EFENDÎ ÇÛ REHMETÊ

**Î**lyas Efendî yek ji munewwer û milletperwerê kurdan bû. Xebat û fedakariya

Efendî di nav hevalan de ne winda ye. Ji hevalan re dilawerî, mêraniya Efendî eşkera ye. Û kes nikare înkâr bike. Îlyas Efendî di berî bişş salan de heta îro ji welatê xwe re xebat kiriye. Çiku Efendî ji berê de hogirê mala Cemil Paşa bû. Bi wan re civat û qulûbên kurdî gelek caran vekiribûn. Wextê mala Cemil Paşa daketin Sûriyê û paşê hilkişiyên çûne dora Mardîne di vegeerê de cenabê wî bi wan re hate nav kurdmancê Cizîrê.

Paşê bû yek azayê (endamê) civata belengazan. Çend caran Efendî ji civatê re li zar û peran digeriya. Çend şerqiyê kurdî ji ber dizanibûn. Li ku rûniştê civat xwe bi serpehatiyên kurdî dilxweş dikirin. Efendî ne bes tenê munewwer bû. Zêdetir axakî mezin û hêja bû. Çiyayê Mazî nêzikî çar hezar mal di bin destê wî de hebûn.

Efendî çend caran ji me re digot: "Ez dixwazim ko di şerê serxwebûna welatê xwe de, di şerê neyar û dijminan de bême kuştin." We lakî Xwedayê cihanê nedivabû go yekî wekî Efendî di şerê dijminan de we yaxud bi gula belengazekî bête kuştin.

Di mêvanxana Amûdê de bi qedehêkê ava şerî canê xwe siparte axa sar. Piştî mirina Efendî çend tomobil ji haval û dilxwaza û çend siwar ji axa û kurdmancan bi cendekê Efendî re meşiyên û birine Ebû Ceradê. Ji ber xortên Cizîrê ve ez serxweşiya mal û mirovên wî dikim rehmeta Xwedê lê bî.

### Cegerxwîn

## EZ BI ŞÛR IM

Hatime ji tarekê

Ketime welateki

Welat welatê Botan

Dest û eşîr Hesinan  
Ez bi şûr im bi rim im

Kurdistanê tu delal  
Gorî te bin xortê şepal  
Min tu dîtî ji dûr ve  
Aşiq bûme ji kûr ve  
Ez bi şûr im bi rim im

Ez kurd im bi ra û xwîn  
Kekê min e Cegerxwîn  
Deşta me kûr gir bilind  
Welatê me delal rind  
Ez bi şûr im bi rim im

Xwedê ez kirim cindî  
Ko şer bikim bi rindî  
Şer bû felata kurdan  
Aza bibit Kurdistan  
Ez bi şûr im bi rim im

Belê min şûr û rim e  
Heyfa min ji ew Rom e  
Şûrê min bi ar û pêt  
Xizmet bikit bo welêt  
Ez bi şûr im bi rim im

**Ebû 'Inad**

## **FERMANA KURDAN**

– Ji Cegerxwînê ceger bixwîn re –

Ferman e Mîro lo Mîro ferman  
Fermana me ye fermana kurdan

Ne tenê ferman bo mîr û axan  
Farmana me ye fermana kan

Fermana millet, fermana welêt  
Dil bi şewat e dora me ji pêt

Hewşêş me bûne berga dijminan  
Mehrem nehiştin ketin her zêlan

Me tişteq nema, ne nav e ne deng  
Lê em diqorin qulingê bêçeng

Ji Xaniqînê hetta Firaî  
Ji me girtine evî welaî

Ketin cihê me em mane derve  
Êrîş e êtîş ji jor û jêr ve

Bêstûn mane kon xeyûtan  
Reşmalên(1) me ji tev kirin talan

Di qesra xwe de em dergevan in  
Di mala xwe de em gî xulam in

Zozan nemane havîngeh bi yar  
Rêlên me bê belg newal bûn pesar

Havîna me sar zivistan germ e  
Ma ez çi bêjim ev hal ne şerm e

Diyarbekira xopan bi sûr û bi tat  
Girdî Siwan (2) de kêlên me bûn lat

Senandeza (3) me maye bê dezdar  
Mîrên Erdelan lê nabin guhdar

Dibên çikiya rûbarê me Zab  
Ji dijminan re me daye cuhab

\*\*\*

Lo Mîro ferman fermana kurdan  
Ax û nalin têt ji keç û bûkan

Pirani em in bûn hindikayî  
Di mala xwe de em bûn biyani

Lêk vekirine ereb û ecem  
Romî ji xwe nas enake tu kerem

Keremkarê ko tev sitemkar in  
Rêya me girî dût ji şehar in

Ën Ewrûpayî ew jî heval in  
Hevalên wan in çimkî em jar in

Kemêl karê xwe wisa pêk ani  
Li hundur dilî ji der ve girî

Bertûlkirî ne dewletên dorê  
Civatomilletan nake tu şorê

Ew civaneke gelek bilind e  
Wek du xwîstan bi sûreteke rind e

Gotina Wilson tev derew derket  
Guhpehn û fireng vir kirin adet

Tev derewîn in ne tenê Wilson  
Zêrê piçûk ji ev e Henderson

"Yes yes"(4) dibêjin "san fût"(5) jî derew  
Ji wan re delal guhpehn û erew

Ereb û eceb guhpehn jî bi wan  
Dest dane hev du tûran û qehtan

Belengaz xizan ne hal û hewal  
Malê me yexma xwîna me helal

Li Qefqasê jî şopên me hene  
Gelek mebin jî çend kurd lê hene

Bipirsî kurdan qewmekî boş e  
Boşêke welê hev du disoje

Rût û tazi ne ne şal e ne şap  
Ji dijminan re me daye cuhab

Lo Miro ferman, ferman e ferman  
Rencîde mane pismam û dotnam

Ar diweşînin mawîzer top in  
Hilweşiyane ne gir ne kop in

Welat perîşan wêran e dehar  
Ne xort xuyane ne kal in diyar

Kurdûn bû gunch kufr e kurdanî  
Çimkî em mêr in weşet mêranî

Serdar nesax in segman birîndar  
Dar û bestan de çeleng e çi dar

Ne keçik hiştin ne jin jinûbî  
Tev xeniqandin bin dar û devî

Dil bi birîn in, derdê me kûr e  
Felata welêt nizamî dût e

Nijdevanî jî çû ji destê me  
Reben û pepûk tev mar gestî ne

Destên xwe me tev ber xwe de berda  
Dest hilînin lew em bibin serxwe

Min hedar nayê ber vî deravî  
Tev cihê xwe de qê bûne bawî

Homa (6) tu bêje ma ev ji hebî  
Kurdên te serwer bikin xulamî

Ne rûmet maye ne namûs ne deng  
Qê em mirîne bêxwîn û bêreng

Nêwal li me kûr derdên me giran  
Sin li me nizm in burcên me wêran

Zevî bûn beyar gundên me xerab  
Ji dijminan re me daye cuhab

## Remoyê Qenco

## BÎRHATİYEK YA ŞÊXÊ MIN

Di sala hezar sêsed û çil û nehan de di xizmeta hezretê şhidê gewre û bihuş-tî, Şex Evdîrehman Efendî de bûm. Li Qamişloke me nimêja îda hacîyan ya mezin dikir. Pîrekek digel çend zarokên xwas û tazî û serkol û perîşan li ber me re borin. Hezretê Şex bi zarê xwe ê şerîn pirs kir:

- Hûn çî kes in xwişkê.

- Ma em çî ji we re bêjin em mihacir û belengazên hêla Hezaromê ne. Di sala berfa giran de şape bi ser me de hat û gund û bajarên me li ber xwe birin û em ji hertiştî xelas kirin û bi vî rengî em li van derî û kolanan êxistin.

Vêre vêre çend hêstirên weke mirariyan ji çahvên reş û belek rijihan û ser ruyê sorgulî û mubarek de herikîn.

- Ma hûn çî dibêjin birao, qê serê wê şapê gihaye we jî.

- Belê em jî weke hewe li berketiyên wê şapê û lehiyê ne. Lê em wek kevoka nûfer-xîn bûn. Ji ber hûc û birîha çengên me ew şape bû pezek û li ber bayê ket û em ziwa pariztî derketin. Bizane xwişkê berfa ko bû şape û li ber lîngan ket zûka dihelit û çiyayên wê zû reş dibin û kulîkên bendemayî zû dibişkin. Bi himmeta Yezdanê pak îro em ew in. Eger tu bawer nakî here li welatê xwe bigere û hewakeve serê kop û kumetên bilind û qenc zêrevaniyê bike. Hingê tu ê bizanî ev tişt hemî rast in û ev dilê te ê peri-

tî û şikestî dê goşt bigire û piştta te dê rast bibe.

Lê çî fêde ye feleka Şexê min zû girtibû û negiha reşatiya wan çîyan û wan bûkikên nûhildayî û bişkiwî têr bibînit û bi wan kul û keser û kovanan ve piştta xwe da me û çî rehmetê.

## Mustefa Ehmed Botî

1. Di zarê Sulemaniyê de konê reş
2. Girdî Siwan di bajarê Suleymaniyê de gornistaneke bi dar û rêl e. Di wextê şerê mezin de eskerê tirkên darên wê birîn, kêlên wê şikênandin û gornistan xerab kirine.
3. Bajarekî Kurdîstana Ecemîstanê ye.
4. Bi îngilîzî, belê belê.
5. Bi Fransîzî, bêşik, herhal.
6. Di zarê paloyî de Xwedê.

## HEJMAR 22

### HESPÊN XWEŞXWANÊN KURDÎ

#### Bi navê Yezdanê pak ê dilovan û mîhrivan

Tu bizan ji rê ve hespên xweşxwanên kurdî çar in.

Ê çeleng û ê laxer û ê sivik û ê rewan.

Hespê çeleng du gavan davêje. Hergavekê pênc movik tê de hene.

Ê laxer du gavan davêje. Hergavekê şeş movik tê de hene.

Ê sivik du gavan davêje. Hergavekê heft movik tê de hene.

Ê rewan du gavan davêje. Hergavekê heşt movik tê de hene.

Ez hevî ji heval û hogiran dikim eger kêmaniyek di hespên min de dîtî birast bikin û derbas bin çiku hespê çê bi ketinekê fihêtkar nabî.

Erê ez ê çendikan ji we re ji hev kit kitî bikim ko we nas kirin. Paşê hûn ê ji min bihtir û çêtir bibezînin.

#### Hespê Çeleng

Gava pêşî: Ez û delalê  
Gava paşî: Çûne qirşika

Movik: 5 ez - û - de - la - lê  
Movik: 5 çû - ne - qir - şî - ka

Malê me li Misrê \* Konê me li ebrê

ma - lê - mel - Mis - rê  
ko - nê - mel - eb - rê

Şepil zêrinê \* Şepil melanê

şe - pil - zê - rî - nê  
şe - pil - me - la - nî

Keçikê te bidine \* mîrê Cezîrê

keç - kê - te - bid - ne  
mî - rê - Ce - zî - rê

Erê siwaro çiqas hespên wekî van te dîtî tu karî bêjî ev hespê çeleng e, dugavan e pênc movik e. Wekî niha van çend hespên ko bi şûn ve tîn.

Destar gerya li \* dora bajêro  
Lolo pismamo \* lazim bi lazim  
De hûrik hûrik \* hûrik deviya  
Hespê Laxer

Hespê laxer du gav davêje. Her gavekê şeş movik tê de hene. Ez ê ji te re çendikan kit kitî bikim. Êdî ji min çêtir û bihtir kari-bi bibezînî.

Gava pêşî: Bişaro nema  
Gava paşî: Dora gund geriyao

Movik: 6 bi - şar - ro - ne - ma - o  
Movik: 6 do - ra - gund - ger - ya - o

Kin im dirêj nabim \* kin im lê lê  
ki - nim - di - rêj - na - bim  
ki - nim - ki - nim - lê - lê

Kal kalê qereçek ê \* kal mêrê keçek ê  
kal - ka - lê - qer - çe - kê  
kal - mê - rê - ke - çe - kê

Ebayê ebayê \* gorê me radayê  
e - ba - yê - e - ba - yê  
go - rê - me - ra - da - yê

Le sefan da le sefan da \* gezek le rûxan da  
(sorani)

les - fan - da - les - fan - da  
ge - zek - le - rû - xan - da

Erê siwaro te çiqas hespê şeş movik dîtin  
tu karî li wan siwar bî û bêjî ev hespê laxer  
e.

### Hespê Sivik

Ew herdu hespên ko çûn di nav kurd-  
mancan de kê m in û hindik mirov karin  
wan bibezînin. Belê ev herduyên ko tîn di  
nav kurmancan de pir in û herkes kare wan  
bibezîni. Hespê sivik du gavan davêje. Her  
gavekê heft movik tê de hene. Ez ê ji we re  
çendekan ji hev kitikî bikim. Êdî hûn ka-  
rin ji min çêtir û bêhîr bajon û bibezînin.

Gava pêşî: Zeko Zeko Zeynebê  
Gava paşî: Hat karwanê Helebê

Movik: 7 ze - ko - ze - ko - zey  
- ne - bê  
Movik: 7 hat - kar - wa - nê - he  
- le - bê

Hê hatin hatin hatin \* koçer ji zozanan  
hatin

Hê - ha - tîn - ha - tîn - ha - tîn  
ko - çer - zo - za - nan - ha - tîn

De yar de yar Qudretê \* Topa Xwedê lê  
ketê

de - yar - de - yar - qud - re - tê  
to - pa - xwe - dê - lê - ke - tê

Lê têrgezê koçerê \* teresbavê koçerê  
lê - têr - ge - zê - ko - çe - rê  
te - res - ba - vê - ko - çe - rê

Xumxumê torîbanê \* kevoka serê banê  
xum - xu - mê - to - rî - ba - nê  
ke - vo - ka - se - rê - ba - nê

Ferho bavê ezêr e \* çû ji talanê berjêr e  
fer - ho - ba - vê - e - zê - re  
çûj - ta - la - nê ber - jêr - e

Ax û eman Çeçanê \* keça Ehmed keyanê  
a - xû - e - man - Çe - ça - nê  
ke - ça - Eh - med - ke - ya - nê

Di vir de ez nikarim hespên sivik tevan  
girêdim. Eger feleka malxerab û sîtemkar  
berê çerxa xwe li min nedê ez ê ji we re dîr  
û dirêj xweşxwanên kurdî tevan kom bikim  
û ji we re belav bikim ax ax siwaro kurmanc  
dibêjin tu çi bêjî li bejna siwarê min tê.

### Hespê Rewan

Hespê rewan pirê caran palvan û xweşx-  
wan ko dibêjin. Hespêkî şêrîn e, ser nerm e,  
rewan e wekî ava giran di bezê de bala xwe  
bidê siwaro delalo. Hespê rewan du gavan  
davêj, her gavekê heft movik tê de hene. Ez  
ê çendikan dişa kitikî bikim. Hûn ê êdî ka-  
ribin bê sergêjî û dilêşî tevan bajon û bibe-  
zînin.

Gava pêşî: Bejna zirav şiva zêro  
Gava paşî: Poz bi qulê xezêm tê ro

Movik: 8            bej - na - zi - rav - şî -  
va - zê - ro

Movik: 8            poz - bi - qu - lê - xe -  
zê m - tê - ro

Meçe gotê tu xeyidî \* ava gola li me ce-  
midî

me - çe - go - tê - tu - xe - yi - dî  
a - va - go - la - lime - ce - me - dî

Selama min senaxwanî \* sehergeh geh  
her veşan bit

Se - la - ma - min - se - na - xwa - nî  
se - her - geh - geh - her - fe - şan - bit

Wê li ser banî çek dişûştin \* zend û bazin  
tev hilmiştin

wê - li - ser - ba - nî - çek - dişûş - tin  
zend - û - ba - zin - tev - hil - miş -  
tin

Agir bi Kurdistanê ket \* lewra dikit he-  
war e dil

a - gir - bi - Kur - dis - ta - nê - ket  
lew - ra - di - kit - he - war - e - dil

Hey mamista xelkê perdê \* şûr de kêşa le  
dû gerdê

hey - ma - mis - ta - xel - kê - per - dê  
şûr - de - kê - şa - le - dû - ger - dê

Her lence xanim lence ye \* lencit ye nokê  
pence ye

her - len - ce - xa - nim - len - ce - ye  
len - cit - ye - nû - kê - pen - ce - ye

Ji bona îro ev çend. Ji xwe ev lê lê ye, he-  
ke xwendevanên Hawarê pê bendewar bûn,  
lolo li pê ye:

Herwekî Xaniyê rehmetî gotiye:

"Çi bikim ko qewî kesad e bazar  
Ninin ji qumaşî ra xeridar"

## Cegerxwîn

## TOLA BAVAN

Li bakuran erz li nîvro Sîpan  
Pênc salan li pêl bû ala me kurdan  
Birho kurên xwe ve, Ferzende Îhsan  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê şêran

Berê me li armancê, piştî me li Yezdan  
Li pêş me rawestî welat, Kurdistan  
Destê me bi xencer devî de Quran  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê şêran

Herdem bi moran mij, berf e Agrî Dax  
Neyaran kir welat zelûl û kambax  
Ma qê namûs e em ko bimînin sax  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê şêran

Heft sal in li gir tê borîna mêran  
Milên xwe dane hev herwekî şêran  
Li ser wan gurmîna top û xumberan  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê mêran  
Çek û pûsatên xwe hilgirin bi lez  
Ne çiya û ne deşt mebên bi bez  
Teva îro mirin li me bûye fêz  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê mêran

Ez dikime herim venagerim mal  
Yadê tu qet mebêj ka ko çû Heval  
Ji bona min bes in Kurdistan û al  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê şêran

Dê bi zorê bigirim Kurdistana xwe  
Ez ê daçikînim li ser ala xwe  
Hinga tola bavan têxim bala xwe  
Zû birot zû birot ey lawên kurdan  
Kurdistan vejandin van hersê Mêran

**Heval Şukrî**

## AX Û KESER

Ezman heşin em nexweş in  
Ezman bi stêr em man bêkêr  
Ezman girgir em man bêxêr  
Ezman bi deng em man bêreng  
Ezman zelal em mane lal  
Mêrg û kanî ma bav kanî  
Lat û zinar ka dost û yar  
Welat şepal em kirin kal  
Bêriya welêt agir û pêr  
Sîpan xelat ma ka welat  
Kerkûk Hevlêr lê bê ser bêr  
Şernex Cizâr em kirin pîr  
Xox û mişmiş em man bêhiş  
Şêr û piling bê dest û ling  
Neyar dostî em êxistî  
Neyar bi bir bi dest û şîr  
Bê tîr xencer em kirin der  
Dost û biran kuştin beran  
Dost û biran çih kirne xan  
Şêxê Botî mêlak sotî  
Şêx bû armanc xelk bûn sêrtaç  
Şêx bû birin xelk pê kenîn  
Dost tê perî ser jê firî  
Find û şemal rêket ji mal  
Çû gora kwîr em hiştin dwîr

**Mustefa Ehmed Botî**

## ŞÎNA XALÊ MIN

**D**i sisiyê hezîranê de, li ezmanê kurdan, tofanek eçêb qewimî; histêrkek pir bi şewq û pir bi nûr ji nişka ve rijîya, xeyidî, xwe da riya dinyake din û nehat!

Ji ber vî halî ye ko îro li dinya me ronahî kêm, hizn û melal zêdetir bûye; ehîlê dinya kurdan – nemaze rewşendarê ji rewşa wê hêstêrikê – kezebîrin û dilbixwîn mane. Yek jê ez im; baxê giyanê min mij û xumama şî-nê girtiye; hundurê min ji xem û xeyalan ca bi can zebûn û birîndar e. Gelo çi bû? Ma hîn dê çi bibê! Xalê min, welatîyê min, mamosta û rêberê min destê xwe ji me qerand û ket bin axa reş û sar. Hey wax! Hey wax!

Xalê min ji bavan de xismê min bû; lê roja ko ez agahê çêyî û xirabiyê bûm ew bû dostê min. Ji lewra ko milletperwerekî hêja bû. Tîrsa bav û birê min, riya min li ser mala wî nebirî, tehdîdê mirovê min stewart man, min bi rûhê xwe ve ew diparast. Wî jî bi dilê xwe ve ji min hiz dikir.

Gelo ji bo çi welatê xwe yê bihuştîr nekir, dest ji xanûman û şaneşînê xwe kir û hat li van çol û çepalan derbîder gerîya? Wî bi xwe ev pîrs ji xwe nekiribû. 'Îşqa milletî hertîşt li ber wî bêqîmet kiribû. Hatibû xebata welatê xwe tola kuştîyê milletê xwe. Heyhat! Xwedê pê re ne bir serî, pêta agirê hundurê wî ew kuşt, mirazê wî bi wî re çû gornê. No! No! Ne mirazê wî ne ew bi xwe jî neçûne gornê. Mirazê wî mirazê me, mirazê gişkan bû. Ji lewra bi me re di me de dijî û heta roja paşîn jî dê bijî. Bi xwe jî neçûye gornê. Ji ber ko herçî di rêya milletê xwe de dimirin laş wan bikeve erdê jî giyanê wan ber bi ezmanan ve bilind dibin û ew bi xwe di dilên welatîyên xwe de dijîn.

Efendî di lawaniya xwe de kurdperwer bû. Di mutarekê de civata kurdî li Dêrikê



eşkere vekiribû, ew bi xwe serwerê civatê, ji heralî libat (e'za) civandin. Pîrî jêhatî bû, hêj bist û çar pênc salî bû, bû serekê du sê eşîran. Memûrê tîrko di destê xwe da dida listin. Di şerê Şêx Seîdê rehmetî de çiqas beg û axayên welatê me û nêzingê me hene bi peyayên xwe ve çûne himberî Şêx. Lê Efendî ne çû. Bi ser da bi çend peyayê xwe ve derket Çiyayê Mazî. Ajot ser qereqola gundê Şewaşê. Esker û cebxana wan dil girt. Gava şehîdê şêrîn Kemal Fewzî Beg hate girtin Efendî bihîst ko ew ê Kemal Fewzî Beg di riya Sêwregê de bibin Anadolê. Ji ber bihîstina vê xeberê birayê xwe Salih Beg (ew jî bû şehîdê milletê xwe) bi çend peyan ve şande ser riya Sêwregê ko Kemal Fewzî Beg jî destê neyaran bi derxûne. Lê sed heyf di riya Xarpêtê şandibûn.

Di pey şikestina Şêx de serwerê delal jî birin berpirsiyariya Îstîqlalê. Lê Xwedê ji wê afatê xelas kir. Şûn da sorgonê Anadolê kirin. Li wê jî rahet nedisekinî; hevalê xwe yê nezan îqaz û îrşad dikir, bi hevalên zana re civat çêdikir. Ji lewra li ciyekî sekna wî tine bû, du rojan li ciyekî nedima. Bi dereke din ve dişandin.

Pîştî efwê dîsa hat welatê xwe, xort li dora xwe civandin. Bi civata mezin re muxabere kir, ji xortên dora wî yek jê ez bûm. Tişteki jî me veşartî tunebû. Gava ko hate Sûriyê xeber da min û çend hevalan. Lê herwekî Hawarê nivîsandîye Xwedê ji tu wan re li hev du neanî.

Berê wî bi jêr ve rast kirin, piştî hatina wî zarokê wî jî canê xwe xelas kirin. Lê di feqîrî û zelûfî.

Salek neçû min jî da dû; me li Hîsiçê hev du dît ji ber ko biraziyekî wî mamekî me kuştibû, navbera me piçekî sar bû. Lê dihat ser kurdîtiyê jî berê germtir bû.

Efendî bêguman hêja bû. Hevalê wî kêm

têne ditin. Ji bo vê wefat hezîn şîn û girî, reşgirêdan li her kurdê xwedan rûmet dikeve. Xwedê rehma xwe lê bike me jî bi rehma wî şabike.

## Qedri Can

### STRAN

Lo mîro lolo Mîro!  
Ro dihatî nimêja nîro

Oda mîrê min bi siwirneg e  
Heçî dosta wî Fireng e  
Emrê wî emrê quling e

Lo Mîro lolo Mîro  
Ro dihatî nimêja nîro

Oda mîrê min bi hine ye  
Heçî dosta wî File ye  
Emrê wî jî emra zêde ye

### HEY DINYA FANÎ

Hey dinya fanî . . hey dinya fanî  
Yê ko tu çêkir qanûnek danî

Got: "Herçî bayê eşqê li wan î  
Gerek tim bijîn bi şadîmanî"

Mixabin, heyhat! Ew gotin nema  
Ew peyman zûda ket avên çema

Hey dinya fanî, hey dinya fanî  
Lal mebe wisa ew qerar kanî?

Bi hêjmara îro şeş û nîv meh in  
Newzad û Nuhbir li dorê hev in

Hey dinya fanî, hey dinya fanî,  
Li me aşiqan ka dilovani?

Nizanim çi bû ew bejna zirav?  
Peyda kirin li min ax! jana zirav

Hey dinya fanî, hey dinya fanî  
Ew şeng û şoxê qametê kanî?

Hiş li min nehişt qet nabin şifa  
Ew çavên di reş hezîna wefa

Hey dinya fanî, hey dinya fanî  
Pir melûl meke vî şêrîn canî

Ew rexên ruyan wek sêvên Xelat  
Sor û zer dibûn her lê rojhilat

Hey dinya fanî, hey dinya fanî  
Îro dût ketim ji wî zemanî

Wê 'îşqê wey wax! giriftar kirim  
Evînek nuh bû birîndar kirim

Hey dinya fanî, hey dinya fanî  
Deyndara yarê dermanê can î

Ax meke Newzad ji bo te şerm e  
Dawiya wahê pertake germ e

Hey dinya fanî . . . hey dinya fanî  
Zêr û ziber be ew çerxa xamê

**Newzad**

## MÎR MIHÊ

**E**rê ev çend caran xwediyê Hawarê ji xwendevanên xwe çirokên kevnare dixwaze. Ji lewra ez dixwazim iro çiroka Mîr

Mihê di nav rûpelên Hawarê de bidim belav krin.

Eya Mîr Mihê yek ji dilgîr û evîndarê welatê kurdan e. Bi xwe yek ji mîrekê Hîzanê ye. Çawan ko rîspî û mezinê welatê me bi yek dev û yek zimanî dibêjin.

Bavê Mîr Mihê mîrê welatê Hîzanê bû. Di saxîtiya xwe de keça birayê xwe ji kurê xwe re bi du erzaniya xwestûbû. Belê herdu piçûk bûn bavê Mîr Mihê piştî çend salan bi riya dergahê padîşahê yekta û Xwedayê cîhanê ve meşiya û canê xwe ê şêrîn sparte axa cebana û tacê mîraniyê sparte birayê mayî. Piştî çend salan Mîr Mihê giha çax û benga xortaniyê. Belê mamê wî herdem jê re digot: "Heta ko şhadetnama îlûm û finûnê dîni û cîhanî nestîni ez keça xwe nadin te"

Ji neçarî Mîr Mihê berê xwe da welatê Cizîra Botan. Sera pîra kete bin barê şêx û mela û ji dîwanxana derker kete nav toza mizgeft û medresan. Çend salan ji emrê xwe yê ezîz bi vî awayî derbas kir. Piştî ko şhadetnama xwe sitand vegeriya welatê xwe. Hate ser soza xwe û mamê xwe. Li derê bajarê Hîzan di xirgêleke mezin li nav cebana daketiye hate medresa feqîyan. Ji wan pîrsî go ey çi ye go "Ma tu nizani Sînema keça apê te miriye". Hê ji nû ve axîneke giran kişand û bi şûn ve vegeriya. Bi serê çol û çiya ket. Û digeriya li ber tûmê giyakê rûnişt û xweşxwaneke giran li ser Sînema xwe gotiye. Pelên giyê ji ber dijiwariya agirê wî weşiyên.

Ez ê çend bendan ji xwaşxwana wî ji xwendevanan re di vir de bêjim:

Ez ê Hîzanê dihebînim du caran tê bihar

<sup>e</sup>  
Ez ê wekî bulbil dixwînim li ser gulên û xar e

Ez ê herim Sînem bibînîm dinya me newînîm ev car e

Mihê tu li dinê digeriya kesî nedigo Sînem nexweş e

Ez ê dihatim hicrokê feqiya dinivîsin kêl û ferş e

Tenbîhê bikim li marên miriya bire nexwun ebruyên reş e

Te rohîva nûrîn e şewqê daye ummetê  
Te gerden şûşa hêşîn e nuqte nuqte xal ketê

Heçî Sînem bibîne bêşik diçe cennetê

Çend caran digel Mela Ehmedê Cizîrî hevalî kiriye. Carekê reşbelek jê re şandiye. Bendek jê hêj va ye di bîra min de ye

Selama min heqîrî  
Sedefek divê têkin  
Îro di Cizîrê  
Heq e li melê kin

Mîr Mihê Emrê xwe bi evîndarî û 'işqebazî li şax û çiyayên Kurdistanê bihurtiye. Rehmeta Xwedê lê bit.

Serpêhatiyê Mîr Mihê di nav kurdan de bêjimar hene. Lê vir de tev naêne gotin. Eger Xwedê bivê ez ê çendekî di ji bilav bikim.

**Cegerxwîn**

## TIRBA SPÎ Û MARÊ QUT

Mirovek bi navê Muhemmed rojkê çû geşt û seyrangêhê. Li cihêkî bi av û bi gul û giya civatek maran dît. Di nav civatê da marên pir stûr û du serî hene. Ji maran pir tirsîya. Kir ko wê civata maran bi

derbekê bikuje. Lê ne diqedand. Da eqlê xwe û kûr fikirî. Di dilê xwe da got: "Ez îro vê civatê bi eqilmendî belav nekim mumkin nîne wê rojkê min bikujin, navê min ji dinê rakin" ser vê yekê banî mezinê maran kir û jê re got:

– Şahê maran kêfa min pir ji civata we ra hat. Ez dixwazim bi te birakî deynim.

Mezinê maran ji nezaniya xwe, bi civana xwe qet neşewirî û bi Muhemmed ra bû destbirak û jê ra got:

– Bîrao defîneke min heye ez ê rojê zêrekî bidim te. Çû zêrek ji Muhemmed re anî û Muhemmed çû mala xwe. Her roja Xwedê karê Muhemmed ev bû. Mideke pir neajot Muhemmed bi perê mar dewlemend bû. Dil kir ko here dan û sitandinê. Beriya ko here banî kurê xwe kir û got:

– Lawo em ê herin cihêkî.

Û kurî da pey û çûne qula mar. Mîna deynê mirovekî li mirovekî be mêtirik banî mar kir û got:

– Maro derkev derva.

Mar derket ber derî, Muhemmed jê re got:

– Vî kurê min qenc nas bike ji îro bi şûn da her rojê zêrekî bide kurê min. Mar got:

– Rind e, ez ê rojê zêrekî bidim wî.

Muhemmed bi kurê xwe ve vegeyriyan hatin mala xwe û Muhemmed çû kirîn û firotinê. Kurê wî li ser wî qerarî rojê diçû zêrek ji mar disitand. Lê pê razî nedibû. Rojkê ji xwe re got: "Ez ê vî marî bikujim û defîna wî bi carekê bixwum" şûrê xwe kir bin paşîla xwe û çû ser qula mar. Dil kir ko bi bêbextî mar bikuje. Şûrê xwe ji kalan kişand û da pişta xwe. Deng li mar kir û got:

– Apo ka zêrê biraziyê xwe bine.

Mar zêrek girt û hat nik kurê Muhemmed. Kurik şûrek avête mar. Şûrê wî seriyekî mar qut kir û mar bi dilekî şewirî lê vege-

riya û pê ve da, kuşt.

Cendekê wî li ber germa rojê ma. Şivane-  
k hat û laşê wî dît. Çû ji mala wî re got.  
Mala wî hatin laşê wî birin û tîrbeke spî jê  
ra çêkirin û tê da veşartin.

Paş midekê Muhemmed ji kirîn û firotinê  
vegeriya hat mal. Ew perê ko di destê wî  
de bûn hemî wînda kiribûn. Pirsyariya ku-  
rê xwe kir. Jê re gotin:

– Tu sax kurê te maran pê ve dan. Mu-  
hemmed dev kire birîna xwe. Hinga zanibû  
ku derba wî ji ko da lê ket. Rabû çû ser qu-  
la mar gazî kir û got:

– Birayê mar derkeve were me zû de hev  
du nedîtiye, em hev du bibînin. Mar serê  
xwe ji qulê derêxist û lê vegerand.

– Ji ber deriyê min here, ne tu tîrba spî ji-  
bîr dikî ne ez serê qut...

## Ş. Hesên

### BERDÊLK

*–Ji Qedrî Canê bira re–*

Ax welato ax welato  
Zulma neyar jê re hato  
Emrê min çû st sal didît  
Min nedît roj lê hîlat e  
Bav û birên xwe dipirsî  
Îro xeber ji wan hato

Hin birîn in hin kuştî ne  
Ewên di ji li ser şîn e  
Ew xwehên şîn girêdan  
Li ser êgir rûniştine

Çavên wan gî hêstir xwîn in  
Tim digirîn li xwe dixînin  
Digirîn li xwe dixînin  
Qedrî Can jî pê dixînin

Ev xebera ji çi beyan  
Ji gotina yekî ciwan  
Ev ciwana filitiye  
Ji dest neyarê Kurdistan

Ev ciwana pismamê te ye  
Ew ji xwîn û dema te ye  
Li ser seran li ser çavan  
Hate cem me mêvanê me ye

Bayê li te kir borebor  
Ew nalîn e . . têtî ji jor  
Ew kaxeza te a bi xwîn  
Yanî êdin hat ser me dor  
Qet metirse Xwey kerim e  
Ya me divê îro hîm e  
Renc û tengî me pir kişand  
Yezdan xefûr û rehîm e

Sazê te ger ne dirêj e  
Lê ji çavan xwîn dirêje  
Ji renc û zulma neyaran  
Em bûn bêhoş ker û gêj e

Qedrî bira ev çi hal e  
Ne hogir manî ne heval e  
Şîna îro pir li cî ye  
hetta qametê [li] bal e

### Lawê Findî

### ZARÊ DUMILÎ Û MEWLÛDA 'USMAN EFENDÎ [\*]

**B**erî çendakî, ber bi xilaseka tarê ve diçûm. Dinya li me bûbû tarî. Min û hevalekî xwe me xwe dabû bin çirakê û me vêtikek dixwend.

Di paş me re kalek dihat. Emrê wî di dorê pence şestî de. Selav li me kir û xwe da nas kirin. Mela Muhemmed Nezîr kurê Heçî Îbrahîmê Dêrşewî. Berî panzdeh rojan jî welêt hatibû û li min digeriya ko jê re an jî birayê wî re karekî peyda bikim. Min got:

– Qenc e, sibe were mal em fedikirin.

Lê zimanê wî ne zimanê xelkê cihê Botan bû. Hêj bêtir diçû ser zarê deştra Diyarbekirê.

Sibetir kalo hat. Biserhatiya xwe jî min re got. Ji ber tirkên, jî ber sitemkariya wan baz dabû. Di nav axaftinê de min seh kir ko herçend bavê wî Dêrşewî bû lê bi xwe di Sêwrekê de jî diya xwe bûbû. Ji lewra zarê wî ne zarê cihê Botan bû.

Mêvanê min mela, melakî medresetiye bû. Kêm û zêde bi herfên latînî jî dizanibû. Wekî min navê Sêwrekê bihîst û min zanî ko Muhemmed Nezîr mela ye zarê dumilî û mewlûda zazakî hatin bira min.

Ji mêj ve min dil hebû hinekî bi zarê dumilî mijûl bibim. Nemaze mewlûda 'Usman Efendî bêxim dest. Wê bi yekî re ko rind bi dumiliya Sêwrekê dizane bixwinim, li ber binivîsinim û bidim çap kirin. Ji xwe di vî zarê şerîn de jî û pê ve tişteki din nehatiye nivîsandin. Hatibe jî min nedîtiye, ne jî

bihîstiye.

Belê jî zû ve ye ez li vê digeriya. Berî du salan nivîstek ketibû destê min lê natevav. Ji pêşî û paşiyê çend rûpel kêm bûn, ên mayin niv çirandî û di hin cihan de pirsên heşifandî hebûn. Digel vê hindê pêlekê ez pê mijûl bûm. Bi kêr nedihat. Min jê tişteki hêja û tekûz neanî der. Ji û pê ve jî min re arikarek jî diviyabû. Arikarekî welê, herçî ko min nizanibû bikare jî min re mane bike.

Melayê min herçend kurdmanc lê Sêwrekî bû. Min jê pirsî heke bi dumilî dizanin. Ji xwe ewlî [ewle] û razî li min vegeand:

– Hingî kurdmanciye bi dumilî jî dizanin. Ji jinikê re "çinêk" jî meriv re "merdim" û avê re jî "aw" dibêjin.

Lê dilê min li gotina wî rûnedinişt. Ji ber ko bi xwe kurdmanc bû. Gelek kurdmanc hene ko bi dumilî dizanin, lê di axaftinê de herdu zaran tevî hev dikin û weke xwe nizanin bibêjin. Lê zazayin hene ko di kurdmanciya wan de tu kêmanî nîne, mîna me bi kurdmancî dizanin.

Ber ko kurdmancî di navbera kurdên welatê jorîn de zimanê teyayî ye û stran û dilokên zazan bi kurdmancî ne. Ji ber wê yekê jî min re yek diviya bû ko dumilî zimanê de û bavê wî bir. Min jî Melê pirsî:

– Tu çawan hîni dumiliyê bûyî?

– Ji diya xwe hîn bûme. Bavê min jî Dêrşewê hatiye Sêwrekê li Sêwrekê diya min mehr kiriye. Diya min bi xwe zaza ye. Keça Mela Suleyman e, Mela Suleyman kurê Hafîz Îsa ye, ew jî pîsmamê 'Usman Efendî,

muftiyê Sêwrekê ye. Yanî ez xwarziyê zazan im. Ez bi xwe di nav zazan de mezin bûme. Ji xwe li Sêwrekê bi dumilî xeber didin, lê bi kurdmançî jî dizanin. Xelkê dora Sêwrekê jî zaza ne. Ez tim diçûm gundan û min hergav ji xelkê ra mewlûda zazakî dixwend.

Êdî min zanibû ko paş çend salan rastî mirovekî xwe hatime. Mela Nezîr dê bi kêrî min bihata. dumilî zimanê diya wî zimanê wî bû. Lê bi zimanê bavê xwe jî, weke xwe, pak dizanibû. Dikaribû herîştê dumiliyê ji min re bi kurdmançî mana bike. Melayê min melakî zor, melakî kitêb binçeng bû. Mewlûda zazakî, ya Melayê Batê û Nehcu 'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî pêre bûn. Paş du rojan Melayê min ji derî ve da hersê kitêb di bin çeng. . .

Mela Nezîr Nivîšta xwe di sala 1321/[1903] di panzdehê meha nîsanê de bi xwe nivîsandibû.

Lê îro çavên wî ji ber nexweşiyekê ew çend tarî bûne ko destnivîsa xwe nema dikare bixwîne. Ji lewra min jê re herbeyt ye-ko yeke dixwendin, ewî mane dikir zêr û ziber diedilandin, min jî bi herdu herfan, erebî û Latînî dinivîsandin. Di dema nivîsandinê û bi hinceta her pîrsa nû min bala xwe dida qewa'idê, destûrinin zimanekî di-anîn der û berpêl dinivîsandin. Bi vî awayî ez digiham bingehê zarê dumilî jî û min ew didanî ber kurdmançiyê.

Jê hêla din diviya bû ez bizanîm û ji xwendevanan re bidim zanîn, ev Mewlûda ha kengê hatiye nivîsandin û bi çi awayî jî 'Usman Efendî re hilketibû.

Li gora gotina Mela Nezîr yekî jî melayên Sêwrekê, bi navê Yûsuf Mewlûdek bi zimanê tirkî nivîsandibû. Ew û 'Usman Efendî bi hev nexweş bûn. Heçkû berberî bi hev dikirin. Paş belavbûna mewlûda Hecî Yûsuf Meyildarên wî digotin: "Melatî û zanatî

holê dibe. Ne bi galgalan. . ." Ev kurt û pist bi guhê 'Usman Efendî ve jî dikirin. Ne gerek e em bibêjin ko herdu mela jî kurd û kurd ziman bûn.

Wekî 'Usman Efendî ev bihîstin ji nasên xwe re got: "Heke zanatî bi nivîsandina mewlûdê ye ez mewlûdekê bi zimanekî welê binivîsim ko pê hêj tu kitêb nehatiye nivîsandin, ne bi tirkî ne bi kurdmançî lê bi dumilî. . ."

Û bi vî awayî û jî wê berberiyê ev mewlûda hate pê. Nik dilê min ev cara pêşîn e ko ji berberiya du kurdan tişteki qenc ber pê bûye. 'Usman Efendî par li Sêwrekê çûye rehmê. rehmêta Xwedê lê bit.

Dîsan li gora gotina Mela Nezîr 'Usman Efendî mewlûda xwe bi pênc salan beriya meşrûtiyê, yanî di sala 1319'an [1901] de nivîsandiyê.

Mewlûda Hecî Yûsuf yanî a tirkî jî xwe hingê ketibû çapê. Lê ya 'Usman Efendî nediket. Carekê nivîşteke wê şandibûn Diyarbekirê, ew nivîšta ko min ya xwe li ber nivîsand. Lê ji ber ko nizanibûn bixwînin bi şûnda vegeandibûn. Herwekî di pelê wê ê paşîn de bi tirkî nivîsandiyê: "Bilxasse selam we sena'dan sonra istifsar xatir êderim. Mezkur kitab wîlayet'den gerî îade edildî. Sebebi okuyamamış'lar dir. Baki selam. 12 heziran [1]322 [1904] - îmza" nayête xwendin.

Piştî Meşrûtiyê pismamekî min, Faîz Beg Bedir-Xan, bûbû qaymeqamê Puturgê. Bavê Mela Nezîr Hecî İbrahîm çûbû balê. Mewlûd şanî wî da. Pir neajot Faîz Beg hate ezil kîm û vegeiya Stenbulê. Mewlûd jî bi xwe re bir ko bêxe çapê. Lê li Stenbulê jî ew nikaribûn bixwînin. Hingê Faîz Beg jî Hecî İbrahîm re nivîsandibû ko an ew bi xwe an kurê wî xwe bigihînin Stenbulê mewlûdê jî wan re bixwînin da ko bikarin

çap bikin. Lê ne kur ne bav neçûn Stenbulê  
û mewlûd neket çapê û Xwedê ji 'Usman  
Efendî re hez nekir ko keda xwe bi herfên  
reş bibînit. Em vê çapê ji bona şakirina gi-  
yanê wî pêşkêşî wî dikin.

\* \* \*

Ji hêla din min dizanîbû ko nik Muhemed  
Elî Ewnî Efendî (1) jî nivîşteke mewlûdê  
heye. Min jê re şand û nivîšta wî anî. Me  
herdu nivîşt danîn ber hev. Me dît ko di  
navbera wan de kêr û zêde ferqin hene.

Berê pêşin di destpêka nivîsta wî de deh  
beyt hene, di ya me de tenê sisê ne. Min ev  
ji Mela Nezîr re xwendin. Ewî got: "Bi min  
beytên zêde paşê hatine bi ser xistin, herhal  
yekê ji ber xwe gotiye"

Di vê babetê de ez tişteki nabêjim lê her-  
wekî xwendevan bi xwe dê bibînin di wez-  
na wan beytan de xwarî û kêmanî zêdene.  
'Usman Efendî bi xwe nikaribû beytên bê  
wezin an xwarwezin binivîsîne. Jê re mew-  
lûda wî giwah e.

Digel vê hindê em wan beytan bê ko tu  
tiştê wan biguhêzinin, rast bi rast diguhêzi-  
nin hire:

Bi namê wahîrê no ard û azmîn  
Ke ma dest kerd bi no girwe rengîn  
Şima hemdê xwe Ellayê rê biyarîn  
Şew û roj qapîdê ey di biqarîn  
Pêxemberî rê selewatî biwanîn  
Tim û tim derdê cê ver di binalîn  
Misalê na dinê zanî ti merdim  
Ti citêrênî, girwey to jî toxim  
Ke to zanan kî no dinya senîn o  
Bizanê a dinê çayê cû nîyo  
Wedaro ey çê kî citêr bikaro  
Kî citêr çî karit ey wedaro  
Beso tobe biyarîn hey xedarîn  
Dinyay di to hemî hewl bikarîn

Gunahdê xo rê arê bin binalîn  
Birejnîn hersê çiman ra bikalîn  
Bibo 'efew gunahê mayê vêrdo  
Gunehkarî kî 'umrê xo di kerdo  
Selewatî biwanîn rind û bolî  
Biresnîn pê dima gandê resûlî

Ji û pê ve di minhuyê (metnê) de, di ge-  
lek cihan de navbera nivîsta me û ya Mu-  
hemmed Elî Ewnî Efendî de ferqên din jî  
hebûn. Me ew ferq berpêl û di bin re û ye-  
ko yeke nişan kirine. Lê ferqên mîna pêş û  
paşbûna pîrs û herfan û guherîna ciyokan  
nehêjayî nişankirinê bûn. Herwekî di beyt  
û misraên jêrîn de tete dîtîn.

1- Çaxo qurban bî devê Ellay resa (Wexta  
qurban bî devê Ellay resa)

2- Kam kî adir ra xelas xo rê waşt  
Wa biwano ê resûlî rê selat  
(Kam kî adir ra xo rê xelas waşt  
Wa resûl rê biwano es-selat)

3- Kerdo înan ard bi Ellay bol nîyaz  
(Kerd înan û ard bi Ellay nîyaz).

Ev e ferqên bingehîn di navbera herdu  
nivîstan. Di nivîsta Mela Nezîr de me tenê  
tiştinî welê guhartûn ko berê ve rengên  
xwe ên binatî wînda kiribûn û rind nedike-  
tin weznê.

\* \* \*

Zarên zimanê kurdî ên bingehîn sisê ne.  
Zarê welatê jorîn, yê welatê jêrîn û zarê du-  
milî.

Herwekî nas e zarê welatê jorîn kurd-  
mancî ye û di kurdmanciyê de ferqên zara-  
wa û şewan hebe jî zarê kurdmancî bê tu  
kêmanî şanê yekîtiyêke zimanekî didê. Lê  
zarê welatê jêrîn ne welê ye. Di nav xwe de  
li zarinî din belav dibe û cih bi cih jî hev  
vediqete, mîna Baba kurdî û Lorî. Ji û pê ve

di wî welatî de zarînin din hene bi gelekî jî zarê welatê jêrîn dûr in û dikevin nêzingî zarên din.

Zarê dumilî: Ev zar zimanê kurdên dumilî an zaza ne. Kurdên dumilî di welatê jorîn di rojavayê wî welatî de rûniştî ne. Bi piranî tevî kurdmancan in û jî zarê xwe pê ve bi kurdmançî jî dizanin. Li gora ko min seh kir di zarê dumilî de jî çend bir hene. Di bingehî de ev birên ha dudo ne. Di nav van herdu biran de di danganê û qewaidê de ferqînin eşkere têne dîtîn. Di denganiyê de: di zarê Sêwrekê de herfa "j" bi qasî kurdmançiyê nin be jî, di hin pirsan de tête dîtîn. Lê di dumiliyên din de mîna zarê paloyê de "j" yekcar nîne û şûna wê "z" yek an "c" yek rabûye. Ji lewra heke jî dumiliyan re jî ber ko li şûna "j" ya kurdmançî "z" dibêjin "zaza" hate gotin dumiliyên Palo û Madenê jî dumiliyên Sêwrekê bêtir zaza ne.

Di zarê dumilî de pirsên herzarê kurdî têne dîtîn, kurdmançî, Babakurdî, Hewrema- nî h. p. . .

Di vî zarî de "v" heye û gelek e. Dibe jî kurdmançiyê bêtir jî. Lê di hin pirsan de vê "v"ê mîna kurdan bi "w"ê diguhêrînin û li şûna "av" û "şev"ê "aw" û "şew" dibêjin.

Di qewa'idê de: Zarê dumilî di qewa'idê de jî her zarî bêtir nêzingî kurdmançiyê ye. Berê pêşîn pronavên "ez" û "min", pronavên zindî, di vî zarî de weke xwe mane û "ez" jî neketiye. Ji lewra herwekî di kurdmançiyê de ye, di dumiliyê de jî fi'lên lazîm û mutê'ddî cihê cihê têne tesrîf kirin.

Tenê di mesela cîsnê de zarê Paloyî kêrmançî kiriye. Lê zarê Sêwrekî mê û nêrên xwe weke xwe hilanîne. Di hin cihan de mesela cîsnê di vî zarî de jî kurdmançiyê bêtir, kurtir û hûrektir e. Ew çend ko di fi'lan de jî tête dîtîn.

Paş ko me ev ferqên ha, bi kurtî, gotin

em ê jî xwendevanan re mînhûkî bi du zarî bidin zanîn, bi yê Sêwrek û yê Paloyî.

Ev mînhû çîrokeke Mikrê ye. Par xortekî hejdeh salî, jî wlatê Mikrê, ev çîrok jî min re gotibû min jî nivîsandibû. Min ev mînhû li herdu zarên jêrîn da wergerandin. Yê pêşîn jî Mela Nezîr û yê duwem jî Mihyeddîn re da wergerandin. Mihyeddîn xelkê Paloyê ye. Ji gundê Meman jî eşîra Qasîman.

Ji bona ko yek di bin hukmê zarê ê din de memînit min jî herduwan re mînhûwa Mikrê xwendin û jê lê zarê wan da wergerandin, bê ko yek ya a din bibîne.

## Dumiliya Sêwrekê

Rojê rojan di dewên di hawar dekewt. Şarê dew pêro remayê. Dewi miyan di kergên û des leyrekî ca di mendê. Lûyêndo vêşan înan ra peyda bî. Kerg xeylî tersa. Lûy ay rê va:

– Ez do to bora tewrê leyrekan.

Kerg cirê va:

– Heta hewt rojî vindir.

Lûy cirê va:

– Qandê çiçî?

Kerg cirê va:

– Leyrek bol werdek î.

Lûy zana dew di kes çinyo veng nêkerd, şî. Kerg kewt qesawet. Tew rê leyrekan dew ra vijiya. Şî arzeyî het. Uja aşwançî ê dinay. Kerg hewar kerd, cirê va:

– Ewro lûyên ma ra peyda bî. Min rê va: "Ez do to bora". Min cirê va: "Heta hewt rojî vindir". Lûy şî, veng nêkerd. Ti nika tazî û kutikan hadire ki heta Dedi Lûy yeno.

Aşwançî va:

– Bol rind o.

O wext postê lûy neway çeturi kerdê. Aş-



wançi xeylî pê weş bî.

Kergî rê va:

– Ezo no meydan di lanên biken. Ezo tewrê kutik û taziyan dekewin. Eger Dedi Lûy ame tenekî ey dir ra kay bike. Odo to rê vaji:

– Ey kergê, kergê, kergê! Ezo to borî tewrê leyrekan.

Bado ti ci ra vaji: "Ey Dedo Aşwançi, ti bixwe û kutikê qundî bê teber."

Lûy ame meydan, venda kerg, kerg şî, ci-rê va:

– Çunkî ti nika mi borî, min rê weş o tenekî kay keran.

Destê jebînî girewî. Kerg cirê va:

– Min rê deyrî biki.

Lûy va:

– Ey kergê, kergê nika ezo to bora tewrê leyrekê to.

Kergê va: "Nobeta min a" dest pa kerd:

– Ey Dedi Aşwançi bê teber, ti bixwe û kutikê qundî.

Lûy tersa, va:

– Hunî mevaji, axir ez tersenno.

Qissey tamam kerdî, Dedi Aşwançi vijya. Tazî û kutikan wexto lûy dînayî, girewt û fetisnay. Aşwançi bi lûy, kergî bi leyrekan bî şay.

## Dumiliya Palûwî

Rwecî rweca dewêkî de hewar kewt. Şarê dew pyero remay. Miyanê dew, ca mend kerg tewlê des liçikana. Yînê rî lûyek peyda bî zehf veşan. Kerg zehf tersê. Lûy tîra va:

– Ez to borî tewlê liçikanê tuwiya.

Kerg tîra va:

– Vindir heta hewtena rwecî.

Lûy tîra va:

– Qey çine ya?

Kerg va:

– Liçikî zehf qic î.

Lûy zanani dew di çew çîno, veng nikerd, şî. Kerg kot dişmiş biyayiş. Dew ra tewlê liçikanê xoya vicyay, şî arye. Uca arbançiyê dî. Kerg hewar kerd, tîra va:

– Eyro lûyek min rî peyda bî. Min ra va: "Ez to borî". Min tîra va: "Vindir hewtna rocî". Lûy şî, veng nikerd. Tî inkey tanzî û bwecî hedre ki heta Apo Lûy yenno.

Arbançi va:

– Zehf hewl o.

In wextî d' postey lûy neway çeturfî kerdî-yê. Arbançi zehf pê weş bi. Xo hedre kerd, kerg ra va:

– Ez in meydan di qulêk bikeyn. Tewlê tanzî û bweciyan dekuwî. Eger kî Apo Lûy ame tay cirî bireqîşî. Wî tue ra vaco:

– Hey kergê, kergê... Ez to borî tewlê liçikanê tue ya.

Bacî ti tîra vac:

– Hey Apo Arbançi, bê teber, ti bixwê w bwecî qundî.

Lûy amey meyda, venda kerg da, kerg şî, tîra va:

– Qey gî ti inkey min borî min rî weş o ez bineyekêkî bireqes.

Lûy va: "Hewl o". Destê yowbînî gured. Kerg tîra va:

– Bineyekêkî ma rî dêrî biki.

Lûy va:

– Hey kergê, kergê, ez inkey ti w liçikanê ti piya borî.

Kerg va: "Serey min o":

– Hey Apo Arbançi bê ti bi xo w bweciy qund ya.

Lûy tersa, va:

– Ano me vac, axirî ez tersenna.

Qalê xo tamam kerdî Apo Arbançi vicya. Tanzî w bwecî hela g' lûy dî, di hal de guret û xeneqnay. Arbançi bi lûy, kerg û liçikan

şa bi.

Paş ko min mewlûd û ev benda ha nivîsandin herdu şanî birayê Şêxê rehmetî Şêx Evdirehîm Efendî dan.

Hingê ewî ji min re got ko ji vê mewlûdê pê ve mewlûdeke din jî bi zarê dumilî hatiye çêkirin û bi ser xist: "Li gora ko di bîra min de maye ji vê dirêjtir bû û ne bi şewa Sêwrekê lê bi ya Pêçarê bû. Yekî bi navê Ehmedê Xasî çêkiribû".

Lê Mela Nezîr ko ji dumiliya Sêwrekê pê ve tu dumiliyê naecibînit dibêje: "Belê Ehmedê Xasî jî mewlûdeke çêkiriye û ew mewlûd gihaye Sêwrekê jî. Min ew dîtiye. Hima sê çar pelik bûn. Ji pirsên kurdmançiyê tîjî bû. Lê piştî ko Mewlûda 'Usman Efendî derket ew betal bû" Lê ji ber ko min dil nîne ez wê betal bikim ji xwendevanan hevî dikim heke pê dizanin û dikarin peyda bikin nivîşteke wê ji min re verêkin da ko ez wê ji bêxîm çapê.

Şam, Tara Kurdan: 16 tîmeh 1933

**Celadet Ali Bedir-Xan**

\* Me tîpguhêziya hersê perçeyên dumilî ji kovara Hêvî, hejmar 2, 1994, girtiye. Tîpguhêziya hersê perçeyan Malmîsanîj kiriye.

## **SEHÎTÎ**

### **Le bo yekîtiya zimanê Kurdî**

- 4 -

Ji ber hersê pirsan ve ez dibêjim

1 - Gereke civatek ji çarkeharên Kurdistanê çê bibe seyda û zana û çend mirovên

go bi lehçeyên Kurdistanê tevan zanin tê de kom bibin.

2 - Şewekî sivik û şêrîn ko pîrên kurdan pê mijûl dibin bigirin ên din tevan bikujin eger pîrsek ji wî ê bijartî kê mî em karin ji şewên kuştî bidizin.

Çiman... go em weha bikin dijwarî digihê du milyon kurd lê eger em şewakî ji tevan çêkin hinga dijwarî digihê neh deh milyon kurd.

Çawan go mîletan hemiyan weha kiriye yanî şewakî pîr şêrîn girtine ên din kuştine.

Belê di qonxerê de hê bêtîr em karin delîl û nîşanan ji fikr û bîra xwe re dirêj bikin êdî heval sax bin.

**Cegerxwîn**

## **SEHÎTÎ**

### **Le bo yekîtiya zimanê Kurdî**

- 5 -

Zimanê kurdî, bi rastî zimanekî pîr şêrîn Zû zehf zengîn we rengîn e. Çunkî galgala wî (mufredat) zor, awayê qisebêjî (lehce û uslûb) gelek zehf e. Ew jî ji ber belavbûna kurdan e li serhedan, we parçekirina welatê wan ê delal ê Kurdistan e li navbera du sê millet û dewletan da. Lewma kurd, ji hevdu veqetiyane û ji hev dûr ketine. Û ji zilm û bêbextiya dijminan îstîbdad û tehqîra bêganeyan, bajêran û gundan berdane. Çûne ketine nav newalan û deştan û derketine ser çiyay û zinaran, dûr li medeniyet û mehrûm ji ilm û îrfanê.

Seva [seba] wî zimanê wan ê kurdî ê pak û delal, ji ni'metê xwendin û nivîsandinê mehrûm maye. We (tenê=tenha) li nav

gundî û eşîran da hatiye peyv û qisekirin. Ema xwenda û zanayê kurdan – heke gundî û eşîrî heke bajêrî be – gişk bi zimanê bêgane û neyaran îlm û îrfan hîn bûne û xuyan zana û xwendayên kurdan hesabandine, û tu li zimanê bav û dê pirs nekirine. Seva wê gire û ribata ke navbera kurdan hebûye, winda bûye û bi yekcar ji nav wan rabûye; ne ko li nav herberek ji bera kurdan ê mezin û gewre rabûye. Belku her eşîrekê ji kurdan xwe tenê kurd hesabandiyê û bi musteqbelê ê dinan nexwestiyê eleqedar bibe. Bi vî awayî, tevda bêganey hev du bûne. Yanî çar, pênc merovên kurd eger li cîkî bicivin we dil bikin ke le ser welatê xwunan qise bikin we ji belengaziya wê baş bikin; bêşik nikarin bi asanî û bi gengazî miraza xwutan fehm kirin bidin, û netiwanin meqseda xwuyan hîn bibin. Çunkî heryek li wan bi awayekî qise dike û dilê xwe da dibê: Ez tenê kurd im. Ê din eger kurd ji bin zimanê kurdî nizanin. Çima? Çünke zar û şeweyê wê nizanin.

We 'l-hal ewan hemû (heme, 'hemû, 'heme, gişk, tevda, giştî) zaro û lawênî milletekî yekziman û yeknijad û yekxwin in. Welê jî li hev nehatiya şewe û zarên wan, nikarin hev û din nas bikin we xwo naskirin bidin.

Eger xwenda û zanaya milletekî bi vî awayî nikaribin bi qise û nivîsa xwe yanî mil û destê hev din bigirin û arîkariya xwutan bikin; bê şubhe ne mumkin e tişteki din da jî destê hev bigirin û yekfikir û yekneseq bibin. Çira?

Çunkî nîşana yekîtiya milletekî û yekbûna komelêkî hebûn û heyiya zimanekî – bi kêmtî yanî 'ela el-eqell li nivîsanê da – yekneseq û yekawa ye. Bê vaya tişteki din çenabe û naye dirist kirin qet. Nuha li vêra pirssek tê bala hemû xwendevan û nivîsevan ew jî vaya ye: Çawan zimanekî kurdîkî yekne-

seq û yekawa ('ela 'l-eqell) li nivîsanê da tê peyda kirin ko hemû kurdan tê bigihîne û pê miraz û meqseda xwuyan biqedînin we çak eda bikin?

\* \* \*

Va nivîsa xwuyanî vira nivîsî, û bona ke Hawar ra ray bikim temîz kiribûm, we bi cuhaba wê pirsê mijûl bûbûm. Ji jimara Hawarê ê şanzdehan da pirsiyarkî heja dor aliya vî mewdû'î; mewdû'ê nivîsara min da hatibû belav kirin we bi kurtî heyanî yekiya gulanê cuhab dihat xwastin. Wexta ke min ev dît û xwend dilê min vehû çavên mi ronî bû we ez zor pê kêfxweş bûm. Seva wê mecbûr bûm cuhabê ko bo temamiya nivîsara xwe hazir dikirdim himan bi te'dil û texyîrêkî hindik binivîsim û bidim bo ev pirsiyariyanê ko li Hawarê da hatiye belav kirin. Paşê vegerim li ser temamiya nivîsarê (meqale) xwo, we doraliya zar û zimanê kurdî, xwasima zazayî (dumilî, dumbilî) da hinek zanîni bo hurî û zimanî belav bikim ko heyanî îro tişteki ji wî nehatiye neşir kirin. Hêviya min ji mirê delal û heja xwediyê Hawarî me hemû kurdan ev e ko ji vî nivîsê şitîk dernexe ji ber ko dirêj e û muxalifê şertê pirsiyariya Hevindê Sorî ye. (2)

1- Zimanê kurdî çawan xwerû û pak dibit?

1- Ma navê pirsiyarê divêt weha bit. Zimanekî kurdêkî tevayî ('umûmî) çawan tê peyda kirin ko hemû kurdan – kurdmanc, goran, lor, kelhor, bextiyarî, zazan, hawraman – jor û jêr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê da, tê bigihîne we karibin pê binwêsin û bixwênin. Çima va pîrsa lazimî weha bit? Çunkî zimanê ko hemû kurdan, kêmtî û zehf têbigihîne hêj peyda nebûye, û nehatiye meydane ko merov, bi paqijî û safî kirina wî mejûl bibe û bixerike.

Herkes zane ko, saf û paqijiya zimanekî hanca paş yekîti (wehdet) we li hev anîna zarên wî ê zehf tê tesewur kirin. Ji bo wê cuhaba vê pirsê ewilî weha didin seva gihaştina mirazê, û peydakirina vê armançê divêt berî hertîştî çiqas zarên û zimanên kurdî – wek kurmançî, babanî, zazayî, lorî, fêlî, bextiyarî, hawremanî. . . – hene be hemû wasteyan û bi awakî zanîni (uslûb îlmî) were civandin û belavkirin. Yanî herzar û herşêwe de bi kêmî – ela 'le-ecell – du sê kitêbok divêt were çapkirin ko heta zana û nivîsevanê kurdan, karibin jê fêde bibînin we şêhr [şî'r] û gouin û nivîsa xwonan, bi qise û pirs û galgalê hemû zarên û lehockanî kurdî çêkin we durust kin we karibin qise û pirsanî bêganeyan berdîn we hêdî, hêdî desta wan jê were kişandin hata bitîwanin bi awayekî kurdî ê xalis û muxlis bêjin û binivîsin.

2 – Bi çi awayî zarê Kurdistanê ên cihê cihê nêzîngî hev dibin. Û zarekî welê tete pê ko, kurd hemû di zarên hev digihên?

Nêzîngbûna zarên zimanên kurdî, hêdî, hêdî û bi xwe ancax paş civandin û belavkirina wan dibin. Çunke wê çaxê heryekê ji xort û ciwanê kurdan ji xwe ra zarêktir - bi zarê xwe - dicibîne tedqîqat û xebata xwe ser wî zarî dimeşîne. We vava midexek dewam dike netîceyê da çiqas zar û lehocyani kurdan hene, tene belav kirin, lakîn bi awayekî zanistî. Û her xwenda û zana û nivîsevan dikare bo nêzîkirina ezmananê kurdî û zarênî kurdmançî û zazayî . . . nivîsa xwunan bi pirs û galgal û awaya hemû zar û zimananî kurdî tevlihev we têkel bike. We sev roj bi vê armançê mejûl bibe. We bona ko hemû kurdanî zana û nivîskaran zanîn û tedqîqatî xwoyan ke li hemû lehocyani kurdî da bikin were xwandin û têgihîştin, divêt îmlakî (awayê nivîsin) mutteliq eleyhî

mewcûd bî heke Latîni bî heke erebî. Mese-la îmlayî erebî yê ke pê zimanê farîsî û 'Usmanî [osmanî] mirî tê nivîsandin ji bo kurdî jî - we lew muweqeten - çak e û baş e xwasima li mabeyna zana û munewwraan da. Ne ko wek biranê me ê kurdanî welatê jêrîni Kurdistan ke nivîsa xwuyan bi hurûfê muqette'e binivîsin heta metb'eyê da, bibe wek şorbe tev li hev û têkel, mirov nikarîbî ji nav derkevit.

3 – Zimanê kurdî çawan pêşve diçî, û bi çi awayî bi ser dikevit?

Hemû nivîsevan û xwendevan ra nas e ko va pirsiyariya netîceya pirsiyariya yekem û ê duduyan e yanî li paş civandin û belavkirina hemû zaranî kurdî, xwe bi xwe ser dikeve we pêşçûyî tê hesabandin. We lê seva ko zû ser bikeve we zahf zengîn û rengîn bibe, lazim e pişt salekê ji va xebatanan civatekî hemûyayî/teveyî (mu'temeri umûmî) bo ziman were li hev we ji bona yekirina awayê nivîsin (îmla) û zarênî kurdî (lehecat) û danîna îstîlahata zansî = zanîne mejûl bibe û bixerîke. We qeraratê ke va xustîsa da derdêxe divêt nik hemû kurdziman meqbûl bit û bi dil were tenfiz kirin. Û dibit herkes bizanî ke mirovîti û qedr û qîmeta wî bi şuxlandina zimanê bav û bapîr û dê û dormaman tê naskirin û zanîn.

Ji ber wê lazim e li ser hemû kurdanî welatparêzan, zar û zêça xwuyan zimanê kurdî ê teveyî hîn bikin we hemû nivîsa xwe bi vî zimanê dayikê binivîsin.

*Misir el-Qahîre*  
**Lacê Henê**

## XWENASKIRIN

*Ji Haco Axayê delal re pêşkêş dikim*

Ey dil tu were bike temaşa  
Ka tac û direfş û kanên ew şah  
Ka şahînsahê cihan Ferîdûn  
Îrec Menûçehrê tekye gerdûn  
Newzir ê bi dû de hatî zab e  
Karê wî bi kêr ji bo me zab e  
Kurapê wî Keyqubadê zordil  
Ostiyax Duristar e wê de bêdil  
Keykawus û Xwusrewê nemek bûş  
Navê wî di deftera de Kîyrûş  
Luhrasibê ferzê wî riham bû  
Qudsî ji nefîrê rar û mar bû  
Kuştasibê dîn û ew li Zeraduşt  
Behmen çû bi dû de dot Harmalîst  
Darayê humay çî jêr debîr bû  
Zerdeştkirina cihan di bir bû  
Darayê duwem çî ejdeha bû  
Kohîn û Muxîn ji ber Ruha bû  
Darayê sêyem ko hat cihan e  
Ferxende nihan bû Ariyane  
Îskenderê hêk zi per ji ber dar  
Belîş kêş dikirin ji bo milkê dar  
Cengek li Kilikya yek li Erbil  
Dara di şerê duwem de bû dil  
Serdar bûn ji Nûh hetanî sêsed  
Sih salî berî mesîh di nav Med  
Aşûr di rojhilat cîhangîr  
Der şehre ava de bûne bargîr  
Alaya zerefş gihîşte Yûnan  
Hind û Yemen û welatê Tûran

\*\*\*

Ka Rostemê kurd û kanî Çopîn  
Ka Nilûferê egît û Gurgîn  
Sultanê Belûc û Xorûsîstan  
Sultanê Hirat Xezen û Efxan

Bapîr e ji wa re şerê Çopîn  
Sultanê li wan ji nesla Gurgîn

\*\*\*

Yezdiwabir û Yezûnûş û Tîrdad  
Sih merwî weh bûne şahê Azad  
Eywana bi nûd ji tac û gurzan  
Dergûş e ji bo tîlûd û dehban  
Piştî ko Mesîh dibûye rehber  
Sasanî li dû dibûne serwer  
Roja ko Huseyn dibûye zava  
Roj we di Belxê çûye ava  
Sultanî buweyh û hakimanan  
Bedlîs û Hezo keranê wan in  
Ev kesro yû keyanê kurd in  
Doza me durust e pê xebirdin  
Tîrdadî ji kurê xwe nivîsand  
Ew kurd ê kurê kurd ê azad  
Şêrgohê ji kirina Azerbaycan  
Şêrgoh e belê di fetha burcan  
Yûsuf bi Selaheddîni navdar  
Pîrsa wî bike ji Flîp û Rîşar  
Ferzê wî eger ko fetha qisê  
Çêkra bi zîmanê kurdî Qudsê  
Xelkê nedigotê Fatimî bû  
Zanayî bikin zîman berî bû  
Zanayê cihan ha seranser  
Pesnê wî didin bi xameya der  
Pişt xatêmê enbiya bi pênc sed  
Şêst salî dibû melîk xwedî bend  
Hêştâ ji evana heştê salî  
Sultanî kirin bila ubalî  
Der Misr û Yemen Hîcaz û Sûrî  
Bayezîd û welatê Şehrezorî  
Heskîf melîkanê wê ji wan in  
Şêrwî bi xwe ferzê wa Keran in  
Merwanî û Amedî li ku man  
Not salî di wê de mane Sultan  
Mîrê di Cîzîra şehre Botan  
Kurdîtû nema li dû Bedîr-Xan

Sultanên bi navê Selim û Qanûn  
 Baxê me li me kirine kanûn  
 Hêja bû ko xaniyê te Îdrîs  
 Zêr helbikira di şehre Bedlîs  
 Kurdmanc te kirine bazikê tirkan  
 Bûn bûkê rîman ciwanê Îran  
 Ey kom û civatên Ewrûpa ye  
 Dilbûn bi vî terzî qê rewaye  
 Bulxar û Mecar û sayê Lubnan  
 Azadî dibin z[j]i bil me kurdan  
 Wilson li ku maye sozika te  
 Musyo Klîmenso gotina te  
 Leşkerkêşê Îngilîzî kani  
 Soza ko te gotî ja ra kani  
 Rastgirê cihan Emîl Bûdicû?  
 Guftara te gotibû çî rast çû  
 Bêje tu bizişkiye çî daro  
 Dermanê nesaxiya me ya ro  
 Yekîti ji me re çî xweş ilac e  
 Yat bûn di me de çî bêrewac e  
 Ey kurdê çiyayê deşt û zozan  
 Umîdê mekin ji destegîran

## B. Ferîdûn

\*. Kitêbxana Hawarê di van rojan de mewlûda zazakî çap û belav kiriye. Ev benda ha pêşgotinka wê mewlûdê ye.

1. Muhemmed Elî Ewnî Efendî ji xwendayên kurdan ên welatparêz û milletperwêr e. Bi xwe jî xelkê Sêwrekê ye. Li Misrê di [Unîversîteya] Ezherê de xwendiyê. Ev deh sal in di dîwana qiranê Misrê de mutercim e. Li Şerefnama ko wê paşiyê li Misrê hate çapkirin pêşgotineke hêja nivîsandiyê.

2. Hêvî û daxwaza te li ser seran û ser çavan.

- ◀ موضوعات كردية ، تأليف : صلاح بدر الدين .
- ◀ القضية الكردية والنظام العالمي الجديد ، تأليف : صلاح بدر الدين .
- ◀ ( ههولير مدينتي الحبيبة ، مدينة المتناقضات ) - حليلة السنجاري - رواية .
- ◀ ( سروه ) - حليلة السنجاري - رواية .
- ◀ البارزاني والحركة التحررية الكردية - مسعود البارزاني - جزءان .
- ◀ دراسات في تاريخ الكورد ، د. فرهاد پيربال .
- ◀ غرب كردستان - دراسة تاريخية - سياسية - وثائقية - موجزة ، صلاح بدر الدين .
- ◀ زنزانه كهقهر - تأليف : سلام عبد الله ، ترجمة : احمد شوكت .
- ◀ şevên deşta mêrdîné - Xemgîn Remo .
- ◀ موجز عن مسيرة الصحافة الكوردية في غرب كوردستان - عبد القادر بدر الدين ، بالكردية والعربية .
- ◀ القضية الكردية امام التحديات - صلاح بدر الدين .
- ◀ المدن الكوردية - آزاد ديركي .
- ◀ West Kurdistan - Salah Bedreddin .
- ◀ صلاح الدين الايوبي من جديد ، عبد الخالق سرسام .
- ◀ الكورد في دائرة المعارف الاسلامية - ترجمة : حميد ريبوار .
- ◀ زرادشت والزرادشتية - رمضان الداودي .
- ◀ تنظيم خويبون وثورة اگری - تأليف : روهاك الاكوم ، مراجعة : شكور مصطفى .
- ◀ Rezmana zimane kurdi - Deham Ebdulfatah .
- ◀ يلماز گونای ودور السينما الوثائقية في النضال الوطني - د . ابراهيم محمود .
- ◀ الادب الشفاهي - علي الجزيري .
- ◀ لقاء العظماء - مذكرات الكاردينال أ . فيليتشكي ، ترجمة عدنان بدر الدين .
- ◀ وقائع المؤتمر التأسيسي لجمعية الصداقة الكردية - العربية .
- ◀ جمعية خويبون والعلاقات الكردية - الارمنية ، محمد ملا احمد .
- ◀ الاصوليات الاسلامية وحقوق الانسان - د. هيثم المناع .

◀ HAWAR

◀ RONAH

## صدر عن رابطة كاوا للثقافة الكردية

- < كفاح واستشهاد البطل السوفياتي الكردي فيودور ليتكين ، تأليف : يوري سالنيكوف ،  
ترجمة : باقى نازي .
- < كردستان والمسألة الكردية ، تأليف : البرفسور بافيج ، ترجمة : برو .
- < لعحات من تاريخ الانتفاضات والثورات الكردية ، اعداد : ابو شوقي .
- < الحركة الوطنية الديمقراطية في كردستان - العراق ( ١٩٦١ - ١٩٦٨ ) ، تأليف : الباحث الكردي  
السوفياتي : ش . ج . اشيريان ، ترجمة : ولاتو .
- < الجبال والسلاح ، تأليف : جيمس اولدريج ، ترجمة : جوان .
- < الجبال الروية بالدم ، باقى نازي - ترجمة عن الكردية : رزو .
- < انتفاضة الاكراد ١٨٨٠ ، تأليف : الباحث الكردي السوفياتي ، جليلي جليل ترجمة :  
سيامند سيرتي .
- < قصائد من الفولكلور الكردي ، تحقيق : حاجي جندي ، اورديخان جليل ، جليل جليل ،  
اعداد وترجمة : ولاتو .
- < نهضة الاكراد الثقافية والقومية ( نهاية القرن التاسع عشر وبداية القرن العشرين ) تأليف :  
جليلي جليل - ترجمة : باقى نازي ، ولاتو ، كدر .
- < القضية الكردية ، ماضي الكرد وحاضرهم ، جمعية خويبون الكردية الوطنية ، النشرة  
الخامسة ، د . بله ج شيركوه .
- < كردستان تركيا بين الحربين ، البرفيسور م . آ . هسرتيان ، ترجمة : د . سعد الدين ملا ،  
باقى نازي .
- < في سبيل كردستان ( مذكرات ) تأليف : زنار سلوبي ، ترجمة : د . رضوان علي .
- < كردستان والاكرد ، تأليف : ملا . ع . كردي .
- < الاكراد ( ملاحظات وانطباعات ) ، الاكراد احفاد الميديين . تأليف : ف . ف . مينورسكي ،  
ترجمة وتعليق : د . معروف خزندار . د . كمال مظهر احمد .
- < الاكراد ، شعبا وقضية ، تأليف : صلاح بدر الدين .
- < Rêzmana Kurdî – Reşîd kurd
- < بطولة الكرد في ملحمة قلعة دمدم ، اعداد : جاسمي جليل - بالكردية والعربية ، ترجمة :  
شكور مصطفى .





Mir CELADET BEDIRXAN  
Xwedî û Berpirsiyare Kovare